

K.T.

ZANÎNGEHA WAN YÛZÛNCÛ YILÊ

ENSTÎTUYA ZIMANÊN ZINDÎ YÊN LI TIRKÎYEYÊ

ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Û ÇANDA KURDÎ

TEZA LÎSANSÂ BILIND

TEŞE Û CIWANKARÎYÊN WÊJEYÎ

DI DÎWANA FEQÎYÊ TEYRAN DE

Edip SAYDUN

14950001002

Şewirmend

Yrd. Doç. Nesim SÖNMEZ

Wan - 2018

T.C.
VAN YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ
TÜRKİYE'DE YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ
KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANA BİLİM DALI

YÜKSEK LİSANS TEZİ

FEQÎYÊ TEYRAN'IN DİVANINDA
ŞEKİL VE EDEBİ SANATLAR

Edip SAYDUN

14950001002

Danışman
Yrd. Doç. Nesim SÖNMEZ

Van - 2018

KURTE

Menzûme û helbestên ku li gor xalên wêjeya klasîk hatine nivîsîn, dema ji aliyê teşeyê ve werin nirxandin pêwîst e hêmanên mîna keş, serwa, paşserwa û *teşeya nezmê* li ber çavan werin girtin. Belaxat, îfadekirina herî zelal û riwîn a hest û ramanekê ya di dem û cîyê xwe de ye; di kurdî de tê beramberî *rewanbêjîyê*. Peyva rewanê jî ew tişta ku bi hêsanî diherike jê re rewan/riwîn tê gotin. Ciwankariyên wêjeyî anku ew karên ciwan, xweşik û şanedar ên wêjeyî jî bi mijara bikaranîna taybet a ziman ve têkildar e.

Ev xebata me ji sê beşan pêk tê. Di ya yekem de jîyan, berhem û hin taybetiyên Feqîyê Teyran hatine vekolîn. Di beşa duyem de li ser helbest û menzûmeyên wî ji aliyê teşe û şêwazê ve hatiye rawestandî. Di beşa dawî de jî me, cî daye peytandina *ciwankariyên wêjeyî* digel pênase, nimandin û mînakên wan.

Di wêjeya klasîk de helbestkarek ji bo ciwankariyên wêjeyî yê resen û biçêj hilberîne ne pêwîst e zimanekî giran û têkel bi kar bîne; ew, bi zimanekî hêsan û riwîn jî vê armanca xwe dikare pêk bîne. Feqîyê Teyran jî ji bo vê mînaka herî baş e.

Peyvên Sereke: Feqîyê Teyran, Feqî, Ciwankariyên Wêjeyî, Teşe, Malik, Helbest û Menzûme

ÖZET

Klasik edebiyatın kurallarına göre yazılan manzûme ve şiiirler, şekil yönüyle değerlendirildiği zaman ölçü, redif, kafiye ve *nazım şekli* gibi öğeler göz önünde bulundurulmalıdır. Belagat, bir duygu ve düşüncenin doğru yer ve zamana göre en sade ve akıcı ifade edilmesidir; Kürtçede *rewanbêjî* sözcüğünün karşılığıdır. Rewan, sözcüğü de kolay ve çabuk akan şey anlamına gelir. Edebi sanatlar yani edebiyatın güzel, hoş ve gösterişli yönü de dilin özel kullanımıyla ilintilidir.

Bu çalışmamız üç bölümden oluşmaktadır. Birincisinde Feqîyê Teyran'ın hayatı, eserleri ve bazı özellikleri incelenmiştir. İkinci bölümde şiiir ve manzûmelerinin şekil ve üslup özellikleri üzerinde durulmuştur. Son bölümünde de *edebi sanatların* tespitinin yanı sıra onların tanım, yorum ve örneklerine yer verilmiştir.

Klasik edebiyatta bir şiiirin güzel ve orijinal edebi sanatlar üretebilmesi için ağır ve müşevveş bir dil kullanmasına gerek yoktur; o, sade ve akıcı bir dille bu amacını yerine getirebilir. Feqîyê Teyran da bunun için en güzel örnektir.

Anahtar Kelimeler: Feqiye Teyran, Feqi, Edebi Sanatlar, Şekil, Beyit, Şiiir ve Manzûme

ABSTRACT

When *Manzume* and poems written according to the rules of classical literature are assessed in the direction of shape, the items such as measure, redif, rhyme and verse form should be taken into account. *Belagat* is the simplest and most expressive expression of a feeling and a thought according to the right place and time. It is the equivalent word *rewanbêjî* in Kurdish. Rewan means something that flows easily and quickly. Literary arts, that is to say, the beautiful, pleasant and ostentatious aspect of literature, are also related to the special use of language.

Our study consists of three parts. In the first part, the life, works and some features of Feqiyê Teyran were examined. In the second part, form and style features of *Manzume* and poetry are emphasized. In the last part, in addition to the identification of literary arts, their definitions, interpretations and examples have been given.

In classical literature, a poet does not need to use a difficult and intricate language in order to produce beautiful and original literary arts. He can reach his purpose with a simple and fluent language. Feqiyê Teyran is the best example for this.

Key Words: Feqiyê Teyran, Feqi, Literary Arts, Figure, Couplet, Poem and Manzume.

PÊŞGOTIN

Di wêjeya klasîk a kurdî de dema navê Feqîyê Teyran tê gotin bêguman şewaza wî ya xwerû û riwîn di hişê mirovan de disewire, loma ji raborîyê û heta dema me helbest û menzûmeyên wî ji alîyê gel ve hatine xwendin û jiberkirin. Sedema vê ya sereke jî bêşik şewaza wî ye û em dibînin ku ev şewaza wî ya hêsan û xwerû ji nîrxên helbestên wî tu tişt kêma nekiriye. Berevajîya vê Feqî, bi vê şewaza xwe ya xweş di helbestên xwe de gelek cureyên ciwankariyên wêjeyî jî hundirandîye û heta mijareke zor û tîkel a mîna tesewîfê jî dîsa bi şewaza xwe ya resen vegotiye.

Feqîyê Teyran hin taybetîyên xwe ve ji xelesa wêjeya klasîk dûr ketiye, vê jî bi xwe re hin teşeyên nezmê yê cihêreng derxistine holê û vê cihêrengîyê jî bo çespanîna teşeyên helbest û menzûmeyên wî, karê lêkolîneran gelek diwartir kiriye û pêşîya nîqaşan jî vekiriye. Bi taybetî bikaranîna wî ya serwaya navekî û dirêjbûna helbestên wî û hwd. li ser mijara teşeyên nezmê tevlihevîyek derxistiye holê.

Me di vê xebata xwe de xwest ku li ser ciwankariyên wêjeyî yên di helbest û menzûmeyên Feqîyê Teyran de derbas bûne em biçespînin. Digel van, cî bidin nimandin û şîroveya her ciwankariya ku me çespanîna wê ji xwe re kiriye armanc. Lewre ciwankari ne tenê firazeya şewaza helbestkarekî ye, hem sînoren xeyalên wî û hem jî behre û asta agahîyên wî nîşan dide. Lê mixabin ji bo ku hem li ser helbest û menzûmeyên Feqîyê Teyran tu şerh û xebatên berfireh nehatine kirin û hem jî di kurdî de li ser ciwankariyên wêjeyî/belaxatê rasterast tu berhem nehatine nivîsîn, me di vê xebatê de gelek diwarî kişandin. Bi vê xebatê -biçûk be jî- me xwest ku kêmasîya di vî warî de ji holê rabe û em hêvî dikin ku piştî vê xebatê li ser ciwankariyên wêjeyî/belaxatê bi kurdî pirtûkên serbixwe werin nivîsîn û ev xebat jî bibe gaveke biçûk. Digel vê mijara sereke, ji ber ku gelek lêkolîneran hemû menzûme û helbestên Feqî, mîna çarrist hatine nivîsîn nîşan dane û li ser vê mijarê di navbera wan de tu yekdengîyek tune ye, me mijara teşeyê jî jixwe re kire armanc û em li serê rawestîyan.

Di pêvajoya amadekirina vê xebata me de ji bo ku şewirmendê min birêz Yrd. Doç. Dr. Nesim SÖNMEZ alîkariyên xwe ji min kêma nekir û şewirmendîtiya min kir ez ji bo vê keda wî gelek spasdar im. Di çespanîna teşeyên nezmê de ji bo ku agahîyên xwe yê nîrxdar bi min re parve kir û ji bo rexneyên wî yê di cî de ez spasîyên xwe ji dil û can pêşkêşî birêz Doç. Dr. Abdurrahman ADAK dikim. Dîsa ji bo ku vê xebata me ji serî heta dawîyê bi hûrgilî xwendin û derîyê pirtûkxaneyê xwe ji min re vekirin ez ji mamosteyên hêja Volkan KORKMAZ û Numan YURT re gelek minetdar im.

Ji bo ku bi hebûna xwe feyz û kêfxweşî dane min û di pêvajoya amadekirina tezê de mîna lehengên veşartî tevgerîyane, ji malbata xwe re spasîyên xwe pêşkêş nekim dê ev beş kêma bimîne.

NAVEROK

KURTE	III
ÖZET	IV
ABSTRACT	V
PÊŞGOTIN	VI
NAVEROK.....	VII
KURTEBÊJE.....	XII
DESTPÊK	1
BEŞA YEKEM	6
FEQÎYÊ TEYRAN.....	6
1.JÎYANA FEQÎYÊ TEYRAN	6
1.1. Navê Wî û Dîroka Jidayikbûn û Mirina Wî :.....	6
1.2.Eşîr û Malbata Wî:	8
1.3. Xwendina Wî û Erdnîgarîya Lê Jîyayî:	9
1.4. Nasnavên Wî:	11
2. HIN TAYBETÎYÊN WÎ YÊN DI WÊJEYA KURDÎ DE.....	13
3. NAVEROKA BERHEMÊN WÎ YÊN KU TÊN ZANÎN	18
3.1.Menzûmeyên Wî yên Tesewîfî/Dînî û Dîrokî:.....	18
3.1.1. Menzûmeyên Wî yên Tesewîfî/Dînî:	18
3.1.1.1. Şêxê Sen'an	18
3.1.1.2. Bersîsê Abid.....	19
3.1.1.3.Zembîlfiroş	20
3.1.2. Menzûmeyên Wî yên Dîrokî:.....	22
3.1.2.1.Keleha/Şerê Dimdim	22
3.2. Helbestên Wî yên Lîrîk.....	23
3.2.1. Ellah Çi Zatekî Ehsan e	23
3.2.2. Ey Av û Av	24
3.2.3. Îro Ji Dest Husna Hebîb	24
3.2.4. Bi Çar Kerîman	24
3.2.5. Îro Gîrya Me Te.....	24

3.2.6. Feqe û Bilbil	25
3.2.7. Dilber:	25
3.2.8. Feqe û Mela.....	25
3.2.9. Dilo Rabe:	26
3.2.10. Îlahî Lew Dikim Zarî :	26
3.2.11. Ez Çi Bêjim	26
3.2.12. Ay Dilê Min Ay Dilo:.....	27
3.2.13. Qewî Îro Ze'îf Hal im:.....	27
3.2.14. Çiya Anî Li Deştê Kir:.....	27
3.2.15. Îlahî 'Ebdukel Atak :	27
3.2.16. Ji 'Îşqê Sotîme Welleh :	28
3.2.17. Bizan Ku Min Yar Tu yî.....	28
3.2.18. Ey Dil Hilo Terk Ke Sefa.....	28
3.2.19. Ordeka Ava Cizîrê	28
3.2.20. Fesla Bihara Cennetê.....	28
3.2.21. Xwedawenda Gunehkar im	29
3.2.22. Xwedawenda Tu Sebbûh î.....	29
3.2.23. Îro Ji Eşqa Sorgulê.....	29
3.2.24. Dilo Carek Xwo Hişyar Ke	29
3.2.25. Min Dî di Xewnê da Gulek	29
3.2.26. Ji Eşqê Te Ezî Dîn im.....	30
3.2.27. Hatim Ber Dergehê Rehmet	30
2.3.28. Ah Ji Destê Cama Wîsalê	30
3.2.29. Ellah Sehergeha Ezel	30
BEŞA DUYEM	32
NÊRÎNEKE RÛXSARÎ LI SER DÎWANA WÎ	32
1. JI ALÎYÊ TEŞEYÊ VE	32
1.1. Ji Alîyê Keşê ve:	32
1.1.1. Ji Alîyê Keşa Erûzê ve:.....	32
1.1.2. Ji Alîyê Keşa Kîteyî ve.....	37
1.2. Ji Alîyê Teşeya Nezmê ve.....	38
1.2.1. Xezel	39
1.2.1.1. Xezelên Musemmet	40

1.2.1.2. Xezelên Bêmetla.....	44
1.2.1.3. Xezelên Muzeyyel.....	47
1.2.2. Qesîde	48
1.2.3. Muselles:	53
1.2.4. Teşeyên Serbixwe.....	58
1.3. Ji Alîyê Serwa û Paşserwayê ve:	63
1.3.1. Serwa:.....	63
1.3.2. Li Gorî Cih Cureyên Serwayê:	63
1.3.2.1 Serwaya Bêpaşserwa:.....	63
1.3.2.2. Serwaya Bîpaşserwa:.....	64
1.3.1.1.3. Serwaya Navekî:	65
1.3.1.2. Li Gorî Hevbeşîya Dengên Cureya Serwayê:.....	65
1.3.1.2.1. Serwaya Mucerrred:.....	65
1.3.1.2.2. Serwaya Murekkeb:.....	66
1.3.1.2.2.1 Serwaya Murdef :	66
1.3.1.2.2.2. Serwaya Muqeyyed	67
1.3.1.2.2.3. Serwaya Muesses	67
1.3.2. Paşserwa.....	68
1.3.2.1. Paşserwaya Qertafî	68
1.3.2.2. Paşserwaya Qertafî û Bêjeyî.....	69
1.3.2.3. Paşserwaya Bêjeyî	69
2. JI ALÎYÊ ŞÊWAZÊ VE	70
2.1. Zarava û Devoka Ku Bi Kar Anîye.....	71
2.2. Ji Alîyê Sazbûnê ve Peyvên Resen ên Helbestên Wî.....	72
2.2.1. Peyvên Xwerû.....	73
2.2.2. Peyvên Dariştî.....	73
2.2.3. Peyvên Hevedudanî û Komî.....	73
2.3. Bandora Zimanên Bîyanî Li Ser Helbestên Wî:	75
2.3.1. Bandora Farisî.....	75
2.3.2. Bandora Erebî:.....	76
2.3.3. Bandora Tirkî:	78
2.4. Bandora Term û Têgihên Tesewifê:	78
BEŞA SÊYEM	83

CIWANKARÎYÊN WÊJYÎ DI DÎWANA FEQÎYÊ TEYRAN DE	83
1. CIWANKARÎYÊN BI MECAZAN RE TÊKILDAR IN	85
1.1. Teşbîh	85
1.1.1. Teşbîha Mufessel (Teşbîha Bihûrgilî):.....	87
1.1.2. Teşbîha Mucmel (Teşbîha Kurtkirî):	88
1.1.3. Teşbîhî Muekked (Teşbîha Perçînkirî):	88
1.1.4. Teşbîha Bedew (Teşbîha Belîx):	89
1.2. Îsti'are	91
1.2.1. Îsti'areya Musaraha (Îsti'areya Vekirî)	92
1.2.2. Îsti'areya Mekkîyye (Îsti'areya Girtî):	94
1.3. Kînaye:	96
1.3.1. Kînayeya Qerîbe:	97
1.3.2. Kînayeya Be'îde:	98
1.4. Mecaza Mursel:	99
1.4.1. Têkilîya Nav û Der:	100
1.4.2. Têkilîya Parçe û Tegahî:	101
1.4.3. Têkilîya Sedem û Encamê:	101
1.4.4. Têkilîya Pêşîtî û Paşîtîyê:	102
1.4.5. Têkilîya Giştî û Taybetî:	103
1.5. Teşxîs:	104
1.6. Întaq:	104
2. CIWANKARÎYÊN BI WATEYÊ RE TÊKILDAR IN	107
2.1. Mubalexe:	107
2.1.1. Teblîx:	108
2.1.2. Ixraq:	109
2.1.3. Xuluv:	109
2.2. Tezad:	111
2.2.1. Tibaqa Îcabê:	112
2.2.2. Tibaqa Selbê:	112
2.3. Tekrîr:	114
2.4. Husn û Ta'lîl:	117
2.5. Tecahula Arif:	120
2.6. Tenasub:	123

2.7. Tewrîye:.....	126
2.8. Îstifham:	130
2.9.Nîda:	133
2.10. Telmîh:.....	136
2.11. Îqtîbas:.....	143
2.12. Teradif:	145
3.CIWANKARÎYÊN BI RUXSARÊ VE TÊKILDAR IN	147
3.1. Cînas:.....	147
3.1.1. Cînasa Tam:	148
3.1.1.1. Cînasa Basît:	148
3.1.1.2. Cînasa Murekeb:	149
3.1.2. Cînasa Kêm:.....	150
3.2. Iştîraq:.....	152
3.3. Alîterasyon û Asonans:.....	156
3.4. Î'ade:.....	159
3.5.Muwazene:.....	163
3.6.Tesmît:.....	165
ENCAM	168
ÇAVKANÎ	170
JÎNENÎGARÎ	174

KURTEBÊJE

b.:	bend
bnr.:	binêrin
C.:	cild
Ç.:	çap
Doç.:	Doçent
Dr.:	Doktor
hwd.:	her wekî din
h.b.:	heman berhem
H.:	hejmar
m.:	malik
nr.:	navber
Prof.:	Profesôr
r.:	rûpel
wer.:	wergêr
weş.:	weşanxane



DESTPÊK

Di vê xebata xwe de me xwest ku li ser ciwankariyên wêjeyî yên menzûme û helbestên Feqîyê Teyran rawestin û van berhemên wî ji aliyê “teşeyê” ve vekolin. Pirsgirêkên lêkolîna me ev in: Feqîyê Teyran di helbest û menzûmeyên xwe de kîjan ciwankariyên wêjeyî bi kar anîne û helbest û menzûmeyên xwe bi kîjan teşeyên nezmê nivîsîne? Dema me ev pirs bersivandin ev xebata me dê bigihîje armanca xwe û cîyê Feqîyê Teyran a di wêjeya kurdî de hindik be jî ê were fêmkirin.

Her çiqas mebesta me ya sereke ev be jî ji bo ku bi mijarên me ve carinan rasterast û carinan jî bi awayekî binavgîn têkildar in, me cî daye tetbîqkirina cureyên keş, serwa, paşserwayê û honandina serwayê. Digel van, taybetîyên ziman û şewaza helbest û menzûmeyên wî û naveroka wan û dîsa jîyan, berhem û hin taybetîyên wî di vê xebata me de cîyên xwe girtine.

Feqîyê Teyran her çiqas di nav gel de gelek hatibe nasîn jî mixabin li ser berhem û jîyana wî agahîyên kêr di destên me de hene û dîsa li ser van taybetîyên wî xebatên zanistî jî kêr in. Di van salên dawî de piştî ku kêlên gora wî li Şandisa Hîzanê tê dîtin, li ser kêleke gora wî derbarê mirina wî û li ser navê wî yê rasteqîn de agahîyên girîng tên wergirtin. Lê ji bilî vê di berhemên wî de jî hin agahîyên biçûk ên mîna nasnavê wî, cîyên ji sedemên curbicur lê jîyayî û hin dîrokên ku helbestên xwe li gor ebecedê nivîsîne cîyên xwe girtine. Lê mixabin li ser eşîr û dê û bavê wî, zewac û zarokên wî tu agahîyên teqez tune ne; hebin jî li gor rîwayet û şîroveyan hatine vegotin û nivîsîn.

Di nav wêjeya klasîk a kurdan de kêr helbestkar hene ku di nav zargotina kurdan de û di nav civatên kurdan de mîna Feqî navdar bûne, lewre ew hem bi helbestên xwe ve hem çîrok û serborîyên xwe ve di nav gel de mîna lehengekî çîrokan navdar bûye. Heta gelek tiştên derasayî jî ji bo wî hatine gotin. Ev tev bi xêra şewaza wî ya hêsan û semîmî ye. Ew bi xêra şewaza xwe, kariye gel ji aliyê mijarên dînî/tesewifî ve ronî û hişyar bike û di vê rêyê de helbest û menzûmeyên xwe mîna amûrekî bi kar anîye. Ew ji xelesa wêjeya klasîk a dînî dûr neketiye. Li gor wî dinya cîyekî demdemî ye, mîna pîrebokeke bêyom e; lewre serê her kesî xwariye û dê bixwe. Ew, zehf pîr e lewre wê gelek kesî dîtiye; ew, pîr e milxûl e. Divê ya can anku axiretê mirov pê nede û hwd. bi vî rengî gel hişyar kiriye. Ji ber vê ye ku heta piştî ku ew dimire jî her rojên pêncşeman gel gora wî ya pîroz zîyaret kiriye û ew bi rêzdarî heta roja me bi bîr anîye.

Em ji helbest û menzûmeyên wî tê digihîjin ku Feqîyê Teyran xwedîyê gelek ‘ilm û agahîyan e. Heya wî ji ayet û sûreyên Qur’ana pîroz heye; derbarê çîrokên evînî û yên îsrailîyatê de xwedî agahî ye. Ew, dîroka pêxemberan û kesên navdar en Rojhilatî û yên Rojavayî û hizrên mîna tesewif, wehdetil wucud, dewrîye û hwd. baş dizane. Ev tev nîşan didin ku Feqîyê Teyran, ji atmosfera çanda Rojhilatî para xwe baş girtiye û ev bi şêwaza xwe ya resen di nav wêjeya klasîk a Kurdî de gelek baş strandine û piştre jî bi awayê ciwankariyên wêjeyî pêşkêşî me xwîneran kiriye.

Em ji pirtûkên li ser berhemên Feqîyê Teyran hatine nivîsîn têdigihîjin ku li ser helbest û menzûmeyên wî edîsyon krîtîkeke zanistî mixabin nehatiye kirin. Hin helbestên ku bi wî ve tîn nîsbetkirin mexles tê de derbas nabin û îhtimal e ku ev helbestên bênasnav ne yên Feqîyê Teyran bin jî. Heta ji bo ku dîwana wî ne dîwaneke mûredeb e hin lêkolîner, ew mîna keşkûlekê dîtiye helbestên ku bi destên wan ketine xistine nav vê berhema xwe ya çapkirî. Vê jî guman xistine dilê me. Lê belê di vê mijarê de kemasîya me jî heye; lewre divîyabû me jî xwe gihandibûna hemû destxetên Feqîyê Teyran û edîsyon krîtîka wan kiribûna û bi vî rengî xwe gaveke din gihandibûna destxeta herî nêzîk a Feqîyê Teyran. Lê mixabin tu derfetên me nîn bûn ku em vê hizra xwe bi cî bînin. Ji ber vê me, tenê ji berhemên li ser navê Feqîyê Teyran hatine latînzekirin sûd wergirtiye.

Me di vê xebata xwe de ji bo qada xebatê sê pirtûkên ku li ser berhemên Feqîyê Teyran hatine nivîsîn di ber çavan re derbas kiriye. Yek ji wan a M. Xalid Sadinî ye û bi navê “Feqîyê Teyran Jîyan, Berhem û Helbestên Wî” hatiye çapkirin, ya duyem pirtûka Seîd Dêreşî ye ew jî weke “Dîwana Feqîyê Teyran” hatiye binavkirin, berhem ji alîyê destnîşankirina jêderka destxetên/helbestên Feqî gelek nirxdar e û di dawîya vê pirtûkê de nivîskar cî daye hin destxetên van berheman û ya dawî jî ya Prof. Dr. Kadri Yıldırım e û ew jî pirtûkeke bi du cildî ye, bi navê “Faqî-yi Teyran Divan/ Dîwan Feki-yi Teyran” digel wergera wê ya tirkî hatiye çapkirin. Di nav van pirtûkan de me helbest û menzûmeyên di pirtûka M. Xalid Sadinî ya bi navê “Feqîyê Teyran Jîyan, Berhem û Helbestên Wî” jî xwe re kire mijara xebata xwe. Di vê pirtûkê de bi qasî 36 helbest û menzûmeyên Feqî cîyên xwe girtine; lê belê helbesta bi navê Çîya Anî li Deştê kir, careke din di bin navê Ji Rengê Dilbera Horî hatiye nivîsîn. Her çiqas hejmara van berhemên Feqî 35 bin jî em li ser helbestên Îlahî Ger Gunehkarem û Sînem û Çerxa Felekê ranewestîyan. Sadinî, di berhema xwe de li gor berhemên din li ser jîyana Feqîyê

Teyran zehftir rawestîyaye. Her çiqas kême be jî behsa şewaza berhemên wî kiriye. Lê ew ji aliyê teşeyên nezmê ve nenirxandine û behsa keş, serwa û paşserwaya wan nekirine. Li gor wî Feqî hemû berhemên xwe bi awayê çarist honandiye. Her du pirtûkên din jî li ser cureyên keş, serwa û paşserwayê nehatine rawestandî; lê di pirtûka Prof. Dr. Kadri Yıldırım de derbarê teşeyên nezmê yê berhemên wî de agahî hatine dayîn; lê belê di vê mijarê de çespendinên me û yê ve pirtûkê ji hevûdin cihê ne. Digel vê, di pirtûkê de ji hêla tîpguhêstî de jî hin çewtî hene. Bo nimûne: Di cilda duyem a rûpela 120em de helbesta biserenava “Îlahî Ebdukel Etak” mîna “Îlahî Ebduke Atak” hatiye nivîsîn û heman çewtî di pirtûka Sadîni de jî bi rengê “Îlahî Ebdukel Etak” xwe domandiye.

Di nav pirtûkên kurdî de yê bi mijara “ciwankariyên wêjeyî” re rasterast tîkildar in gelek kême bûn û yê heyî jî gelek bi sînorkirî û rûkî bûn, vê jî karê me diwartir kir. Ji van çavkanîyan hin ji wan ev in: Mela Ehmedê Zivingî, Şerha Dîwana Melayê Cizirî, bi serenava “Bikaranîna Hunera Bedî’/Bedewî û Rewanîyê”; M. Emîn Bozarslan, Mem û Zîn, bi serenava “Ji Aliyê Hunerî ve Mem û Zîn”; Perwîz Cîhanî, Mem û Zîn, bi serenava “Nasandîna Cuwankariyên Toreyî û Biwêjên Wê” û Rojen Barnas bi nivîsa xwe ya bi navê “Termên Edebî” ku ev jî di kovara Nûdemê de derketibû. Di nav van çavkanîyan de her çiqas a Perwîz Cîhanî ji aliyê hejmara ciwankariyan ve zehftir be jî lê ji aliyê tîpguhêstî û şewazê ve pîrsgirêkên wê hebûn. Mela Ehmedê Zivingî û M. Emîn Bozarslan jî li ser vê mijarê agahiyên gelek kême dabûn; di nav van xebatan de ya herî baş dîsa ya Rojen Barnas bû. Barnas, li ser serwa û paşserwa û li ser çend tîpguhêstî wejeyî rawestîyabû û cî dabû hin ciwankariyên wêjeyî û çend keşên erûzê jî. Lê belê ew jî ji bo xebata me kême mabûn. Divê were gotin ku di mijara ciwankariyên wêjeyî de me herî zêde ji pirtûka Prof. Dr. M. A. Yekta Saraç a bi navê “Klasik Edebiyat Bilgisi Belagat” û ji bo mijara teşeyên nezmê jî dîsa me ji berhema wî ya bi navê “Klasik Edebiyat Bilgisi Biçim-Ölçü-Kafiye û Klasik Edebiyat Bilgisi Belagat”ê sîd wergirtiye. Digel van pirtûka Doç. Dr. Abdurrahman Adak a bi navê “Destpêka Edebîyata Kurdî ya Klasîk” jî di mijara teşeyên nezmê û serwa û paşserwayê de gelek bi kêrî me hat.

Digel çavkanîyên vê xebatê di amadekirina wê de hin gotar, tez û nivîsên ku di ber çavan re hatine derbaskirin kême zêde ev in:

Berken Bereh, “*Ey Av û Av*”, Kovara W , H. 29., Dîyarbekir 2009, r. 37.

Bülent Kaya, Feqîyê Teyran’in Şêxê Sen’an Şiirinin İçerik Açısından İncelenmesi, Dicle Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı, Yüksek Lisans Tezi, 2017

Firatê Dengizî, “*Dilê Feqî*” Kovara W , H. 29., Dîyarbekir 2009, r.41

Îmad Weysî Xalid, Berawirdkirdinê (Dastanê Şêxê Sen’an)î Ettarî Nîşabûrî û Feqîyê Teyran, Pileyî Doktora, Zankoyê Selehedîn, Hewlêr, Heremî Kurdistan, Iraq 2003

Mîrza Ronî, “*Şopên Feqîyê Teyran*” Kovara W , H. 29., Dîyarbekir 2009, r. 51.

Seîd Dêreşî, “*Mîr Mih û Mîm û Hê*” Kovara W , H. 29., Dîyarbekir 2009, r. 49.

Sewer Denîz, “*Feqî Xwezanîn û Paşxane*” Kovara W, H. 29., Dîyarbekir 2009, r. 46.

Şeyhmus Orkin, Di Berhemên Feqîyê Teyran de Hêmanên Tesewifî, Zanîngeha Alparslan a Muşê Estîtuya Zanistên Civakî Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Teza Lîsansa Bilind, 2015

Me di xebata xwe de pêşî behsa cureyên serwa û paşerwayê û yên keşê kiriye û piştê jî ew li ser mînakên helbest û menzûmeyên Feqîyê Teyran nîşan dane. Ji bo teşeya nezmê jî me, pêşî cî daye pênase û nimandina teşeya nezmê ya ku me çespendina wê jî xwe re kiriye armanc. Piştê me jî helbestên Feqîyê Teyran a ku bi mijarê re têkil dar e herî kêr cî daye mînakekê û ji bo ku em, agahîyên xwe piştrast bikin, me jî çend helbestkarên klasîk ên kurd jî mînakên bi heman rengî girtine. Di dawîyê de jî em li pey çespendina ciwankariyên wêjeyî yên ku Feqî di helbest û menzûmeyên xwe de bi kar anîne ketine. Berî çespendina ciwankariyan ji bo piştrastkirina mînakên ciwankariyên wêjeyî yên ku di helbestên Feqî de derbas bûne me pêşî bi awayekî bi hûrgilî cî daye pênaseya wan û bi berfirehî ew ciwankarî nimandine, ji bo ku hin ciwankariyên wêjeyî baştir werin fêmkirin me carcaran serî gotinên pêşîyan jî daye, ciwankariyên ku nêzikî hevûdin bin me behsa cudahiya wan kiriye û piştê mînakên Feqî di warê ciwankariyên wêjeyî de şîrove kirine. Herî dawîyê de jî me ew ciwankariya ku behsa wê kiriye derbarê wê de, bi qasî bendekê, agahîyên bi giştî dane.

Bi vê rêbazê em, hêvî dikin ku helbest û menzûmeyên Feqî ji aliyê teşeyê ve li ber çavan werin raxistin da ku kêmasî û çewtîyên li ser vê mijarê hatine kirin hindik be

jî werin rastkirin û ciwankariyên wêjeyî yên ku helbest û menzûmeyên wî de derbas bûne jî yek bi yek werin kifş kirin; lewre ciwankariyên wêjeyî awêneya şêwaz, têgihîştin û hestkirina helbestkarekî ye.

Bi vê xebata biçûk, cîyê Feqîyê Teyran a di wêjeya kurdî de hindik be jî were fêmkirin em ê bextewar bibin.



BEŞA YEKEM

FEQÎYÊ TEYRAN

1. JÎYANA FEQÎYÊ TEYRAN

1.1. Navê Wî û Dîroka Jidayikbûn û Mirina Wî :

Yek ji helbestkarên ku di nava rûpelên dîroka wêjeya klasîk a kurdî de cîyekî taybet girtiye Feqîyê Teyran e. Navê wî yê rasteqîn Mihemmed e. Lewre ew di dema muşa'ere anku pêkvegotina helbesteka xwe ya bi navê “Feqe û Melê” da di risteya bendekê da “Bi ismê Mihemmed nav im.”¹ dibêje û nemaze derbarê vê mijarê de agahîyeke nirxdar dide.

Her çiqas derbarê jidayikbûn û mirina Feqîyê Teyran de ji aliyê hin wêjenas û lêkolîneran ve gelek gotegot û hizrên ji hevûdin ciyawaz hatibin nivîsîn jî derheqê dîroka jidayikbûna wî de di malika jêrîn de bi rêya hin delîlan agahîyên teqez tên bidestxistin:

“**Mîm û Hê** heftê felek çûn ji hîcretê dewran gelek çûn

Sal hezar û çil û yek çûn ev xezel anî diyare”

(Feqîyê Teyran, Dilo Rabe, m. 80., r. 236)

Nexwe dema Feqî, ev helbesta xwe (Dilo Rabe) ya ku ev malik tê de derbas dibe nivîsiye bi gotina “heftê felek çûn” nêzikî heftê salîya xwe dijî; lewre heftê felek, heftê sal dîke² û bi gotina “Sal hezar û çil û yek çû” jî dîroka hicrî ya ku tê de dijî nivîsiye. Dema ji dîroka 1041ê 70 sal were kêmkirin 971ê hicrî dimîne û ev jî nêzikî beramberê 1563yê mîladî ye. Nexwe li gor vê peytandinê Feqî di 1563yan de hatiye dinê³. Digel vê li ser cîyê jidayikbûna wî ji aliyê gelek lêkolîneran ve lihevkirineke xurt heye. Li gorî wan Feqî ji Miksê (Wê demê li ser Hekarîyê bû) ye⁴. Heta Feqî, di helbestên xwe de bikaranîna mexles/nasnavê xwe yê “Miksî” vê agahîyê piştrast dîke:

¹ M.Xalid Sadînî, *Feqîyê Teyran, Jîyan, Helbest û Berhemên Wî*, Weş. Nûbihar, Ç. heftem, İstanbul 2013, r. 200

² Abdurrahman Adak, *Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk*, Weş. Nûbihar, Ç. yekem, Stenbol 2013, r.211

³ M.Xalid Sadînî, h.b., r. 44

⁴ Qanatê Kurdo, *Tarîxa Edebiyata Kurdî*, Weş. Özge, Ç. duyem, Enqere 1992, r.70; Kadri Yıldırım, *Faki-yi Teyran Divan-Dîwan Feki-yi Teyran*, Wer. Kadri Yıldırım, Weş. Wezaretê Çandê, Ç. yekem, Enqere 2014, C. yekem, r. 16; Mehmet Uzun, *Destpêka Edebiyata Kurdî*, Weş. Îtakî, Ç. sêyem, 2011 Stenbol, r. 12; Abdurrahman Adak, h.b, r.211; Seîd Dêreşî, *Kelehên Ava*, Weş. Spîrêz, Ç. yekem, Hewlêr 2005, r. 21 û hwd.

“**Miksî** dibê avê webû pêxemberan aqil hebû

Qet hewceyî pirsan nebû wan dest gihabû sohbetê”

(Feqîyê Teyran, Ey Av û Av, m. 29., r. 120)

û ev xwe di çend cîyan de dubare dike; lê ji bo gundê ku lê çêbûye agahî û delîlên bi vî rengî di dîwana wî de tune ne. Li gor rîwayetê ew li gundê Warezûzê ya bi ser Miksê ve hatiye dinê⁵.

Li ser mirina Feqîyê Teyran di çend salên dawî de hin agahîyên zelal hatine bidestxistin. Li gor van agahîyan li gundê Şandisa Hîzanê kêlên gora wî hatine dîtîn, ji van kêlan a kêla li ber serî de bi tîp û nivîsîna erebî: ”Ev gora dilşad, rehmêtî, bexşandî û mihtacê rehmeta Xwedê Mihemedê navdar ê bi Feqehê Teyran e ku di sala 1041ê de koçî dawîyê kiriye.”⁶ nivîsîye, li gor vê ew 1041ê hîcrî ku ev jî beramberî 1632ê mîladî dike çûye rehmêtê. Nexwe li gor van daneyan Feqî dema çûye rehmêtê di 69 saliya xwe de bû, dîsa li gor vê nivîsê ihtimaleke mezin e ku ew li gundê Şandisa Hîzanê emrê Xwedê kiriye; lê digel dîtina kêlikên gorina wî jî tu teqezîyek tune ye ku ew li gundê Şandisê yan jî li gundê Warezûzê ya Miksê hatiye veşartin; lewre li ser veşartina Feqî, di navbera Miksî û Hîzanîyan de bûyere rûdaye û ev jî mîna çîrokekê di nava gel de belav bûye û heta roja me hatiye⁷. Rastîya vê bûyerê li aliyekî, vegotina çîroken bi vî rengî tişteki pêkan e; lewre di nava demê de gelek gorên wan kesên ku ji aliyê gel ve hatine nasîn û hezkirin dikare derkeve holê, ev jî nîşaneyê parvenekirin û hezkirina wan kesayetên e, Feqî jî yek ji wan e.

Wek encam, li gor agahîyên me yê jorîn navê rasteqîn ê Feqîyê Teyran Mihemmed e, ew 1563an li gundê Warezûzê ya bi ser Miksê ve hatiye dinê û 1632an li gundê Şandisa Hîzanê çûye ber dilovanîya Xwedê û ihtimaleke mezin e ku li wir hatiye veşartin.

⁵ Kadri Yıldırım, h.b., r. 16, Abdurrahman Adak, h.b., r. 211 û h.w.d.

⁶ Abdurrahman Adak•Yusuf Baluken•Hayrullah Acar, ”Gora Feqîyê Teyran”, Nûbihar Akdemî, H. 1, C. 1., Stenbol 2014, nr. 115-116

⁷ M.Xalid Sadîni, ”Çend Mesele di Derbarê Feqîyê Teyran de”, Nûbihar, H. 127, Stenbol 2014, r. 35

1.2.Eşîr û Malbata Wî:

Derbarê zewac û malbata Feqîyê Teyran de di pirtûk û gotarên ku li ser wî hatine nivîsin de mixabin tu malûmat nehatiye dayîn, di helbest û menzûmeyên wî de jî em dîsa tûşî tu delîlan nayên; lê belê derbarê zewaca wî de di nava gel de çîrokeke bi navê “ Feqîyê Teyran û Sêva Heram”⁸ belav bûye û li gor vê çîrokê ew jî gundê Warezûzê zewicîye.

Em agahîyên balkêş ên derbarê êl û eşîra Feqî de ji gotara Celadet Elî Bedîrxan a bi navê “Klasîkên Me”⁹ digrin. Li gor Celadet nisxeyeke Şêxê Sen’anî li ber destê wî heye û di dawîya wê de bi erebî hatiye nivîsîn ku ev nezim ji aliyê “Mîr Mihemed” ve hatiye tamam kirin û ev Mîr Mihemed bi navê Feqîyê Teyran navdar bûye. Li gor vê şîroveyê Feqîyê Teyran mîr bû û îhtimaleke mezin bû ku ew jî mîrekên “Miksê” bû.

Li gor Sadînî jî Feqî ji mala Mîrê Miksê ye û navê wî yê din ku di nava gel de tê zanîn “Feqê Mala Mîr Ebdalan” e. Sadînî di vir de “ Şerefnameyê” jî xwe re bingeh digire û dibêje Feqê Teyran kurê Mîrê Miksê Mîr Ebdal e¹⁰. Ya bi rastî dema mirov Şerefnameyê dinêre di dîroka navborî de di nava Mîrên Miksîyan de bi navê Mîr Ebdalê kurê Mîr Ehmed heye û du zarokên wî hene, navê yek ji wan jî “Mihemed” e¹¹. Lê belê jî bo ku em van agahîyan piştrast bikin pêwîst e awirên xwe dîsa bizîvrînî menzûme û helbestên wî û pey şopa mîrbûna wî bikevin. Li gor hizra me di çend malikên wî de em li ser vê mijarê hin delîlan bi dest dixin. Bo nimûne, di malikeke helbesta xwe ya bi navê “ Ordeka Ava Cizîrê” de wisa dibêje:

“Ne me ra **mîr** im bibêje ne bi hîcranî mepêje

Çerx û dolabek qirêj e ev denîdinya fetîq”

(Feqîyê Teyran, Ordeka Ava Cizîrê, m. 9., r. 455)

⁸ Ebdurreqîp Yûsif, *Dîwana Kurmancî*, Weş. Dîwan, Ç. yekem, Stenbol 2012, r. 39; Feqî Huseyn Sagniç, *Dîroka Wêjeya Kurdî*, Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Ç. yekem, Stenbol 2002, r. 37; M.Xalid Sadînî, h.b., r. 98

⁹ Herekol: “Azîzan, *Klasîkên Me An Şahir û Edîbên Me Ên Kevin*”, Kovara Hawarê, H. 33., Weş. Sebat, Şam 1941, r. 9

¹⁰ M.Xalid Sadînî, nr. 47-50

¹¹ Şerefhan, *Şerefname Kürt Tarihi*, Wer. M. Emin Bozarşan, Weş. Hasat, Ç. sêyem, Stenbol 1990, nr. 245-246

Di vê denîdinyaya ku mîna çerx û dolabeke qirêj e, min ne bi agirê cudabûnê bisoje û ne jî pişt re ji min re “Mîr im!” bibêje. Li gor vê nexwe di jîyana rasteqîn de hin kes ji Feqî re mîr im jî gotine ku ew, dema ji qirêj û dek û dolabên dinyayê gazindan dike navê ku payebilindbûna wî nîşan dide bi awayekî dilşikestî red dike. Heman helwestê bi celebeke din di malika bin re jî nîşan daye:

“Ne ji **mîran** im ne **xan** im **muksî** yim bê xan û man im

Cesed im bêrûh û can im ketme pê derdê ‘emîq”

(Feqîyê Teyran, Ordeka Ava Cizîrê, m. 10., r. 455)

Di helbestên Feqî de bi gelemperî jixwe xwebiçûkxistin û reşbîniyek tê hîskirin di dawîya vê helbestê de jî ev tê dîtin. Ew, ji ber ku ketiye pey derdekî kûr û nedîtî mijûlîya wî ne mîrîtî û ne xanîtî ye; lewre kesên mutesewif in xwe nasipêrin şohret û qaîdeyan¹²; xwe ji nav û meqaman şûştine, Feqî jî heman helwest nîşan daye.

Nexwe li gor van peytandinan ew ji malmezinan e anku kurê Mîr Ebdal e, Mîr Ebdal jî ji mîrekên Miksê ye, ji ber vê li ber navê wî nasnava mîrîtîyê jî hatiye bikaranîn û jê re Mîr Mihemed gotine.

1.3. Xwendina Wî û Erdnîgarîya Lê Jîyayî:

Bi qasî ku hatiye gotin Feqîyê Teyran, di gelek medreseyên Kurdistanê de û li cem seydayên payebilind ‘ilm xwendiyê. Wî xwendina xwe ya pêşî li Miksê di Medreseya Mîr Hesên Welî de kiriye û piraniya xwendina xwe li wê derê domandiye¹³. Ji bilî vê medreseyê li Medreseya Hîzanê, ya Cizîra Botan û ya Finikê jî perwerdeyeke baş girtiye¹⁴. Digel vê li gor rîwayetê li gundê Finikê jî medrese û tekyeyek ava kiriye û bi awayekî birêkûpêk demekê, xwe daye ilmên medreseyê û zikr û îbadetan¹⁵. Heta tê gotin ku wî li Cizîra Botanê li nik Melayê Cizîrî jî ders girtiye¹⁶

Erdnîgarîya ku Feqî çavên xwe li jîyanê vekiriye bêguman Miks e; lê li gor rîwayetan ew li Finika Botan jî demek baş maye û menzûmeya xwe ya bi navê “Kela

¹² Mustafa Kara, *Tasavvuf ve Tarikatlar Tarihi*, Weş. Dergah, Ç. Sêzdehem, Stenbol 2016, r. 25

¹³ Feqî Huseyn Sagniç, h.b., r. 371

¹⁴ Ebdurreqîp Yûsif, nr. 37-39

¹⁵ Kadri Yıldırım, h.b., r. 17

¹⁶ Ebdurreqîp Yûsif, h.b.,r. 39

Dimdim” li vî gundî nivîsîye¹⁷, ji ber vê yekê ye ku heta niha jî gelek kes behsa Feqî û Finikê bi hev re kirine. Heta di nava gelê Botanê de hatiye belavkirin ku menzûmeya wî ya bi navê “Ey Av û Av” jî tê de, wî gelek helbestên xwe di bin dareke tûyê de ku ev dar di kêleka Çemê Finika Botanê de ye nivîsîye. Ji bilî Finikê li gor hin delîlan Feqî li Cizîra Botanê jî demeke baş maye, li vir bi Cizîrî re muşa’ereyek jî nivîsîye û dîsa çîroka navdar a bi navê “Feqîyê Teyran û Tuma” jî li gor vegotinê li Cizîrê li nik Mîrê Cizîra Botanê rûdaye. Li gor rîwayeteke din, ew li Hêşetê jî maye û helbesta xwe ya bi navê “Îro Girya Me Tê” li ser mirina keça Mîrê Hêşetê ya ku hezkirîya wî bû li vir nivîsîye¹⁸.

Ji gelek çîrok û metelokan tiştêkî misoger derdikeve holê ku Feqîyê Teyran di erdnîgarîya bi sedemên cuda lê jîyayî de ji aliyê gel ve gelek hatiye hezkirin, piştî ku rehmet dike jî gora wî ya pîroz ji aliyê girseyê ve her rojên in û duşman hatiye ziyaretkirin¹⁹, heta jîyan û serborîyên wî di nava gel de bi awayekî derasayî û fişalekirî hatiye vegotin. Ew, ji aliyê mirovan ve adeta mîna lehengekî çîrokan hatiye dîtin²⁰.

Piştî van agahîyan pirseke bi vê mijarê re têkildar e derdikeve holê: Gelo ji bo çî Feqîyê Teyran ji aliyê gel ve ewqas hatiye nasîn û navê wî li ser erdnîgarîyeke fireh belav bûye? Li gor me çend sedemên vê hene. Yek: Ew, mutesewif û Xwedêhezekî ji dil bû ji ber vê li gor siruşt a xwe mîna derwêşekî tevdigerîya û tenê cîyê ku jê dayik bûye ranewestîye; lewre agirê evîna Îlahî ew li cî û warên curbicur xistibû, heta ji ber vê di nava gel de bi nasnavê “Feqîyê Gerok” jî dihat nasîn²¹. Du: Ji ber xwendina wî; lewre wî di gelek medreseyan Kurdistanê de mîna feqîyên din ders digirt û bi xêra xwendinê gelek cî diguherandin û ji aliyê niştêcihên mazûvanîya xwendina wî kirine ji nêz ve dihat nasîn. Sê: Zimanê xwerû yê ku di berhemên xwe de bi kar anîbû. Ji bo ku berhemên xwe bi şêwazeke xwerû û hêsan nivîsîye berhemên wî ji aliyê gelek kesan ve -çî xwende çî nexwende- hatine jiberkirin û hezkirin, jixwe ew helbestkarên ku di navbera wêjeya klasîk û ya tesewifî de mane şêwazeke bi vî rengî bi kar tînin, ev taybetîyeke wan e. Heta piştî ku Feqî dimire jî berhemên wî ji aliyê nifşên nû ve bi

¹⁷ Kadri Yıldırım, h.b., r. 17

¹⁸ M. Xalid Sadî, nr. 51-52

¹⁹ Abdurrahman Adak•Yusuf Baluken•Hayrullah Acar, h.b., r. 13

²⁰ Alî Tenîk, *Tarihsel Süreçte Kürt Coğrafyasında Tasvuf ve Tarikatlar*, Weş. Nûbihar, Ç. yekem, 2015 Stenbol, r. 221

²¹ Seîd Dêreşî, *Dîwana Feqîyê Teyran*, Weş. Lîs, Ç. yekem, 2011 Enqere, nr. 23-24

awayekî zargotinî hatine vegotin û belavkirin. Van tevan kiriye ku Feqî li ser erdnîgarîyeke fireh û ji alîyê gelek kesan ve were nasîn û hezkirin.

1.4. Nasnavên Wî:

Weke ku tê zanîn di wêjeya klasîk de bikaranîna nasnavan anku mexlesan mîna kevneşopîyekê hatiye dîtin, Feqî jî ev domandiye. Nasnavên ku ji berhemên wî dizanin ev in: Feqî, Feqe, Feqê, Feqeh, Feqîyê Teyran, Feqê Têra, Miksî, Mîm û Hê, Mîm û Hê û Dal û Xoce. Ji van nasnavan wî herî zêde “Mîm û Hê” bi kar anîye. Tîpên Mîm û Hê kurtkirina Mihemed Hekarî ye²²; lewre navê wî yê rasteqîn Mihemed e û cîyê ku jê dayik bûye Miks e, Miks jî wê demê bi ser Hekarîyê ve dihat hesabandin. Lê li gorî hizreke din “Mîm û Hê” kinkirina Mihemed tenê ye; lewre li gorî qaîdeyên erebî ev her du tîp, tîpên pêşî yên navê Mihemed in²³, bi me jî hizra herî rast ev e. Bo nimûne:

“**Mîm û Hê** şairkî pak e herkesê b’ruh bû ji make

Hemiyana dê ew fena ke ew jî Şahê Qudretê ”

(Feqîyê Teyran, Îro Girya Me Tê, m. 24., r. 145)

Guhertoyeke nasnava Mîm û Hê heye ku ew jî Mîm û Hê û Dal e. Li gorî Seîd Derêşî ev nasnav kurtkirina Mihemed e. Ev nasnav tenê di menzûmeyaya wî ya bi navê “Ey Av û Av” de derbas dibe:

“Bê dev û qîl û qal bibêj hêdî bi lefzê hal bibêj

Ber **Mîm û Hê û Dal** bibêj şerh û beyana kaxetê”

(Feqîyê Teyran, Ey Av û Av, m. 22., r.118)

Di dîwana Feqî de nasnava serdest her çiqas Mîm û Hê be jî; lê em dizanin ku ew bi nasnavê xwe yê Feqîyê Teyran hatiye nasîn, heta cenabê Xanî jî di Mem û Zîna xwe de wî bi vî nasnavî bi bîr tîne²⁴. Derbarê bikaranîna nasnavê Feqîyê Teyran de gelek hizrên ji hevûdin cuda derdikeve holê. Li gorî gotara Celadet Elî Bedirxan a bi navê “Klasîkên Me” Feqî zimanê teyran zanîbû û di nivîsa xwe de derbarê vê agahîya

²²M.Xalid Sadinî, h.b., r. 29

²³ Abdurrahman Adak h.b., r. 213

²⁴ M.Emin Bozarslan, *Mem û Zîn*, Weş. Deng, Ç. sêyem, Stenbol 2010, r. 172

derasayî de jî cî dide çîrokeke dûvedirêj.²⁵ Ebdurreqîb Yûsif jî di heman hizrî de ye û dibêje: Feqî ji bo ku zimanê teyran zanîbû loma jê re Feqîyê Teyran gotine²⁶. Lê li gorî A. Adak sedema nasnavê Feqîyê Teyran tiştêkî din e û wiha şîrove dike: Ji bo ku ew piştî feqetîyê melatî nekiriye navê feqîyê li ser maye û ji ber ku Feqî ji teyran hez dikir û dîsa di menzûmeyên xwe de zehf behsa wan kiriye bi teyran ve hatiye nîsbetkirin ji ber vê jê re Feqîyê Teyran gotine²⁷. M. X. Sadînî jî ji aliyekî din ve nêzîkî mijarê dibe û dibêje: Feqîyê Teyran ji ber ku nefsbîçûk bû di nava alim û zanayên dema xwe de xwe biçûk dîtiye û dîsa ji bo ku temenê xwendinê tune ye, mirov heta dawîyê şagirt û feqî ye²⁸ ji ber vê ye ku wî peyva “feqî” çêtir dîtiye. Ji bo peyva “teyran” jî wisa didomîne: Ew ji ber ku di bin bandora Mentîq et-Teyr a Ferîdeddîn Ettar de maye peyva teyran ji wê berhemê girtiye²⁹. Her weke ku tê dîtin ev tev hizr û nêzîkahîyên ji hevûdin cuda ne. Ev nasnava ku Feqî bi wê navdar bûye di helbestên wî yên bi navê “ Ez Çi Bêjim” û “ Bizan ku Min Yar Tu yî” wisa derbas dibe:

“Ew mehbûba wekû stêra te’esîra keça mîra

Te helandî **Feqê Têra** kes bi halê min nezan”

(Feqîyê Teyran, Ez Çibêjim, m. 8., r. 416)

“Nesaxê êşan ez im bikul û derdan ez im

Mecrûh ji qehran ez im tazî û ‘uyan ez im

Ê dûr ji şehran ez im **Feqîyê Teyran** ez im”

(Feqîyê Teyran, Bizan Ku Min Yar Tu, b.18. 9., r. 447)

Di dîwana Feqî de piştî nasnavê “Mîm û Hê” yê herî zêde hatiye dubarekirin “Feqe” (Feqî, Feqê, Feqeh) ye. Ev nasnav di helbesta wî ya bi navê “Ey Av û Av” de pênc caran derbas dibe, ji bo ku Feqî û Av di vê helbestê de ketine guftûgoyekê de ji ber vê ev nasnav ewqas hatiye dubarekirin:

²⁵ Herekol Azîzan, nr. 47-50

²⁶ Ebdurreqîp Yûsif, h.b., r. 37

²⁷ Abdurrahman Adak h.b., r. 212

²⁸ M.Xalid Sadînî, h.b., r. 22

²⁹ M.Xalid Sadînî, h.b., r. 25

“Pirsa **Feqî** bê cih nebû lewra di Fuqanê hebû

‘Erşê Xwedê li ser te bû avê gelo bîra te tê’

(Feqîyê Teyran, Ey Av û Av, m. 35., r. 122)

Nasnavêkî Feqîyê Teyran heye ku cîyê jêdayik bûye nîşan dide, ew jî Miksî ye:

“Ne ji mîran im ne xan im **Muksî** yim bê xan û man im

Cesed im bêrûh û can im ketme pê derdê ‘emîq’

(Feqîyê Teyran, Ordeka Ava Cizîrê, m. 10., r. 455)

Feqî, di helbesta xwe ya bi navê “Dilo Rabe” de ji bilî Mîm û Hê di du cîyan de nasnavê “Xoce” jî bi kar anîye; lê belê ev nasnava wî gelek nehatiye bihîstin:

“Xewa bê cih qewî pûs e me ne nave ne namûs e

Dikana me qewî rûs e dibêjin **Xoce** qerdar e”

(Feqîyê Teyran, Dilo Rabe, m. 15., r. 209)

Ji bilî van nasnavên ku di helbestên wî de derbas dibin mîna Feqîyê Hêşetê, Feqîyê Gerok jî bi awayekî zargotinî di nava gel de belav bûne.

2. HIN TAYBETÎYÊN WÎ YÊN DI WÊJEYA KURDÎ DE

Feqîyê Teyran, di navbera sedsalên XVI û XVIIem de cîyê xwe di nava dîroka wêjeya kurdî ya klasîk de girtiye. Ew, ji helbestkarê herî girîng ê van sedsalan e. Ji bo taybetîyên wî yên ku di dîroka wêjeya kurdî ya klasîk de pêş ve derketine û yên ku rengê xwe dane wêjeyê baş were fêmkirin em ê van taybetîyan xal bi xal rêz bikin.

Derheqê vê babetê de divê pirsra herî girîng “Helbestkarê gewre Feqîyê Teyran bi kîjan taybetîyên xwe ji helbestkarên din tê veqetandin?” were kirin ku xalên ji vê pirsra bingehîn re bibin bersiv baş werin peytandin:

1. Dema wêjeya klasîk tê gotin bêguman şêwazeke giran, xemlandî û zimanekî têkel ku ji kurdî, farisî û erebî ava bûye tê bîra mirovan; lewre pêgirtî û şopdarên vê şaxa wêjeyê di medreseyan Kurdistanê de bi zimanê mîna kurdî, farisî û erebî dersên curbicur didîtin. Ev perwerdeya zexm û bêhevta bandor li wêjeyê bi taybetî li helbest û

menzûmeyan jî dikir. Heta di berhemên wêjeyî de bikaranîna şewaza giran û xemlandî dibû sedema şanazî û pesindayînê, ji ber vê her helbestkar dixwest xwe bigihîne şewazeke wisa û pênuşa xwe di vê rê de dibezand. Lê belê Feqî her çiqas di gelek medreseyan de perwerdeyê baş girtibe û ev çanda têkel û hevpar baş zanibe jî xwe ji vê, ji aliyê ziman û şewazê ve, dûr girtiye; lewre di menzûme û helbestên xwe de kurdîyê xwerû riwîn bi kar anîye, heta di hin malikên xwe de dema cî dide peyvên biyanî di kêleka wan de hemwateya(teradîf) wan a bi kurdî jî nivîsiye. Kesên ku çanda medreseyê nizanibin jî ji ber zimanê wî yê xwerû û xwezayî ji helbestên wî tehm û çêjeke xweş girtine. Bi vê taybetîya xwe wî, xwe gaveke din nêzîkî wêjeya geleri/tesewifi kiriye; lewre helbestkarên mutesewif ên mîna Feqî digel bikaranîna term û mezmûnên tesewifi ji bo fikr û ramanên xwe bi gel hêsanî bidine fêmkirin zimanekî xwerû bi kar anîne.

Nexwe her çiqas sedema bikaranîna vê şewazê bi awayekî teqez newe zanîn jî zelal e ku wî ev çêtir dîtiye û bi vê helwesta xwe ji gelek helbestkarên klasîk cuda bûye û ew adeta di navbera wêjeya klasîk û geleri/tesewifi de mîna pirekê bûye.³⁰

2. Feqîyê Teyran, ne tenê di wêjeya klasîk de di zargotina kurdîya kurmancî de jî hatiye nasîn, me li jor jî behs kiribû ew di nava gel de mîna lehengekî çîrokan û derwêşekî xwedî ilm û me'rîfet û şîretan e. Ji ber vê di civaka kurdan de digel serborî û çîrokên wî qesîde û beytên wî jî belav bûne û bûne malê zargotina kurdî.

Li ser zargotina kurdî Ordîxanê Celîl û Celîlê Celîl xebatên pir girîng kirine. Di berhema wan a bi navê “Zargotina Kurda” de cî dane gelek kelûpelên zargotinî û di nav van kelûpelên ku bi awayekî zargotinî di civata gel de bi salan jîyane û pişt re ji aliyê wan ve hatine berhevkirin de mîrateya Feqî jî bi behreke mezin cîyê xwe girtiye³¹. Di van beytên tomarkirî yên ku bi bal Feqî ve tînin nîsbetkirin de mijarên mîna Methê Feqîyê Teyra, Feqîyê Teyra û Esmer, Feqîyê Teyra û Meriv, Feqîyê Teyra û Tixûb, Feqîyê Teyra û Emir, Feqîyê Teyra û Aqil, Feqîyê Teyra û Cîranyî, Feqîyê Teyra û Mirin, Derd û Xem û hwd. derbas dibin. Têkilîya van malik û qesîdeyan hem ji aliyê

³⁰Abdurrahman Adak, “Kürt Dili ve Edebiyatı” İslam Ansiklopedisi, Weş. Türkiye Diyanet Vakfı, Stenbol 1988, nr. 1111-1114

³¹ Ordîxanê Celîl û Celîlê Celîl, *Zargotina Kurda I, II*, Weş. Aram, Ç. sêyem, Amed 2013, C. Duyem, nr. 59-90

teşeyê hem ji alîyê şêwazê û hem jî ji alîyê honandina risteyan ve bi menzûme û helbestên wî yên ku di dîwana wî de cîyên xwe girtine tune ye. Bo nimûne: Di xebata navborî de qesîde û beytên mîna “Feqîyê Teyran û Av” û “Feqîyê Teyra û Dîlber” derbas dibe, ev serenav xezelên Feqî yên bi navê “Ey Av û Av” û “Dilber” bi bîra me dixê; lê belê di encama berawirdkirina van berhemên zargotinî û xezelên wî yên di dîwana wî de derbas dibin tu pêwendîyek dernakeve holê, bes serenav û hindik be jî ji alîyê mijarê ve nêzîkî hevûdin in. Dibe ku ev berhem, yên Feqî bin û ji alîyê dengbêjan ve jî bo ku bi awayekî zargotinî hatine vegotin di nava demê de hatibin guhertin an jî dibe ku ev berhem ne yên Feqî bin jî ber hezkirina wî bi bal Feqî ve hatibin nîsbetkirin. Lê li gor me hizra yekem serdesttir e.

Sedema nivîsîna van berhemên zargotinî çî bibe bila bibe bi qasî ku tê zanîn di wêjeya kurdî ya klasîk de kesekî ku mîna Feqî bûye mijara zargotina kurdî tune ye, ev jî taybetîyeke wî yê din e.

3. Feqîyê Teyran, di mijarên berhemên xwe de jî giranîya xwe nîşanî me dide; lewre nivîsîna hin menzûmeyên dînî-tesewîfî mîna “Şêxê Sen’an” û “Bersîsê Abid” ku di erdnîgarîya Îslamê de nivîsîna wan ji alîyê netewên Mislîman ve mîna çandekê hatiye pejirandin di wêjeya klasîk a kurdî de bi wî dest pê dibe. Feqî, wan bi awayê menzûmeyî li gor xwe careke din dinivîse û dibe malê wêjeya kurdî. Ji bilî van, du çîrokên din mîna “Zembîlfiroş” û “Keleha Dimdim” ku ev jî ji alîyê mijarê ve xwemalî ne, yekem carî ji pênuşa wî niqûtîne. Keleha Dimdim, li ser bûyereke rast a dîrokî; Zembîlfiroş jî li ser mijareke dînî-tesewîfî ava bûye, ev her du berhem mîna her du berhemên wî yên din bi awayekî menzûmeyî hatine nivîsîn.

Feqî, bi nivîsîna menzûmeyan-ku yekem carî bi wî dest pê dibe- rengê cihê daye wêjeya kurdî.

4. Bi qasî ku tê zanîn kesandina heyberên derveyî mirovan anku fablan cara yekem bi awayekî zêde di helbestên Feqî de tê dîtin. Fabl, jî bo şîret û pendan tîne nivîsîn û bi vî rengî rêya rastî nîşanî mirovan didin. Jixwe Feqî jî şa’irê nesîhetan e ji ber vê ev celeb nivîsîn li gor siruştaya wî ye. Di nav menzûmeyên wî de nemaze menzûmeyên bi navê “Ey Av û Av” û “Feqî û Bilbil” li ser van hîman hatine ristîn.

Di “Ey Av û Av” de Feqî, bi avê re diaxive û li ser gerdûnê û afirandina hemû bûnewerên wê pirsan ji avê dike; lê belê di pirsên Feqî de bersivên wî jî veşartî ne. Ev guftûgoya di navbera wan de nêrîna tesewîfî ya li ser bûneweran nîşanî me dide û Feqî jî hizr û nêzîkayîya xwe ya li ser vê mijarê bi zimanê bûneweran kifş dike; lewre li gor bawerêya tesewîfê hemû tiştên ku em dibînin, Xwedê ji nûra xwe afirandiye. Feqî jî ev hizr domandiye.

Di wêjeya klasîk a hevpar de alegorîya “gul û bilbil” gelek caran hatiye bikaranîn; lê di menzûmeya Feqî de nêzîkayîyeke cuda heye; lewre ya ku bi bilbil re diaxive ne gul e, Feqî ye. Feqî, bilbilî bi kêmaqilbûne tawanbar dike û şîretan lê dike; lewre ew evîna ku bilbil pey ketiye mecaz û vala ye, heke ku dostekî ebed û heqîqî bixwaze ew jî Xweda ye, dixwaze bilbilî vê rastîyê bibîne.

Feqîyê Teyran, di van menzûmeyên xwe de bi kesandina heyberên jorîn çêjeke cuda daye wêjeya kurdî, ev terz jî dîsa bi wî dest pê dike.

5. Muşa’ereya/pêkvegötina di navbera Melayê Cizîrî û Feqîyê Teyran de jî bi qasî ku tê zanîn di kurdîya kurmancî de ya yekem e. Ev muşa’ere di dîwana M. Cizîrî de jî derbas dibe³². Di vê muşa’ereyê de Feqî 25 bendên bi sêrist û Mela jî 25 bendên bi sêrist beranberê hevûdin gotine û ev helbesta hevbeş a ku li gor hesabê ebcêdê 1621ê hatiye nivîsîn cara yekem bi Mela û Feqî dest pê kiriye.

6. Mexles anku nasnav, ew navên ku ji aliyê helbestkarekî ve di helbest û menzûmeyên xwe de bi kar anîye jê re mexles tê gotin. Bikaranîna mexlesan taybetîyeke wêjeya klasîk e, Feqî jî ev taybetî domandiye. Di nava nasnavên wî de ya herî bal keş “Mîm û Hê” ye, ev nasnav jî kinkirina seretîpên navê Mihemed Hekarî yan jî her du tîpên dengdêr ên navê Mihemed e.

Li gor agahîyên ber destên me di nav helbestkarên bi kurmancî nivîsîne û helbestên wan heta roja me hatine pêşî Elî Herîrî ye. Ne Elî Herîrî û ne jî hevdemê Feqî Melayê Cizîrî nasnavekî bi vî rengî bi kar anîne. Herîrî; Elî, Elîyo, Şêx Elî û Huseynî; Cizîrî jî Ehmed, Mela û Nîşanî bi kar anîne. Helbestkarên wêjeya klasîk ên ku peyrewên

³² Mela Ehmedê Zivingî, *Gerdeniya Gewherî /Şerha Dîwana Melayê Cizîrî*, Weş. Avesta, Ç. yekem, C. sêyem, Stenbol 2013, r. 219

wan in heman awayî nasnav bi kar anîne: Yan navên xwe yên rastî yan jî navine din li xwe kirine, anku bi tîpên dengdar ên navên xwe yên rastî nasnav ava nekirine; lê belê piştî Feqî, Bekir Begê Erizî (sedsala 18an) jî ji bo ku di bin bandora wî de maye di helbestên xwe de mexlesa “Be û Kaf”ê³³ ku ev jî her du tîpên dengdêr ên navê Bekir e bi kar anîye.

Weke ku tê dîtî bikaranîna mexlesên bi vî awayî dîsa bi Feqîyê Teyran dest pê kiriye.

7. Wêjeya klasîk, şaxeke wêjeyêke wisa ye ku li ser xal û qaîdeyan ava bûye; yek ji wan qaîdeyan jî bikaranîna serwa anku qafiyeyê ye. Serwa, ji qaîdeyên teşeyî yên ahengê ye. Bi gelemperî, di wêjeya klasîk û gelerî de serwa di dawîya risteyan de tê bikaranîn. Digel vê kêma be jî carinan di nava risteyan de jî tîpên dîtî û ji van serwayan re serwaya navekî tê gotin; lê belê emilandina serwayê ya di nav û dawîya risteyan de huner û marîfetek dixwaze û heta gelek caran li ber nivîsîna helbesteke birêkûpêk, astengeke mezin bûye. Li gor peytandina me, Feqî ev kar bi awayekî bi pîşekarî û serkeftî bi kar anîye. Wî ev terz di hemû helbestên xwe de-çi xezel çi jî qesîde û çi jî musellesan de- bi kar anîye û ev bi serê xwe hunerek gelek zor e. Jixwe digel zimanê wî yê zelal bi xêra serwaya navekî jî helbestên wî hêsantir hatine jiberkirin.

Divê were gotin ku ew xezelên bi serwaya navekî hatine nivîsîn ji wan re xezelên musemmat û qesîdeyan re jî qesîdeya musemmat hatiye gotin. Em dizanin ku di wêjeya klasîk a kurdî de kesên xezel û qesîdeyên musemmat bi kar anîne hene; lê belê helbestkarekî ku hemû helbestên xwe bi vî rengî nivîsîbin tune ne. Vê jî taybetîyeke din daye helbestên Feqîyê Teyran û ev taybetî dike ku helbestên wî ji alîyê ahengê ve xwirttir û xweştir bibin.

8. Di wêjeya klasîk a kurdî de cihêrengîyeke din a Feqî bikaranîna wî ya teşeya nezmê ya serbixwe ye. Em vê taybetîyê di menzûmeyên wî yên tesewîfî û dîrokî de bi navê “Şêxê Sen’an”, “Bersîsê Abid”, “Zembîlfiroş” û “Keleha Dimdim” dibînin; ev mezûme her çiqas nêzîkî destanên çêker bin jî me ew weke teşeyên nezmê yên serbixwe bi nav kirine. Ji bo piştrastkirina vê hizra xwe em ê bi awayekî berfireh di beşa duyem de di bin serenava “teşeyên serbixwe” de careke din cî bidine vê mijarê.

³³ Abdurrahman Adak, h.b., r. 303

9. Cudahîyeke wî ya din jî ew e ku hin xezelên Feqî ji alîyê mijarê ve gelek ne kûr in; lewre helbestên xwe ji bo şîretên dînî/tesewifî mîna amûrekî bi kar anîne. Mebesta wî ya sereke ragihandina şîret û mijarên dînî ne. Jixwe Feqî bi gelek taybetîyên xwe ve nêzîkî wêjeya gelerî ye. Bo nimûne di wêjeya tirkî de helbestkarên wêjeya gelerî dema xezelan dinivîsin xezelên wan ji alîyê mijarê ve ne kûr in û helbestên van helbestkaran ji alîyê erûzê ve jî ewqas ne serkeftîne, ev her du taybetî jî li Feqîyê Teyran tîn. Ew bi vî awayî ji hevdemê xwe anku ji Melayê Cizîrî cuda dibe; lewre Cizîrî bikaranîna erûzê de gelek pispore û xezelên wî ji alîyê mijarê ve gelek kûr in. Lê Feqî berevajîya vê bi van taybetîyên xwe adeta ekoleke din ava kiriye û gelek helbestkarên din jî di bin bandora xwe de hiştine.

3. NAVEROKA BERHEMÊN WÎ YÊN KU TÊN ZANÎN

Naverok, mijara nivîs û berhemekê ye; ji bo nasîna nasnameya wêjeyî ya helbestkar û nivîskarekî gelek girîng e; lewre ew, awêneya hizra wêjegerekî ye. Ji ber vê di encama vê beşê de em ê jî têbigihîjin ku hizrên Feqî bê çî ne. Digel vê ji bo peytandin û dabeşkirina teşeyên nezmê yên menzûme û helbestên wî ev beş gelek bi kêr hatiye; lewre bi navkirina teşeyên nezmê de ji bilî taybetîyên rûxsarî mijara berheman jî gelek girîng in.

3.1.Menzûmeyên Wî yên Tesewifî/Dînî û Dîrokî:

3.1.1. Menzûmeyên Wî yên Tesewifî/Dînî:

3.1.1.1. Şêxê Sen'an : (M. X. Sadinî nr. 239 –336)

Di vê menzûmeyê de behsa evîna Şêxê Sen'anê ku xwedî teqwa, tekya û pênc sed sofîyan dike.

Şêxê Sen'anê ku di nav civakê de xuyayî û bi evîn û muhebbeta Xwedê bi nav û deng e rojekê di xewnê de dilbereke mîna horîyan dibîne û ji destên wê tasek mey vedixwe. Şêx, piştî ku ji xewê hişyar dibe ji ber bedewbûna dilberê dikeve rewşa dînîtiyê û aqil tavêje û bi çolan dikeve. Piştî ku dil dide keça xaçperest dev ji tekya û mirîdan berdide û li pey keça xaçperest dikeve. Hemû mirîdên Şêx wî terk dîkin û hêvîyên xwe jê qut dîkin. Piştî demekê dilbera xaçperest/Gurcî jî ji bo ku sebr û semaxa Şêxê Sen'an biceribîne tu nebaşî (dîn terk kiriye, xaç xistiye stûyê xwe, şivantîya berazan kiriye, mushef şewitandiye, zinar girêdaye û hwd.) namîne ku nayîne serê Şêx.

Lê Şêx jî ji van xwestekên xaçperestê, xwe paş ve nakişîne û wan tevan bi cî tîne. Piştî diwazdeh heyvan Şêxê Yemenî bi van neyînîyan dikemile; lê belê mirîdên wî yên ku ji vê rewşê ne hayîdar in dixwazin Şêxên xwe ji vê rewşa xirab rizgar bikin û xwe digihînin dêrkeleha keça xaçperest û careke din wî ber bi Yemenê ve dibin. Piştî çûyîna Şêx dilbera xaçperest bi awayekî derasayî dil dide Şêx Sen'anê heştê salî û ji ber vê di dawîyê de ew jî pey Şêx dikeve. Gava digihêje Şêx, bi wî re şehadetê tîne û Misilman di be. Herî dawîyê de her du jî ji kerba hevûdin dimrin û dibine bûk û zavayê axiretê.

Ev berhema Feqî li ser hîmên hizra wahdetil wicûd ava bûye; “ lew aşiq û me'şûq cismek in.” û di vir de Şêx ne go ku dil daye dilberekê, wî dil daye nûra Îlahî ya ku di rûyê dilberê de der daye.

Lê belê divê were gotin ku ev mijara tesewifî cara yekem ji aliyê Ferîdudîn Etar ve hatiye nivîsîn û di berhema wî ya navdar a bi navê Mentiqût Teyr de derbas dibe. Ev mijara evînî-tesewifî piştî Etar di wêjeya hevpar a rojhilat de ji aliyê netewên Misliman ve mîna ereb, tirk û kurdan ve hatiye nivîsîn û bûye navdar. Li gor rîwayetan navê Şêxê Sen'an ê rastî Abdulrezaq e û ji Yemenê ye, ji bilî Etar di pirtûka Xezalî ya bi navê Tuhfetü'l Mulûk de jî ev çîrok derbas dibe³⁴.

Feqî, dema ev berhem nivîsîye ji aliyê mijarê ve ji Etar sîud wergirtiye, ne go ku berhema Etar wergerandiye kurdî; lewre Etar berhema xwe bi awayê teşeya nezmê ya mesnewîyê; lê Feqî ev çîrok bi teşeyeke serbixwe ya nezmê nivîsîye û kiriye malê kurdî. Ew, di dawîya berhema xwe de sedema nivîsîna çîroka Şêxê Sen'anî- ku çîrokeke alegorîk û evînî-tesewifî ye- bi gotina:”Muksî ji işqê sotiye/ Ev qewl li şêx nû gotiye/ Halê xwo tê da gotiye/ Li xeyn û lama hicretê” bi awayekî zelal vegotiye.

3.1.1.2. Bersîsê Abid: (M. X. Sadinî nr. 337 –382)

Mijara vê menzûmeyê Xwedênas û zahidekî Îsrailî yê bi navê Bersîsê Abid e ku ew piştî dek û dolabên şeytên ji dîn derketiye.

Bersîsê Abid ê ku ji Şamê ye, ji bo ku her dem ta'et û zikra Xwedê dikir gihaştibû meqamê wehdetê. Ji ber evîna Îlahî bi çol û çiyayan ketibû û bûbû ewlîya bi vî awayî navê wî gihaştibû heta rojhilat û Şamê; lê belê sed mixabin ku wî ji xwe re şêx û

³⁴ İskender Pala, *Ansiklopedik Divan Şiiri Sözlüğü*, Weş. Kapı, Ç. sêzdehem, Stenbol 2004, r. 430

mirşîdek negirtibû. Şeytanê mezin ê le'în dikir û nedikir nikarîbû wî ji rê derxe û ji vê gelek gazindan dikir. Rojekê kurê şeytên ê bi navê Ebyad ev peywira bavê xwe girt ser xwe û ji bavê xwe re ahd û peyman xwendin ku ew ê Bersîs ji rê derxe.

Piştî demekê Ebyad xwe dixwe şiklê zahidekî pak, bi hîle û pîleyan û bi îbadetên qelb/sixte xwe digihîne Bersîs û pê re dibe dost. Piştî ku xwe jê re îspat dike Bersîs jî şêxîtiya wî qebûl dike. Ebyad bi fê'lên xwe yên kirêt dike ku Bersîsê Abid nikaribe nefsa xwe û meylê bide keça mîr a ku mîna perîyekê bedew e û bi vî awayî ew, ji evîna Îlahî ber bi evîna mecazî ve dadikeve. Di berdewamîya vî karî de bi şîretên Ebyad, Bersîs qetl û zînayê dike.

Li ser vê bûyerê mîr û dadgerên wî, fermana mirina Bersîs didin û wî tînin ber sêdarê, ew jî ji bo ku ji vê tengezarîyê xilas bibe ji kurê îblîs anku ji Ebyad alîkarîyê dixwaze. Ew jî dibêje ku: ” Eger tu ji bo min herî secdeyê ez ê te ji vî halî rizgar bikim.” û Bersîsê Abid ê ku heta heftê û yeksalîya xwe her tim bi zikir û ta'etan derbas kiriye bi îşareteke îblîs, jê re diçe secdeyê û bi vî rengî dikeve şirkê û ji dîn derdikeve, bi vî awayî dimire.

Sedema nivîsîna vê berhema Feqîyê Teyran şîretên dînî-tesewifî ne û derheqa vê de di serê menzûmeyê de wiha dibêje: “Ew kesên ku nexwaze ta'etên wî mîna Bersîsê Abid vala here divê ji xwe re şêx, pîr an jî alimek bigire.”; lewre di tesewifê de pêdivîya her mirîdekî bi rêberekî anku bi mirşîdekî heye ku rêya heqîqetê nîşanî wî bide û di dawîyê de jî: ” Xwe ji hodbîniyê dûr bixin û di karê îbadetan de qure nekin” dibêje.

Ev çîroka ku ji îsraîlîyatê hatiye wergirtin hem di nava gel de û hem jî di çanda wêjeya dînî-tesewifî de gelek navdar e.

3.1.1.3.Zembîlfiroş: (M. X. Sadinî nr. 399 – 413)

Feqî di vê menzûmeyê xwe de behsa tekoşîna zahidekî yê bi navê Zembîlfiroşî ya li hemberî Gulxatûna êsîra şehweta xwe bûye dike.

Dibêjin xortek hebû navê wî Zembîlfiroş bû; ew zewicî bû û xwedî zar û zêç bû. Ji alîyê qeşengbûna xwe ve mîna Yûsuf Pêxember bû û her dem Xwedê di bîra wî de bû. Ew kesekî feqîr bû; lê digel vê kesekî rast û dirust bû. Debara xwe bi firotina zembîlan dikir û di vê pîşeyê de gelek jîr bû.

Rojekê dîsa dixwest ku selikên çêkirine bibe bazarê, xatûnek wî ji dût ve dibîne û bi heft dilan dil dikeviyê. Xatûn, vê raza xwe bi carîyeyên xwe re parve dike û dibêje: "Xortek dilê min parçe kir û ji ber vê xew li min heram bûn." Li ser vê bûyerê Xatûn carîyeyeke xwe dişîne bal Zembîlfiroşî ve da ku derdê wê ji wî re vebêje. Carîyeyê jî ji bo Zembîlfiroşî bixapîne derew dike û jê re dibêje; "Mîr dixwaze selikan ji te bistîne; lê divê tu selikên xweşik çêbikî û bînî li ber deriyê qesra wî, wê demê Mîr jî ê heqê te bide te." Li ser vê gotinê lawik jî diçe malê û selikên gelek xweşik çêdike û tîne ber deriyê qesra Mîr; lê carîyeyek xwe berdide jê û jê re dibêje ku Mîr dixwaze te bibîne. Lawik bêfîkar bi jor ve diçe, piştî ku dikeve menzelê derî li ser tê dadan. Li ser vê bûyerê fêhm dike ku ev dafikeke hatiye serê wî. Piştî demekê Gulxatûna gelek bedew derdikeve pêşberî wî û dibêje: "Min dil daye te û dixwazim ji te lezetê bigrim." û wî vedixwîne nava nivîna xwe; lê law vê daxwazîya Xatûnê qebûl nake; lewre ew ji Xwedê re ji dil e û jê ditirse. Ji Xatûnê re dibêje: "Were em her du li ser vê daxwazîya te tobe bikin." û bi vî awayî gelek ber hevûdin didin. Law dibîne ku ji destê Xatûnê xilasbûna wî tune ye bi bahaneya teheretê ji menzelê derdikeve û diçe ser banê qesrê/kelehê. Dinêre ku tu cîyê revê tune ye dilê wî pê dişewite û ji ber halê xwe digirî û piştî berê xwe dide Xwedê û bi dilekî şewitî alîkarî jê dixwaze û xwe ji birca kelehê tavê xwarê. Piştî bi fermana Xwedê Cebraîl wî li hewayê zêft dike û bi awayekî nerm datîne erdê. Ji bo ku Xwedê wî ji vî halê zehmet û zor xilas dike ew jî ji bo Xwedê diçe secdeyê û şikra xwe tîne.

Weke ku tiştêk nebûye Zembîlfiroş, radije selikên xwe berê xwe dide mala xwe; lê belê Mîr selikên di destên wî de ne bi zordarî jê distînin. Destevala diçe mala xwe bermalîya wî ya bîaqil ji wî re dibêje ku: "Her çiqas zadek li malê tune be jî em ê mîna berê tenûr/kuçika xwe dadin." Piştî demekê cîraneka wan tê dixwaze ku ji tenûra wan rahêje agirekî; bi hev re lê dinêrin ku tenûra wan a vala bi xûrekên cinetê tijî bûye û bi vî awayî çîrok diqede.

Di vê çîroka dînî de azmûna Xwedantirs û zahidekî yê bi navê Zembîlfiroş tê dîtîn, ew zahidê ku hey ji helalî û heramî heye, di vê çîrokê de mîna Yûsuf Pêxember dibe remza îfetê û şîreta Feqî ber bi vî alî ve ye.

Her çiqas ev berhema Feqî weke Şêxê Sen'an û Bersîsê Abid dînî be jî cudahîyeke wê heye; lewre ji aliyê mijarê ve berhemeke xwemalî ye. Li gor gelek kesan

ev bûyer li Farqînê û serdema Merwanîyan de rûdaye³⁵. Bi rastî jî li Farqînê bircek heye ku heta dema me hatiye û navê wê “Birca Zembîlfiroş”e. Her weke din çîroka Zembîlfiroş di nava zargotina kurdîya kurmancî de jî gelek bi nav û deng e û di nava gel de çî destxetî û çî bi zargotinî gelek guhertoyên vê çîrokê hene. Jixwe di nava gel de weke “Destana Zembîlfiroş” tê nasîn.

Her çiqas rasterast bi mijara me ve ne têkildar be jî lê belê divê were gotin ku di wêjeya klasîk a kurdî de Destana Zembîlfiroş ji aliyê Miradxanê Bayezîdî û Melayê Bateyî ve jî hatiye nivîsîn. Lê belê gava em antolojîyên helbestên klasîk³⁶ an jî hin pirtûkên li ser dîroka wêjeya klasîk hatine nivîsîn³⁷ dinêrin, mixabin dibînin ku Zembîlfiroşa Feqî li ser navê Bateyî hatiye çapkirin. Li gor hizra me ev zembîlfiroşên ku hatine çapkirin – ên li ser navê Bateyî- tev ên Feqî ne û guhertoyen hev in; lewre dema menzûmaya Zembîlfiroş a ku di pirtûkên cuda de li ser navê Feqî û Bateyî hatine çapkirin (Pirtûka Selîm Temo ya bi navê *Kürt Şiiri Antolojisi* û ya Q. Kurdo a bi navê *Tarîxa Edebîyata Kurdî*) dema em wan berawird dikin dibînin ku nebera wan de gelek cudahî tune ne, hebin jî di asta nuansan de ne û mîna guhertoyen hev disekinin.³⁸ Ya balkêş di dawîya tu Zembîlfiroşên ku li ser navê Bateyî hatine çapkirin de nav an jî nasnavê Bateyî derbas nabin, bes ev bi bal Bateyî ve tîr nîsbetkîrin. Ji bilî vê jixwe derheqê Zembîlfiroşa Bateyî de agahî gelek kêr in, hin ji wan di pirtûka A. Adak de hene. Li gor agahîyên A. Adak di sala 1978an de Kurdnasa Rûsî Jakêlî Şûrênovna Musaelyan di teza xwe ya doktorayê ya bi navê “Zembîlfiroş û Şovêd wê Folklorî” de cî daye zembîlfiroşên Bateyî û wisa dibêje kû li Petersburgê gelek nusxeyên Zembîlfiroşên ku bi bal Melayê Bateyî ve tîr nîsbetkîrin jî hene³⁹. Li gor van daneyan dibe ku Zembîlfiroşa Bateyî hê jî nehatibe çapkirin ji bo zelalkirina mijarê pêdivîya xebateke berfireh û serbixwe heye.

3.1.2. Menzûmeyên Wî yên Dîrokî:

3.1.2.1. Keleha/Şerê Dimdim: (M. X. Sadinî nr. 383 – 397)

³⁵ Aziz Samur, *Destana Zembîlfiroş û Gulxatûn*, Weş. Nûbihar, Ç. yekem, Stenbol 2015, r. 62

³⁶ Selim Temo, *Kürt Şiiri Antolojisi*, C. 1., Weş. Agora, Ç. yekem., Stenbol 2007, bnr., nr. 108-112.

³⁷ Qanatê Kurdo, h.b., nr. 66-67.

³⁸ Edip Saydun, *Berawirdkirina Feqîyê Teyran û Melayê Bateyî*, Semînera Lîsansa Bilind a Bitez, Zanîngeha Wan Yûzûncû Yilê, Enstîtuya Zimanên Zindî yên li Tirkîyeyê, Wan 2015, nr. 10-13

³⁹ Abdurrahman Adak, h.b. nr. 252-253.

Ev berhem, li ser şerê di navbera Xanê Keleha Dimdimê anku Xan Ebdal û leşkerên şahê ecem de çêbûye hatiye nivîsîn.

Gelek guhertoyên vê destana ku li ser lehengî û mêrxasiya kurdan hatiye nivîsîn hene. Di hin guhertoyan de behsa lehengîya Emîrxanê Biradostan anku Xan Ebdal dikin û ji bilî vê ava kirina kelehê, sedema serhildana li hember Şahê Eceman, berxwedana salan a di nava kelehê, xayîntîya Mehmûd Malakanîyê kurd û di encamê de ketina Keleha Dimdimê jî ji dewama destanê ye. Lê belê di menzûmeya Feqî de ev bûyer bi awayekî hûrgilî nehatiye vegotin, li ser çend dîmenên şer û şhadeta kurdên mukrî û ketina Keleha Dimdimê sekinîye. Feqî, Xan Ebdal mîna Xan Ebdalê Botî û şerekî Mukrî nîşan daye. Ji bilî vê li gor Feqî; Mukrî di rêya Ebûbekir, ‘Umer û Hz. Pêxember de ne anku Mislimanê sunî ne, di dema li hemberî eceman şer gur dibe Mukrî alîkarî ji roman dixwazin; lê belê rom hewara wan nabihîzin û naçine alîkarîya wan. Destan bi hilweşîna kelehê diqede û Feqî; di dawîyê de ji nebî, ewlîya, ji xwe û Xan Ebdalê re -ku wî mîna şehîdekî dibîne- fatîhayan dixwaze.

Feqî, mijara vê bûyerê ji dîrokê girtiye û bi awayekî menzûmeyî honandiye. Ev bûyera rasteqîn di sala 1608an de li Keleha Dimdimê ku ew dikeve Kurdistana Îranê û nêzî başûrê Urmîyeyê ye diqewime⁴⁰, bi gotineke din ev destan bîngeha xwe ji serhildana Kurdên Mukrî yên ku di navbera salên 1608-1610an de serî rakirine sitandiye. Ev bûyer di pirtûka dîroknasê navdar Îskender Bek Turkman(1560/61-1633/34) a bi navê “*Tarih-i Alamaray-i Abbasi*” de derbas dibe.⁴¹

Divê were gotin ku ev berhema Feqî, mîna Zembîlfiroş ji aliyê mijarê ve xwemalî ye.

3.2. Helbestên Wî yên Lîrik

3.2.1. Ellah Çi Zatekî Ehsan e : (M. X. Sadinî nr. 103 – 110)

Ev helbesta wî bi rêzkirina sifâtên Xwedê dest pê dike û piştî jî bi hin termên tesewifê lave û hezkirina li hemberê Xwedê didome. Mirada dilê wî Xwedê ye û ji bo ku ev daxwazîya wî bi cî were hemd û sena, zîkr û îbadet lazim e. Lê belê dilê wî ji ber nefsa wî ya le’în tije birîn bûye. Di dawîyê de jî bi gotina “*Ey ew Xwedayê ku rehma*

⁴⁰ Edurreqîp Yûsif, h.b., r.42

⁴¹ Ordîxanê Celîl, *Kürd Kahramanlık Destanı*, Weş. Avesta, Ç. yekem, Stenbol 2001, r. 11

wî gelek tu rehma xwe li me bikî! “ ji Xwedê bexşandinê dixwaze. Feqî di vê helbesta xwe de ji gelek termên tesewifî sûd wergirtiye.

3.2.2. Ey Av û Av : (M. X. Sadinî nr. 111 – 126)

Av, di vê helbesta wî de mîna sofîyekî ku şev û rojan zikir û ta’etan dike hatiye dîtî û bi vî awayî hatiye kesandin. Feqî bi avê re bi awayek derasayî dikeve guftûgoyê û jê pirsan dike. Ew bi bahaneya van pirsan derheqê afirandina gerdûnê û bûnewerên gerdûnê bi nêrîneke sofîyane bersivan dide. Bi rêya ciwankariya husn û ta’lîlan herikandina avê ya ku bêrehet û bêsekne ye û bizavên wê yên din bi evîna Îlahî ve girê dide û ji avê daxwaz dike ku raza dilê xwe mîna derwêşekî bi zimanê hal bibêje. Derheqê afirandina însanan de jî dibêje ku Xwedê ew bi taybetîyên aqil, kamil û arifbûnê afirandiye û di dilê wan de jî nûrek vejandiye. Feqî di vê helbesta xwe de tecelîya evîna Îlahî ya li ser bûneweran li ber çavan raxistiye.

3.2.3. Îro Ji Dest Husna Hebîb : (M. X. Sadinî nr. 127 – 136)

Feqî di vê helbesta xwe de jî evîna hebîbê/hezkirîyê xwe sergerdan û sergeşte ye, evîna wî adeta di asta nexweşîyê de ye. Xwe şibandiye Hz. Musayê ku li çîyayê Sînayê li hember nûra Xwedê secde anîye û li pey vê nûra Îlahî ketiye. Ew agirê evînê ya ku di dilê wî de ye gava bi deryaya sor û bi heft deryayan bikeve dê ew mîna neftê pê bikevin û bişewitin. Ew li pey raza Îlahî ketiye û hesreta ku dikşîne mîna hesreta Hz. Yaqubê ku ji bo Hz. Yûsif kişandiye. Ji bo ku ev hesret dawî bibe Loqman mîna tebîbekî nîşanî wî dane; lê belê ew dizane ku dermanê wî Hebîb e û bi vê rastîyê îmanê anîye. Divê were gotin ku di vê helbesta wî de malikine di asta selhîmumtenî de hene û gelek têgihên tesewifî jî cîyê xwe girtine.

3.2.4. Bi Çar Kerîman : (M. X. Sadinî nr. 137 – 138)

Di vê helbesta ku Feqî xwe mîna şa’irê nesîhetan nîşan daye de mirovan derheqê roja qiyametê de hişyar dike. Ji bo ku em nebin poşmanê roja qiyametê û di wê rojê de rûspî bin ‘emelên baş bikin, berî ku ew we’deya emanetî xilas bibe pêwîst e ji vê xefletê hişyar bibin û destên xwe ji vê heyeta qirêj bişon.

3.2.5. Îro Gîrya Me Te : (M. X. Sadinî nr. 139 – 145)

Li gor rîwayetan Feqî vê helbesta xwe li ser mirina hezkirîya xwe ya keça Mîrê

Hêşetê nivîsîye. Dibêjin ku Feqî ji bo xwazgînîya keça Mîrê Hêşetê diçe lê dinêrin ku berî wî keçik miriye. Li ser vê bûyerê jî Feqî ev mersîye nivîsîye. Di vir de cî daye rastîya mirinê, gazinda ji felekê, êş û jana cudabûnê û hwd.; lê belê ew dizane ku çi were li serê mirovan ji Xwedê ye lewre xêr û şeran ew teqdîr dike.

3.2.6. Feqe û Bilbil : (M. X. Sadinî nr. 147 – 156)

Feqî, di vê helbesta xwe de Bilbil dikesîne û pê re dikeve guftûgoyê. Ew bi vê bahaneyê nêrîna xwe ya tewhîdê û eşqa îlahî anîye li ser zimên; lewre ew eşqa ku bilbil li pey ketiye mecaz e, ne heqîqî ye û ne ebedî ye kesê ku “yekê” ji dil perestibe divê ew, yareke ebed be û di rêya wê de canê xwe jî feda bike. Ji bo ku bilbil pey eşqa mecaz ketiye Feqî, wî bi kêmaqilbûnê tawanbar dike; lewre ew sir û dînê ku bilbil pey ketiye betal bûye.

3.2.7. Dilber: (M. X. Sadinî nr. 157 – 161)

Di vê helbestê de Feqî, taybetîyên bedewîyên dilbera xwe rêz dike û bi gotina “*wêran ez im malim xirab!*” – ku ev di dawîya her risteyê de xwe dubare dike- bandora evîna dilbera xwe anîye ziman; lê di dawîya helbestê de dîyar dibe ku ew hêvîdarê eşqa heqîqî ye ne ya mecazî ye.

3.2.8. Feqe û Mela : (M. X. Sadinî nr. 163 – 202)

Ev muşar’ere anku pêkvegotin ne tenê di dîwana Feqî ya bêmuretteb de, di dawîya dîwana M. Cizîrî de jî derbas dibe⁴². Helbest li ser guftûgoya tesewifî ya ku di navbera Feqî û dost û seydayê wî M. Cizîrî de derbas dibe ava bûye.

Feqî û Mela, hizrên xwe yên tesewifê bi alegorîyan û termên mîna xemra ezêlî, gul, perwane, şemal, xêrgeh, du nûn, eyn û sad, şerbet, wesl û hwd. xemilandine. Saqî/ Xuda ji eşqa ezêlî bi gotina xwe ya “Bibe!” hemû ‘ilman bi hûrgilî afirand, bi teqdîra xwe hemû rizq û nesîban li gor qederekê ava kir û Xweda bi tecelîya xwe ev neqşên mecazî sewirand û li ber çavan raxist. Xergeh anku ew tiştên ku li ber çavan hatine raxistin mîna ewrên reş rûdema Dilbera wî (Xudê) ya ku ji alîyê bedewbûnê ve mîna hîlalekî ye veşartîye û nixumandiye, ji ber vê ew jî weke perwaneyê ku dil daye şemalê bi ezab û jan e. Yara ku wî dildayê heqîqî ye anku Xaliq e, ew dikare canê xwe di rêya

⁴² M.Ehmedê Zivingî C. 3., h.b., r, 219

wê de bifiroşe; lewre ew qenc, letîf û laîq e. Tîrên evînê bi awayekî bêdeng û nepen di dilên derwêşan ve çûye, ew ji van derban dinalin û xwedî êş in, di vê êşê de kemilîne û dixwazin perdeyên navbera wan û dildara wan de zûzûka rabin; lewre li gor wan çûyîna ber bi Xwedê ve heyata rastî bixwe ye bi vî awayî ew û Xweda bi hev re dibin sifatek û miraza wan a eslî jî ev e.

3.2.9. Dilo Rabe: (M. X. Sadinî nr. 203 – 236)

Wî di vê helbesta xwe ya herî dirêj de cî daye demdemîbûna dinyayê. Ji ber vê ev helbest ji serî heta binî ji hişyarî û şîret û hikmetan pêk tê. Çi mirov bin çi riwek çi jî tiştên din ên ku hatine afirandin bin di dawîyê de ev hemû bi bal Xwedê ve wê herin; lewre ev dinyaya ku ji alîyê Hz. Îsa ve bi sê telaqan hatibû berdan ne ji Pêxember û welîyên Xwedê re ne jî kesên gelek navdar – çi ji rojhilat çi ji rojava – re mabû û ew kesên ku çûne ber bi axê ve deng ji wan nehatiye û venegerîyane. Dinya dergûş e, ku me mîna zarokan bi xew ve dibe, ew sêrbaz û pîrebok e, me ji rê derdixe û ne yoldaşeke wefadar e. Dinya ji mêj ve heye, mil û xûl pîr e, mirov ji bo ya pîr ya ciwan û can anku axiretê feda nake, ew kesên zana û bîaqil vê bazara çewt nakin. Divê mirov ji vê xewa xefletê hişyar bibe û aqlê xwe bide serê xwe bi vî awayî dikare xwe nêzîkî Xwedê bike.

Divê were gotin ku Feqî di vê helbesta xwe de bikaranîna mazmûna “ pîredinê” li gor çanda wêjeya klasîk a hevpar tevgerîyaye; lewre li gor pêgirtiyên vê wêjeyê dinya “pîr” e , “pîrebok e” “bê wefa û fetlanok” e , “ çerx û dolabek qîrêj” e û “ mirov destên xwe ji serê rake û dev jê berde” jixwe ev helbesta Feqî jî li ser vê hizrê hatiye honandin.

3.2.10. Îlahî Lew Dikim Zarî : (M. X. Sadinî nr. 237 – 238)

Helbest, bi laveyê dest pê dike. Ji Xwedê ji bo gunehên wî yên gelek, bexşandinê dixwaze. Ew, ji dilşahîya şeraba Saqî û ji şewqa dîtina Saqî birîndar e aqil avêtiye. Ji bo ku ji dil bi Saqî secdeyê bînin bangî Mislîmanên qelb dike; lewre her heyberek diyarbûna zatê Xwedê ye û ew jî serxweşê van heyberan e.

3.2.11. Ez Çi Bêjim : (M. X. Sadinî nr. 415 – 416)

Feqî, helbestkarê evînê ye. Ji ber raza dilê xwe ew bi meh û salan her dinale û westîyaye; aşîqê nûra Xwedê bûye û ji bo cemala wî bibîne amade ye ku canê xwe jî bide.

3.2.12. Ay Dilê Min Ay Dilo: (M. X. Sadinî nr. 417 – 420)

Di vê helbesta wî ya mişt hest de wî bi awayekî hewarî (Ay dilê min ay dilo!) behsa evîna dilê xwe û jan û azara ku daye wî anîye ser zimên. Ji bo ku wî; deftera eşqê xwendiyê serxweş û dîn bûye, sebr û aram ji destên wî çûne, ji ber ku derdê evînê ew şewitandiyê hêstirên bi xwîn dirjîne, dax û kevanên ku di dilê wî de peyda bûne adeta wî dixwin û ev rewş bi şev û rojan didome.

3.2.13. Qewî Îro Ze'îf Hal im: (M. X. Sadinî nr. 421 – 424)

Ew ji derdê hicranê dîn û birîndar bûye, her çiqas bendewarê wisletê be jî di falê de xwesteka wî elîf dernayê û temenna û recayên wî bi du'ayan jî qebûl nabe. Di dawîyê de ji bo ku meya evînê bûye qîsmetê wî ew ji îşqê adeta şewitîye û xwe mîna şehîdê îşqê dibîne.

3.2.14. Çiya Anî Li Deştê Kir*: (M. X. Sadinî nr. 425 – 427)

Ew dilbera horî ya ku Feqî jê hez kiriye ji Zuleyxayê bedewtir e, sond be ku di nava nûrê de adeta dîberiqe. Ji ber dilbera xwe Feqî, li deştan dikeve, mîna Mecnûn dîn dibe û fena bilbil dixwîne. Ew ji ber vê rewşa xwe ya hewarî xwe şibandiyê Hz. Yûsifê ku li Ken'anê di heps û di zindanê de maye.

3.2.15. Îlahî 'Ebdukel Atak : (M. X. Sadinî nr. 429 – 434)

Di vê helbesta xwe de ew pêşî behsa sîfatên Xwedê dike û piştê xwe dispêre Xwedê û ji ber gunehên xwe ji Wî efûyê û alîkarîyê dixwaze; lewre ji bilî Xwedê tu Xeffar û efûker nîn in. Ew, ketiyê pey derdê gunehên xwe û ditirse di roja heşrê de Seyîdê Serwer mîna mehdervanekî dixwaze û di wê roja teng de ji Xwedayê Ekber rehmê mîna libên baranê hêvî dike. Her çiqas ew gunehkar be jî; lê belê Xwedê Xefar e.

* Ev helbest di heman pirtûkê de bi navê “Ji Rengê Dilbera Horî” careke din hatiye nivîsîn. Bnr., Sadinî, *Feqîyê Teyran, Jîyan, Helbest û Berhemên Wî*, r. 439.

Divê were gotin ku ev helbest di dawîya pirtûka S. Dêreşî de (Bnr. Seîd Dêreşî, *Dîwana Feqîyê Teyran, Weş. Lîs, Ç.yekem, 2011 Enqere*) di beşa destnivîsên helbestên Feqîyên Teyran de mîna helbesta duwazdehem hatiye nivîsîn û bi latînî “Ji Rengê Dilbera Horî” hatiye binavkirin; lê belê dema em destxetê dinêrin di serê helbestêde bi erebî “Haza qesîdet Melayê Bateyî” anku ev qesîde ya Melayê Bateyî ye derbas dibe. Ev jî pêşîya nîqaşine nû vedike, mûxtacê vekolinê ye.

3.2.16. Ji ‘Işqê Sotîme Welleh : (M. X. Sadinî nr. 435 – 438)

Feqî di vê de behsa derdê agirê işqê dike. Bi rêya bibîrxistina çîroka evîna Mecnûn, Şêxê Sen’an û Memê Alan ê ku ji derdê evînê bêzar bûbûn, rewşa xwe ya di asta şewatê de ye li ber çavan radixe. Lê belê di dawîya helbestê de ew, ji bo ku cemala anku tecelîya Xwedê bibîne perde û astengên navbera wan de dixwaze rabin.

3.2.17. Bizan Ku Min Yar Tu yî : (M. X. Sadinî nr. 443 – 447)

Ev helbesta Feqî, li ser dijberîya “Tu û Ez“ê ava bûye; lewre dema ku ew, bedewbûna yarê nima dike bi wesfên xweşik û bi awayekî fişalekirî van wesfan pey hev rêz dike û wê berztir nîşan dide. Lê belê xwe jî berevajî vê kêmtir û weke bende û muhtelayê yara xwe pênase dike. Di vê helbestê de bandora evînê ji dilê Feqî çawa der daye baş tê dîtin, mirov dibêje qey ew di rewşa cezbeyê de ev helbest nivîsiye.

3.2.18. Ey Dil Hilo Terk Ke Sefa: (M. X. Sadinî nr. 449 – 452)

Feqî bi gotina “Ey dil hilo! “ bangî dilê xwe dike û derheqê bêwefabûn û valabûna zewq û sefayê, cewr û cefayê û hwd. wî hişyar dike. Li gor Feqî ji bilî Şahê Qedîm û Mubîn tu kes ne bi wefa ye; lewre Ew dilên şewitî derman dike, Me’bûdê bêfena ye û buxz û kîn ji wî dûr in. Ji ber ku bi dilberan re wefa tune ye, di şûna wan de lazim e her dem huba Xwedê em bînin bîra xwe. Di dawîya helbestê de helwest û sekna xwe nîşan dide; lewre ew, ji roja “elest”ê (Ew roja berî ku Xwedê însên biafirîne ji wan dipirsî “ Ma ez ne Rebbê we me ? “) ve dilopek ji şeraba Îlahî vexwariye û ji wê demê ve mest û serxweşê evîna Îlahî ye.

3.2.19. Ordeka Ava Cizîrê : (M. X. Sadinî nr. 453 – 455)

Di vê helbestê de tecelîya Xwedê ya li ser xweza û bûneweran anîye zimên; lê dîsa jî ev denîdinya ya fetîq çerx û dokabek qirêj e û ew, xwe ji mîr û xanan nahesibîne; lewre ew ketiye pey derdekî giran û zehf kûr. Bi vê, helwesteke sofîyane nîşan daye: Wî, ji bo ku xwe bigihîjîne Xwedê ji hemû meqam û şohretan xwe şuştîye.

3.2.20. Fesla Biharê Cennetê : (M. X. Sadinî nr. 457 – 459)

Feqî, bi hatina demsala biharê re dibin guhertinên wê yên xweş de dimîne; ços û kelecana wî zêdetir dibe; lewre bihar fesleke pîrozîn e: Xuşxuşa ava zozanan û awaza teyran û dîmenên xweş ên baxên gulîzaran wî dîn dikin. Ev eşq ji alîyê biharê ve li her

derî tê gerandin. Dîsa di dawîya vê helbestê de jî Feqî ji Xwedê bexşandina gunehên xwe û rehmê dixwaze.

3.2.21. Xwedawenda Gunehkar im : (M. X. Sadinî nr. 461 – 463)

Ev helbesta wî li ser lavayê ava bûye. Ew ji Xwedê ji bo gunehên xwe bexşandinê û di roja mehşerê de şefe'et û navbeynkarîya Hz. Pêxember dixwaze.

3.2.22. Xwedawenda Tu Sebbûh î : (M. X. Sadinî nr. 465 – 467)

Di vê helbesta xwe de bi giştî behsa zorbûna li ber mirinê, tirs çûyîna ber bi gorê ve û tirs agir û dojhê dike. Ew ji ber van dijwarîyan ji Xwedê bi awayê lavayê alîkarî dixwaze. Lê hêvîya wî heye ku here cenneta baqî û li wir seyranê bike. Divê were gotin, weke ku ev helbest neqedîyaye û weke berhevkarê vê berhemê nîşan daye hin cîyan de risteyên wê nehatine xwendin.

3.2.23. Îro Ji Eşqa Sorgulê : (M. X. Sadinî nr. 469 – 471)

Feqî, di vê helbestê de eşqê bê çawa bandorî wî kiriye bi awayekî lîrîk vegotîye. Mebesta dilê xwe rasterast dibêje: Ew nûra Hebîbê xwe dixwaze û ji ber vê xwestekê ji lingan heta serî; sebr û qirara wî nemaye, lewre dilê wî şubhê agir şewitîye; tu şîret lê asir nakin, ji ber vê rewşa wî ya bihewarî her dem nalînên wî ber asîmanan ve diçin. Di vê helbesta wî de hin mezmûnên wêjeya klasîk jî hatine bikaranîn.

3.2.24. Dilo Carek Xwo Hişyar Ke : (M. X. Sadinî nr. 473 – 476)

Ev helbest di serî de bi şayesa bandora heyva nîsanê ya li ser gulistanan hatiye destpêkirin û bi şayesa dilbera wî ya ku bi eşqa xwe ji qeyd û bendan wî rizgar kiriye hatiye domandin. Ew, di rewşa xelweyê de bi Xwedê re bi awayek ma'newî û nepenî sohbet kiriye û bi vê weslê bûye bendewarê fermana Wî. Di wê dîwana ku qerqefa şeraba Îlahî tê de digerîya û sed hezar milyaket sef girtibûn, ew jî li wê derê hazir bû û bûbû serxweşê wê camê.

3.2.25. Min Dî di Xewnê da Gulek : (M. X. Sadinî nr. 477 – 478)

Çawa ku di helbestên din de behsa eşqa Îlahî û bandora wê kiribe di vê de jî heman mijarî anîye zimên: Weke ku ew di xewnekê de tecelîya Xwedê (Gul) dibîne û piştî ku ew hişyar dibe dibîne ku ew xewnek bû, ji ber vê xemgînîyê nalînên wî ber bi

asîmanan ve diçe. Ji derdê firaqê adeta ew dihele û ji kerba eşqê her dem dinale û her dilkul e.

3.2.26. Ji Eşqê Te Ezî Dîn im : (M. X. Sadinî nr. 479 – 481)

Di vê helbestê de jî behsa îştîyaqa eşqa îlahî dike. Ev eşq; dil û mêlakên wî tijî kul û şeraba vê eşqê jî wî dîn û heyran kiriye. Piştî ku ew ji destê canana xwe bi fincanê şerab vexwariye di meclîsa dostên Xwedê de bûye Saqî anku meyger. Ji ber eşqê dîn bûye, aqil avêtiye û li vê dinyayê mîna Mecnûn lê hatiye.

3.2.27. Hatim Ber Dergehê Rehmet : (M. X. Sadinî nr. 483 – 486)

Feqî di vê helbestê de pesnê Hz. Pêxember dide û bi dubarekirina dawîya her malikekê de ji wî mededê dixwaze; lewre Feqî, ji mêj ve aşiqê Xwedê bûye, ji ber vê jî her du çavên wî di şûna hêstiran de xwîn dibarînin; bê dewa û bê tebîb e ji eşqa Îlahî dilkebîb e û hwd.

2.3.28. Ah Ji Destê Cama Wîsalê : (M. X. Sadinî nr. 487 – 489)

Di vê helbestê de Feqî, behsa gihîştina camê anku eşq û muhabeta Îlahî û çêja wê dike. Ji çavên wî hêstirên bi xwîn dibarin. Dilê wî ji eşqê pijîyaye û xwedîyê dilê wî yê peritî mayînde û baqî ye; lewre ew, xwedîyê “*kûn feyekûn*”ê ye; zanayê bûn û nebûnê ye û mifteya dilan bi wî vedibe. Feqî êdî şeraba Îlahî vexwariye û hêvîyên xwe ji Xwedê qut nake. Tenê ew kesên ku wê meya sarsaleyê vexwaribe dê ji rewşa Feqî karibe fêhm bike.

3.2.29. Ellah Sehergeha Ezel : (M. X. Sadinî nr. 491 – 492)

Feqî, di vê helbestê de jî behsa taybetîya Xwedê ya ezêlibûnê, afirandina gîyaneweran û qedera wan dike; lê belê divê were gotin ku ev helbesta wî ji alîyê xwetemamkirina mijarê ve kêmtir maye. Nemaze di navbera malika dawîyê û yê berî wê de ji alîyê wateyê ve qutbûnek heye.

Di encama vê beşê de derdikeve holê ku Feqîyê Teyran di helbest û menzûmeyên xwe de bi giranî li ser mijarên mîna tesewif, şîretên dînî, du'a, lave û hwd. rawestîyaye; lê digel vê di “Şerê Dimdim” de bûyereke dîrokî û di “Îro Girya Me Tê” de jî mersîyeyekê ji xwe re kiriye mijar.

Em dibînin ku Feqîyê Teyran helbestkarê hest û evînê ye. Di helbestên wî yê mîna “Ay Dilê Min Ay Dilo”, “Qewî Îro Ze’îf Hal im” û “Bizan Ku Min Yar Tu yî” de dema mirov bi awayekî rûkî li wan dinêre dikare bibêje ku ew dilbera Feqî behsa wê kiriye dilbereke beşerî ye; lê heke ev helbestên wî yê navborî baş were xwendin û analîzkirin û helbestên wî yê din jî li ber çavan werin girtin ê wê demê were dîtin ku ew deftera eşqê ya ku wî xwendiyê û eşqa ku wî xistiye rewşa serxweşî û hewarîyê ne eşqeke beşerî ye. Dîsa meya evînê ya ku wî vexwariye ne meyeke mecazî ye û ew eşqa ku di rêya wê de bûye şehîdê wê ne eşqeke beşerî ye. Ji ber vê li gor hizra me Feqî di van helbestên xwe de jî behsa evîna Îlahî anku tesewifê kiriye.



BEŞA DUYEM

NÊRÎNEKE RÛXSARÎ LI SER DÎWANA WÎ

1. JI ALÎYÊ TEŞEYÊ VE:

Manzûme û helbestên ku li gor qaîdeyên wêjeya klasîk hatine nivîsîn, dema ji alîyê teşeyê ve werin nirxandin pêwîst e hêmanên mîna keş, serwa, paşserwa û teşeya nezmê li ber çavan werin girtin.

1.1. Ji Alîyê Keşê ve:

Keş an jî kêş tê wateya pîvan û giranîyê. Ew pîvana ku ahenga nezmê dipêve jê re keş tê gotin. Weke ku tê zanîn sê cureyên keşê hene: Keşa erûzê ya kêteyî û ya serbest in. Keşa erûzê di wêjeya klasîk de tê dîtin û li ser lihevkirina dengên (tîp an jî kête) kurt û dirêj ava bûye; keşa kêteyî, ew jî di wêjeya gelerî de hatiye dîtin û li gor lihevkirina hejmara kêteyan hatiye nivîsîn û ya serbest jî di wêjeya nûjen de derketiye holê û ji navê wê jî tê fêmkirin ku tu rêzik û pîvanên wê tune ne.

Divê were gotin ku me hin menzûmeyên ku di pirtûka M. Xalid Sadinî ya bi navê *Feqîyê Teyran, Jîyan, Berhem û Helbestên Wî* de ne tu keşa erûzê neçespandiye. Me ev manzûme mîna bi keşa kêteyî hatine honandin hesabandîye. Dibe ku Feqî, ev manzûme bi kêteyî jî nivîsî bin; lê belê îhtimal e ku ev ji arîşeyên mina tîpguhestin û jêgirtin anku îstinsehê bin jî ji ber vê ev mijar tam ne zelal e û mixtacê lêkolînê ye.

1.1.1. Ji Alîyê Keşa Erûzê ve:

Li gor xebata me 29 manzûme û helbestên Feqî, bi erûzê hatine nivîsîn. Me li jor jî cî dabûyê: Erûz, li ser lihevkirina kêteyên kurt û dirêj ava bûye: lê belê di hin menzûmeyên Feqî de di mijara lihevkirina dengên kurt û dirêj de gelek çewtîyên erûzê mîna zîhaf (kinxwendina kêteya dirêj) û îmleyê (dirêjxwendina kêteya kin) hene. Ji ber van çewtîyan di hin menzûmeyên wî de tespîtîkirina qaliban gelek dijwar be jî; lê belê menzûme û helbestên wî yên bi navê mîna “Şêxê Sen’an”, Bersîsê Abid”; “Min Dî Di Xewnê de Gulek”, “Ellah Sehergeza Ezel”, “Qewî îro Zeîf Hal im”, Çiya Anî Li Deştê Kir”, “Hatim Dergehê Rehmet”, “Îlahî 'Ebdûkel Atak”, Ey Dil hilo Terk ke Sefa”, “Dilo Carek Xwo Hişyar Ke” û hwd. de jî qalibên erûzê gelek hêsan hatine peytandin.

Di menzûmeyên Feqî de sê qalibên erûzê hatine bikaranîn. Ev ji behra recezê "Mustefîlun / Mustefîlun / Mustefîlun / Mustefîlun" an jî Mustefîlun / Mustefîlun ji

behra hecezê "Mefa'îlun / Mefa' îlun / Mefa' îlun / Mefa' îlun" û ji behra remelê jî "Fa'îlatun / Fa'îlatun / Fa'îlatun / Fa'ulun" in. Ev her sê qalibên 'erûzê ahengeke xweş dane helbestên wî. Jixwe li gor A. Adak, Cenabê Xanî jî di berhema xwe ya " Nûbihara Biçûkan" de herî zêde cî daye van her sê behrên erûzê û dîsa li gor dîtina A. Adak helbestkarên kurd ên din jî herî zêde ji van behra sûd wergirtine⁴³ û Feqî jî ketiye nav vê daraza gelemper û ev şop domandiyê. Ji van her sê behran wî herî zêde behra recezê emilandiye û ev behr, xwe di 14 manzûme û helbestan de nîşan daye û dîsa behra hecezê 10 û behra remelê jî 5 caran xwe dubare kiriye.

Weke ku tê zanîn piranîya keşa erûzê ji sê yan jî ji çar parçeyan pêk tê, ji her parçeyêke wê re "tefîle " hatiye gotin. Bo nimûne: Fa'îlatun an jî Mefa'îlun û hwd. Keşa ku sê yan jî çar tefîleyên/parçeyên wê yek bin jê re "keşa salim"; ji van tefîleyan yek ji wan jî cuda be jê re "keşa nesalim " hatiye gotin. Nexwe Feqî di manzûmeyên xwe de du keşên salim (Mustef'îlun / Mustef'îlun / Mustef'îlun / Mustef'îlun û Mefa'îlun /Mefa'îlun /Mefa'îlun /Mefa'îlun /) û keşeke nesalim (Fa'îlatun / Fa'îlatun / Fa'îlatun / Fa'îlun) bi kar anîye; lê belê di wêjeya klasîk de keşa salim çêtir hatiye dîtin, lewre ew ji aliyê yekahengîyê ve békêmasî ye. Bo nimûne:

Me di mînakên jêrîn de kîteya kin bi vî awayî "+", kîteya dirêj jî bi vî awayî "-" nîşan daye û da ku çewtîyên erûzê yên Feqî baştir werin dîtin jî ji bo zîhafê nîşaneyê (+) û ji bo îmaleyê jî nîşaneyê (-) bi kar anîye.

(**ji behra recezê** : Mustef'îlun / Mustef' îlun)

Qelbê ku hal tê ra bitin

- - + -/- - + -

Yan dê j' Resûl peyda bitin

- - + -/- - + -

Hal bêmecaz qet nabitin

- - + -/- - + -

⁴³ Abdurrahman Adak, h.b., r. 350

Carî bûye l'vê adetê

- - (+) (-) /- - + -

(Feqîyê Teyran, *Şêxê Sen'an*, b. 4., r. 240)

(**ji behra recezê** : Mustef'ilun / Mustef' ilun)

Ey dil were dîsa bi coş

- - + (-) /- - + -

Carek ji cama mey binoş

- - + - /- - + -

Bikim qîsse zembîlfiroş

- - (+)(-)/- - + -

Da seh bikin hîkayetê

- - + - /- - + -

(Feqîyê Teyran, *Zembîlfiroş*, b. 1., r. 399)

(**ji behra recezê** : Mustef'ilun / Mustef' ilun / Mustef' ilun / Mustef'ilun)

Ey dilbera gerdenzerî way nazika dêmqemerî

- - + - /- - + - /- - + - /- + + -

Qamet ji mûma fenerî Wêran ez im malim xirab

- - + - /- (-) + - /- - + - /- - + -

(Feqîyê Teyran, *Dilber*, m. 1., r. 157)

(**ji behra recezê** : Mustef'ilun / Mustef' ilun / Mustef' ilun / Mustef'ilun)

Xuşxuş were eya bihar çûm di nava baxê gulîzar

- + - (-) + + - / -(-)(+)/- - + - -

Ez dîn kirim işqa bihar dîsa bi xêr hatî bihar

- + - /- - + - /- - + - /- - + -

Biharekî bi rengîn e derê işqê digerîne

(-)- + /(-) - (+) (-)/(-)- (+)- (-)(-)(+)-

Qelbê me kir'ye birîne dîsa bi xêr hatî bihar

- + - / (-) (-)(+)(-)/-- + - / -- + -

(Feqîyê Teyran, *Fesla Bihara Cennetê*, m.5. û 6., r.458)

(Ji behra hecezê: Mefa'îlun/ Mefa'îlun/ Mefa'îlun/ Mefa'îlun)

Qewî îro zeîfhal im dinalim ez li wê tayê

+ - - - / + - - - / + - - - / + - - -

Di birhanan dihat falim tilsima wesletan nayê

+ - - - / + - - - / + - - - / + - - -

(Feqîyê Teyran, *Qewî Îro Ze'îfhal im*, m. 1., r. 421)

(Ji behra hezecê : Mefa'îlun/ Mefa'îlun/ Mefa'îlun/ Mefa'îlun)

Li xwe şîrîn meke newmê ji nefsa xwe bike lewmê

+ - - - / + (-) - - / + - (-) + - - -

Meçe nêzîkî, vê qewmê qewî ew fî'la xesar e

+ (-) - - / + - - - / + - - - (+)(-) - -

Dilo newma me jê behs e beyana xefletê nehs e

+ - - - / + - - - (-) / + - - - - / + - - -

Ne hişyarî gelek tehs e me nêv xabe ku mirdar e

+ - - - - / + - - - (-) / + - - - (-) + - - - -

(Feqîyê Teyran, *Dilo Rabe*, m. 2 û 3., r. nr. 203 û 204)

(Ji behra remelê: Fa'îlatun / Fa'îlatun / Fa'îlatun / Fa'îlatun)

Aşiqê sêv û biha me ji bo cemala muhtela me

-+ - - - / + - (-) / - + - - - / - + - - -

Ger bibînîm canfida me kes bi halê min nezan

-+ - - - / - + - (-) / - + - - - / - + - - -

(Feqîyê Teyran, *Ez çi Bêjim*, m. 6., r. 416)

(Ji behra remelê: Fa'îlatun / Fa'îlatun / Fa'îlatun / Fa'îlatun)

Dil ji min nakit xeyalan bûme perwana şemalan

+ - - / - + - - - + - - / - + - -

Bêriya husn û cemalan ay dilê min ay dilo

- + - - - + - - - + - - / - + -

Canfirît im te nebînîm deftera 'işqê dixwînîm

- + - - / (-) + - - / - + - - / - + - - -

Serxweş û sekran û dîn im ay dilê min ay dilo

(+) - - / - (+) - - / - + - - / - + -

(Feqîyê Teyran, *Ay Dilê Min Ay Dilo*, m. 1 û 2., r. 417)

TABLOYA KEŞA ERÛZÊ

| Cureyên Kêşa Erûzê | Navê Menzûme û Helbestan |
|---|---|
| *Behra Recezê :
- Mustef' ilun/Mustef' ilun | - Şêxê Sen'an
- Bersîsê Abid
- Zembîlfiroş |
| -Mustef' ilun/Mustef' ilun/ Mustef' ilun/
Mustef' ilun | -Ellah Çi Zatek Ehsan e
-Ey Av û Av
-Îro ji Dest Husna Hebîb
-Bi Çar Kerîman
-Îro Girya Me Tê
-Dilber
-Ey Dilo Hilo Terk Ke Sefa
-Fesla Bihara Cennetê
-Îro Ji Eşqa Sorgulê
-Min Dî Di Xewnê De Gulek
-Ellah Sehergeha Ezel |

| | |
|--|--|
| <p>*Behra Hezecê :
-Mefa'îlun / Mefa'îlun / Mefa'îlun / Mefa'îlun</p> | <p>-Dilo Rabe
-Îlahî Lew Dikim Zarî
-Qewî Îro Ze'îf Halim
-Çiya Anî Li Deştê Kir
-Îlahî 'Ebdukel Atak
-Ji Eşqê Sotîme Welleh
-Xwedawenda Gunehkarim

- Xwedawenda Tu Sebbûh î
-Dilo Carek Xwo Hişyar Ke
-Ji Eşqa Te Ezî Dîn im</p> |
| <p>*Behra Remelê:
-Fa'ilatun/ Fa'ilatun/ Fa'ilatun/ Fa'ilun</p> | <p>-Ez Çi Bêjim
-Ay Dilê Min Ay Dilo
-Ordeka Ava Cizîrê
-Hatim Dergehê Rehmet
-Ah Ji Destê Cama Wîsalê</p> |
| <p>Berheva Wan</p> | <p>29 e.</p> |

1.1.2. Ji Alîyê Keşa Kîteyî ve :

Keşa kîteyî li ser lihevkirina hejmarên kîteyan ava dibe, Feqî, menzûmeyek û sê helbestên xwe li gor vê pîvanê honandiye ev: ” Keleha Dimdim”, “Feqî û Bilbil”, “Feqe û Mela” û “Bizan Ku Min Yar Tu yî” ne û Keleha Dimdim, bi heft kîteyî û her sê menzûmeyên din jî bi 14 kîteyî hatine nivîsîn; lê belê di hin risteyan de kîteyên kêman jî zêde derdikeve holê.

Bikaranîna keşa kîteyî helbestkarekî klasîk, gaveke din nêzikî wêjeya gelerî dike jixwe Feqî jî hin alîyan ve berê xwe daye wêjeya gelerî. Bo nimûne:

(7 kîteyî)

Ez j'xîreta Nebî me : 7

Ez şêrekî Mukrî me : 7

Xan Ebdalê Bohtî me : 7

Ez jî bi navê vî me : 7

(Feqîyê Teyran, *Şerê Dimdim*, b. 1., r. 383)

(14 kîteyî)

Bilbil dibê awazan xirab carek xweya kir : 14

Bes bike şî'r û sozan ateş l imin te kir : 14

Çend didî fir û bazen j'te ra nînin çû agir :14

(Feqîyê Teyran, *Feqe û Bilbil*, b. 1., r. 147)

(14 kîteyî)

Selama min heqîrê sedefek di vê tê kin : 14

Îroke li Cizîrê heq e ku li Melê kin :14

Hilak j'derba tîrê Derman divê kul ê kin : 14

(Feqîyê Teyran, *Feqe û Mela*, b. 1., r. 163)

(14 kîteyî)

Bizan kum in yar tu yî dil jê birîndar tu yî :14

Ez kuştim yekcar tu yî ê bikom û bêçar tu yî : 14

Bişeml û destar tu yî pir li min kubar tu yî :14

(Feqîyê Teyran, *Bizan Ku Min Yar Tu yî*, b. 1., r. 443)

1.2. Ji Alîyê Teşeya Nezmê ve:

Ew taybetîyên nezmê yên ku ji derve tîr xwiyakirin jê re "teşeya nezmê "

hatiye gotin. Ev taybetî: Keşa ku hatiye bikaranîn, hejmara komristeyan/bendan, hûnandina serwayê, yekeya nezmê û hwd. in. Ev tev, teşeya nezmê dîyar dîkin; lê belê mijara helbestê jî dîsa ji bo peytandina teşeyeke nezmê gelek girîng e.

Pirsa" Feqîyê Teyran menzûmeyên xwe bi kîjan teşeya nezmê nivîsiye?" dê bersiva vê binbeşa me bibe.

1.2.1.Xezel :

Peyva xezelê ji aliyê wateyê ve "sohbata li ser eşqê ya ku bi jinan re tê kirin"⁴⁴ e. Mijara xezelan jî bi gelemperî evîn, tesewif, şerab, felsefe, hîkmet, şîret, û hwd. in. Ew xezelên ku mijara wan şerab û çêja wê û ya dinyayê be ji wan re "xezela rindane", yên mijara wan bedewbûna jin û evînê be "xezela şûxane", yên mijara wan tesewif be "xezela sûfiyane" û yên mijara wan şîret bin ji wan re jî "xezela hekîmane"⁴⁵ hatiye gotin.

Di xezeleke asayî de yekeya nezmê (Ji komeristeyên ku helbestan pêk tîne jê re yekeya nezmê tê gotin.) malik in û hejmara malikan li gor wêjeya klasîk a faris û tirkî di navbera 5 û 15 malikan de diguhere, hûnandina serwayê jî wisa ye: Malika yekem (Her malik ji du risteyan pêk tê.) di navbera xwe de bi serwa ye û risteyên duyem ên malikên din jî bi risteyên malika yekem re bi serwa ye; bi awayê şemakirî jî wisa tê ristîn: aa / xa / xa / xa/ xa / û hwd. Malika yekem re "metla", ji ya dawî re jî "meqta" hatiye gotin û helbestkar bi gelemperî mexlesên xwe di malika meqta de dinivîsin. Bo nimûne:

"Min Dî di Xewnê de Gulek"

Mustefîlun/Mustefîlun/ Mustefîlun/ Mustefîlun

1-Min dî di xewnê de gulek hişyar dibûm wê saetê - a

Nalîn ji min çûne felek sebr û qirara min netê - a

⁴⁴ M. A. Yekta Saraç, *Klasik Edebiyat Bilgisi, Biçim-Ölçü-Kafiye*, Weş. Gökkubbe, Ç. nehem, Stenbol, 2015, r. 46

⁴⁵ Abdurrahman Adak, h.b., r. 371

* Dîyar e ku ev xezel kême.

2-Sebr û qirara min nema nalîn ji min çûne sema - **x**

Zêde li ser min bû xema her dem ku ahîne me tê - **a**

3-Her dem dinalim dîkulum zêde ji eşqa bilbil im - **x**

Ji derdê firaqê dihelim qe d'xum peyala şerbetê - **a**

4-Geh ewwelî geh axerî j'neqşê te ra sed aferî - **x**

Kes namînit rengê berî ella ku şahê qudretê - **a**

5-Kullê şiya ku per dibî j' keyfa berê me'zûl dibî - **x**

J' husna berê tebdîl dibî aşiq dibînin 'îbretê - **a**

(Feqîyê Teyran, r. nr. 477 û 478)

Digel van agahîyan ji bo ku xezelên Feqî ji xezelên asayî hinek cihê ne em ê xezelên wî di nav hin cureyên xezelê de binirxînin:

1.2.1.1.Xezelên Musemmet:

Ew xezelên ku di hundirên malikên wan de serwa/qafiye hebe ji wan re "xezela musemmet"⁴⁶ hatiye gotin. Wî di hemû xezelên xwe de çî yên muzeyyel û çî jî yên bêmetla de serwaya navîn bi kar anîye. Ev cure xezel pêwîst e bi keşên erûzê yê bi çar tef'île hatibin nivîsîn; lewre dema malik li gor serwaya navîn li bin hev bên rêzkirin murebbayek an ku çarristek derdikeve holê.⁴⁷ Jixwe K. Yildirim, S. Derişî û M. Sadîni jî di berhemên xwe de xezelên musemat ên Feqî bi awayê murebbayê nîşan dane. Bo nimûne:

“Ji Eşqê Te Ezî Dîn im”

Mefa'îlun / Mefa'îlun / Mefa'îlun / Mefa'îlun

1-Ji eşqê te ezî dîn **im** / şev û rojê d'xiyalê da -**a**

Hero carek te nabînim / wekû gerham di malê da -**a**

2-Wekî gerham şîrîn kanê / j'dev û lêva şekir barî -**x**

⁴⁶ Abdurrahman Adak, h.b., r. 378

⁴⁷ Abdurrahman Adak, h.b., r. 378

L'min ruhnî kir şeva tarî / weku bayê şemal lê da -a

3-Şeva tarî şemal hil**kir** / dil û mêlak li min kul kir -x

Tijî nar û tijî pel **kir** / ji eşqa wê delalê da -a

4-Delalê j'min hebû **kerbek** / bi destê xo hejand herbek -x

Li min da dilberek **derbek** / wekî bizmar di ne'lê da -a

.

.

.

13-Ez im Mecnûn **li dinyayê** / min sond xwerî bi Tahayê -x

Tu horîkî **li dinyayê** / te dêm geş bûn d'hîlalî da -a

14-Tu yî bedra şîrîn **eynê** / ji tora qabe qewseynê -x

Ji wan herfa tu mabeynê / çî bê xiş bû di fêslê da -a

(Feqîyê Teyran, r. nbr. 479 û 481)

Lê belê heman xezel bi vî awayî anku bi çarrist jî dikare were nîşandan:

1-Ji eşqê te ezî dîn im

şev û rojê d'xiyalê da

Hero carek te nabînim

wekû gerham di malê da

2-Wekî gerham şîrîn kanê

J'dev û lêva şekir barî

L'min ruhnî kir şeva tarî

Weku bayê şemal lê da “ û hwd.

Divê were gotin ku ji alîyê honandina risteyên xezelekê ve awayê yekem dirusttir û estefîktir disekine û ji bilî vê ev teşe xezel in, ne murebba ne; lewre di wêjeya klasîk a kurdî de bi qasî ku me dîtiye çî murebba/çarrist a bêserwaya navekî û çî jî muxemmes/pêncrist bin ne bi du tef'îleyan, bi çar tef'îleyan hatine nivîsîn. Digel van agahîyên me, Ebdurreqîp Yûsif jî di berhema xwe ya bi navê “Dîwana Kurmancî” de dema behsa Feqîyê Teyran dike cî dide helbesta wî yê “Îro ji Dest Husna Hebîb” û “Bi Çar Kerîman” jî. Lê belê Yûsif van helbestan ne mîna murebba/çarristan, ew jî weke me bi awayê malikan nîşan daye û vê hizra me piştrast kiriye⁴⁸. Bo nimûneyên murebba û muxemmesan:

“Min Di Ber Qal û Bela”

Fa’ilatun/ Fa’ilatun/ Fa’ilatun/ Fa’ilun

1-Min di ber “Qal û Bela” batin vi wî rab û evîn -a

Hêj li ser “ehda elest” im ta bi roja axirîn -a

Min divê lê eşkera kim careke daxa nihîn -a

Goftim û ra ma do’agûyê to em ey hûrî’în -a

“E’redet ‘ennî we qalet ma du’a ul-kafirîn” -a⁴⁹

(Melayê Cizîrî)

“Min Dî Şeva Cum’eyê Esmerek, Ez Bûm Xulam”

Fa’ilatun/ Fa’ilatun/ Fa’ilatun/ Fa’ilun

1-Min dî şeva cum’eyê esmerek, ez bûm xulam -a

Çûm tewafa rê û laman, dîlbera şîrînhudam -a

Şewq û nûra xet û xalan, dil muferreh bû tamam -a

Esmerê min, dilberê min, li te bin yûz bîn selam -A

⁴⁸ Bnr. Edurreqîp Yûsif, h.b., nr. 45-47

⁴⁹ M.Ehmedê Zivingî, b.n.b., C. 2., r., 13

2-Sed selam û selewatê Padîşahê Qudretê -b

Ew bibarin her mudamet bejn û bala qametê -b

Bê hebîba xwe me nevê qet duxûla Cennetê -b

Esmerê min, dilberê min, li te bin yûz bîn selam -A ⁵⁰

(Ehmedê Xanî)

“Eyyuhel Îxwanu Mehla...”

Fa’ilatun/ Fa’ilatun/ Fa’ilatun/ Fa’ilun

1-Firqeta nazik qeda leb xunçeya Şêrînkêlam -a

Dilbera qametxweş û gul çehreya bedra tamam -a

Sorgula bostanê qelba Hezretî Nûrşîn meqam -a

Da dilan derd û xem û alam û narê iftiraq⁵¹ -b

(Mela Ebdulfettah Hezoyî)

“Mexferê ‘Alem Muhemmed”

Fa’ilatun/ Fa’ilatun/ Fa’ilatun/ Fa’ilun

1-Min ji ‘isyan û gunahan reşkirî sêsed kitab -a

Nê penahê min tu yî ey padîşahê kamiyab -a

Tu şefe’et ke ji bo min seyyîdê “yewmûl qiyam -b

Gerçî ef’alê ti min têkda xeta nasewab⁵² -a

(Perto Begê Hekkarî)

⁵⁰ Ehmedê Xanî, HEM Û BERHEM, Weş. Lîs, Ç. yekem, Stenbol 2008, nr. 285- 286

⁵¹ Tehsîn Îbrahîm Doskî, *Dîwana Fethî*, Mela Ebdulfettah Hezoyî, Weş. Nûbihar, Ç. yekem, Stenbol 2012, nr., 129-130

⁵² Tehsîn Îbrahîm Doskî, *Dîwana Perto Begê Hekkarî*, Weş. Nûbihar, Ç. duyem, Stenbol 2014, nr. 56 û 57

Em dikarin li van mînak zêde bikin; lê belê her weke ku tê dîtî ev murebba ne bi du, bi çar tef'ileyên hatine nivîsîn û di nava risteyên wan de serwaya navekî jî tune ye. Jixwe ji aliyê honandina serwayê ve jî ev mînak, li murebbayên asayî tî.

1.2.1.2.Xezelên Bêmetla:

Di xezelekê de malika yekem re "metla" bi gotineke din "destpêk" hatiye gotin. Ev malik di nav xwe de bi serwa ye anku bi awayê "aa" yê ye û yê piştre jî bi awayê "-xa/xa/xa/xa..."yê dewam dike; lê bi qasî ku me dîtîye di hin xezelên Feqî de malika metlayê tune ye anku hin xezelên wî ne bi "aa"yê bi "xa"yê dest pê kirine. Ji ber vê taybetîya wan, me ji van xezelan re navê "xezelên bêmetla" guncavtir dîtîye. hejmara xezelên ku bi vî rengî hatine nivîsîn 8 in: Bi Çar Kerîman, Dilber Îlahî Lew Dikim Zarî, Ez Çi Bêjim, Ay Dilê Min Ay Dilo û hwd. Bo nimûneya xezela bêmetla :

"Allah Sehergeha Ezel"

Mustef 'ilun / Mustef 'ilun / Mustef 'ilun / Mustef 'ilun

1-Ellah sehergeha ezel ferman dikir subha ezel - **x**

Ruh tê mucerred bê ' emel anî dîwana hîsab - **a**

2-Anî ji sehreya 'edem hind kafîr û hind muhterem - **x**

Hemya ji bo kerba qelem reş kir bi wî terzî kîtab - **a**

3-Emrê te çû ser lefzê kun mecmu'e erwahan jî bin -**x**

Anîna dîwana mezin ferman te kir wan re xîtab -**a**

4-Jê kir sual lefza ezel qet yek nebû cûz'ek di dest -**x**

Emrê te ev qanûne xwest her çend ku wan neda cewab -**a**

5-Hêj ne Adem bû beşer e er Mîm û Hê 'eksa bê xeber e -**x**

Baxwoy nivîsîn xêr û şer e defter kirin şerr û sewab -**a**

(Feqîyê Teyran, r. nr. 491 û 492)

Weke ku di vê xezelê de tê dîtî malika metlayê tune ye anku malik bi " xa ,xa,

xa ,xa" yê hatine ristin : Lê belê divê were gotin ku helbestên Feqî yên ku bi vî awayî hatine nivîsîn ji aliyê teşeyê ve dişibin qit'ayên kebîr" anku "qit'ayên mezin" jî qit'ayên asayî ji du malikan pêk tê û malika wan a metlayê tune ye û bi awayê "xa, xa," yê têtin û heke ku hejmara malikan li ser duyan be jê re qit'aya kebîr hatiye gotin. Mînaka ku me li jorîn cî dayê de li pênaseya qit'aya kebîr têt; lê belê ji bo ku em bibêjin di wêjeya kurdî ya klasîk de teşeya nezmê ya qit'ayê heye hê zû ye; lewre ji bo piştrastkirina vê peytandinê li ser gelek helbestên kurdî yên ku bi şêwaza klasîk hatine nivîsîn lêkolîneke bi hûrgilî û berfireh pêwîst e were kirin; lê belê heman terz di xezelên çend helbestkarên din de jî têt dîtin:

“ Min dî ji xefletê cam”

Mustef'ilun/Mustef'ilun/ Mustef'ilun/ Mustef'ilun

1-Min dî ji xefletê cam di kef Şahê Necef dil kir hedef -x

Roj hat şeref stêr bûne xef herçar teref nûra yeqeq -a

2-Zulmet nema suhbet we ma nûra şemalan çû sema -x

Lê ew dema zulf bûn cema hatin semayê yekneseq⁵³ -a

(Melayê Cizîrî)

“ Ya Reb Hewar Sed Car Hewar”

Mustef'ilun/Mustef'ilun/ Mustef'ilun/ Mustef'ilun

1-Ya Reb hewar sed car hewar perwane qet nakit qerar -x

Xweş muhbetê havêtî nar ya Reb tu yî dermanê min -a

2-Sed car hewaran dikemê ya agehdarê 'alemê -x

Derman bike vê elemê ya Reb tu yî dermanê min⁵⁴ -a

(Melayê Bateyî)

⁵³ M.Ehmedê Zivingî, h.b., C. 1., r., 519

⁵⁴ M. Xalid Sadînî, Mela Huseynê Bateyî, Jîyan, Berhem û Helbestên Wî, Weş. Nûbihar, Ç. duyem, Stenbol 2011, r. nr. 73 û 74

“Bi Xeflet Umrê Me Bûrî B’Temamî”

Mefa’îlun / Mefa’îlun / Fe’ûlun

1-Bi xeflet umrê me bûrî b’temamî -x

Nizanim kengî emê l’xwe bibine hişyar -a

2-Emê bimrin biçin heşr û hisabê -a

Cihê qenca ye cennet yê dinê nar⁵⁵ -x

(Seyîd Elîyê Findikî)

“Bi Cefa Bit Gilgî Sebrê”*

1-Bi cefa bit gilgî sebrê qewî sehle welê -x

Bête pir muşkîle “wellahî” ji bo sebrê sebûr -a

2-Tu nizanî ji meraqê ti dilan bûye heşr -x

Ya meger nîne te yek xewf ji eyyamê ti şûr -a

3-Heme lebteşneyê zewqa te ne me’şûq û muhib -x

Heme cûbayê zelala te ne nêzîk çî dûr⁵⁶ -a

(Perto Begê Hekkarî)

“‘Uzlet Tikirim Daim Dîsan”

Mef’ûlu/ Mefa’îlun/ Mef’ûlu/ Mefa’îlun

1-‘Uzlet tikirim daim dîsan(i) wekû kungir -x

Her wê ki hebit kavilek ez lê tixûnim qû qû -a

2-Geh geh wekû hudhud ez menzûrê Suleyman im -x

⁵⁵ Selman Dilovan – Huseyn Şemrexî, *Dîwana Seyîd Elîyê Findikî*, Weş. Nûbihar, Ç. şeşem, Stenbol 2012, nr. 185 û 189

* Me tu keşa erûzê di vê helbestê de nepeytandîye.

⁵⁶ Tehsîn Îbrahîm Doskî, *Dîwana Perto Begê Hekkarî*, h.b., r. 152

Geh geh li rûyê şehra bi fixan dibêjim pû pû -a

3-Dîtîm ki li ser darê ba zeban fesîh kapil -x

Tigirî ki tîbin xafil ev xelq(i) hemû kû kû⁵⁷ -a

(Şêx Şemsedînê Exlatî)

1.2.1.3.Xezelên Muzeyyel:

Di hin xezelên wî de hejmara malikan zêdeyî 15an e, ji wan xezelên ku hejmara malikên wan li ser 15an bin jî ji wan re "xezelên muzeyyel/mutewel"⁵⁸ anku "xezelên dirêj" hatiye gotin. Di nav menzûmeyên Feqî de hejmara xezelên ku bi vî rengî hatine nivîsîn 7 in, xezela muzeyyel a ku herî kin bi 16 malikan helbesta "Ey Dil Hilo Terk Ke Sefa" û ya herî dirêj jî bi 80 malikan helbesta bi navê "Dilo Rabe" ye. Lê belê dirêjbûna xezelên Feqî dibe ku ji taybetîyeke wêjeya klasîk a kurdî be jî; lewre çarçoveya hejmara malikên xezeleke asayî -me li jor jî cî dabûyê- li gor wêjeya farisî û tirkî hatiye xêzkirin lê dibe ku pêşerojê hejmara sînorên malikên xezelên kurdî werin guhertin jî. Bo nimûneya xezela muzeyyel:

" Ey Dil Hilo Terk Ke Sefa "

Mustef'ilun / Mustef'ilun / Mustef'ilun / Mustef'ilun

1-Ey dil hilo terk ke sefa qet kes li bal nînin wefa - a

Bêfeyde cewr û cefa qet kes li bal nînin wefa - a

2-Cewr û cefa bê feyde ye çen dî bigirîn holê xwe ye -x

Agah ji halim kê heye qet kes li bal nînin wefa -a

3-Bînev bîra xwe Şahê Qedîm me'bûd ew e ji 'eyban selîm -x

Derman diket derdê seqîm qet kes li bal nînin wefa -a

4-Berke derê Şahê Mubîn dûr e ji wî buxz û kîn - x

⁵⁷ Bamed Serdar, *Dîwana Şêx Şemsedînê Exlatî*, Weş. Nûbihar, Ç. yekem, Stenbol 2015, r. 149

⁵⁸ M. A. Yekta Saraç, *Klasik Edebiyat Bilgisi, Biçim-Ölçü-Kafîye*, r.48

Derman diket daxê di xwîn qet kes li bal nînin wefa -a

.
. .

15-Teqdîr we bû ji roja elest cam û şerab dê min bi dest - x

Qetrek vexwar ez mam mest qet kes li bal nînin wefa - a

16-Ey Mîm û Hê ey Mîm û Hê 'umrim diçû ber ahê wê - x

Razî bi wî hukmê Xwedê qet kes li bal nînin wefa - a

(Feqîyê Teyran, Ey Dil Hilo Terk Ke Sefa, r. nbr. 449 û 452)

Weke ku tê dîtin ev xezel ji bo ku ji 16 malikan pêk tê xwedî zeyl e anku ji xezeleke asayî dirêjtir e.

Teşeya herî zêde ya ku Feqî di dîwana xwe de bi kar anîye bêşik xezel e. Hin xezelên wî ji alîyê mijarê ve li ser mijarên mîna felsefe, hîkmet û şîretan hatine nivîsîn “xezelên hekîmane” û hin ji wan jî ji bo ku li ser tesewifê hatine nivîsîn “xezelên sûfîyane” ne. Beramberê vê ji alîyê cureyên xezelê ve jî wî, xezelên mîna “muzeyyel” “musemmat” û “bêmetla” bi kar anîne.

Lê divê were gotin ku bi gelemperî xezelên Feqî ji alîyê mijarê ve gelek ne kûr in; lewre helbestên xwe ji bo şîretên dînî/tesewifî mîna amûrekî bi kar anîye. Mebesta wî ya sereke ragihandina şîret û mijarên dînî ne.

1.2.2.Qesîde:

Wateya peyva qesîdeyê “qestkirin” û “çûyîna ber bi tiştêkî ve” ye⁵⁹. Qesîde ji alîyê honandina risteyan ve dişîbin xezelan, mîna xezelan ji malika yekem re “metla” û ji ya dawîyê re jî “meqta” tê gotin û hwd. Ji bilî van dîsa di qesîdeyan de mîna xezelan serwaya navekî jî dikarin werin bikaranîn, ji van qesîdeyan re “qesîdeyên musemmat” tê gotin; lê belê qesîde û xezel ji gelek alîyan ve jî cihêreng in: Di qesîdeyê asayî de

⁵⁹ M. A. Yekta Saraç, *Klasik Edebiyat Bilgisi, Biçim-Ölçü-Kafîye*, r. 21

hejmara malikan di navbera 31/33 û 99an de diguhere, qesîdeyeke kemilî ji 6 beşan pêk tê: Nesîb/teşbîb, girizgah, medhîye, texazul, fexrîye, du'a⁶⁰; lê ev taybetî ji bo qesîdeyeke kemilî wisa ye; di qesîdeyeke nekemilî de dibe ku ji van beşan hin ji wan an jî yek ji wan jî tune bin û mijarên ku di qesîdeyan de cîyên xwe girtine ev in: "Tewhîd", "munacat", "ne'et", "pesindayîn", "rexne" û "şînî". Ev taybetîyên ku me ji bo qesîdeyan rêz kirine qesîdeyan ji xezelan cuda dike.

Di çarçoveya agahîyên jorîn de bi qasî ku me peytandiye Feqî, helbesteke xwe tenê li gor teşeya qesîdeyê nivîsiye û ew jî qesîdeyeke musemmat e:

“ Îro Girya Me Tê”

Mustef'ilun/Mustef'ilun/ Mustef'ilun/ Mustef'ilun

1-Îro werin lêzim werin / cîran û xelkê Hêşetê -a

Hûn rayekê li min bikin / îro qewî girya me tê -a

2-Îro qewî j'mi tê girîn / sosin li mêrgan xeyirîn -x

Sed heyfa lêvê şekirîn / êdî venaxun şerbetê -a

3-Lêvên di le'lîn û şeker / kêmbûn ji wan durr û xeber -x

Sed ah û kovan û keser / heyf eyn û lam çûn hicretê -a

4-Heyf eyn û lam bûne cuda / şîn û girîn dîsa te da -x

Em razî ne b'emrê Xuda / herçî ji dergahê te tê -a

5-Her çî diki ew mîr dikit / xêr û şeran teqdîr dikit -x

Daxan li qelban pir dikit / sohtim bi narê firqetê -a

6-Sotim bi nar û agirî / vê faniyê em j'ev kirî -x

Heta xweş in em dê girî / dost çû ye çerxa adetê -a

7-Eman adet bê eman e / wan melek mehbûb rewan e -x

⁶⁰ Abdurrahman Adak, h.b., r. 368

Can di nêv axê nih**an e** / ê felek bê mirwetê **-a**

8-Ey felekê bê we**fayê** / te çira muhlet ned**ayê -x**

Yar di nêv axê gi**hayê** / ey felek bê mirwetê **-a**

9-Ey felekê bê î'û**bar** / min bi te nîn in qet çu **car -x**

Nê te gelek mehbûb ve**şar** / paşî ewan xal û xetê **-a**

10-Nazik û mehbûb û ciwan**ik** / qamet û bejna zirav**ik -x**

“Kullu şey'în” dê bin hal**ik** / ji xeyrî Şahê Qudretê **-a**

11-Her bi can xeyrî wî nab**in** / ew hemî ax û turab **in -x**

..... / çûye mala zulmetê **-a**

12-Zulmeta tarî û k**ûr e** / meqbera nav lê qub**ûr e -x**

Ji haniyan yanî d**ûr e** / qebr e benda firqetê **-a**

.
. .

23-Çîçeka kanî û av **lê** / sosina daîm xunav **lê -x**

..... / dê tamam kim suhbetê **-a**

24-“Mîm û Hê “ şairkî pak **e** / herkesê b'ruh bû ji make **-x**

Hemiyan dê ew fena **ke** / ew jî Şahê Quretê **-a**

(Feqîyê Teyran, Îro Girya Me Tê, r. nbr. 139 û 145)

Weke ku tê dîtîn di vê qesîdeyê de tu beşên qesîdeyêke kemilî tune ye û ev jî ji bo peytandina teşeya nezmê dijwarîyek derdixê holê; lê belê ji bo ku mijara wê şînî û mirin e -ku Feqî ev qesîde li ser mirina hezkirîya xwe ya keça Mîrê Hêşetê nivîsîye- me ew mîna qesîdeyêke pejirandiye.

Digel van agahîyan xezelên muzeyyel û qesîde ji alîyê dirêjbûnê ve dişibin hev. Di vê rewşê de pirsar “Gelo mirov qesîdeyên Feqî û xezelên wî yên muzeyyel dikare çawa ji hev û din cihê bike?” derdikeve holê. Taybetîyê Feqî ew e ku wî xezelên gelek dirêj nivîsîne, heta hin xezelên wî hene ku ji vê qesîdeya navborî jî dirêjtir in; lê belê dirêjbûna xezelên wî ji bo peytandina teşeya nezmên wî ne bes e; di vê rewşê de mijara helbestan jî girîng e, ji ber vê heke ku di helbestên wî yên dirêj de mijarên mîna:” Tewhîd”, “munacat”, “ne’et”, “pesindayîn”, “rexne” û “şînî” tune bin em nikarin ji wan re bibêjin ev helbest bi teşeya qesîdeyê hatine nivîsîn. Bi gotineke din ji bo ku mijara helbesta “Îro Girya Me Tê” şînî û mirin e me jê re gotiye ev qesîdeyek e û ev taybetî ne ji dirêjbûna wê tê.

Ji bo piştrastkirina vê nêzîkahîya me delîla herî xweş, Feqî di dîwana xwe de di malika dawî ya helbesta xwe ya bi navê "Dilo Rabe" de bi vî awayî daye:

“Dilo Rabe”

Mefa’îlun / Mefa’îlun / Mefa’îlun / Mefa’îlun

1-Dilo rabe dilo rabe veke çavan ku êvar e **-a**

Nezan û bes di xew da be bi newmê ra mebe yare **-a**

2-Li xwe şîrîn meke newmê ji nefsa xwe bike lewmê **-x**

Meçe nêzîkî vê qewmê qewî ew fi’la xesar e **-a**

3-Dilo newma me jê behs e beyana xefletê nehs e **-x**

Ne hişyar î gelek tehs e me nêv xabe ku mirdar e **-a**

4-Dilo rabe ji vê xabê wekî bapîr û wek babê **-x**

Em jî dê çîne turabê bi bal baxwoy û ferwar e **-a**

5-Binêr baxwoy û ferwarî binêr çerxê di rozgarî **-x**

Li te roj hate êvarî te ne ‘eql e, ne hişyar e **-a**

6-Eger ‘eql î were çengî binêr nefsê heya kengî **-x**

Tu xafil bî bi vî rengî eya eqlê neguhdar e **-a**

7-Çiqa sist î çiqa kehî tu xwe yekcar jixwe mehl î **-x**

Mebe xergûş di nêv dehlî seyadê te kivandar e **-a**

8-Seyadê bê tî te rake mebêj na û mebêj nake **-x**

Mecala ew bi xewxak e binêr carek çi hewar e **-a**

9-Binêr carek çi bangîn e ji newmê xwe bi hiş bîne **-x**

Dinê qetl e dinê xwîn e dinê gerdûn û rojgar e **-a**

10-Dibarin tîr ji gerdûnê ji xew rabe demek rûnê **-x**

Tu natirsî ji êtunê di bin da agir û nar e **-a**

11-Di nêv agir di nêv pê tî li ser sihlê xewa kê tî **-x**

Ecel gurrye yeqîn pê tî te ne fikr e ne efkar e **-a**

.

.

.

49-Ne Adem ma û ne Şîs ma ne Nûh ma ne Îdrîs ma **-x**

Ne Yûsuf ma ne Cercîs ma ne Eyyûbê birîndar e **-a**

50-Ne Yahya ma ne Salih ma ne Harûn ma ne Mûsa ma **-x**

Ne Meryem ma ne Îsa ma ne Ehmed ma ne çaryar e **-a**

51-Ne heval man ne çaryar man ne eshabê di xemxar man **-x**

Ne ‘alimên di hişyar man ne Calisê wefadar e **-a**

52-Ne Calis û ne Soqrat man ne Talis û ne Boqrat man **-x**

Ne Zulqerneyn û Mîr’at man ne Cumcum man ne Exyar e **-a**

79-Em biçîn heval bimînin “Mîm û Hê” bîra xwe bînin -x

Fatihana jê ra bixwînin hewce û der întîzar e -a

80-“Mîm û Hê” heftê felek çûn j’hicretê dewran gelek çûn -x

Sal hezar û çil û yek çûn ev xezel anî diyare -a

(Feqîyê Teyran, Dilo Rabe, nr. 203 û 236)

Weke ku tê dîtina dema Feqî, mêjûya nivîsîna vê helbestê dide. Bi pê re bi awayekî zelal teşeya nezmaya wê jî bi gotina "Ev xezel anî diyar e" dide. Lê belê heke em li gor rêzkirina risteyan a Yildirim, Sadîn û Dêreşî herin xezelek dernakeve holê; lewre ev helbest ne bi awayê malikan, bi awayê çarînan hatiye ristîn û dîsa ji aliyê dirêjbûnê ve jî dişibe qesîdeyan; lê belê ji aliyê mijarê ve nakeve nav xelesa teşeya nezmaya qesîdeyê; me li jor jî cî dabûyê mijara qesîdeyan bi gelemperî :” Tewhîd”, “munacat”, “ne’et”, “pesindayîn”, “rexne” û “şînî” ye. Lê diyar e ku mijara vê helbestê ji serî heta binî ji hişyarî, şîret û hikmetan pêk tê û peyama ku xwestiyê were dayîn jî demdemîbûna dinyayê ye.

1.2.3.Muselles:

Di dîwana Feqî de ne tenê teşeya qesîde û xezelê, ya musellesê jî tê dîtina. Ev teşeya nezmaya ku her bendeke wê ji sê risteyan pêk hatiye jê re " muselles"⁶¹ anku " sêrist" hatiye gotin. Bi gelemperî mijarên musellesên Feqî lave, tesewif û tewhîd in. Weke ku tê dîtina ev mijar, mijarên dînî ne. Di wêjeya tirkî de jî muselles li ser mijarên dînî-tesewifî ava bûne. Honandina risteyên musellesan bi gelemperî wiha ye: "aaa, bba, cca ... " ji vê şemayê tê fêmkirin ku di benda yekem de her sê riste di nav xwe de bi serwa ne û risteyên sêyem ên bendên din jî bi risteyên benda yekem re bi serwa ne; lê belê di musellesên Feqî de ristina serwayê diguhere, her bend di navbera xwe de bi

⁶¹ Abdurrahman Adak, h.b., r. 385

serwa ne; anku "aaa, bbb, ccc, ddd ..." û wiha diçe û ev di hemû musellesên wî de tê dîtin. Bo nimûneya musellesê :

"Ellah Çi Zatek Ehsan e "

Mustef'ilun / Mustef'ilun / Mustef'ilun / Mustef'ilun

1-Ellah çi zatek ehsan e zêde letîf û qadîr î **-a**

Mexlûq hemî nexşê te ne vêk ra li hemyan fikirî **-a**

Hemd û sena laîq we ne yê 'erşê 'ezîm çêkirî **-a**

2-'Erşê 'ezîmê ekber e zînet û raza merkezî **- b**

Ew kursiya heq li ser e bê şems û gerdûn dibezî **- b**

Heq wahîd e witr e fer e bênewm e baxvanê rezî **-b**

3-Baxê ku baxvan bête ber erdek heye ew lê nebî **- c**

Dara ku enqa bête ser belgek heye sih lê nebî **-c**

Kî j' nî'metê dê dît xeber ya Reb derê feyzê vebî **-c**

4-Ser çeşmeya feyzê çî ye hate lîsanê 'arifan **-d**

Ew nûreka esmanî ye darête qelbê xaîfan **-d**

Jê şem'eyek da Miksî ye lew bûm nedîmê taîfan **-d**

.
. .
.

20-Avek mehîn im kemter im min cerg û dil bûne birîn -e

Sewda û dîn û ebter im pabendê vê nefsa le'în -e

Muksî yê jar û bedtir im ferhemnî xeyrê rahimîn -e

(Feqîyê Teyran, Ellah Çi Zatek Ehsen e, nr. 103 û 110)

Lê belê ji ber ku Feqî mîna qesîde û xezelên xwe de di musellesên xwe de jî serwaya navekî bi kar anîye ev helbestên wî jî mîna qesîde û xezelên wî ji alîyê Sadinî û lêkolînerên din ve ji serwaya navekî ve hatine qutkirin û musellesên wî mîna museddesan/şeşristan hatine ristin. Lê ya balkêş ew e ku dema Mela Ehmedê Zivingî, di şerha Dîwana Melayê Cizîrî de cî dide⁶² muşa'ereya Feqîyê Teyran û Melayê Cizîrî ew, ne şeşrist; mîna sêrist anku musellesê nîşan daye. Ev jî çespandinên me pîştrast dike. Bo nimûne:

“Feqe û Mela”

Feqe:

Selama min heqîrê

Sedefek di vê tê kin

Îroke li Cizîrê

Heq e ku li Melê kin

Hilak in j' derba tîrê

Derman divê ku lê kin

Mela:

Selamên milyaketan

Bê hedd û bê hisêb in

Şubhetê avên şetan

⁶² Bnr. M.Ehmedê Zivingî, h.b., C.3., r., 219

Ji Mela l' "Mîm û Hê" bin

Hilak in ji zehmetan

Derman ji "Lam û Bê"bin

Ya tekuz: "Feqe û Mela"

7+7=14 kîteyî

Feqe:

Selama min heqîrê / sedefek di vê tê kin -a

Îroke li Cizîrê / heq e ku li Melê kin -a

Hilak in j' derba tîrê / derman divê ku lê kin -a

Mela:

Selamên milyaketan / bê hedd û bê hisêb in -b

Şubhetê avên şetan / ji Mela l' "Mîm û Hê" bin -b

Hilak in ji zehmetan / derman ji "Lam û Bê"bin -b

(Feqîyê Teyran, Feqe û Mela, nr. 163 û 202)

Weke ku tê dîtin ev ne şeşrist, sêrist in; lewre di wêjeya tirkî ya klasîk de jî ew helbestkarên ku helbestên xwe bi serwaya navekî nivîsîne ji bilî wêjeya klasîk çêtir nêzîkî wêjeya gelerî-tesewifî ne.⁶³ Li gor peytandinên me yên berê jixwe Feqî jî mutesewifek e û bi hin taybetîyên xwe jî nêzîkî wêjeya gelerî dibe û dîsa muselles hem bi keşa erûzê û hem jî ya kîteyî jî dikarin werin nivîsîn⁶⁴ Feqî jî muselleseke xwe bi erûzê û her sê yên din bi kîteyî nivîsîye. Naxwe ev delîl nîşan didin ku her çiqas Sadînî û lêkolînerên din ev helbest mîna têşeya nezmê ya museddasan nîşan dabin jî di rastîyê de ev muselles in û divê were gotin ku musellesên Feqî mîna xezelên wî gelek dirêj in;

⁶³ M. A. Yekta Saraç, *Klasik Edebiyat Bilgisi, Biçim-Ölçü-Kafiye*, r. 108

⁶⁴ M. A. Yekta Saraç, *Klasik Edebiyat Bilgisi, Biçim-Ölçü-Kafiye*, r. 108

lewre ya herî kin ji 18 bendan (Bizan Ku Min Yar Tu Yî) û ya herî dirêj jî ji 50 bendan (Feqî û Mela) pêk hatiye .

Ew şîroveya ku me ji bo murebbayan kiribû ji bo museddesan jî dikare were kirin; lewre museddes mîna murebbayan, ne bi du tef'îleyan bi çar tef'îleyan tên nivîsîn. Ji bo piştrast kirina vê hizra me çend nimûneyên museddesan ji helbestkarên din:

“Derê Xemha”

Fa’ilatun/ Fa’ilatun/ Fa’ilatun/ Fa’ilun

1-Ey derê xemha li tenha ew li şemsa xawerê **-a**

Xan û man têk da zulûmat paşî wê dêmenwerê **-a**

Piştî lêvê wê venaxwim mutleq Ava Kewserê **-a**

Min nevêt dinya bi carek paşî wê sîmaperê **-a**

Ger bizanim ez di heşrê da nebînim Dilberê **-a**

Cennetê dê çi bikim, pê wer bikim xagusterê **-a**

2-Sed muxabin çû ji ba min ew hebîba çavbelek **-b**

Ah û efxanê di min daîm diçûn heta felek **-b**

Mam di qeyda dax û derdan paşî wê zulfa xelek **-b**

Hem ji feryadê di min aciz dibûn îns û melek **-b**

Ger bizanim di heşrê da nebînim Dilberê **-a**

Cennetê dê çi bikim, pê wer bikim xagusterê⁶⁵ **-a**

(Ehmedê Xanî)

⁶⁵ Ehmedê Xanî, *HEM Û BERHEM*, nr. 267 û 268

“Ey Dilo Mizgîniya Min Hat”

Fa’ilatun/ Fa’ilatun/ Fa’ilatun/ Fa’ilun

1-Ey dilo mizgîniya min hat û paşayê Heleb -a

Van li wilda girtî exmayê ji ber toqa qeseb -a

Bes bike vê gotinê ey bê îcab ey bê edeb -a

Dil ji min bir xemz û naza girtim ez mîrê ‘Ereb -a

Dil me da û qet çi nakit lê heye fikra serî -b

Şehniqab avêt û meş’ya hate der sîmaperî⁶⁶ -b

2-Hate eywanê ji qesrê şu’le da mexrib zemîn -c

Avirek da ‘alemê wê tîr li kohê qaf pirîn -c

Zulf bi dêmî de hejandin ta bi ta nasîn bivîn -c

Lew nesîmî bêhn reva bû, bir heta Maçîn û Çîn -c

Her merheba ateşenî sohtîn ber û dar û dirî -b

Şehniqab avêt û meş’ya hate der sîmaperî⁶⁷ -b

Weke ku tê dîtîn ev şeşrist bi çar tef’îleyan hatine ristin.

1.2.4. Teşeyên Serbixwe:

Helbest û menzûmeyên ku ne li gor xalên teşeyê nezmê hatine nivîsîn ji wan re “teşeyên serbixwe” dikare were gotin. Menzûmeyên ku ji alîyê Feqî ve ne li gor qaîdeyê teşeya nezmê hatine nivîsîn ev in: “Şêxê Sen’an”, “Bersîsê Abid”, “Zembîlfiroş” û “Keleha Dimdim”. Ev her çar menzûme ji alîyê mijarê û ji alîyê dirêjbûnê ve dişibin mesnewîyan. Lê belê ji alîyê honandina risteyan û ji alîyê honandina serwayê ve ji mesnewîyan cihê dibin; lewre mesnewî bi malikan tên nivîsîn û ristina serwayên malikên wan bi awayê aa/bb/cc/dd/ee/ff/gg ... weke ku tê dîtîn bi cotî

⁶⁷M. Xalid Sadîni, *Mela Huseynê Bateyî, Jîyan, Berhem û Helbestên Wî*, nr. 151 û 152

diçe. Lê ev menzûmeyên Feqî bi awayê çarristan û ji alîyê serwayê ve jî abcb/dddb/dddb û abab/cccb/dddb an jî aaab/ cccb/dddb û hwd hatine honandin. Bo nimûne:

“Şêxê Sen’an”

Mustef’ilun / Mustef’ilun

1-Guh din vê nutqê aşiqan **-a**

Da ez bixwînim vê xetê **-b**

Hemd û senayê Xaliqî **-c**

Subhan ji şahê qudretê **-b**

2-Subhan ji şahê zulcelal **-c**

Fikrê me neqşê bê zewal **-c**

Hal bêmeqaz naête bal **-c**

Kamil dibî b’ulfîyyetê **-b**

(Feqîyê Teyran, Şêxê Sen’an, nr. 239 û 336)

Lê divê were gotin ku ji van menzûmeyan di menzûmeya “Şerê Dimdim”de çarrist mîna malikan were hesibandin awayê ristina serwayê ya mesnewîyekê derdikeve holê :

“Şerê Dimdim”

1-Helal kir’ye tahayê / Mezhebê qe kêr nayê **-a**

Em dim’rin nay’ne rayê / Axret xoştir e j’dunyayê **-a**

2-Qeda l’dunyayê b’kevî / Dê rûreş bin l’nik nebî **-b**

Qebûl nekin vî mezhebî / Hem’yan go: Belave bî **-b**

3-Hemiyar rayek vekir / Go aferîn ‘ehda te kir **-c**

Avêtin tac qebûl **nekir** / L'ser xat'ra Ebûbekir -c

(Feqîyê Teyran, Şerê Dimdim, nr. 383 û 397)

Weke ku tê dîtin ristina serwayê bi cotî anku bi awayê aa/bb/cc û hwd. diçe; lê belê di vê menzûmeyê de tu keşa erûzê nehatiye peytandin û bi vî awayî di malikan de serwaya navekî derdikeve holê. Ev her du taybetî jî nakevin nav taybetîyên mesnewîyan, bi gotineke din pêwîst e mesnewî bi keşeke erûzê werin nivîsîn û di mesnewîyan de serwaya navekî tune ye. Ji ber vê ev menzûme jî li gor agahîyên ber destên me mîna mesnewîyekê nikare were pejirandin.

Ji bilî vê, ev menzûme ji alîyê rûxsar û mijarê (evîn, şîret, pesin û rexne) ve dişibin murebbayan; lê belê -me li jor jî çi dabûyê- murebba ne bi du tefîleyan, bi çar tefîleyan tên nivîsîn û ev menzûme li gor murebbayan gelek dirêj in; lewre menzûmeya wî ya herî kin jî 60 û ya herî dirêj jî 336 bendan pêk tê; lê di wêjeya tirkî de hejmara bendên murebbayan bi gelemperî di navbera 5 û 7an diguhere⁶⁸, di kurdî de jî çend nimûne ev in: murebbayeke Ehmedê Xanî 7, ya Mela Ebdulfettah Hezoyî 8 û Perto Begê Hekkarî jî ji 10 bendan pêk hatiye. Ev dane, kême zêde nîşan dide ku murebba ne helbestên zehf dirêj in.

Her weke ku tê dîtin ev menzûme, ji alîyê taybetîyên xwe ve yek bi yek li teşeyê nezmê nayên; lê belê ji alîyê dirêjbûn, mijar, komeristeyan û honandina serwayê ve dişibihin destanên çêker. Lewre destanên çêker bi awayê çarrist û bi serwaya abcb/dddb/dddb, abab/cccb/dddb an jî aaab/ cccb/dddb dikarin werin honandin. Ji alî mijarê ve jî li ser mijarên mîna lehengî, dînî-tesewifî, evînî û hwd. dikarin werin nivîsîn. Heta di wêjeya gelerî ya tirkî de bi gelemperî ev curedestan bi keşa kîteyî hatine nivîsîn; lê yên ku bi erûzê jî hatine nivîsîn hene. Li hemberê vê Feqî jî Şêxê Sen'an, Bersîsê Abid û Zembîlfiroş bi erûzê (Mustefîlun/Mustefîlun); Keleha Dimdim jî bi keşa kîteyî (7 kîteyî) nivîsîye. Digel van ji bo metna zembîlfiroş, di nava gel de "Destana Zembîlfiroş" û ji bo metna Şerê Dimdim jî "Destana Lehengîya Kurdan"⁶⁹ hatiye gotin. Ev taybetî van menzûmeyan gaveke din nêzikî destanan dike. Lê belê menzûmeyên Bersîsê Abid û Şêxê Sen'an di nava neteweyên Mislîman de bi teşeya

⁶⁸ M. A. Yekta Saraç, *Klasik Edebiyat Bilgisi, Biçim-Ölçü-Kağıt*, r.111

⁶⁹ Ordîxanê Celîl, *Kürt Kahramanlık Destanı, Dımdım* (Wer.:İbrahîm Kale), Weş. Avesta, Stenbol 2001

nezmê ya mesnewîyê hatine nivîsîn û bûne mijara wêjeya klasîk; lê belê em dibînin ku Feqî ev her çar menzûme bi heman teşeyî nivîsîne. Nexwe dibe ku Feqî Bersîsê Abid û Şexê Sen'an jî bi awayê destankî nivîsîbe; lê belê ji bo ku li ser îhtimalan encameke teqez em nikarin derxin û ji bo ku çarçoveya destanên çêker ên kurdî tam ne dîyarkirî ne, em ji van menzûmeyan re nikarin bibêjin ev destan in. Ji ber van sedeman me, ev menzûme weke teşeyên nezmê yên serbixwe bi nav kirine.

Wek encam divê were gotin, ev menzûme ji teşeyên nezmê herî zêde nêzîkî destanan e, lewre desan jî ji menzûmeyên teşeyên nezmê yên wêjeya gelerî ne, jixwe Feqî jî ji gelek taybetiyên xwe ve nêzîkî wêjeya gelerî ye.

Di vê beşê de derdikeve holê ku Feqîyê Teyran helbestên xwe bi teşeyên mîna xezel (xezelên musemmet, xezelên muzeyyel û xezelên bêmetla), qesîde (qesîdeya musemmet), muselles û serbixwe nivîsîne.

TABLOYA TEŞEYA NEZMÊ

| Teşeyên Nezmê | Navê Menzûmeyan |
|---------------------------|--|
| *Xezelên Musemmet | <ul style="list-style-type: none"> - Îlahî Lew Dikim Zarî -Çiya Anî Li Deştê Kir -Xwedawenda Gunehkar im -Xwedawenda Tu Sebbuh î -Îro Ji Eşqa Sorgulê
 -Dilo Carek Xwo Hişyar Ke -Min Dî Di Xewnê Da Gulek -Ji Eşqê Te Ezî Dîn im -Ah Ji Destê Cama Wîsalê |
| *Xezelên Muzeyyel/Mutewel | <ul style="list-style-type: none"> -Ey Av û Av -Îro Ji Destê Husna Hebîb -Dilo Rabe |

| | |
|-------------------|---|
| | <p>-Qewî Îro Ze'îfhal im
 -Ji Eşqê Sofî Me Welleh
 -Ey Dil Hilo Terk Ke Sefa
 -Hatim Ber Dergehê Rehmet</p> |
| *Qesîde | -Îro Girya Me Tê |
| *Xezelên Bêmetle | <p>-Bi Çar Kerîman
 -Ez Çi Bêjim
 -Ordeka Ava Cizîrê
 -Fesla Bihara Cennetê
 -Ellah Sehergeza Ezel
 -Dilber
 -Îlahî 'Ebdukel Atak
 -Ay Dilê Min Ay Dilo</p> |
| *Muselles | <p>-Ellah Çi Zatek Ehsan e
 -Feqe û Bilbil
 -Feqe û Mela
 -Bizan Ku Min Yar Tu Yî</p> |
| *Teşeyên Serbixwe | <p>-Şêxê Sen'an
 -Bersîsê Abid
 -Zembîlfiroş
 -Şerê Dimdim</p> |
| Berheva Wan | 33 |

1.3. Ji Alfyê Serwa û Paşserwayê ve:

Serwa û paşserwa di wêjeya klasîk de ji bo sazkirina ahenga helbest û menzûmeyan ji hêmanên jêneger in. Aheng, di helbestekî de di encama lihevkirina dengan de derdikeve holê. Helbestkarekî klasîk jî ji bo di helbestên xwe de ahengê ava bike her çiqas gelek caran ji keşa 'erûzê sûd wergirtibe jî carinan serî li ciwankariyên mîna: Cînas, alîterasyon, asonans, î'ade, îştîqaq û hwd. û carinan jî li serwa û paşserwayê dide.

Di vê binbeşê de me dixwest ku di helbestên Feqî de ji bo ava kirina ahengê giraniya serwa û paşserwayê çî ye kifş bibe. Piştî peytandina ji mînakên helbestên Feqî em ê bigihîjin vê armanca xwe. Ji bo her cureyeke serwa û paşserwayê heta ji destê me hatiye me cî daye du mînakan.

1.3.1. Serwa:

Serwa bi gotineke din qafiye ew hevdengên ku di dawîya herî kêr du risteyan de xwe dubare dikin û ji alfyê wateyê ve jî ji hevûdin cihê bin ji wan re "serwa"⁷⁰ tê gotin. Serwa bi dubarekirina dengan çêdibe û ew dengên ku xwe dubare dike jê re "rewî" tê gotin. Rewî herfa bingehîn a serwayê ye⁷¹ û maza serwayê saz dike. Rewî di dawîya serwayên bêpaşserwa, berî serwaya bipaşserwa û serwaya navekî de dikare were dîtin. Rewîya ku bêhereke anku bêdeng be jê re "rewîya muqayyed" û ya bi hereke anku bideng re jî "rewîya mutleq"⁷² hatiye gotin.

Divê neyê ji bîrkin ku hevbeşîya dengan a serwayê pêwîst e di binemaya bêjeyan de çêbibe⁷³ û li gor cîyê xwe serwa dibin sê beş: Serwaya bêpaşserwa, serwaya bipaşserwa û serwaya navekî.

1.3.2. Li Gorî Cih Cureyên Serwayê:

1.3.2.1 Serwaya Bêpaşserwa:

Ji wê serwaya ku di dawîya risteyan de cihê xwe girtiye û ya ku paşserwaya wê

⁷⁰ Abdurrahman Adak, h.b., r. 358

⁷¹ Cem Dilçin, *Örneklerle Türk Şiir Bilgisi*, Weş. Tdk., Ç. heftem, Enqere 2004, .r. 60

⁷² M. A. Yekta Saraç, *Klasik Edebiyat Bilgisi, Biçim-Ölçü-Kafiye*, r. 269

⁷³ Abdurrahman Adak, h.b., r. 358

tune be jê re serwaya bêpaşserwa hatiye gotin.

“Avek mehîn im kemter im min ceng û dilbûnê birîn

Sewda û dîn û ebter im pabendê vê nefsa le'în

Muksî yê jar û bedtir im ferhemnî xeyrê rahimîn “

(Feqîyê Teyran, *Ellah Çi Zatek Ehsen e*, b. 20., r. 110)

Serwa bi serwaya "în" ê çêbûye û weke ku tê dîtin ji bilî hevbeşîya van dengan di dawîya risteyan de paşserwa tune ye.

"Bilbil dibê awazan xirab carek xweya kir

Bes bike şî'r û sazan ateş li min te rakir

Çend didî fir û bazan j'te ra nîn in çû agir"

(Feqîyê Teyran, *Feqe û Bilbil*, b. 1., r. 147)

Di dawîya risteyan de serwaya bêpaşserwa "ir" ê xwe dubare kiriye. Rewî di mînaka yekem de "n" û ya duyem de jî "r" ê ye ji bo ku ev her du rewî bêdeng in ew rewîyên muqayyed in.

1.3.2.2. Serwaya Bipaşserwa:

Ji wê serwaya ku di dawîya risteyan de paşserwa û berî paşserwayê jî serwayek hebe⁷⁴ jê re serwaya bipaşserwa hatiye gotin. Di vê cureya serwayê de bi serwayê re di dawîya risteyan de paşserwa jî xwe dubare dike.

“Îro ji dest husna hebîn sergeşte û heyran im ez

Min eşq û muhbet bûn nesîb sewdayê sergerdan im ez “

(Feqîyê Teyran, *Îro ji Dest Husna Hebîb*, m. 1., r. 127)

Di peyvên "heyran û "sergerdan" de hevbeşîya dengên "an" ê serwayê saz dike û rewî jî dengê "n" yê ye. "im ez" jî paşserwaya vê malikê ye.

⁷⁴ Abdurrahman Adak, h.b., r. 359

"Xwedawenda gunehkar im bi heqqê zatê ekber key

Pelîtê mucibê nar im bi wê Rewza munewwer key"

(Feqîyê Teyran, *Xwedawenda Gunehkar im*, m. 1., r. 461)

Dubarekirina "er" an serwa û ya "key" an jî paşserwayê saz dike.

1.3.1.1.3. Serwaya Navekî:

Ew serwaya ku di nava risteyan de cîyê xwe girtiye jê re serwaya navekî tê gotin. Jixwe di hemû helbestên Feqî de ev celeb serwa heye.

"Vê îlletê beyan bike bes vê sirê star bike

Carek li min 'eyan bike da seh bikin hîkayetê"

(Feqîyê Teyran, *Ey Av û Av*, m. 18., r. 117)

Di nîvê vê malikê de di navbera peyvên "beyan " û "'eyan" de dubarekirina dengên "an" ê serwaya navekî ava kirine. Jixwe peyvên "bike" jî paşserwa ne.

"Ta'et dikî bê pa û dev çendî dikî çûna li hev

Dengê te tê bi roj û şev zikrî dikî bi haletê"

(Feqîyê Teyran, *Ey Av û Av*, m. 5., r. 112)

Peyvên "dev" û "şev" bi dubarekirina "ev" ê serwaya navekî saz kirine.

1.3.1.2. Li Gorî Hevbeşîya Dengan Cureya Serwayê:

1.3.1.2.1. Serwaya Mucered:

Ew serwaya ku tenê bi tîpa rewîyê hatiye çêkirin jê re "serwaya mucered" hatiye gotin. Di vê cureya serwayê de serwa bi dubarekirina rewîyê tê çêkirin û tîpa rewîyê divê bê hereke be û berî wê jî tîpeke bi hereke hebe.⁷⁵

"Ellah çî zatek ehsan e zêde letîf û qadir î

Mexlûq hemî nexşê te ne vêkra li hemyan fikir î

⁷⁵ Abdurrahman Adak, h.b., r. 360

Hemd û sena laiq we ne yê 'erşê 'ezim çêkir î “

(Feqîyê Teyran, *Ellah Çi Zatek Ehsen e*, b. 1., r. 103)

Di dawîya her sê risteyan de weke ku tê dîtin "ir" serwaya mucerred e, tîpa rewîyê jî "-r" e.

“ Saqî ji xemra ezêlî nûn qelem jê afîrand

Darêhte lewha ewelî rizq û nesîb pê qedirand

Ew bû murada meselê neqşê mecaz pê sewirand”

(Feqîyê Teyran, *Feqe û Mela*, r. 171)

Qertafên "and" ê paşserwaya qertafi "ir" serwaya mucerred û tîpa "r" yê jî rewîya muqeyyed e.

1.3.1.2.2. Serwaya Murekkeb:

Di vê cureya serwayê de tîpên ku xwe dubare dikin ji yekê zêdetir in; anku ji bilî tîpa rewîyê ji herfên mîna "ridf", "qeyd" û "te'sîs" ê yek ji wan jî tê bikaranîn. Ev cure serwa ji sê binbeşan pêk tê: Serwaya murdef, serwaya muqeyyed, serwaya muesses in.

1.3.1.2.2.1 Serwaya Murdef :

Di vê cureya serwayê de berî tîpa rewîyê yek ji tîpên ridfê tê, tîpên ridfê li gor elfebeya erebî : "elîf, waw, û yê " ⁷⁶û li gor a latînî jî "a, û, î," ne.

"Cema kin têk alemê hemîyan bi ustad kin

Herfek j'lewhê qîdemê bînin b'şerh û sewad kin

Nayêne ber qelemê behran ew bi medad kin”

(Feqîyê Teyran, *Feqe û Mela*, r. 198)

Tîpa "d"yê rewî û "a" jî tîpa ridfê ye.

"Em dê biçîn j'oldaş e navê me dê bimîne

⁷⁶ Abdurrahman Adak, h.b., r. 358

Umrê me çû belaş e çû feyde me nedîne

Ger qewlê me bibêjî fatîhê j'bo me bixwîne”

(Feqîyê Teyran, Feqe û Bilbil, b. 20., r. 156)

Dubarekirina dengê "n" yê rewîya mutleq û "î" ya ku berî rewîyê hatiye dubarekirin jî tîpa ridfê ye. Ji ber ku divê sêristê de berî rewîyê tîpa ridfê hatiye dubarekirin serwaya murdef derketiye holê.

1.3.1.2.2.2. Serwaya Muqeyyed:

Di dawîya risteyan de berî tîpa rewîyê qeydî anku bêhereke (bêdeng) were⁷⁷ serwaya muqayyed derdikeve holê.

“Mîrê firengî tu yî sultanê zengê tu yî

Şahê durengî tu yî di rojê cengê tu yî

Tîra xedengê tu yî kîvanê yengê tu yî”

(Feqîyê Teyran, *Bizan Ku Min Yar Tu*, b. 15., r. 446)

Di dawîya vê sêristê de koma "ê tu yî" paşserwa, tîpa "g" yê rewî û tîpa "n" yê jî qeydê saz kirine.

“Xulmet dikî bê pa û dest_j'kê ra dikî çend koh û best

Baxwoy negot gavek vewest hindî diçî dengê te tê.”

(Feqîyê Teyran, *Ey Av û Av*, m. 9, r. 114)

Di nivê vê malikê de peyvên "dest" û "vewest" serwaya muqeyyed ava kirine; lewre tîpa "t" yê rewî û ya "s" yê jî qeyd e.

1.3.1.2.2.3. Serwaya Muesses:

Berî rewîyê tîpeke bi hereke û berî wê herfê jî "elîf"ek anku "a"yek hebe

⁷⁷ Abdurrahman Adak, h.b., r. 361

serwaya muesses derdikeve holê.⁷⁸ Tîpa elîfê tîpa tesîsê ye û tîpa ku di navbera elîf û rewîyê de maye jê re jî tîpa "daxil" tê gotin. Divê neyê jibîrkirin ku tîpên daxil ji hevûdin cihê bin jî pêwîst e herekeyên wan weke hev bin.

“Barî emanet wî li we nakim sîyaset wî li we

Ferz û kîfayet wî li we heşr û beyana kaxetê”

(Feqîyê Teyran, *Bi Çar Kerîman*, m.5., r. 138)

Peyvên mîna "emanet" û "kîfayet"ê hevdengîyek ava kiriye. Tîpa "t" rewî, "a" tesîs" û kîteyên "ne û ye" yê jî daxil in.

“Secdeya şukrê carek me ferz e di wîsalê

Ne perde bê sitarek li ber wechê hîlalê

Ehsenellah tebarek ji sira wê cemalê”

(Feqîyê Teyran, *Feqe û Mela*, r. 167)

Peyvên “carek, sitarek û tebarek” di nav risteyan de ahengeke xweş ava kiriye; “k” rewî, “a” tesîs û “re”yan jî daxil in.

1.3.2. Paşserwa:

Paşserwa anku redîf, her cure dubarekirinên ku piştî serwayê tîpên jê re paşserwa tê gotin⁷⁹. Paşserwa dibe ku di asta qertafî, qertafî-bêjeyî/komepeyvî û bêjeyî bibe. Di paşserwayê de xala herî girîng “hevwater”, “hevpeywir” û “hevniwîsîna” qertaf an jî bêjeyan e û jixwe ev taybetî wê ji serwayê vediqetîne.

1.3.2.1. Paşserwaya Qertafî:

Di paşserwaya qertafî de, piştî serwayê paşserwa tenê di asta qertafan de tê dubarekirin.

"Dilo carek xwo hişyar ke helo da çîne seyranê

⁷⁸ Abdurrahman Adak, h.b., r. 361

⁷⁹ Abdurrahman Adak, h.b., r. 362

Carekê tu bi xwo xweş ke were seyra gulistanê"

(Feqîyê Teyran, *Dilo Carek Xwo Hişyar Ke*, m. 1., r. 473)

"ê" paşserwaya qertafî ye.

"Ma ez dibê m vê gotinê bêy te ziban bê gotin e

Ew qal û qîlê di dinê zahir û batin sakin e

Bûn û mîqata mirinê ew j'bal te ne, ne j' bal min e"

(Feqîyê Teyran, *Ellah Çi Zatek Ehsen e*, b.10., r. 107)

"e" paşserwaya qertafî ye.

1.3.2.2. Paşserwaya Qertafî û Bêjeyî:

Di vê cureya paşserwayê de, piştî serwayê di asta qertafî û bêje yan jî komebêjeyî de ne.

"Bizan ku min yar tu yî dil jê birîndar tu yî

Ez kuştîm yekcar tu yî ê bi kom û biçar tu yî

Bişeml û destar tu yî pir li min kubar tu yî"

(Feqîyê Teyran, *Bizan Ku Min Yar Tu*, b.1., r. 443)

Koma "tu yî" paşserwaya qertafî û bêjeyî ne.

"Îro ji dest husna hebîb sergeşte û heyran im ez

Min eşq û muhbet bûn nesîb sewdayê sergerdan im ez "

(Feqîyê Teyran, *Îro ji Dest Husna Hebîb*, m.1., r. 127)

"-im" serwaya qertafî û "ez" jî ya bêjeyî ye.

1.3.2.3. Paşserwaya Bêjeyî:

Di vê cureya paşserwayê de paşserwaya ku piştî rewîyê tê di asta bêjeyî de ye.

"Hemd û sena heqq e li me bê hedd û bê qiyas bikin

Zikr û îbadet lazim e cuhde terîqa ras bikin

Roja qiyamet qaîm e ta'etek pir esas bikin “

(Feqîyê Teyran, *Ellah Çi Zatek Ehsen e*, b.16., r. 109)

"Bikin"ên dawîya van risteyan paşserwaya bêjeyî ye.

"Lew bûm herîf lew bûm nedîm min 'işqeka dijwar heye

Kovî kirim serfa 'ezîm min hêj meya pêrar heye

Minet ji Rehmanê Rehîm min mîrekî settar heye”

(Feqîyê Teyran, *Ellah Çi Zatek Ehsen e*, b. 5., r. 104)

Dubarekirina "heye" paşserwaya bêjeyî ye.

Feqî bi navbeynkarîya serwa, paşserwa û bi taybetî bi serwaya navekî hêza ahenga helbestên xwe berztir kiriye. Li gor çarçoveya ku me li jorîn xez kiriye mînakên hemû cureyên serwa û paşserwayê hatine peytandin. Dikare were gotin ku ew di warê ava kirina serwa û paşserwayê de tu keşe nekişandiye, hem bikaranîna serwaya navekî û hem jî ya dawîya risteyan nîşaneyê vê taybetîyê ye.

2. JI ALÎYÊ ŞÊWAZÊ VE:

Şêwaz, terza vegotina helbestkarekî ye. Risteyên kurt û dirêj, vegotina xwerû yan xemilandî, celebên ciwankarîyên wêjeyî, celebên peyvan, sazûna peyvan, bikaranîna peyvên biyanî, di vegotinê de zarava û devokên serdest û hwd. ev tev mijarên şêwazê ne û dibine bersiva pirsar: "Helbestkar helbestên xwe bi çi awayî nivîsîne?"

Divê neyê jibîrkin ku di wêjeya klasîk de cîyekî taybet a "şêwazê " heye, lewre di wêjeya klasîk de ya herî girîng ne mijar e, şêwaza vegotinê ye. Jixwe di wêjeya klasîk de sedema xwedubarekirina mijaran jî ev e, anku heman mijar bi şêwazên cihêreng hatine vegotin û bi vî awayî ev çand heta dema me ya îroyîn dewam kiriye.

Em ê di vê beşê de terza vegotina Feqî bi awayekî rûkî be jî li ber çavan raxin.

2.1. Zarava û Devoka Ku Bi Kar Anîye:

Feqîyê Teyran bêşik helbestên xwe bi kurdîya kurmancî nivîsîye û gava mirov bi awayekî baldarî helbestên wî dinirxîne dibîne ku ew dibin bandora ekola/devoka Botanê de maye, jixwe di wêjeya kurdî ya klasîk de devoka serdest ya Botanê ye. Di helbestên wî de şopên vê devokê di hin peyvên mîna "lebit, diket, key, dicit, çû pet, kanê, bibit, duhî, bît, bo, têtê, dikîn, dikêşim, kit, nasebîrit, bête, belg, dit, bikit, nêv, neşêm, bey te, we ye, ezman, biçîn, nakit, rakit, kehnî, nayêt, sojit, naçit, çu, divête, bit, zilfêd û hwd."de tê dîtin. Ev gewşîna wî ji mînakên jorîn jî tê fêmkirin ku bi gelemberî di lêkeran de derdikeve holê. Bo nimûne :

"Herçî dicit ew mîr dicit xêr û şeran teqdîr dicit

Daxa li qelban pir dicit sohtim bi narê firqetê "

(Feqîyê Teyran, *Îro Girya Me Tê*, m.5., r. 140)

"Perwane lew dimirit xweş nîn e ev bijînê

Zeîf xwe negirit tîj e berqa evînê

Di perdê nasebirit perde kemala dînê"

(Feqîyê Teyran, *Feqe û Mela*, r. 192)

Bikaranîna bi vî rengî di hemû helbestên wî de nayên dîtin û xwe bi van peyvên bi sînor nekiriye, di gelek cîyan de xwe ji şêwaza devokî dûr girtiye.

Feqî, di helbestên xwe de kurmancîyeke zelal û riwîn bi kar anîye anku zimanê helbestên wî kurmancîyeke gelêrî saf û pak e. Ji bilî vê bi navbeynkarîya bikaranînên - ku di hundirê xwînerê xwe de kelecane ava dike- mîna "Ay dilo, sotin, biraştim, dîn kirim, kuştim, agir, dax, kovan, 'ezab, dert, qeyd, bend, nalîn, dilkul, birîn, şîn, wêran, zarî, êş, jan, efxan, meded, birîn, xûn, ax, dilo, kuştin, muhbet, derb, fîrax û hwd." şêwazeke lîrîk û hestewar jî bi xwe re ava kiriye. Ev taybetî şêwaza wî ya honrawîyê xwirttir û bi bandortir kiriye. Bo nimûne :

"Agirê işqê û pêt e herkesê dî kes nevête

Demekî nakit tebête ay dilê min ay dilo "

(Feqîyê Teyran, *Ay Dilê Min Ay Dilo*, m.9., r. 418)

"Çendî bêjim sir û halan ah ji destê çavxezalan

Her dinalim mah û salan kes bi halê min nezan"

(Feqîyê Teyran, *Ez Çi Bêjim*, m. 2. , r. 415)

"Ji işqê sotîme Welleh çî derdek wê ateş tê

Bi zerbê halî tèn gehgeh birûska ser heta laş tê"

(Feqîyê Teyran, *Ji 'Işqê Sotîme Welleh*, m.1., r. 434)

"Nesaxe êşan ez im bikul û derdan ez im

Mecrûh ji qehran ez im tazî û 'uryan ez im

Ê dûr ji şehran ez im Feqîyê Teyran ez im "

(Feqîyê Teyran, *Bizan Ku Min Yar Tu*, b.18., r. 447)

Divê neyê jibîrkin ku ev şêwaz, ne her dem be jî bi xwe re ciwankariya tenasûbê tîne û atmosfereke hestewar ava dike.

2.2. Ji Alîyê Sazbûnê ve Peyvên Resen ên Helbestên Wî:

Feqîyê Teyran, ji me re ne tenê ji hêla wêjeyê ve helbestên tehmxeş hiştine, gencîneyeke peyvên resen ên kurdî jî wek mîrateyekê diyarî me kiriye. Gelek peyvên ku di roja me de ber bi windabûnê ve diçin mîna: "gerdûn, raz, maz(hestîyê piştê), dêm, kovan, asan, sotin, soj, solîn, perestin, bed, ageh, mêj(kevin), çak, biryar, afirandin, ewir(xwe li cîyekî danîn), dozex, şepal, xunav, lom, penc(pence), mêlak, pîşe, dergevan, hinar(hinartin), dibare/dubare, narinc, xwudbîn, nima(nimandin), pûlad(polad), dijûn, çîj(çêj) û hwd." em, di nav risteyên helbestên wî de bikaranîneke xwezayî ya van peyvên dibînin. Digel vê, hin peyv jî hene ku di roja me de bi awayekî karîger tèn bikaranîn mîna: "jîn, evîn, evînî, gerdûn, evîndar, hingaftin, vexwendin, babet, noşîcan, aram, şermezar û hwd."ev peyv ji alîyê hin kesan ve weke ku van salên dawîyê ketibin kurdî tèn dîtin; lê belê ev tev di kurdîya 300-350 sal berî de jixwe hebûn û di helbestên

Feqî de jî derbas dibin. Ji bilî van, ew di sazkirina peyvên hevedudanî de jî bi awayekî hostetî tevgerîyaye û peyvên resen û biçêj ên kurdî, mîna: "dêşşemal, hişkedar, çavri, gulav, rengzer, gerdenzirav, xweşmêr, serkar, nûbûk, bînxoş, seremêr, dilgir, dilkul, pîremêr, dûrbîn, çûnxweş, noşîcan, bager, çavxezal, zarezar, renggeş, sorgul û hwd." bi kar anîne; wî bi vî awayî taybetiyeke xwezayî ya kurdî mîna dîyardeyekê li ber çavan raxistiye.

2.2.1. Peyvên Xwerû:

Ew peyvên ku qertafên çêker nesitandine ji wan re peyvên xwerû tê gotin. Ev curepeyv an di rewşa rayekê de ne yan jî tenê qertafên keşanê girtine li ser xwe. Ji berhemên Feqî çend mînak: Hemû, gerdûn, raz, rez, bax, dar, belg, sih, kovî, dijwar, mîr, xweş, çerx, deng, xeml, gav, xanim, ziman, dest, roj, dil, evîn, mak, tarî, çak, dîn, av, pê, ba, agir, maz, çira, kovan, dax, qût, jan, birîn, hewce, kevir, best, xwezî, dev, bejn, tazî, nivêj, xwar, cîran, qewî, lêv, ax, cot, sosin, reyhan, xunav, xem, soj, xezal, sunbul, gişt, rijî, bisk, perwane, derman, şemal, tav, dêm, şabaş, jîn, zend, kerr, şox, dehl, mar, war, mêrg, payîz, bihar, heval, asmîn, adar, dijwar, pertal, zarok, mêt, şên, bazar, bûk, sond, tehl, xak, mêj, stêr, keç, aram, jar, gazin, nivîşt, zirav, selve, kemer, şeng, fena(mîna), digel, lew, ligel, ewir, rind, bilbil, lomî, şîn, kêr, dêr, kehnî, tazî, kes, ordek, şubh (mîna), quling, êtun, qaz, qumrî, paş, şîret, gerden, belek, qerasî, têkil, ba, kerb, bizmar, çakuç, sosin û hwd.

2.2.2. Peyvên Dariştî:

Ew peyvên ku herî kêr qertafeke çêker sitandibin ji wan re peyvên dariştî tê gotin. Ji berhemên Feqî çend mînak: Kuştî, evîndar, serdarî, pêxember, şîrînî, sotî, bêasan, kuştî, girtî, kuştin, dergevan, bêbawer, meyxan, perestin, dirustî, rizîn, rastî, sohtin, bişkiftin, nivîstin, evînî, xwendin, kesandin, biraştin, bêhiş, bêhejmar, bîrîndar, hişyarî, xebatkar, tirsîn, helandin, bêhewar, pisyar, zarî, têgiştin, destar, kolîn, bêdil, revandî, hejandî, lomandî, pence, hêstir, vedixwûnit û hwd.

2.2.3. Peyvên Hevedudanî û Komî:

Ev jî herî kêr ji du peyvan çêdibin. Ji bo çend mînan: Xwedê, naskirin, bab û da, hişkedar, dar û ber, rastkirin, ceng û dil, jar û bed, av û av, têt û têt, pa û dev, roj

û şev, şevtarî, sewdaser, şînbûn, geh geh, çavrî, fetl û ger, gulav, carek, cudakirin, windakirin, dilber, kerker, xulxul, xweşxwan, serxweş, rengzer, qeydkirin, bîr û ageh, kovan û keser, sondxwarin, kiz û zer, xet û xal, ker bi ker, baderêj, zîv û zêr, bapîr, yekcar, hevdil, hevrî, xweşxwîn, kelemper, gazîkirin, xweşmêr, nûbûk, serkar, lêvşûr, devkûr, hevûreng, serhefsar, dilsoj, çavxezal, çep û rast, gilh û gazîn, hewarkirin, dêmşemal, şepal û şox, renggeş, beraber, gîrdav, her dem, qeyd û bend, xweşbejn, berbext, dilkul, nûbar, bidilxwaz, rojgar, sêgaz, her kes, gerdênixal, şehlîl û bilbil, cotbûn, nalî î ahî, dozex û agir, heybetpiling, dev û lêv, destegir, zarezar, sersal, pîremêr, dûrbîn, çûnxweş, noşîcan û hwd. Bo nimûne :

"Şerab û mey di dan dil dil li selwa ewwirîn bilbil

Bi zarî wan kire xulxul kusa jî wê gula reş tê"

(Feqîyê Teyran, *Ji 'Işqê Sotîme Welleh*, m.5., r. 435)

"Bi serê Mecnûn çi reng anî wekî şeyxê di Sen'anî

Ku bêzar kir ji îmanî şepal û şoxa renggeş tê "

(Feqîyê Teyran, *Ji 'Işqê Sotîme Welleh*, m.9., r. 436)

"Perwane lew dimirit xweş nîn e ev bijînê

Zeîf e xwe nagirit tîj e berqa evînê

Di perde nasebirit perde komala dînê"

(Feqîyê Teyran, *Feqî û Mela*, r. 192)

"Binêr carek çi bangîn e ji newmê xwe bi hiş bîne

Dinê qetl e dinê xwîn e dinê gerdûn û rojgar e"

(Feqîyê Teyran, *DiloRabe*, m.9., r. 206)

"Hêstirên barîn ji xwînê sotim ez derdê evînê

Kes ji min nakit yeqînê ay dilê min ay dilo"

(Feqîyê Teyran, *Ay Dilê Min Ay Dilo*, m. 6., r. 418)

2.3. Bandora Zimanên Bîyanî Li Ser Helbestên Wî:

Zimanê wêjeya klasîk zimanekî têkel û giran e, şopdarên vê wêjeyê jî zimanekî têkel û xemilandî bi kar anîye, ev jî pêkan e; lê belê dikare were gotin ku Feqî li gor çanda wêjeya klasîk a dema xwe şêwazeke xwerû bi kar anîye û ev gewşîna wî jî di wêjeya kurdî ya klasîk de taybetîyeke cuda daye wî. Di helbestên wî de şopên peyvên farisî, erebî û zehf kêr be jî tirkî hene; lê belê di gelek cîyan de di kêleka van peyvên kurdîya wan jî bi kar anîye û ev şêwaza wî bi xwe re ciwankarîya hemwateyî anku teradif jî anîye. Bo nimûne :

"Sotim bi nar û agirî vê faniyê em j' ev kirî

Heta xweş in em de girî dost çû ye çerxa adet "

(Feqîyê Teyran, *Îro Girya Me Tê*, m.6., r. 140)

"Bêkef kirim zîlfê di reş biskê siyah zîlfêd qemer

Eşq û muhbeta min li ser wêran ez im malim xirab"

(Feqîyê Teyran, *Dilber*, m.15., r. 161)

"Ji wê bejnê ji wê qamê nicûma zulmeta Şamê

Stêra dêm û endamê tecella bû li selwayê"

(Feqîyê Teyran, *Qewî Îro Ze'îf Hal im*, m. 15., r. 424)

2.3.1. Bandora Farisî:

Di helbestên Feqî de kêr zêde peyvên sereke yên farisî ev in: Xan, ziban, rewneq, mehder, pabend, kemter, mîhr, dîdar, mah, suxen, keç, sergeşte, koh, xedeng, çeşm, tule, pend, ateş, murx, meykeş, padîşah, duxter, huweyda, sîyah, goşe, leb, mey, ustad, rozgar, meymest, xoce, mûr, cobar, ruxsar, beyaban, xwunkar, guşdar, xurşîd, şeyda, mest, xestexal, zilf, bende, dîwan, bîmar, gulşen, darû, kam, dam, peyal, geda, pertew, surme, fexunde û hwd. Ji bilî van peyvên hin peyv hebûn ku mîna: cam, perwane, pîr, şîrîn, baxçe, perde, xet, xal, wêran, guneh hwd. ji bo ku hem di kurdî û hem jî di farisî de tîrîkîyan em dikarin van peyvên jî mîna peyvên hevbeş ên kurdî û farisî bipejirînin.

Gava em hejmarên peyvên farisî yên di dîwana Feqî de derbas dibin li ber çavan bigirin dikarin bibêjin ku Feqî di bin bandora farisî de li gor dema xwe hindik maye anku şewaza xwerû ya helbestên xwe bi peyvên farisî nefetisandiye. Bi qasî ku me dîtiye wî dema ev peyv bi kar anîne xwe ji hevoksaîya farisî jî dîr xistîye û li gor rêzimana kurmancî tevgerîyaye. Bo nimûne :

"Îro ji dest husna hebîb sergeşte û heyran im ez

Min eşq û muhbet bûn nesîb sewdayê sergerdan im ez"

(Feqîyê Teyran, *Îro ji Dest Husna Hebîb*, m.1., r. 127)

"Bêhiş kirim zilfê di reş biskê siyah bihnê di xweş

Ey duxtera çapik bimeş wêran ez im malim xirab"

(Feqîyê Teyran, *Dilber*, m.14., r. 161)

"Dilo borîn ji nîsanê hewayê wan mehan kanê

Bûye eylûl li rozanê ne kanî man ne çobar e"

(Feqîyê Teyran, *Dilo Rabe*, m. 26., r. 214)

2.3.2. Bandora Erebi:

Peyvên sereke yên di dîwana Feqî de ev in: Ellah, ehsen, letîf, qedîr, mexlûq, hemd, sena, laîq, herîf, 'ezîm, ekber, kursî, heq, şems, wahîd, witr, newm, nî'imet, kebab, feyz, lîsan, 'arif, nûr, qelb, nedîm, taîf, qulzem, 'îşq, serf, setter, kerîm, hakîm, îbtîda, qadir, xaliq, rûh, mirad, meyt, furqan, qal û qîl, sîyaset, zahir, batin, sakin, quwet, sewt, qudret, hubb, can, beşer, qemer, sani', herf, subhan, hemd, sena, qiyas, zikr, îbadet, cuhd, terîq, qîyamet, ta'et, telaq, mektub, şems, nefis, fanî, baqî, turab, cennet, ebter, nefis, le'in, muhbet, qisse, me'na, heyran, zikr, mehbûb, mensûb, cellad, metlûb, lîbas, remz, rehmet, teb'et, meş, beyan, 'eyan, cuz, binyad, xivet, feyz, heqîqet, 'enasir, şerh, î'tîbar, îzhar, wazih, 'alem, Rebb, hikmet, sa'et, ehwal, alem, tedbîr, 'eqil, 'eyn, teftêş, qudret, sûret, nebat, esnaf, însan, nar, melek, ritub, yabis, keynûn, evraz, suflewî, hîret, ebter, 'illet, me'ne, kîtab, hafîz û hwd. Weke ku tê dîtin Feqî di dîwana xwe de gelek peyvên erebî bi kar anîye, ev jî nîşan dide ku ew di bin bandora erebî de maye. Di

hin helbestên wî yên mîna " Ellah Çi Zatek Ehsan e, Îlahî Lew Dikim Zarî, Îlahî 'Ebdukel Atak, Xwedawenda Gunehkar im, Hatim Ber Dergehê Rehmet û hwd. " rêjeya peyvên erebî zêde dibin. Ev taybetî bi mijarên dînî ve têkildar e. Heta di hin cîyan de ne tenê peyvên erebî her çiqas hindik be jî hevokên kin û ravekên erebî jî bi kar anîne. Piranîya van bi awayê jêgirtinên du'a û ayetên pîroz ên Qur'anê ne û vê şêwazê bi xwe re ciwankariya îqtîbasê anîye. Sedema bikaranîna zêde ya peyvên erebî li gor me ji ber perwerdeya wî ya medreseyê ye. Lewre di wê demê de zimanê perwerdeyê yê medreseyan erebî bû û Feqî jî di van medreseyan de xwendiyê û di nava demê de kemilîye. Ji ber vê, zêdebûna peyvên erebî yên di dîwana wî de tiştekî pêkan e.

Bo nimûne :

"Avek mehîn im kemter im min ceng û dil bûne birîn

Sewda û dîn û ebter im pabendê vê nefsa le'în

Muksî yê jar û bedtir im ferhemnî xeyrê rahimîn"

(Feqîyê Teyran, *Ellah Çi Zatek Ehsan e*, b. 20., r. 110)

"Te'alellah tu yî qadîr tu Pêxember bikî zahîr

Li mel"ûnî bikî sadir nebit , nêzîkî îmanê

(Feqîyê Teyran, *Îlahî 'Ebdukel Atak*, m.3., r. 429)

"Tewhîd e 'ilmê hal e 'arif dikin tefsîrî

Miradek e li bal e bi "mîn ledun" xebîrî

Nizam te kî xîyal e tu b'kîjamî dilgirî"

(Feqîyê Teyran, *Feqî û Bilbil*, b. 8., r. 150)

"Gelek sotim kirim kibab kirye bi min sed reng xirab

Ya leytenî kuntu turab wêran ez im malim xirab

(Feqîyê Teyran, *Dilber*, m.12., r. 160)

"Sani'ê kun feyekûn ê 'alimê bûn û nebûnê

Mifteya dil pê vebûnê nanê 'işqê zatî ye"

(Feqîyê Teyran, *Ah ji Destê Cama Wisalê*, m.5., r. 487)

"Sahibê ala Cemîlî nebiyê j'nesla Xelîl î

Qa'imê b'emrê Celîl î ya Resûlellah meded "

(Feqîyê Teyran, *Hatim Ber Dergahê Rehmet*, m.18., r. 486)

2.3.3. Bandora Tirkî:

Bi qasî ku me peytandiye di dîwana Feqî de bandora peyvên tirkî weke ku tune ye; lewre peyvên ku ji tirkî hatine gelek bi sînor in. Di du sê cîyan de peyva yoldaş xwe dubare kiriye û " tuxra, toq, qışle, al(rengê sor), qûl(evd), kopek, îlan, sewaş û hwd. " jî peyvên tirkî yên di dîwana Feqî de derbas dibin in. Bo nimûne :

"Dilo ya pîr bi kêr mayê eger aqil û zanayê

Mebe yoldaşê dinyayê ne yoldaşek wefadar e

(Feqîyê Teyran, *Dilo Rabe*, m.42., r. 222)

"Serdanê dilkulan im ji êş û jan û doxan

ji terhê sunbulan dixwînim lew di baxan

Aşiqê sorgulan im dê lê bigrim qışleyan "

(Feqîyê Teyran, *Feqe û Bilbil*, b. 11., r. 152)

"Kopekî pehtî bi niftê

Şhreza kir şêx bi miftê

Bir kire yarê şikeftê

Ne bi xêr kî qissetê"

(Feqîyê Teyran, *Şêxê Sen'an*, b. 92, r. 356)

2.4. Bandora Term û Têgihên Tesewifê:

Di vê xebatê de ji bo ku mijara me ne bandora tesewifê ya li ser Feqî ye em ê li

ser vê mijarê ranewestin û bi awayekî dûvedirêj cî nedin pênase û şîroveyên termên tesewifê, armanca me bes çespendina termên tesewifê ne; lewre ev jî rasterast bi şêwazê ve têkildar e.

Wateya ferhengî ya tesewifî lixwekirina hirîyê⁸⁰ ye; lê ji alîyê tesewifî ve gelek pênaseyên wê hene: Ji serî heta binî edeb e, kamilbûn e, xwe nêzîkkirina bal Xwedê ve ye⁸¹ û hwd. Pêgirtîyên vê hizrê re jî mutesewif hatiye gotin. Tesewif ne 'ilme qal e, 'ilmê hal e anku ji bo were fêmkirin divê were jiyîn, ji bo were hînbûn divê were tehmkirin û ji bo were zanîn jî divê were çêjandin⁸². Ji helbestên Feqî em têdigihîjin ku wî ev 'ilmê hal baş çêjandiye ji ber vê ew mutesawifekî dilsoj û jidil e. Ew ji bo ku eşqa Îlahî ya ku di dilê wî de vejîyaye bîne der, helbestên xwe mîna amûrekê bi kar anîye⁸³. Ji ber ku helbestên wî li ser hîmê hizra tesewifê ava bûne, wî jî mîna helbestkarên din ên tesewifê di helbestên xwe de term û têngînên tesewifê bi kar anîne. Lê kurdîya xwe ya xwerû û riwîn bi van têngihan jî razber û têkel nekiriye, bi gotinekê din wî raza dilê xwe bi vegotîneke zelal a tesewifî nivîsiye. Lê belê ji alîyê hin lêkolîneran ve : "... Feqîyê Teyran xwe ji nîrê tesewifê rizgar kiriye."⁸⁴ hatiye gotin, ev peytandîneke dûrî rastîyê ye; lewre ji bo ku Feqî mutesawifek e, termên tesewifê ji bo şêwaza Feqî ne mîna nîrekî ye; ev term, maza şêwaza helbestên wî bixwe ne. Term û têgehên tesewifî yên dîwana wî de hatine bikaranîn kêm zêde ev in: 'Eşq, yar, muhbet, arif, derwêş, me'rîfet, hal, tewhîd, herf, nefis, defter, saqî, dil/qelb, heyahey, Xelîl, kemal, fena, beqa, ruh, felek, feyz, firqet, rengzer, efxan, mey/şerab, dilber, ava heyatê, kase/kuze/tas, meyxane, sofî, sir, meclîs, but, sûret, mirad, perde, meykeş, serxweş, cuhd, lêv, peyal, gul, çeşme, nûr, şem', talib, sevda, ateş, zikr, kudret, dinya, heqîqet, cewher, hîkmet, secde, mezher, sifet, seher, xerab, sema, reqs, û hwd.; lê belê divê neyê jibîrkirin ku ev peyv di dîwana Feqî de her dem ne di wateya xwe ya tesewifî de hatine bikaranîn. Lewre weke ku tê zanîn mutesawifan, ev term ne bi wateya wan a asayî anku ferhengî bi kar anîne, wan li gor xwe li van peyvan wateyên nû siwar kirine û wan ev peyv mîna sembolan bi kar anîne. Feqî jî ev peyv carinan di wateya wan a tesewifî de bi kar anîne. Ji bo termên

⁸⁰ Ethem Cebecioğlu, *Tasavvuf Terimleri ve Deyimleri Sözlüğü*, Weş. Otto, Ç. şeşem, Enqere 2014, r. 475

⁸¹ Süleyman Uludağ, *Tasavvuf Terimleri Sözlüğü*, Weş. Kabcacı, Ç. duyem, Stenbol 2016, r. 345

⁸² Süleyman Uludağ, hb., r. 5

⁸³ Şeyhmus Orkin, *Di Berhemên Feqîyê Teyran de Hêmanên Tesewifî, Zanîngeha Alparslan a Muşê Estîtuya Zanistên Cîvakî Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Teza Lîsansa Bilind (Teza neçapkirî)*, 2015 Muş, r. 104

⁸⁴ Mehmet Uzun, *Destpêka Edebiyata Kurdî*, Weş. Îtakî, Ç. sêyem, 2011 Stenbol, r. 13

tesewifi çend nimûne:

"Ser çeşmeya feyzê çî ye hate lîsanê 'arifan

Ew nûreka esmanî ye darê te qelbê xaîfan

Jê şem'eyek da Miksî ye lew bûm nedîmê taifan"

(Feqîyê Teyran, *Ellah Çi Zatek Ehsen e*, b. 4., r. 104)

Çeşme: Dilê kesê arif/kamil ê ku xwe gihandiye Xwedê.⁸⁵

Feyz: Fûrîna tecellîya Îlahî ye.⁸⁶

'arif: Ew kesê ku Xwedê baş nas dike.⁸⁷

Nûr: Tecellîya Xwedê ya navê Wî yê ez-Zahir e.⁸⁸

Qelb: Cîyê ku Xwedê lê tecellî kiriye, cîyê Xwedê⁸⁹.

Sem': Ew nûra ku dilê sofîyan dişewitîne, nûra îrfanî.⁹⁰

"Lew bûm herîf lew bûm nedîm min 'işqeka dijwar heye

Kovî kirim serfa 'ezîm min hêj meya pêrar heye

Mînet ji Rehmanê Rehîm min mîrekî setter heye"

(Feqîyê Teyran, *Ellah Çi Zatek Ehsen e*, b. 5., r. 104)

'şq: Pileya dawî ya hezkirinê.⁹¹

Mey: Evîna bihêz û çêja ku daye.⁹²

Mîr: Xwedê bi xwe ye.

⁸⁵ Ethem Cebecioğlu, hb., r. 114

⁸⁶ Ethem Cebecioğlu, hb., r. 165

⁸⁷ Ethem Cebecioğlu, hb., r. 52

⁸⁸ Süleyman Uludağ, hb., r. 280

⁸⁹ Süleyman Uludağ, hb., r. 205

⁹⁰ Ethem Cebecioğlu, hb., r. 458

⁹¹ Süleyman Uludağ, hb., r. 48

⁹² Ethem Cebecioğlu, hb., r. 335

“Heqîqeta van cewheran me'rîfeta 'enasiran

Penhan neke j'yar û biran bê dev bibêje hikmetê”

(Feqîyê Teyran, *Ey Av û Av*, m. 21., r. 118)

Cewher: Ew tiştê ku bi nefesa Îlahî çebû ye.⁹³

Me'rîfet: Zanîn e.⁹⁴

'enasir: Mebest di vir de çar hêmanên mîna ax, hewa, av û agir e.

Hikmet: Ew ‘ilmê ku ji yekbûna kirin û zanînan derketiye holê.⁹⁵

Serxweşê ava heyatê meclîsa reqs û sema tê

Dê çi bikim b' sewm û selatê bi kûze û fincan im ez ”

(Feqîyê Teyran, *Îro ji Dest Nura Hebîb*, m. 31., r. 136)

Serxweş: Mestbûn, aqilavêtin.

Ava heyatê: Ava zindîbûnê, ji navên Xwedê el- Heyy e.⁹⁶

Meclîs: Cîyê civîna sofîyan, nîşaneyê aramî û nêzîkahîyê.

Reqs û sema: Ew reqsên ku bi bandora musîqîya dînî tê kirin. Delîlê coşbûnê ye.

Kûze û fincan: Pîyana şerabê. Di vir de mebest şerxweşbûn e.

“Were sofi misliman be bi saqî secdeyê bîne

Ku sûret mezherê zat e sifatê Heq Teala ye ”

(Feqîyê Teyran, *Îlahî Lew Dkim Zarî*, m. 4., r. 237)

Sofi: Ew kesê safderûn⁹⁷. Di vir de sofî di wateya neyînî de ye.

Saqî: Ew Xwedayê ku çavkanîya hezkirin û feyzê ye. Dibe ku mirşîd be jî.⁹⁸

⁹³ Süleyman Uludağ, hb., r. 88

⁹⁴ Ethem Cebecioğlu, r. 318

⁹⁵ Ethem Cebecioğlu, r. 216

⁹⁶ Ethem Cebecioğlu, r. 28

⁹⁷ Süleyman Uludağ, hb., r. 322

Secde: Ji bo perestina Xwedê, rûyê ku bi erdê ve bûyî⁹⁹; lê mebest di vir de secdeya dil e.

Sûret: Mirovê kemilî ye. Ji bo ku Xwedê, mirov ji sûretê xwe afirand mirovê kemilî jî sûretê Xwedê bi xwe ye.¹⁰⁰

Zat: Ew tiştê ku bi xwe bi xwe heye. Hemû nav û sifet ji tiştêkî tê, ew jî zat bixwe ye.¹⁰¹

Sifat: Taybetî.

“Seher her rojê meyxanê xerab û serxweş û mest im

Mela uzra me meqbul e ku dilber mahê sîma ye”

(Feqîyê Teyran, *Îlahî Lew Dkim Zarî*, m. 5., r. 237)

Seher: Bêxew mayîn.¹⁰² Sofî, di vê demê de her tim îbadet û zikir dikin.

Meyxane: Cîyê ku sofî lê îbadetê lê dikin, dilê mirşîdên kamil e.¹⁰³

Mest: Rewşa serxweşîyê, di vir de eşq bi her awayî dildar di bin bandora xwe de hiştîye.¹⁰⁴

Dilber: Rewşa qebzê, ku di vê rewşê de di dil de digel xemgînîyê hezkirin jî heye.¹⁰⁵

Mahê sîma: Tecellîya nûra Îlahî.

Her çiqas ji hin ciwankarîyên wêjeyî mîna peyvên diywate, hemwate, mecazî û yên xwe dubare dikin, şibandin û hwd. binbeşa vê mijarê bin jî ji bo ku em ê di beşa ciwankarîyên wêjeyî de bi awayekî hûrgilî cî bidin van me hewcê nedît ku em li vir behsa van bikin.

⁹⁸ Ethem Cebecioğlu, hb. r. 415

⁹⁹ Süleyman Uludağ, hb., r. 309

¹⁰⁰ Süleyman Uludağ, hb., r. 324

¹⁰¹ Süleyman Uludağ, hb., r. 390

¹⁰² Süleyman Uludağ, hb., r. 310

¹⁰³ Süleyman Uludağ, hb., r. 248

¹⁰⁴ Süleyman Uludağ, hb., r. 245

¹⁰⁵ Süleyman Uludağ, hb., r. 108

BEŞA SÊYEM

CIWANKARÎYÊN WÊJEYÎ DI DÎWANA FEQÎYÊ TEYRAN DE

Em ê di vê beşa ku maza xebata me dihundurîne de, bi çend bendan be jî pêşî li ser pênase û agahîyên belaxatê anku rewanbêjîyê û têkilîya wê ya bi ciwankarîyên wêjeyî re rawestî. Piştê jî em ê li pey peytandîna ciwankarîyên wêjeyî yên ku Feqî di dîwana xwe de bi kar anîne bikevin. Piştî peytandîna ciwankarîyan em ê wan, li gor taybetîyên wan, di bin sê binbeşan de bicivînin. Ji bo piştrastkirina mînakên ciwankarîyên wêjeyî yên ku di dîwana Feqî de derbas dibin em ê pêşî bi awayekî bi hûrgilî cî bidîne pênaseya wan û pêwîst be bi berfirehî wan ciwankarîyan binimînin û piştê mînakên Feqî di warê ciwankarîyên wêjeyî de şîrove bikin. Herî dawîyê de jî em ê wê ciwankarîya ku peytandin û pênaseya wê me ji xwe re kiriye armanc derbarê wê de, bi qasî bendekê, agahîyên bi giştî bidin. Herwiha bi vê rêbazê em ê têbigihîjin ku Feqî di dîwana xwe de kîjan ciwankarîyên wêjeyî yên sereke bi çî awayî bi kar anî.

Peyva belaxatê, di ferhengê de tê wateya gotina baş, bedew û hilû ya peyvê. Belaxat, îfadekirina herî zelal û riwîn a hest û ramanekê ya di dem û cîyê xwe de ye¹⁰⁶; di kurdî de tê beramberî rewanbêjîyê. Peyva rewanê jî ew tiştê ku bi hêsanî diherike jê re rewan/riwîn tê gotin¹⁰⁷. Bi awayeke din, rewan ji alîyê wateyê ve zelalbûn, ya ku hêsanî dikaribe were gotin û xwendin e. Ew zanista ku behsa qaîdeyên wê dike jê re jî zanista belaxatê anku rewanbêjîyê tê gotin.

Ji alîyê pûxteyê ve du alîyên rewanbêjîyê hene. Yek ji wan alîyan alîyê wê yê hutbunî/melekeyî û ya din jî zanistî ye¹⁰⁸. Pûxteya her însanî de îfadekirina hest û boçûnekî ya di dem û cîyê xwe de heye, ev gewşîna ku însan di xwe de dihundurîne, behre û qabilîyetek e û ji siruştê wî tê. Naxwe, pêdivîya vegotina riwîn û xweş a dem û cîyê xwe de ji behreyeke zikmakî ye; lê belê divê neyê jîbîrkirin ev behre di hemû mirovan de ne di heman astê de ye. Alîyê wê yê duyem jî alîyê wê yê zanistî ye û ev jî bi xal û metodolojîya vê zanistê re têkildar e.

Çawa ku zanistên din di nava demê de bi pêş ketibin û kemilîbin derbarê wan de pirtûkên zanistî yên serbixwe hatibin nivîsîn ev rewş di zanista rewanbêjîyê de jî

¹⁰⁶ Yekta Saraç, *Klasîk Edebiyat Bilgisi, Belagat*, Weş. Gökkuşbe, Ç. heftem, Stenbol 2010, r. 35

¹⁰⁷ Zana Farqînî, *Ferhenga Kurdî-Tirkî*, Weş. Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Ç. yekem, Stenbol 2004, r. 1587

¹⁰⁸ Yekta Saraç, *Klasîk Edebiyat Bilgisi, Belagat*, r. 17

hatiye dîtin. Damezrînerê zanista rewanbêjîyê 'alimê Mutezîlî yê mezin Cahiz (Mirin : 869) tê qebûlkin. Ew, di dema xwe de di hin pirtûkên xwe de - ku ew derheqê rewanbêjîyê de hatibûn nivîsîn - li ser hin ciwankarîyên wêjeyî agahî dabû¹⁰⁹. Piştî wî gelek kesên xwedî 'ilm ev rêç şopandibûn; lê belê zanista rewanbêjîyê, di demên pêşî de ne zanistêke serbixwe bû; di nava zanistên mîna " nahiv ", "edebiyat", "luxat" û "tefsîr"ê de dihat bikaranîn, piştê weke zanistêke musteqîl û serbixwe hatiye dîtin û ji aliyê es-Sekakî (Mirin: 1229) û şopdarên wî ve hatiye birêkûpêkkirin¹¹⁰. Divê were gotin ku di peytandina bi awayek berfireh ên xalên rewanbêjîyê û kemilandina wê ya mîna zanistêke musteqîl de bandora hewldana têgihîştina Qur'ana pîroz jî hebû¹¹¹. Lê belê 'alimê Qur'anê ne tenê li pey şîrove û fêmkirina Qur'anê ketibûn, di nava demê de ew têgihîştibûn ku şêwazek Îlahî û serata ya vê pirtûka pîroz jî hebû û ev hişmendî kiribû ku zanista rewanbêjîyê bi pêş ve here û pirtûkên ku di vî warî de hatibûn nivîsîn pêşî ji destên ereban û piştê jî yên farisan û di dawîyê de jî netewên Misliman ên din derketibûn.

Weke ku tê zanîn wateyek, bi gelek celebên gotinê dikare were zimên; lê belê dema wate ji van celebên gotinê ya herî guncan re bibe yek û were bilêvkirin wê demê rewanbêjî derdikeve holê. Nexwe di rewanbêjîyê de vegotina honrawî û wate divê li hev bike. Ji bilî vê ji bo ku gotinek, wesfê belîxbûnê bi dest bixe divê têgihîştina dengê wê û wateya wê di heman demê de bin. Ev jî tê wateya zelalbûn û fêhbûnê, lê belê ji bo belîxbûnê vegotina zelal bi serê xwe ne bes e; lewre wê demê mandelekirina vegotina mecazî, girtî û têkel derdikeve holê; lê belê ev vegotin ji aliyê gelek kesan ve jî ji vegotina vekirî û eşkere çêtir hatiye dîtin¹¹².

Ya ku metneke wêjeyî nirxdar dike çêja wê ya ziman e. Peywira pêşî ya zimanê wêjeyî jî ne ragihandina bûyer û darazekê ye; afirandina kelecaneke û bandoreke ye anku honrawî ye. Ji ber vê helbestkar, ji bo vê armanca sereke pêk bîne carina bi zanebûn serî li hin rê û rêbazên cuda yên ziman dide; lewre ji bo helbestkarekî mijar çiqas girîng be awayê vegotinê jî ewqas girîng e, ev jî bi xwe re şêwazê derdixe

¹⁰⁹ Yekta Saraç, *Klasîk Edebiyat Bilgisi, Belagat*, r. 19

¹¹⁰ Nurettin Boleli, *Belagat, Arap Edebiyatı Bilgi ve Teorileri*, Weş. Marmara Üniversitesi İlahiyat Fakültesi Vakıf Yayınları, Ç. yekem, Stenbol 1993, r. 2

¹¹¹ Yekta Saraç, *Klasîk Edebiyat Bilgisi, Belagat*, r. 38

¹¹² Yekta Saraç, *Klasîk Edebiyat Bilgisi, Belagat*, r. 36

holê. Şêwaz, bikaranîna taybet a zimên ve têkildar e; lewma rewanbêjî vê bikaranîna taybet jî ji xwe re dike mijar.

Ciwankarîyên wêjeyî anku ew karên ciwan, xweşik û şanedar ên wêjeyî; mijara bikaranîna taybet a ziman e; bi gotineke din xemla gotinên bêkêmasî û zelal e; ji ber vê ew jî dikeve nava xelesa zanista rewanbêjîyê. Ciwankarîyên wêjeyî, ne rewanbêjî bixwe ne; lewre rewanbêjî weke zanistekê dibe sê beş: Me'anî, beyan û bedî. Pêwendîya ciwankarîyên wêjeyî bi beyan û bedîyê re heye; lê belê bi me'anî re tune ye. Ji ber vê rewanbêjî ji alîyê naverokê ve ji ciwankarîyên wêjeyî gelek berfirehtir e.

Giranîyeke mezin a ciwankarîyên wêjeyî di nav rewanbêjîyê de hene; lewre ciwankarîyên wêjeyî, gîyanê ziman û şêwaza metneke wêjeyî ye. Ev ciwankarî, ji bo têgihîştina nasnameya wêjeyî ya helbestkarekî û ji bo têgihîştin û şîroveya metnên wêjeyî hêmanên gelek nirxidar in. Digel vê ji bo ku wêjeya klasîk bi huner û vegotina ciwan re têkildar e û ciwankarîyên wêjeyî ji alîyê helbestkarên klasîk ve gelek hatine hezkirin. Lê belê divê were gotin ku ji bo ava kirina ciwankarîyeke wêjeyî ne pêwîst e ku helbestkarek zimanekî gelek şanedar, giran û xemilandî bi kar bîne; bi zimanekî zelal û riwîn jî dikare vê mebesta xwe bi cî bîne. Ji bo vê mînaka herî baş Feqîyê Teyran bixwe ye.

Em ê vê beşê di bin sê binbeşan de vebêjin: Ciwankarîyên bi mecazan re têkildar in, ciwankarîyên bi wateyê re têkildar in û ciwankarîyên bi ruxsarê re têkildar in.

1. CIWANKARÎYÊN BI MECAZAN RE TÊKILDAR IN

Mecaz, bi wateya xwe ya ferhengî ve “rê yan jî cîyê derbasbûnê” û “berevajîya rastîyê”¹¹³ ye. Peyvek heke ne di wateya xwe ya bingehîn anku ya rastî, bi wateyeke din de hatibe bikaranîn wê demê wateya wê ya mecazî derdikeve holê. Wateya mecazî ya peyvê çêjeke xweş û zindîbûnê dide zimanekî. Em ê di vê beşê de cî bidine ciwankarîyên mîna: “teşbîh, îsti'are, kînaye, mecaza mursel, teşxîs, întaq”ê.

1.1. Teşbîh:

Teşbîh, bi du tiştên ku di navbera wan de ji hin alîyan ve şibandin hebe tê

¹¹³ Ferit Devellioğlu, *Osmanlıca-Türkçe Ansiklopedik Lûgat*, Weş. Aydın Kitapevi, Ç. hijdehem, Enqere 2001, r. 593

çêkirin. Ji van her du tiştan ê lawaz ji hin alîyan ve (bedewî, zîrekî, tiralî hwd.) bi ye bihêz ve tê şibandin. Ev peyva erebî di kurdî de tê wateya "mîrandin" , "şibandin" an jî "dirûvandine"¹¹⁴.

Di teşbîheke berfireh de çar hêman hene¹¹⁵. Du ji wan hêmanan hêmanên bingehîn in, du ji wan jî yên alîkar in. Hêmanên bingehîn: "şibandî"(muşebeh) û "pêşandî"(muşebehenbîh); "barê şibandinê"(wechê şebah) û "daçeka şibandinê" jî hêmanên alîkar in¹¹⁶. Hêmana şibandî, ji aliyê taybetmendîya xwe ve ya lawaz e; ya pêşibandî jî ya bihêz e. Çawa ku hêmana barê şibandinê, ji aliyê şibandinê ve wateya hevokan temam dike daçeka şibandinê jî bi daçekên weke "mîna, fena, weke, tu dibêjî, qasî û hwd." re cîyê xwe di hevokan de digire.

Hunera şibandinê hem di edebîyat klasîk de hem biwêjên kurdî de û hem jî di axaftina rojane de bi awayekî karîger hatiye emilandin. Bo mînak: " Çav û birûyên dilberê bi qasî şevê tarî bûn." Çav û birûyên dilberê hêmana şibandî (a lawaz) peyva şevê jî hêmana pêşibandî (a bihêz) ye; barê şibandinê tarîbûn, daçeka bi qasî jî daçeka şibandinê ye. Anku çav û birûyên dilberê ji aliyê tarîbûnê/reşatîyê ve bi şevê hatiye şibandin. Ev mînak ji aliyê barê şibandinê ve mînakeke erênî bû, lê mînakên neyînî jî dikarin derkevin pêşberî me: " Ew, di bazara xwe de her dem fena rovîyekî xapoyî tevdigerîya. " Di vir de barê şibandinê " xapoyî " ye û ji aliyê wateyê ve neyînî ye û dîsa peyva "ew"ê şibandî, "rovî" pêşibandî û "fena" jî daçeka şibandinê ye.

Cîgirtina şibandinê/mîrandinê ya di nava axaftin û nivîsandinê de tiştêkî xwezayî ye; lewra di axaftin an jî nivîsandinê de kesê ku bixwaze hest, boçûn û ramanên xwe şênbertir ragihîne serî li şibandinê dide û şibandin jî vê mebesta wî hêsantir bi cî tîne. Teşbîheke resen, hem di wêjeyê de û hem jî di axaftinê de mîna xemleke xweş disekine.

Li gor hebûn û tunebûna hin hêmanên teşbîhê, çar cureyên şibandinê hene: Şibandina bihûrgilî (teşbîha mufassal), şibandina kurtkirî(teşbîha mucmel), şibandina perçînkirî (teşbîha muckked) û şibandina bedew (teşbîha belîx) in.

¹¹⁴ Ferit Devellioğlu, h.b., r.1094

¹¹⁵ Nurettin Boleli, h.b., r. 86

¹¹⁶ Perwîz Cihanî, *Mem û Zîn*, Weş. Nûbihar, Ç. yekem, Stenbol 2010, r. 45

1.1.1. Teşbîha Mufessel (Teşbîha Bihûrgilî):

Ev cure şibandin her çar hêmanên şibandinê ¹¹⁷ anku şibandî, pêşibandî, barê şibandinê û daçeka şibandinê di xwe de dihûndirîne. Di hevokekê de ev çar hêmanên ku têne bilêvkirin hatibe bikaranîn şibandina bihûrgilî derdikeve holê. Bo nimûne:

"Xusûsa Seyyîdê Serwer di heşrê de bikit mehder

Bibarît rehmeta Ekber şebîhê qetrê baranê "

(Feqîyê Teyran, Îlahî 'ebdukel Atak, m. 22, r. 433)

Di vê malika ku ji alîyê mijarê ve dînî ye Feqî, ji Xuda di roja heşrê de rehmeteke wiha lava dike ku ev rehmet mîna libên baranê di ser wî de bibare. Di vir de peyva "rehmet" hêmana şibandî, peyva "baranê" jî hêmana pêşibandî ye û dîsa peyva "bibarî" hêmana barê şibandinê, peyva "şebîh" jî hêmana daçeka şibandinê ye. Naxwe rehmet, ji alîyê barîne ve bi baranê ve hatiye şibandin û daçeka şibandinê anku "şebîh" jî hatiye bikaranîn. Weke ku tê dîtîn ji bo ku Feqî, her çar hêmanên şibandinê emilandiye nexwe pêdivîya xwe ya şefe'et û rehmetê bi şibandina hûrgilî şayes kiriye.

"Felek çerx e û dewran e mislê mewcê behran e

Meaşê ehlê şeytan e dînê dewrê û dewwar e"

(Feqîyê Teyran, Dilo Rabe, m. 38., r.220)

Feqî, di vê malik û gelek menzûmeyên xwe de ji bêewlebûn û bêxêrbûna felekê gelek caran gazindan dike. Felek, ji bo wî mîna pêlên deryayê fitlonek û xapînok e. "Felek" hêmana şibandî, "pêlên deryayê" ya pêşibandî, "fitlonekbûn" (çerx û dewran) barê şibandinê û peyva "mislê" jî daçeka şibandinê ye. Di vê mînakê de ji ber ku her çar hêmanên şibandinê hatiye bikaranîn şibandineke bihûrgilî derketiye holê.

Di dîwan Feqîyê Teyran de gelek mînakên şibandina bihûrgilî hene : "Tu j'emrê kê her têt bi bez / Sewdaserî şubhetê ez / Fena bilbil dixwînim ez " , " Di hebs û hem di zîndanê / wekî Yûsif li Ken'anê " , " Dil şewitî teşbîhê nar " , " Lew aşîq li erzê perpitî wek maşîqê bi dêmê ketê"... Di van nimûneyan de ya balkêş ew e ku ji parçeyên şibandinê parçeyek jî Feqî bixwe ye; lewre ew, xwe di navenda evîne de dibîne.

¹¹⁷ Cem Dilçin, hb., r. 407

1.1.2. Teşbîha Mucmel (Teşbîha Kurtkirî):

Di vê cureya şibandinê de " barê şibandinê " nayê bikaranîn¹¹⁸. Bo nimûne:

“Delalê j'min hebû kerbek bi destê xo hejand herbek

Li min da dilberê derbek wekî bizmar di ne'lê da"

(Feqîyê Teyran, Ji Eşqê Te Dîn im, m., 4., r. 479)

Helbestkarê hest û evînê Feqîyê Teyran, di vê malika xwe de jî vê gewşîna xwe raxistiye ber çavan, Feqî dildayîna dilberê weke derbeke lêketî dibîne û vê rewşa xwe ya kambax û razber bi şibandina bizmarê ku di ne'lê de kutayî şênber dîke. Derba ku dilberê lê da hêmana "şibandî", bizmarê di ne'lê de hêmana "pêşibandî" û peyva wekî jî hêmana "daçeka şibandinê" ye. Ji bo ku di vê şibandinê de "barê şibandinê" nehatiye bikaranîn şibandina kurtkirî (teşbîha mucmel) derketiye pêş.

Ji bilî vê mînakê "Reng şubhetê qelbê minê" , "Ji sewadayê wekî dîn im ", Halê min wekê perwanetê" ... ji hin mînakên din ên şibandina kurtkirî ne. Di van mînanan de jî jana ku ji destê evînê dikşîne bi şibandinê salix dide.

1.1.3. Teşbîhî Muekked (Teşbîha Perçînkirî):

Di vê cureya şibandinê de hêmana "daçeka şibandinê" nayê bikaranîn¹¹⁹. Ji bo ku daçeka şibandinê di vê cureyê de tune ye şibandî û pêşibandî çêtir nêzîkî hevûdin dibin û şibandin perçîn dibe. Bo nimûne:

“Çavriyê sîrra li pêş im meqseda ez lê viyêşim

Hicreta Yûsif dikêşim Ye'qûbê Ken'an im ez "

(Feqîyê Teyran, Îro ji Dest Husna Hebîb, m. 20., r. 20)

Meqseda Feqî, raza Hebîb anku Xuda kifş bike û vê cudabûnê ji holê rake. Ev rewşa ku ew tê de ye bi rêya telmîhê(bibîrxistinê) şibandiye Yûsif û Ya'qûb Pêxember. Anku Feqî ji alîyê dûrketina Yûsif, xwe şibandiya Ya'qûb Ken'anî. Di vir de “ez” şibandî, “Ya'qûbê Ken'anî” pêşibandî û “kişandina hicretê” jî barê şibandinê ye. Weke ku tê dîtin ji bo ku ji hêmanên alîkar hêmana "daçeka şibandinê" nehatiye bikaranîn

¹¹⁸ Cem Dilçin, hb., r. 408

¹¹⁹ Cem Dilçin, hb., r. 408

şibandineke perçinkirî (teşbîha muekked) derketiye holê.

1.1.4. Teşbîha Bedew (Teşbîha Belîx):

Di şibandina bedew de jî tenê hêmanên bingehîn ên şibandinê anku "şibandî" û "pêşibandî" tê bikaranîn¹²⁰. Bo çend nimûneyan:

“Dilê min şuleyek nar e qewî rojek bi hawar e

Melek ji 'erşan tèn xare ligel alayê nûranî”

(Feqîyê Teyran, Îlahî ‘ebdukel Atak, m. 13., r.431)

Di risteya yekem a vê malikê de Feqî, dilê xwe şibandiye pêta agir. Dil hêmana şibandî, şuleyek nar jî hêmana pêşibandî ye. Di vê şibandinê de ji bo ku tenê hêmanên bingehîn hatine bikaranîn şibandina bedew (teşbîha belîx) derketiye pêş. Bi vê bikaranînê Feqî di hişê me de tabloyekê vedijîne û bandoreke xweş li me dike.

“Min dîye muhbet çî reng e soht e dijwar e pereng e

Min mudan dil jê bi heng e bi nalî û efxan im ez “

(Feqîyê Teyran, Îro ji Dest Husna Hebîb, m. 7., r. 129)

Feqî di vê malikê de hesta muhbetê bi şibandina bedew salix daye û ev jî bi sê peyvên ku hevûdin bi bîr dixin anku "soht, "dijwar" û "pereng" ê çêkiriye. Ji bo wî muhbet; soht e, dijwar e, pereng e. Naxwe muhbet şibandî; soht, dijwar û pereng jî pêşibandî ye.

Ji bilî van mînakên, di dîwana wî de gelek mînakên mezmûnên wêjeya klasîk jî hatine bikaranîn û piranîya van jî li ser şibandina bedew ava bûne. Çend ji van nimûneyan: "Way nazika qamelîf ", "Way nazika dêmqemerî", "Ey dibere gerdenzerî", "Dêmşûşeya tijî gulav", “Mehbûb di tîr awir in", "Bûme perwana şemalan", "Zulfên herîr xemgîn kirim", " Nazikê şîrînkêlamê", "Dame ser gezmê di tîra " û hwd. Ji bilî mezmûnan, hin mînakên şibandina bedew hene ku Feqî, xwe û dilbera xwe bi kes an jî heyberên dinê re dirûvandiye û di vê rewşê de carinan mînakine resen jî derdike pêş. Bo nimûne:

¹²⁰ Cem Dilçin, hb., r. 409

“Horîya rehman tu yî mohra sultan tu yî

Îsayê zeman tu yî min dike derman tu yî

Ê ez di ferman tu yî hekîmê loqman tu yî “

(Feqîyê Teyran, Bizan Ku Min Yar Tu Yî, b. 7, r. 444)

Di vê bendê de ji bo dilberê methîyeyek hatiye rêzkerin. Di her sê risteyan de dilber bi horîya Rehman, mohra siltan, Îsayê zeman û Hekimê Loqman hatiye şibandin. Menzûmeya ku ev sêrist tê de derbas dibe (Bizan Ku Min Yar Tu Yî) ji serî heta binî mînakên bi vî rengî di xwe de dihundirîne: "Kuştiyê rindê ez im", Sozanê Findê ez im ", "Cama peyala tu yî ", " Sotiyê Sêfil ez im " û hwd. Di vê helbestê de Feqî, dema xwe û dilbera xwe bi rêya şibandina bedew rave dike di bandora hestên xwe de dimîne û adeta ew di atmofsereke cezbeyê de dijî.

Hin mînakên teşbîha bedew ên di dîwana wî de ev in: “Qulzemê 'Umran im ez", "Ez murxê nav hezar e“, "Dinê sûk e û bazar e", "Dilê min Turî Sîna ye", “Ku dilber mahê sîma ye", “Agir û biryar im ez" û hwd.

Di dîwana Feqîyê Teyran de ya bêguman û ya berbiçav gelek bûna hejmara mînakên ciwankariya teşbîhê ye. Di van mînan de cureyên teşbîhê, ji aliyê bikaranîna hejmara mînan ve ji hevûdin cihê ne. Ji aliyê rêjeyê ve, ji cureyên teşbîhê ya herî zêde teşbîha belîx hatiye bikaranîn.

Di hunera helbestê de şibandina bedew li gor şibandina bihûrgilî xweştir û çêtir hatiye dîtîn¹²¹ û Feqî jî di dîwana xwe de herî zêde şibandina bedew bi kar anîye û bandora teşbîhê zêde kiriye. Cardin, ji aliyê belaxatê ve şibandina kurtkirî li gor şibandina bi hûrgilî bedewtir û birûmettir e¹²²; lê di manzûmeyên Feqî de hejmarên mînakên şibandina kurtkirî li gor şibandina bihûrgilî kêmtir in. Heta mirov dikare bibêje ku di nav cureyên şibandinê de Feqî herî kêmtir cî daye şibandina kurtkirî û ya perçinkirî.

¹²¹ Cem Dilçin, h.b., r. 409

¹²²M. A. Yekta Saraç, *Klasik Edebiyat Bilgisi, Biçim-Ölçü-Kafiye*, r.131

1.2. Îsti'are:

Wateya wê ya ferhengî tişteki bi awayê deyn û qerzê hatiye standin¹²³ e. Di îsti'arê de wateya hin peyvan ji wateya wan ên bingehîn bi emanetî anku spardeyî tèn girtin û di hin wateyên din de tèn bikaranîn¹²⁴. Anku bêjeyek bi rengê demdemî di şûna bêjeyeke din de tê bikaranîn¹²⁵ Bi vî awayî ev bêje ji wateya xwe ya ferhengî dûr dikeve û tê wateyek din a spardeyî.

Ji pênase û şîroveyên li jor hatine kirin tê fêmkirin ku pêwendîya îsti'areyê bi wateya mecazî ve heye; lewre peyva ku dibe mijara îsti'areyê ji wateya xwe ya rastî dûr dikeve û wateyêke din bi dest dixê. Lê di navbera peyva ku li serê îsti'arê hatiye kirin û wateya wê ya nû de di hişên me de pêwendîyek ava dibe û em vê amajeyê bi hêza feraseta xwe kifş dikin.

Weke ku tê zanîn di navbera îsti'are û şibandînê de jî têkilîyêke berbiçav heye, ev têkilî jî bi vî awayî dikare were pênasekirin: Îsti'are şibandîneke kinkirî ye¹²⁶ yan jî kakilê şibandînê ye¹²⁷. Lewra di bikaranîna şibandînê de pêwîst e hêmanên bingehîn ên şibandînê anku hêmana şibandî(muşebbeh) û ya pêşibandî(muşebbehunbîh) hatibe emilandin; lê di îsti'areyê de her du hêmanên bingehîn bi hev re nikarin werin bikaranîn, tenê ya hêmana şibandî û yan jî ya pêşibandî dikare cîyê xwe di risteyan de bigre. Ji ber vê îsti'are, şibandîneke kin e û bi rastî jî ew li ser hîmê îsti'areyê saz dibe.

Di wêjeyê de îsti'are hunereke qedirbilind û hêja ye. Helbestkar ji bo hestekê yan jî boçûn û ramanekê bi awayekî bi bandor di hişê xwînerên xwe de şênbertir bike serî îsti'areyê dide. Ji bo ku îsti'are were kifşkirin û fêmkirin pêwîst e helbestkar hin delîlan jî bi kar bîne. Jixwe me li jor jî behs kiribû ku di îsti'areyê de ji hêmanên bingehîn ên şibandînê ya hêmana şibandî û yan jî ya pêşibandî tê bikaranîn. Bo nimûne: "Hêviyên min ji destên min firîyan yek bi yek." Em dizanin ku baskên hêviyên me tune ne û ew nikarin bifirin, naxwe hêviyên me ji aliyê xwedîbaskbûn û firînê ve bi çivîkan hatiye şibandin. Di vê mînakê de weke ku tê dît "hêvî" hêmana şibandî ye û hatiye nivîsîn, "çûk" jî hêmana pêşibandî ye; lê nehatiye nivîsîn, veşartî maye û dîsa delîla vê

¹²³ Ferit Devellioğlu, hb., r. 453

¹²⁴ M. Emin Bozarslan, *Mem û Zîn*, Weş. Deng, Stenbol 1994, r. 79

¹²⁵ İskender Pala, *Divan Edebîyatı*, Weş. Ötüken, Ç. çarem, Stenbol 1998, r. 137

¹²⁶ M. A. Yekta Saraç, *Klasik Edebiyat Bilgisi*, Belagat, r. 118

¹²⁷ Perwîz Cihanî, h.b., r. 49

îsti'areyê jî "firîn" e. Nexwe peyva "hêvîyê" ji bo "çûk" hatiye bikaranîn anku hêvî ji bo çûkê îsti'are bûye. "Stûna malê ji bo zarokên xwe çîrokan dixwîne." Di vê mînakê de jî peyva "stûnê" ji aliyê zexmbûnê ve bi bav re hatiye îsti'arekirin. Lewra em dizanin ku stûneke hişkeholî nikare bibe xwedî zarok û ji wan re çîrokan bixwîne. Naxwe stûn hêmana pêşbandî ye û hatiye nivîsîn, bav hêmana şibandî ye; lê nehatiye nivîsîn, anku ji hêmanên bingehîn tenê ya pêşbandî hatiye nivîsîn û îsti'areyek xweş derketiye holê.

Di wêjeya klasîk de gelek mezmûnên bi şewaza îsti'areyê hatine bikaranîn hene û bi giştî ev mezmûn ji bo rêzkirina bedewbûna rûçik û lebatên dilberê hatine bikaranîn. Bo nimûne: Dema di malik an jî çarînekê de peyva "selwî"yê derbas dibe îhtimalek mezin e ku mebest di vir de "bejna" dilberê ye û selwî bi bejnê re hatiye îsti'arekirin. An jî dema behsa "du celadan" hatibe kirin mebest "çavên dilberê" ne. Ji bo nimûneyên din: herfa mîmê yan jî şekir lêvên dilberê, xonce dev an jî lêvê dilberê, tîr bijang an jî awirên wê, marên reş an jî ejderha kakul an jî biskên wê, kewan an jî herfa r'yê birûyên wê, heyv an jî gencîne rûyên wê, dur diranên wê hwd. re bi gelemperî tenê îsti'arekirin.

Di gelek pirtîkên ku li ser belaxat û hêmanên wêjeyî hatine nivîsîn de ji aliyê wateyê ve cureyên îsti'areya musaraha, îsti'areya meknîyye, îsti'areya tebey'ye, îsti'areya muserreh, îsti'areya mucerred û îsti'areya mutlaq in; lê em di vê xebata xwe de dê cî bidine îsti'areya musaraha û îsti'areya meknîyyeyê tenê.

1.2.1. Îsti'areya Musaraha (Îsti'areya Vekirî):

Di vê cure îsti'areyê de ji hêmanên bingehîn ên şibandinê hêmana "pêşbandî"(muşebbehunbîh) tê nivîsîn¹²⁸; lê ya şibandî nayê bikaranîn û veşartî dimîne. Bi gotineke din, di îsti'areya vekirî de hêmana ku ji aliyê taybetîyên xwe ve bihêz, tê nivîsîn û li ber çavan e; lê hêmana lawaz nayê nivîsîn û xwîner, ji hin delîlan û bi feraseta xwe wê kifş dike. Mezmûnên edebiyata klasîk bi gelemperî di vê rewşê de ne. Bo nimûne:

"Cewaba Wahîdê bêçûn çî reng bêjim ezê mehzûn

Ji çava tê Furatê xwûn di dil da narê selxanî"

(Feqîyê Teyran, Îlahî 'Ebdukel Atak, m. 12, r. 431)

¹²⁸ Ferit Devellioğlu, hb., r. 453

Di vê malikê de Feqî, ji ber kirinên xwe yên dinyewî gelek xembar e û ji ber hesabdayîna Xudê jî gelek heyrî û neçar maye. Ew di vê rewşa xwe ya kambax de ji xemgîniyê ji çavên xwe Firatên bixwîn dirijîne û di dilê wî yê bidax û birîn de jî agirê selxanî ava bûye. Bi vî awayî di vê mînakê de du îsti'are ava bûne. Yekem: Hêstirên çavan bi çemê Firatê hatiye şibandin. Manendîya ku di navbera Firat û hêstiran de hatiye qebûlkirin jî herikbûyîna wan e. Anku Firat ji aliyê herikandinê ve hêstiran re îsti'are ye. Lewra, peyva Firatê ji wateya xwe ya ferhengî dûr ketiye, di wateya hêstiran de hatiye bikaranîn. Bi gotineke din, ya rastî ji çavan hêstir dibarin, lê ne çem. Ji ber ku hêmana pêşbandî anku "Firat" tenê hatiye nivîsîn û hêmana şibandî anku "hêstir" nehatiye nivîsîn îsti'areya vekirî derketiye holê. Ji bilî vê Feqî, bi raveka rengdêr a "Furatê xwûn" jî fîşaleyêke (mubalexe) xweş daye îsti'areyê. Duyem: Derd û kovana di dilê wî de bi agirê selxanî hatiye şibandin. Lewra agirê(nar) ku bahsa wî tê kirin ne agirekî ku pêdikeve, diberiye û tîn dide; lê tiştê ku tîne bîra mirov êş û kul in. Êdî agir di vê risteyê de ji wateya xwe ya rastî dûr ketiye û di wateya êş, derd û kovanan de hatiye emilandin. Em dizanin ku di jîyana rasteqîn de agir di dilê me de pênameke; lê êş û derd di dilê me de peyda dibin. Mirov dikare bibêje "Ew derd û kovanên mîna agir, dilê me dişewitîne" û bi vî awayî şibandineke berfireh ava bike û mînakê li ber çavan zelaltir raxe; lê ji bo ku di risteyê de tenê "agir" derbas dibe dîsa îsti'areya vekirî saz dibe. Agir ji aliyê şewatê ve ji derd û kovanan re îsti'are ye. Feqî, di gelek malikên xwe de derd û kovanên dilê xwe bi rêya îsti'areya vekirî şibandiye agir, şewat, şemal, birîn, pêt, dax û hwd. Ev taybetmendî li gîyana Feqî a hestîyar jî tê.

“Heybet piling ku dîn kirim bê ser û bê teskîn kirim

Zulfên herîr xemgîn kirim her dem ku ahîne me tê”

(Feqîyê Teyran, Îro ji Eşqa Sorgulê, m. 3, r.469)

Feqî, ji destê evîna heybetpilingê rewşa xwe ya bêsekne û bêaram, di asta dînîtiyê de û bi ax û zarînî adeta mîna alekê vekiriye. Ev pilinga ku behsa wê tê kirin ne pilinga ku ji malbata pisîkan e, ew dilbera Feqî ya xwedî bandoreke mezin û zulfên hevrîsimî ye. Dilber di vir de bi pilingeke biheybet hatiye şibandin anku piling bi dilberê re hatiye îsti'arekirin. Ji bo ku hêmana pêşbandî anku "piling" hatiye bikaranîn îsti'areya vekirî derketiye holê.

Di dîwana Feqî de îsti'areyên bi vî rengî li ser dilberê ava bûne gelek in: " Nobedarê xan im ez ", Çavriyê siltan im ez", "Herçî dikit ew mîr dikit ", " Padîşahê kul û mil ", " Li destê wê şepalê da", " Îro ji eşqa sorgulê" û hwd.

“Tîr tîn j'qewsê surme lê agir ji ber wan hilhilê

Ser ta qedem tîk bûm xulê dîn bûm ji remza heybetê”

(Feqîyê Teyran, Îro ji Eşqa Sorgulê, m. 2, r. 469)

Weke ku tê zanîn wêjeya klasîk li ser mezmûn û qlîşeyan ava bûye. Bijang û birûyên dilberê ripîreş in, adeta kildayî ne û bijangên wê mîna tîran, birûyên wê jî weke kevanan biqews in. Dema dilber li dildarê xwe dinêre mîna nêçîrvaneke bêrehm bi kevana xwe bi ser dildarê xwe ve tîran direşîne, ji bo ku dilber nîşangereke gelek çelenge, dildarê xwe ji dilê wî birîndar dike. Naxwe peyva "tîr" di vir de îsti'areyeke vekirî ava kiriye; lewre tîr di wateya awiran de hatiye bikaranîn.

Çend mînakên din ên bi vî rengî jî ev in: "Yengîyên nîsbet ji nûnan", " Ew meyê gerden dirêjan", " Şeraba lam û bê yan", " Du nûn di siyahreng in ", "Gemzên Eyn û Sad an", "Ji didanê şekirxayê", "Tecella bû li selwayê", "Ji lê'lan şerbetek da min" û hwd.

1.2.2. Îsti'areya Meknîyye (Îsti'areya Girtî):

Berevajîya îsti'areya vekirî îsti'areya girtî de hêmana "şibandî"(muşebbeh) tenê tê bikaranîn¹²⁹; lê ya pêşibandî veşartî dimîne û nayê nivîsîn. Di mînakên îsti'areya girtî de bi gelemperî bi hêmana şibandî re taybetîyeke hêmana pêşibandî jî tê bikaranîn.¹³⁰ Bo mînak:"Tenêti, her gav xwe keraxa min dide." Di vir de "tenêti" bi "pêlên avê" re hatiye şibandin. Tenêti şibandî ye, pêlên avê jî pêşibandî ye û di jîyana rastî de taybetîyeke pêlên avê heye ku ew jî xwe, her dem li keraxan didin. Weke ku tê dîtin taybetîyeke pêlên avê jî hatiye dayîn. Bo nimûne:

“Van xeman yekcarî xwar im dîn kirim dinê bê hewar im

Agirê işqê bi jar im ay dilê min ay dilo "

¹²⁹ Ferit Devellioğlu, hb., r. 453

¹³⁰ İskender Pala, *Divan Edebîyatı*, r. 137

(Feqîyê Teyran, Ay Dilê Min Ay Dilo, m. 8., r.418)

Di vê malika xwe de Feqî, xemên xwe şibandine ajaleke dirinde û mirovxur. Naxwe “xem” şibandî, ajaleke mirovxur jî pêşinbandî ye, lê ji bo ku tenê hêmana şibandî hatiye bikaranîn îsti'areya girtî ava bûye. Me li jor jî behs kiribû ku di îsti'areya girtî de barê şibandinê jî dikare were bikaranîn. Di vir de barê şibandinê gotina "xwar im" e. Ji bilî vê mînakê: "Sewda ji mêjyê wî firî", "Çeng û lîsan digirî", "Avê cewab da bê suxen", " Bilbil dibe bizar e", "Her roj koç e herroj çûn e" û hwd. ev jî mînakine din ên bi vî rengî ne.

Ji bilî van agahîyan dikare were gotin ku cîyê "cînas" û "teşxîsê" tê de cî girtiye di wir de îsti'areya girtî jî heye. Bo nimûne:

“Bilbil-i her zarezar e daîma dil wî bi nar e

Lê ze'îf û pur neçar e lew min nûrek tê dî ye”

(Feqîyê Teyran, Ah ji Destê Cama Wîsalê, m.6., r.488)

Zarezarbûn, dilşewitî û neçarmayî ev tev taybetîyên mirovan e; lê Feqî van ji bo bilbilî bi kar anîye û teşxîsek ava kiriye. Ji ser teşxîsê îsti'areyeke girtî çêbûye anku bilbil ji alîyê zarezarîyê, dil ji alîyê şewatê û neçarmayînê ve bi însan re hatiye şibandin. Bilbil şibandî ye û ew tenê hatiye bikaranîn.

“Avê digo: Feqî rabe bê tedbîr û 'emel nabe

Ji halê te dê çawa be j'kê ra dikî vê suhbetê”

(Feqîyê Teyran, Ey Av û Av, m. 30., r.121)

Bi rêya întaqê îsti'are ava bûye. Lew ev pêşnîyaz û hişyarîyên ku li jorê ji alîyê avê ve hatine rêzkirin karê mirovan e. Anku av mîna însên axaftiye, nexwe av ji alîyê axaftinê ve bi însên re îsti'are ye. Ji bo ku hêmana lawaz anku av (şibandî) tenê hatiye bikaranîn îsti'areya girtî derketiye holê.

Di hunera nivîsandinê de îsti'are li gor şibandinê çêtir hatiye dîtin; lewra di şibandîneke ku çar hêmanên şibandinê hatine bikaranîn de bi pîranî tixûbê xeyalan hatiye xêzkirin û pêyama ku dixwaze were dayîn ne rasterast be jî dîyarkirî û berçav e.

Lê di îsti'areyê de tişteke wiha tune ye; lewra ji hêmanên şibandinê yên bingehîn tenê yek tê bikaranîn û ji bo hêmanên din jî xwîner li gor hest û hêza nîgaşa xwe hêmanên şibandinê yên din di hişê xwe de temam dike. Feqî jî di dîwana xwe de di gelek cîyan de hem îsti'areya vekirî û hem jî ya girtî bi kar anîye. Bi taybetî îsti'areyên vekirî yên ku wî di menzûmeyên xwe de bi kar anîne, li ser mezmûnên klasîk ava bûne.

1.3. Kînaye:

Gelek caran mirov naxwaze ku mebestekê rasterast ragihîne, belkî mirov mebesta xwe bi şêweyekî sergirtî û veпоşandî radigihîne. Ji vê mebesta sergirtî û veпоşandî re kînaye tê gotin¹³¹. Jixwe ev peyva erebî bi wateya xwe ya ferhengî tê wateya gotineke bi awayekî sergirtî û binavgîn an jî "veşartî"¹³².

Peyva ku kînayeyê saz dike bi du wateyê ye: Yek ji van wateya "rastî" û ya din jî wateya "mecazî" ye. Di helbestekê de mebesta helbestkar bi gelemperî wateya dîr e, anku ya mecazî ye. Her çiqas di hunera kînayeyê de wateya rastî ya peyvê wek encamekê derkeve holê jî ya ku derbas dibe û dibe mijara hunerê wateya wê ya mecazî ye.¹³³

Di axaftina rojane de bi taybetî di biwêjên kurdî û gotinên pêşîyan kurdan de wateya kînayeyê cîyekî girîng digire û bi awayekî karîger tê bikaranîn. Dema mirov dibêje "Devê wî ji hev ma bû" jî vê biwêjê wateyeke mecazî û yek jî ya rastî derdikeve pêş. Ev biwêj ji bo rewşa matmayî û şaşwazîbûnê tê bikaranîn û ev jî wateya wê ya mecazî ye; lê dibe ku bi rastî jî devê kesekî ji hev an jî vekirî mabe, ji bo ku ev her du wate derdikeve holê li vir kînayeyek ava dibe. Lê belê wateya wê ya ku di hişê me de cî digire "matmayîbûn" anku wateya wê ya mecazî ye. "Di destê wî tu tişt nema bû.", "Ew, mirovekî çavlider e.", "Derîyê wî ji her kesî re vekirî bû", "Li hember vê karesetê çavên wî fireh bûn.", "Dest girtî", "Dest vekirî" û hwd. Ev ji mînakên din ên biwêjên kînayeyî ne. Gotina pêşîyan a "Av bi bêjîngê nayê civandin." jî ji aliyê wateyê ve kînaye ye: Bi rastî jî gava mirov bixwaze avê bicivîne ev bi bêjîngê nayê civandin û ev wateya wê ya rastî ye. Lê mebesta vê gotina pêşîyan ev e: Gava mirov tişteki bixwaze bîne cî, pêwîst e ku rê û rêbaz an jî alavên bi keystirîn bi kar bîne; nexwe keda ku hatiye

¹³¹ Perwîz Cihanî, h.b., r. 47

¹³² Ferit Devellioğlu, hb., r. 521

¹³³ Cem Dilçin, h.b., r. 416

dayîn ê vala biçe. Ev gotina şîretbar bi wateya mecazî ye û mebest jî ev wate ye: "Behr bi devê çûkan heram nabe.", "Jehr ji çêlikên maran xilas nabe.", "Kanîya ku tu avê jê vexwî keviran neavêjîyê." û hwd. ev jî hin mînakên din in. Ev hemî xwedîyê wateyek rastî û yeke mecazî ne.

Ciwankarîya kînayeyê dibe ku bi hunera tewrîyeyê re jî were tevlihevkerin, pêwîst e mirov di vê mijarê de baldar be. Cudahîya di navbera wan de ev e: Di ciwankarîya tewrîyeyê de du wateyên peyvê hene, ev wate tev "rast" in; lê di kînayeyê de du wateyên peyvê hene, yek ji van wateya mecazî û ya din jî wateya wê ya rastî ye.

Ji alîyê wateyê ve du cureyên kînayeyê hene:

1.3.1. Kînayeya Qerîbe:

Kînayeya ku ji alîyê wateyê ve dîyar e¹³⁴ jê re kînayeya qerîbe tê gotin. Di kînayeya qerîbe de îhtimala wateyêke din a peyvê tune ye wate teqez e. Bo mînak:

“Zehmetber î mîhnetkeşê lê nazikê teb'etxweş î

Bê ruh li erdê dimeşî bê dest û pa tu ji ku ve tê “

(Feqîyê Teyran, Ey Av û Av, m. 16., r.116)

Di vê malikê de Feqî, bi avê re diaxive û taybetîyên wê rêz dike û ew, avê mîna sofîyekî dikesîne. Nemaze, herikandina avê ya bêrih û hatina wê ya "bêdest û pê" taybetîyên wê yên rastî ne, anku av di jîyana rasteqîn de bê dest û pê û bêgîyan e. Ev wateyên rastî ne. Lê mebesta Feqî, di vir de ne ev e. Bi wateya xwe ya binavgîn: Av, ji hezkirina hebîb anku Xudê rih daye, canê xwe firotiye û ji dest û lingan ketiye. Ev jî wateya wê ya "mecazî" ye. Mebesta Feqî jî di vir de wateya mecazî ye, naxwe ji bo ku wateya peyvê di vê malikê de dîyar e, ev mînakeke "kînayeya qerîbe"yê ye.

“Dinê mehd e û mehlok e weku le'be û leyzok e

Çi zanin tîfl û zarok e felek çerx e û xeddar e”

(Feqîyê Teyran, Dilo Rabe, m. 37., r. 220)

Bi gotina “Çi zanin tîfl û zarok e ?” kînayeyê ava dike. Bi rastî jî zarok ji hêla

¹³⁴Cem Dilçin, h.b., r. 416

xedarbûn û nemayîndebûna dinê ve ne xwedî agahî û feraset in; anku zarok, dinê mîna leyîstikekê dibînin û rastîya jîyanê nizanin; temenê wan têra vê rastîyê nake, ev wateya wê ya rastî ye. Ya mecazî jî ev e: Kesên nezan û bêfîkar, nizanin ku jîyana dinê demeke bisînorkirî û demdemî ye. Mebesta Feqî ya bi gotina "tîfl û zarok e" mirovên nezan û xemsar in; tîfl û zarok ji nezanînê re kînaye ye. Ev mînakeke "kînayeya qerîbe"yê ye.

1.3.2.Kînayeya Be'îde:

Kînayeya ku ji alîyê wateyê ve hatibe veşartin¹³⁵ jê re jî kînayeya be'îde tê gotin. Di vir de wateya peyvê ya mecazî yan jî ya rastî nediyar e. Bo nimûne:

"Nexweşê reng lê nemayî dest li ser falê nihayî

Wan digot j'çavan gihayî kuştîyê 'eynan im ez"

(Feqîyê Teyran, Îro ji Dest Husna Hebîb, m.14., r131)

Di wêjeya klasîk de çî ji bo evîna heqîqî û çî ji bo ya mecazî têgiha çavan çiyekî girîng digire. Dema dilber an jî mirşîd, bi awirên tîravêj li dildarê xwe dinêre, ew awir îsabetî dilê dildar dike, di encamê de bûyerek dedikeve holê, ew jî nexweşîya evînê ye. Her çiqas ev şîroveya wêjeyê hinek bi mubalexeyî be jî di jîyana rasteqîn de di nav lebatên mirov de lebatên herî bi bandor bi rastî jî çav in. Vêca Feqî jî sedema nexweşîya xwe bi gotina "Wan digot j'çavan gihayî" dide nîşandan. Ev şîrove dîyar dike ku bi gotina "j'çavan gihayî" bi alîyekî xwe ve tê wateyê "rastî"; lê dema mirov bi baldarî risteya yekem dixwîne derîyê şîroveyek din vedibe: Feqî, li pey sedema nexweşîya xwe dikeve û serî li falê dide. Di falê de dibîne ku sedema nexweşîya wî çav in anku nezer e. Ji gotina "J'çavên gihayî" nezerlêketin tîne bîra mirovan, ev jî wateya wê ya mecazî ye. Wek encam bikaranîna "j'çavan ez dildar bûme û nexweş ketime", ev wateya wê ya rastî ye û ya duyem : "Sedema nexweşîya min çav in; anku nezer e." ev wate jî ya mecazî ye. Di vê malikê de ji bo ku wateya serdest (mecazî û rastî) tam ne dîyar e "Kînayeya Be'îde" derketiye holê. Feqî bi awayekî jîrane ev ciwankarî bi kar anîye.

"Şîret asir nakin li min wê ji min dil bir ji min

Çî b'kim ne wek halê di min vê agir û heraretê"

¹³⁵Cem Dilçin, h.b., r. 416

(Feqîyê Teyran, Îro ji Eşqa Sorgulê, m. 9., r. 470)

Feqî, di vê malikê de rewşa xwe ya ji destê evînê kişandî teşbîhê agir û heraretê kiriye. Ji bo ku dil daye dilberê vîna xwe ji dest daye û ji bo ku ji vî halê mîna agir rizgar bibe şîret lê tê kirin; lê mixabin tu şîret jî bandorî wî nakin û ew jî bi awayekî neçar di vê rewşê de dimîne. Feqî, bi gotina "wê ji min dil bir, ji min " rê li pêşîya du wateyan vedike. Ya yekem : "Wê bi evîna xwe kiriye ku ez ji dil herim û jixwe derbas bibim." e, dema kesek dil dide dildara xwe bi rastî jî tu şîret lê tesîr nakin; lewre ew ji dil çûye û bê hiş maye û jixwe derbas bûye. Ev wateya wê ya rastî ye. Wateya duyem jî ev e: "Wê dilberê ez kirime dildarê xwe û dilê min bi xwe re biriye, ji ber vê tu şîret û gotin te'sîrî min nake û dilê min aram nabe; lewre dilê min ne bi min re ye. " Ev jî wateya wê ya mecazî ye. Ji bo ku di vê mînakê de armanc kîjan wate ye (rastî yan mecazî) tam ne dîyar e kînayeya be'îde derketiye holê.

Bi qasî ku me çespandiye di nav ciwankariyên wêjeyî yên ku Feqî di dîwana xwe de bi kar anîye ji alîyê hejmarê ve kêr dimîne yek ji wan jî ciwankariya kînaye ye. Her çiqas hejmara van mînanan kêr be jî her mînakek şarezatîya Feqî li ber çavan radixe û ji alîyê çêja wêjeyî ve jî dike ku em wêjeyê bitehmijin. Jixwe ciwankariya kînayeyê ciwankariyeke wiha ye ku pêwîst e mirov li serê bîstekê birame, encax bi vî awayî mirov dikare derbarê wateyên wê de serwext bibe.

Gava mirov bi baldarî li dîwana Feqî dinêre dibîne ku ciwankariya kînayeyê di atmosferê hestiyarî de û di mijarên dînî, evînî û şîretî de derdikevin holê. Em di dîwana wî de tûşî her du cureyên kînayeyê tên.

1.4. Mecaza Mursel:

Peyveke bêyî mebesta şibandinê, di şûna peyveke din de were bikaranîn¹³⁶ di wir de mecaza mursel tê çêkirin¹³⁷. Di vir de wateya bêjeyê ji wateya xwe ya rastî dûr ketiye û derbasî wateyeke din bûye. Ev cureyeke mecazê ye ku di navbera bêjeyan de armancên şibandinê tune ye. Di ciwankariya mecaza mursel de pêwîst e sê merc bi cî werin:

1- Peyva ku peywira mecaza mursel di xwe de dihewîne pêwîst e derveyî wateya

¹³⁶ Cem Dilçin, h.b., r. 415

xwe ya rastî hatibe bikaranîn.

- 2- Di navbera wateya mecazî û ya rastî de, derveyî şibandinê, pêwendiyek hebe.
- 3- Ji bo têgihîştina wateya rastî ya peyvê, pêwîst e qarîneya ma'nî anku astengek hebe.¹³⁸

Her weke ku tê zanîn ev ciwankariya hunerî cureyeke mecazê ye û di axaftina rojane de gelek caran tê bikaranîn; lê belê em dê mînakên wê di bin sernavên cureyên wê de bidin. Li gor gelek pirtûkên ku bi vê mijarê re pêwendîdar in û li gor qinyata me hin cureyên mecaza mursel ev in: "Nav -der", "parçe-tevahî" , "sedem-encam", "pêşîtî-paşîtî", giştî-taybetî". Ev ciwankarî bi giştî li ser van ava dibe.

1.4.1. Têkilîya Nav û Der:

Di vê cureya mecaza mursel de carinan nava tiştekî tê gotin; lê mebest di vir de derveyê wê ye, carinan jî derveyê wê tê gotin; lê mebest ya nava wê ye. Bo mînak: Gava em dibêjin "Ji kerema xwe sobeyê dade." Di vir de mebest ne dadana sobeyê ye, dadana darên nava sobeyê ne lewre agir bi sobeyê nakeve, bi darên nava sobeyê dikeve. Der (sobe) hatiye gotin; lê mebest nav (dar) e. An jî gava em dibêjin: "Zilamê gund, hê ji nimêja îne derneketine." di vir de bi gotina derketina ji nimêja îne mebest mizgeft e; lewre kes nikarin ji nimêjê derkevin. Di vê mînakê de nav (nimêj) hatiye gotin, lê mebest derve (mizgeft) ye. Bo nimûne:

“Kefa kûze û tas tê nazik û spî zend in

Cama ku meya xas tê binêrin talib çend in

Wexwun ji destê rastê bi medhan mehbûb xwendin"

(Feqîyê Teyran, Feqî û Mela, r. 195)

Ev risteyên ku di nava xwe de têgihên tesewifê hewandiye tê de têkilîya "nav û der" heye; lewre kef, bi kûze û tasê nakeve, bi şeraba nava kûzî û tasê dikeve. Cardin, di talibên risteya duyem de ne talibê cama meya xas in; ew, talibê meya xas a di nava camê ne. Di vir de mebest ne xwestina camê ye, şeraba di nava camê ye, anku der (kûzî, tas, cam) hatiye gotin; lê armanc nav (mey, kef, şerab) e. Bi peyvên kûzî, tas û camê

¹³⁸ M. A. Yekta Saraç, Klasik Edebiyat Bilgisi, Belagat, r. 110

mecaza mursel hatiye ava kirin.

1.4.2. Têkilîya Parçe û Tevahî:

Di "tevahîyê" de tevahî tê gotin; lê mebest parçe ye di "parçeyê" de jî parçe tê gotin; lê mebest tevahî ye¹³⁹. Ji bo mînakê em dikarin vê biwêjê bidin: " Kesê ku tilîya xwe bixe guhê xwe dê zanibe çî bibêje." bi tilîyê mebest serê tilîyê ye; naxwe bi gotina tevahî anku tilîyê mebest parçe ye anku serê tilîyê ye. Ji bo berevajîya vê, ev mînak jî dê di cî de be: "Di nava tarîfîyê de cotên çavan ez dişopandim." bi gotina cotên çavan mebest mirovek e, anku tevahî ye weke ku tê zanîn çav jî parçeyê mirov e. Bo nimûne:

"Dilo rabe ji vê xabê wekî bapîr û wek babê

Em jî dê çîne turabê bi bal baxwoy û ferwar e"

(Feqîyê Teyran, Dilo Rabe, m. 4., r. 204)

Di vê malika şîretbar de Feqî, bangî "dilê" xwe dike ku ji xewê/nezanîyê rabe û ji bo bibîrxistina mirinê û rastîya çûyîna bi bal Xuda (Ferwar, Mîr) ve mirina bapîr û bavan mînak dide, lê em dizanin ku "dil" ji bo ku lebatek anku parçeyê mirovan e, ne dengan dike û ne jî têdigihîje. Bêjeya "dil" di vir de bêjeyê mecazî ye bi peyva "dil" mebest Feqîyê Teyran bixwe ye anku Feqî gazî xwe dike û hişyarîyê dide xwe û şîretan li xwe dike. Di vê mînakê de pêwendîya "parçe û tevahî" heye; lewre di vê malikê de parçe (dil) hatiye gotin, lê mebest tevahî (Feqî) ye. Peyva "dil" mecaza mursel ava kiriye.

1.4.3. Têkilîya Sedem û Encamê:

Di vê cureya mecaza mursel de dema sedem tê gotin mebest "encam" û dema encam tê gotin mebest "sedem"¹⁴⁰ e. Bo mînak: "Îsal li der û dora gundê me rehm zehf barî." bi gotina "rehmê" mebest "baran" e. Li gor bawerîya Mislîmanan Xuda rehm dike û di encamê de baran dibare. Naxwe sedem hatiye gotin; lê peyama ku dixwaze were dayîn encam e, anku baran e. Bo mînakeke din: "Min pora xwe di vê rêyê de spî kir." Dîsa di biwêja porspîkirinê de mecaza murselek xweş derdikev holê. Porspîkirin, di encama tecrûbeyekê yan jî di jîyîna tiştê de derdikeve holê; anku mebest bi gotina

¹³⁹ M. A. Yekta Saraç, Klasîk Edebiyat Bilgisi, Belagat, r. 110

¹⁴⁰ M. A. Yekta Saraç, Klasîk Edebiyat Bilgisi, Belagat, r. 111

porspîkirinê tecrûbe (sedem) ye. Bo nimûne:

“Ey felekê bê î'tibar min bi te nîn in qet çu car

Nê te gelek mehbûb veşar paşî ewan xal û xetê”

(Feqîyê Teyran, Îro Girya Me Tê, m. 9., r. 141)

Di vê çarîna ku ji felekê gazind tê kirin de rastîyeke jîyanê bi awayekî nerm û sîtemkarane hatiye vegotin. Bi peyva "veşartinê" mebest kuştin/mirin e, lê belê sedema veşartinê mirin e; anku mirov ji bo ku dimire tê veşartin an jî tê binaxkirin. Nexwe veşartin anku encam hatiye gotin; lê mebest mirin (sedem) e. Bi vî dirûvî bi peyva "veşartin"ê pêwendîya "sedem û encam"ê derketiye holê, "veşar" mecaza mursel e û Feqî, ruyê sar ê mirinê bi gotina veşartinê bi awayekî hostane estetîze kiriye.

1.4.4. Têkilîya Pêşîtî û Paşîtîyê:

Tiştêkî, rewşa wê ya rabirdû yan jî ya dahatûyê bilêvkin e¹⁴¹. Ji rewşa dahatûyê re "pêşîtî" û ya rabirdûyê re jî "paşîtî" tê gotin. Di vê mecaza mursel de wateya rastî ya peyvê li gor dema darazê yan li paş mayê yan jî bi pêş ve çûye. Bo mînak: Gava em dibêjin " Beroşê datîne ser agir ji bo ku xwarin bipije." Di vê mînakê de bi gotina xwarinê mebest malzeme yan jî kelûmelên xwarinê ne; lewre hê ev kelûmelên xwarinê nepijîyane û ev nebûne xwarin. Xwarin, navê dahatûyê ya van kelûmelan e; lê ev nav (xwarin) ji bo rewşa niha ya kelûmelên xwarinê hatiye bikaranîn û bi vî rengî pêşîtî ava bûye. Û gava em dibêjin: " Mirina Apê Salih ji titinê bû." Peyva titinê mecaza mursel a paşîtîyê ava dike; lewre bi gotina titinê mebest cixare ye; lê cixare bi rewşa xwe ya rabirdûyê anku paşîtîyê hatiye binavkirin. Bo nimûne:

“Mîm û Hê şairkî pak e herkesê b'ruh bû ji make

Hemiyan dê ew fena ke ew jî Şahê Qudretê”

(Feqîyê Teyran, Îro Girya Me Tê, m.24., r. 145)

Dema em vê malikê dixwînin ew ayeta pîroz a ku dibêje " Hemî xudan rih dê li

¹⁴¹M. A. Yekta Saraç, Klasîk Edebiyat Bilgisi, Belagat, r. 111

tehma mirinê binêrin.¹⁴² tîna bîra me; lewre Feqî, her kesê ku ji maka xwe zaye rojek were ew, dê fena bibe dibêje. Lê belê di vir de peyva "fenabûnê" yan jî bi wateya xwe ya ferhengî "tunebûnê" di wateya "mirinê" de hatiye emilandin. Gava mirov dimire ji alîyê gîyanê ve ji vê dinyayê koç dibe û tune dibe; lê ji alîyê laşê xwe ve hê tune anku fena nebûye: lê belê laş pêşî dirize, piştî demeke dirêj tev li axê dibe û bi vî awayî tune dibe. Naxwe "mirin" bi navê xwe yê dahatûyê anku "fenayê" hatiye bikaranîn. Ji ber vê pêwendîya "pêşîtî û paştîyê" derketiye holê; lewre peyva "fenayê" bi wateya xwe ya pêşîtîyê mecaza mursel derxistiye holê.

1.4.5. Têkilîya Giştî û Taybetî:

Dema ku bêjeyek ji wateya xwe ya giştî dûr dikeve û di wateyêke taybet de yan jî ji wateya xwe ya taybet dûr dikeve û di wateyêke giştî de tê emilandin ev pêwendî derdikeve holê¹⁴³. Gava mêvanek ji bo mazûvanekî bibêje: "Min gelek nanê te xwariye." di vir de peyva "nan" ji bo xwarinê hatiye gotin û nan di wateya giştî de û dîsa gava em dibêjin: "Însanên Xanê Çengzêrî di vê kelehê de dîlgirtî mabûn." însan di wateya "gel" de anku di wateya taybetî de hatiye bikaranîn.

Di vê ciwankariya wêjeyî de hem cure û hem jî mînakên wê dikarin were zêdekirin. Bo mînak: Têkilîya "tiş û xwedîtîyê, têkilîya cî û ber û niştecih" jî ji wan cureyên mecaza mursel in ku me cî nedaye wan. Bo nimûne:

"Xelkê Xwedê aqil kirî hem arif û kamil kirî

Nûrek di dil da hilkirî eslê qisan rê dibêtê "

(Feqîyê Teyran, Ey Av û Av, m. 33., r. 122)

Ew gewşînên ku Xuda ji bo mirovan bexşandine di vê malikê de hatine ristanandin. Ev gewşînên ku têne ristanandin ji bo hemû endamên malbata mirovahîyê dikarin werin gotin; lê belê ya balkêş ew e ku Feqî, dema van gewşînan rêz dibe peyva "mirovan" bi kar nayîne, beramberê vê peyva "xelkê" anku "gel" bi kar tîne; lê em dizanin ku mebesta bikaranîna "xelkê" ne gel e "malbata mirovahîyê" ye. Nexwe bi peyva "xelkê" pêwendîya "giştî û taybetî" derdikeve pêş û heman peyv, bi wateya xwe

¹⁴² *Wergera Qur'ana Pîroz Bi Zimanê Kurdî*, Wer., Mele Huseynê Êsî, Mele Se'îdê Girdarî, Mele Muhammed Bêrkevanî, Sûreya Enkebût, Ayeta 57., Weş. Bang. Ç. duyem, Stenbol 2011, r. 404

¹⁴³ M. A. Yekta Saraç, *Klasik Edebiyat Bilgisi*, Belagat, r. 111

ya giştî (malbata mirovahîyê) hatiye bikaranîn.

Ev ciwankariya wêjeyî di menzûmeyên Feqî de di kêr cîyan de derdikeve pêşberî me û mînakên ku me tespît kirine bi giştî li ser heman bêjeyî ava bûne. Bo mînak: Di mecaza mursela “parçe û tevahî” de peyva "dilo" derketiye pêş ku ew nîda ye. Di “giştî û taybetî” de jî di peyva "xelkê" ku ew jî di wateya “mirovan” de ye hatiye bikaranîn û derketiye pêş. Dîsa mînakên pêwendîya wan bi sedem û encamê re hene zehftir di “mijarên dînî” de peyda bûne.

Her çend ji aliyê hejmar û dewlemendiyê ve mînakên ciwankariya mecaza murselê kêr bin jî lê ji van cureyên ku li jorê pênaseya wan hatiye kirin di dîwana wî de mînakên wan hatine dîtin.

1.5. Teşxîs:

Teşxîs, ew e ku kesek taybetmendiyên mirovan û kesan bide tiştan û wan bi rewş û tîtalên mirovan bide nîşandanê û wek mirovan raber bike ¹⁴⁴ye. Di vir de tiştên ji bilî însên mîna însên tên "kesandin" û taybetiyên kesan ji bo bûnewerên din tên bikaranîn. Çi di helbestan de çi di menzûmeyan de û çi jî di mesnewiyên alegorîk de ciwankariya teşxîsê ne di tenê bûnewerên zîndî, yê ne zîndî de jî dikare were dîtin.

Di ciwankariya teşxîsê de bi awayekî xwezayî îsti'areya girtî jî ava dibe; lewre bûnewerên derveyî mirovan, ji hin alîyan ve (razan, kenîn, axaftin, ramandin û hwd.) bi mirovan tê şibandin. Nexwe gava em bibêjin cîyê ku teşxîs heye îsti'areya girtî jî heye ne çewt e.

1.6. Întaq:

Ji aliyê ferhengê ve tê wateya “pê dan gotin”, “anîna ziman” e¹⁴⁵. Nivîskarek di nivîsa xwe de dema heyberên ji bilî mirovan bide peyvandin di wir de jî ciwankariya întaqê pêk tê.

Ciwankariya întaqê bi xwe re hem "teşxîs" û hem jî "îsti'areya girtî" ava dike anku cîyê ku întaq lê heye teqez teşxîs û îsti'areya girtî jî heye; lê berevajîya vê ava nabe anku teşxîs û îsti'areya girtî dibe ku bi xwe re întaqê neanîbe. Bo nimûne: Gava em

¹⁴⁴ Perwîz Cihan, hb., r. 54

¹⁴⁵ Ferit Devellioğlu, hb., r. 442

dibêjin: "Hirç, henekên xwe bi te dikin." di vir de tenê teşxîs û îsti'areya girtî heye; lê belê gava em dibêjin " Got: Avê çima deng ji te nayê ?" Got: "Hevalê min kevir e." di vir de ciwankarîya berbiçav "întaq" e; lê ew bi xwe re hem teşxîs e û hem jî îsti'areya girtî anîye. Bo nimûne:

“Lazim te mehbûbek heye yan dost û metlûbek heye

Yan meyl û mensûbek heye lew bê lîbas û kiswetê”

(Feqîyê Teyran, Ey Av û Av, m. 12., r.115)

Di vê malikê de Feqî bi avê re diaxive û sedema herikandina avê ya bê cil û berg bi hezkirîyekê ve girê dide. Lê em dizanin ku "hezkirin", "dostanî", "meyllêkirin" û "lixwekirina cil û bergan" ji taybetîyên mirovan e. Feqî, bi van gewşînan avê dide nîşandan û wê teşxîs dike.

“Perwane lew dimirit xweş nîn e ev bijînê

Zeîf e xwe nagirit tîj e berqa evînê”

Di perdê nasebirit perde kemala dînê "

(Feqîyê Teyran, Feqî û Mela, r.192)

Çi di evîna heqîqî û çi jî ya mecazî de têgiha perwane û findê temsîliyeta dildar û dilberê dikin. Di wêjeya klasîk de helbestkar dilbera xwe dirûvandiye findê, xwe jî bi perwaneyî re. Bi vî awayî nîşan daye ku di rêya wê de dikare canê xwe jî bide; lewre perwane, di derdora ronîya findê de bêrawestîn dizîvire û demek tê ku xwe li nav agirê findê dide û bi vî rengî canê xwe dide¹⁴⁶ Perwane nîşan dide ku dilsozê evîna xwe ye û dikare were gotin ku guhertoyên çîrka perwaneyî û findê gelek in. Di vê sêristê de jî tê gotin ku dilê perwaneyê bi jînê ve ne xweş e û jixwe wa ew dimire û ji bo ku ew gelek lawaz e li ber evîna ku birûskên wê tuj in, xwe nikare bigre û hwd. Nexweşbûna dilê wî ya bi jînê, xwegirtina wî û bêsemaxbûna wî ya di perdeyê de ev tev taybetîyên mirovan in; lê ji bo ku ew ji bo perwaneyê hatine bikaranîn "perwane" hatiye teşxîskirin.

“Dinê mehd e, dinê mak e dinê teng e dinê xak e

¹⁴⁶ Îskender Pala, *Ansiklopedik Divan Şiiri Sözlüğü*, r. 370

Bi ewladan ebed nake ewa bêrehm û dijwar e“

(Feqîyê Teyran, Dilo Rabe, m. 69., r. 231)

Feqî di vê malika xwe de dinya şibandiye makekê. Ku ew mak bêrehm, dijwar e û heta hetayê dê bi zarokên xwe neke. Bi vî awayî peyva "dinê" hatiye kesandin.

“Avê digot : Feqî rabe bê tedbîr û 'emel nabe

Ji halê te dê çawa be ji kê ra dikî vê subhetê “

(Feqîyê Teyran, Ey Av û Av, m. 30., r. 121)

“Bilbil dîsa xeberda: qîsmet cara ewel bû

'Aşiq bûme li werda maşûqa min sorgûl bû

Dikêşim jan û derda lew min birîn dli kul bû”

(Feqîyê Teyran, Feqe û Bilbil, b. 15., r. 154)

Di van her du mînakên dawîyê de axaftina "Avê" û ya "bilbil" întaq ava kiriye û weke ku me li jor jî behs kiribû întaqê bi xwe re teşxîs û îsti'areya girtî anîne.

Bi qasî ku tê zanîn di dîroka wêjeya klasîk a kurdîya kurmancî de yê ku fabl di menzûmeyên xwe de cara yekem bi kar anîne Feqîyê Teyran e û di encama fablan de jî bi awayekî xwezayî gelek teşxîs û întaq jî derketine holê, ev gewşîn tehmeke taybet daye menzûme û helbestên wî û nîrxên wan bilindtir kiriye.

Di dîwana Feqî de teşxîs û întaqê bi hejmareke zêde cîyên xwe girtine. Nemaze di menzûmeyên wî yên navdar ên bi navê "Ey Av û Av " û Feqî û Bilbil" de ji serî heta binî întaq û teşxîs hatine afirandin. Hin bûnewerên sereke yên ji alîyê Feqî ve hatine teşxîskirin ev in: teyr, tiyûr, ceng, bilûr, perwane, tutak, goyîn, bilbil, xezam, ba, sî, dinê, enqa, qews, birû, tûtî, teyr, şehlîl hwd. Piranîya van bûneweran endamên jîyana xwezayî ne û ev jî bi qasî ku em dizanin li gîyana Feqî tê; lewre Feqî di erdnîgarîyeke ku ji van bûneweran dora wî dorpeç kiribin de jîyana xwe domandiye û dibe ku di bin bandora erdnîgarîya ku lê jîyaye de mabe.

2.CIWANKARÎYÊN BI WATEYÊ RE TÊKILDAR IN

Ji serenivîsê jî tê fêmkirin ku ev beşa ciwankariyê, bi wateya peyvan ve têkildar e û helbestkar, helbestên xwe jî alîyê wateya peyvan ve dixemilîne. Ciwankariyên ku di vê beşê de cîyên xwe girtine, dibe ku jî peyvekê yan jî li ser têkilîya peyvan hatibin ava kirin; lê belê ev peyv bi wateyên xwe yê rastî di helbest û menzûmeyan de jî xwe re cî dîtine. Di vê beşê de em ê ciwankariyên mîna:” Mubalexe, tezad, tekrîr, husn û ta’lîl, tecahula arif, tenasub, tewrîye, istifxam, nîda, telmîh, îqtîbas, teradif” jî xwe re bikin mijar.

2.1.Mubalexe:

Ev peyva erebî jî alîyê ferhengî ve jî peyva “balixbûnê”¹⁴⁷ tê. Ji alîyê rewanbêjîyê ve jî gava mirov hestekê, boçûnekê yan jî bûyerekê vebêje, dikare ji xelesa rastîyê derkeve, li serê zêde bike û wê mezintirîn nîşan bide yan jî rewşa wê ya heyî dikare biçûktir û kemtir jî dîyar bike; di vê rewşê de mubalexe derdikeve holê.

Di mubalexeyê de bi gelemperî tiştên ku mirov jê bawer neke û li dijî hewna mirovan tê dîtin; lê belê carinan ev tişt dibe ku rastîyek be jî¹⁴⁸. Mubalexe, di axaftina rojane de jî ji nezanî yan bi zanebûn gelek caran tê bikaranîn. Gava mirov dibêje “Qalibê mêşê dengê şeşê ye.”, ”Agir û pêt ji devê wî dibare.” yan jî ”Ji tîna zimanê wî bostek kişiyabû.” û hwd. ev tişt dûrî hewna mirovan e anku jî alîyê biçûkbûnê ve tu kes nagihîje qalibê mêşan û dengê şeş kesa jî nikare derxe, kesek çiqas enirîbe jî agir û pêtê nikare ji devê xwe derxe û dîsa zimanê mirovan tu caran bostekê nayê kişandin. Ev gotin, her çiqas durî rastîyê bin jî bedewbûnek û tehmeke xweş didin axaftinê û dibin xemla axaftinê.

Her weke ku tê zanîn wêjeya klasîk, li ser têgihên razber ava bûne ji ber vê yekê di wêjeya klasîk de mubalexe cîyekî girîng digire. Helbestkar, gava bixwaze xwînerê xwe têxe nava atmosfereke xeyalî û di dilê wî de kelecaneke ava bike serî li ciwankariya mubalexeyê dide. Ji bo ku ev armanc pêk were pêwîst e ku helbestkar xwedîyê feraset û nîgaşeke baştirîn be.

Hunera mubalexeyê; bi gelemperî, bi îsti’are, salixdayîn û şibandinan tê çêkirin. Li gor polînkirinê sê cureyên mubalexeyê hene:

¹⁴⁷ Ferit Devellioğlu, hb., r. 699

¹⁴⁸ M. A. Yekta Saraç, Klasik Edebiyat Bilgisi, Belagat, r. 219

2.1.1.Tebîx:

Mubalexeya ku hem bi eqîl mirovan dikeve û hem jî li gorî bastana/toreya mirovan e. Bi awayekî din, rewş an jî bûyera ku di helbestê de tê behskirin li gorî hewna mirovan e û di demên borî de dibe ku qewimîbe jî.¹⁴⁹ Bo nimûne:

“Eşqê gelek sewda kirin bê mal û mewda kirin

Nûra çira winda kirin Mûsayê ‘Umran im ez”

(Feqîyê Teyran, Îro Ji Dest Husna Hebîb, m. 2., r. 127)

Feqî, mîna Mûsayê kurê Umran ji destê evîna Îlahî sewda û bê mal û bê serwet maye û nûra çirayê jî winda kiriye. Ew, bi peyva “sewdayê” asta evîna xwe gelek bilind nîşan daye; ji bo ku peyva sewdayê bi du wateyî ye, ya yekem ”perîşanî û sefilî” ye û ya duyem jî “hezkirina di asta nexweşîyê de” ye, jixwe di evîndarîyê de asta herî bilind, hezkirina bi awayê nexweşîyê ye. Ji ber vê yekê mubalexeyeke xweş derdikeve holê. Ev bûyer ji bo ku bi hewna mirovan dikeve û dîsa di demên borî de dibe ku hatibe jîyîn ji ber vê yekê ev mubalexe di asta “teblîxê” de ye.

“Serxweş û ebter kirim te ji ’illeta rengzer kirim te
Sotim û ker ker kirim te agir û biryan im ez.”

(Feqîyê Teyran, Îro ji Dest Husna Hebîb, m.10., r. 130)

Te, ez serxweş û dîn kirim, ji derdan mad û rengê min zer bû, te ez şewitandime û perçe perçe kirime û di dawîyê de ji evînê bûme mîna agir û goştê biraştî. Feqî, rewşa xwe ya tê de bi peyvên mîna “ebter”, ”rengzer”, ”ker ker”, ”sotim” û “biryan” salix daye. Rengê zer anku madê zerbûyî nîşaneyê derbûna nexweşîyekê ye; nexweşîya Feqî jî ji evîndarîyê tê, asta evîna xwe bi rengê “zer”bûnê mubalexe kiriye. Rengê zer di tesewifê de tê wateya “rîyazetê*¹⁵⁰”. Dema sofî ji bo Xuda şev û roj îbadet dîkin bedena wan çîqal dikeve û mehdên wan zer dibe.¹⁵⁰ Ev bûyer hem bi hewna mirovan dikeve û hem jî di bastanê de dibe ku hatibe jîyîn ji ber vê yekê mubalexeyeke di cî de anku “teblîx” kiriye.

¹⁴⁹ M. A. Yekta Saraç, Klasik Edebiyat Bilgisi, Belagat, r. 220

***Rîyazet:** Xwe ji lezzetên û dinyayê dûrxistin (Ferit Devellioğlu, h.b., r. 895); bi xwestekên nefsa xwe re pevçûn û têkoşînkirin e.

Feqî, di risteya dawîyê de jî asta evîna xwe ne li gorî hewn û toreyê mubalexe kiriye. Dibe ku di vê malikê de peyvên ku tiştên neyînî bi bîra mirovan dixin hatibin bikaranîn. Lê belê ji bo ku derdê Feqî ne dilbereke dinyayî ye, derdê wî husna Hebib e û ji vana gazindan nake. Ji bo ku ev jan û bela di rêya dilberê de ye ev pey di tesewifê de dibe sedema xwepesindayîne jî.

2.1.2.Ixraq:

Mubalexeya ku li gorî hewna mirovan e; lê ne li gorî adetê ye. Bûyera ku di vê curemubalexeyê de tê dîtin bi hewna mirovan dikeve; lê di demên borî de nehatiye dîtin û nehatiye jîyîn.¹⁵¹ Me ji bo ixraqê tu mînak neçespendine.

2.1.3.Xuluv:

Di vê cureya mubalexeyê de bûyer an rewşa ku tê bilêvkirin ne bi hewna mirovan dikeve û ne jî tu caran di toreyê de hatiye jîyîn. Jixwe di ciwankariya mubalexeyê de lûtkeya herî bilind mubalexeya li ser mubalexeyê ye û ew jî “xuluv”e.¹⁵²

Bo nimûne:

“Remzê ku dê dilber bikin carek bi çeşman seyr bikin

Dê Kohê Qaf kerker bikin mecrûhê pirkovan im ez.”

(Feqîyê Teyran, Îro Ji Dest Husna Hebib, m. 4., r. 128)

Dema hûn carekê bi çavên serê xwe temaşe bikin, hûn ê bibînin ku Çîyayê Qafê ji ber sembola dilberê perçe perçe dibe, ez jî ji destê dilbera xwe nexweşê xwedîyê pir derd û xeman im. Feqî, di vê malika xwe de bi peyvên “seyr bikin”, ”koh” û ”kerker bikin” telmîha (bibîrxistin) ku “Hz. Mûsa, li Çîyayê Sînayê ji Xudê(C.C.) re dibêje ez dixwazim ku te bibînim, Xudê(C.C.) jî li Çîyayê Sînayê tecellî dike û li ser vê bûyerê çîya perçe perçe dibe”¹⁵³ bi bîra me dixê. Ev bûyera derasayî (perçeperçe bûna çîya) di

¹⁵⁰ Mahmut Kaplan, “Esrâr Dede Divanı'nda Renkler”, r. 21., International Periodical For The Languages, Literature and History of Turkish or Turkic Volume 8/1 Winter 2013, p.1793-1816, ANKARA-TURKEY

¹⁵¹ M. A. Yekta Saraç, *Klasik Edebiyat Bilgisi*, r. 220

¹⁵² M. A. Yekta Saraç, *Klasik Edebiyat Bilgisi*, r. 220

¹⁵³ *Wergera Qur'ana Pîroz Bi Zimanê Kurdî*, Sûreya A'rafê, Ayeta 143., r. 168

malikê de ne bi dilber (Xuda); lê sembola dilberê diafirîne, ji ber vê ev mubalexeya di asta "xuluvê" de ye.

Ya balkêş ew e ku di risteya duyem de nabêje Çîyayê Sînayê, dibêje "Çîyayê Qafê" perçe perçe bû. Lê belê Çîyayê Qafê çîyayekî nîgaşî ya çîrok û efsaneyan e.¹⁵⁴ Ji bo ku vê bûyera pîroz û derasayî bilindtirîn nîşan bide serî li têgeheke xeyalî anku Çîyayê Qafê dide û bi vê pileya mubalexeyê tîrtir dike. Feqî, di vir de jî mubalexeya di asta "xuluvê" de çêkiriye. Lewra ev her du bûyer ne bi hewna mirovan dikeve û ne jî di toreyê de hatine dîtin.

"Qulzem û behrên di heftê agirê eşqê ku keftê

Dê sojit şubhetê neftê min dîye û pê zanim ez"

(Feqîyê Teyran, Îro Ji Dest Husna Hebîb, m.7., r. 129)

Gava agirê evînê bi Deryaya Sor û bi heft deryayan ket ew derya mîna neftê de bişewitin, min ev bûyer dîtiye û ez vê rewşê baş dizanim. Tu av nîn e ku weke neftê bişewitê anku agirek çiqas dijwar be jî av dikare wê wemirîne; lê belê agirê dojhê ne tê de. Nexwe tê fêmkirin ku agirê dilê Feqî mîna agirê dojhê ye ku dikare Deryaya Sor û heft deryayan bişewtîne.

Bi gotina "Min dîye û pê zanim ez." jî tê fêmkirin ku Feqî, ne dîrî vê rewşê ye û ev bûyer; hatiye serê wî bixwe anku yê weke deryayan dişewite ew bixwe ye. Feqî, bi awayekî jîrane xwe şibandîye Qulzemê (Deryaya Sor) û ew jan û kovanên di dilê wî de ne jî şibandîne agirê dojhê, bi vî awayî dereceya evîna xwe kişandiye lûtkeyê û bi rêya şibandîne mubalaxeyeke ne bi hewna mirovan dikeve û ne jî di bastanê de tê dîtin dike; ji ber vê yekê "xuluvek" derdikeve holê.

"Xwezî min sed ser hebana sed hezar dev pêve bana

Ew hemû li medhê te bana hêj bi wan noqsan im ez"

(Feqîyê Teyran, Îro ji Dest Husna Hebîb, m. 25., r. 134)

Feqî, ji bo pesindayîna hezkirîya xwe sed serê ku pê ve hezar dev hebe dixwaze û dîsa jî bi vê xwestekê xwe kêmbê. Di vê malika xwe ya navdar de ew jî bo metihkirina bedewbûna hezkirîya xwe tiştêkî nebûyî dixwaze û bi vê xwestekê jî kira

¹⁵⁴ İskender Pala, *Ansiklopedik Divan Şiiri Sözlüğü*, Weş. Kapı, Ç. sêzdehem, İstanbul 2004, r. 248

wî naşike. Di vê mînakê de “xuluveke” gelek resen afirandiye û ev jî nîşaneyê kûrbûna feraseta wî ye.

Di wêjeya klasîk de tu helbestkar tune ye ku serî li ciwankariya mubalexeyê nedabe, yek ji wan helbestkaran jî Feqîyê Teyran e. Feqîyê Teyran, di dîroka wêjeya kurdî ya klasîk de weke helbestkarê hezkirin û evînê dikare were pênasekirin; helbestên wî ji aliyê mijarê ve bi piranî eşq, tesewif, şîretên dînî û hwd. in. Jixwe mubalexe jî ji bo salixdayîn û şayeskirina van mijaran hunereke bikeystirîn e. Feqî, rewşa xwe ya tê de û raza di dilê xwe carinan rasterast û carinan jî bi navgîn bi xêra mubalexeyê bi awayekî zîrekî bi kar anîye. Wî, di gelek cîyan de mubalexeyên resen û di asta xuluvê de bi kar anîne. Di helbestên Feqî de mubalexe bi giştî dema gilî û gazinên xwe dike derdikeve holê. Feqî evîna xwe ya Îlahî û şîretên xwe yên dînî di asta hewariyê de bi navbeynkariya mubalexeyan vegotîye.

Hunera mubalexeyê bi asayî bi hêza nîgaşan tê çêkirin; Feqî jî ji bo ku di hişên xwînerên xwe de bibîrxistinên cihêreng ava bike, di gelek cîyan de zorê dide sînoren xeyalên mirovan û mubalexeyên xwe di asta xuluvê de bi kar anîye û dîsa ev bibîrxistin jî bi rêya telmîhan û hin peyvên weke: agir û pêt, bêhîsab, sotin, kuştin, rengzer, nexweş, ker ker û hwd. ” bi awayekî karîger emilandîne.

2.2. Tezad:

Peyva tezadê ji "zidda" erebî tê¹⁵⁵, di kurdî de tê wateya "dij", "dijber" û "berevajî"yê. Di wêjeya klasîk de ev ciwankarî bi navên weke "mutabiqê", "tîbaq"¹⁵⁶, "tatbîq û "teqafu" jî tê zanîn.

Ciwankariya tezadê, di riste, malik an jî komeristeyan de du bêjeyên ji aliyê wateyî ve dijberî hevûdin bin tê çêkirin; anku li ser dijberîyekê ava dibe. Tezad, ne tenê li ser diywateya peyvan tê sazîkirin, li ser dijberîya hest, têgih, boçûn hwd. de jî tê çêkirin.

Tezad li ser bibîrxistinên ku bi rêya kelecane hatine holê ava dibe. Ev ciwankarî, di helbest, gotûbêj, rexne û şayesan de bi kêrî xemilandina şewazê tê; dike

¹⁵⁵ Ferit Devellioğlu, h.b., r. 1105

¹⁵⁶ Perwîz Cîhanî, h.b., r.54

ku kelecana mirovan zindî bimîne¹⁵⁷ û bandora peyama ku dixwaze were dayîn zêdetir dike.

Di ciwankariya teza de peyvên ku ji alîyê wateyê ve di navbera wan de teza heye, dibe ku ji heman cureyên peyvê bin; anku her du peyvên dijberî hevûdin in dikarin bibin navdêr an lêker an jî cureyên ji hevûdin cihê. Tezada di navbera lêkeran de jî di nav xwe de dibin du beş: Tibaqa Îcabê û Tîqaba Selbê.¹⁵⁸ Em dê ji bilî van cî bidine tezatên ji rêzê jî:

2.2.1. Tibaqa Îcabê:

Îcab, ji alîyê wateya xwe ve tê wateya erênî yan jî erênîkirinê¹⁵⁹. Tîqaba îcabê: Ew tibaqa/tezada ku li ser dijberîya du lêkerên erênî ava bûne tê gotin. Bo mînak: "Nan firot pê dew kirî." firot û kirî ev her du lêker dijberî hevûdin bin jî di wateya erênî de ne an jî çû-hat, ket-rabû û hwd. Bo nimûne:

"Tu j'emrê kê her têt bi bez sewdaserî şubhetê ez

J' kê ra dikî çûna bi lez vê serqutan û xulmetê"

(Feqîyê Teyran, Ey Av û Av, m.8., r. 113)

Feqî, di vê malika xwe de av kesandiye û bangî avê dike, hatina avê ya bilez didirûvîne sewdaserîya xwe û dîsa pîrsa sedema çûyîna avê ya mîna sergerandî û xulamekî dike. "Hatin" û "çûna" avê teza anîye holê û ji bo ku "têt" û "çûn" ev her du lêkerên ku di navbera wan de teza çêbûye ji alîyê wateya xwe ve ji bo ku erênî ne ji tibaqa anku tezada îcabê dê were hesibandin.

2.2.2. Tibaqa Selbê:

Peyva "selb"ê jî tê wateya neyînîkirinê¹⁶⁰. Ji du lêkeran, ku ji heman rayekê têt, yek ji wan bi wateya xwe ya erênî û ya din jî bi wateya xwe ya neyînî dema bi hev re tene bikaranîn tibaqa selbê derdikeve holê. Bo mînak: "Mebî dijminê xeraban, bibî dijminê xerabîyê." mebî û bibî. Dijberîya van lêkeran jî ji wateya erênî û neyînîyê têt;

¹⁵⁷ İskender Pala *Ansiklopedik Divan Şiiri Sözlüğü*, r. 455

¹⁵⁸ M. A. Yekta Saraç, *Klasik Edebiyat Bilgisi, Belagat*, r. 163

¹⁵⁹ Ferit Devellioğlu, h.b., r. 406

¹⁶⁰ Ferit Devellioğlu, h.b., r. 932

çû-neçû, ket-neket û hwd. Bo mimûne:

“Xwedawenda tu yî me'bûd duayê min nekî merdûd

Şefî'ê min bikî mehbûd seqîl bin xêr di mîzanê”

(Feqîyê Teyran, Îlahî ‘Ebdûkel Atak, m. 24., r.433)

Di vê lave û xwestekên ku ji Xudê tê kirin de anku "Dua'yê min nekî merdûd" û "şefî'ê min bikî mehmûd" bi rêya lêkerên "bikî" û "nekî" tezad ava bûye û ji bo ku ji her du lêkeran yek ji wan erênî û ya din jî neyînî ye tîbaqa selbê derketiye holê.

Çend nimûnyên din ên tezadê:

“Dermanê jaran tu yî hêviya bêçaran tu yî

Selwa li daran tu yî gula biharan tu yî

Tîrbê nûbaran tu yî xutba mehdaran tu yî "

“Ê xerq dixwînê ez im kuştîyê birînê ez im

Ê dûrî jînê ez im xerîb ji dinê ez im

'Aşîqê bînê ez im wekî di şînê ez im"

(Feqîyê Teyran, Bizan Ku Min Yar Tu yî, b. 9. û 10., r. 445)

Ji van komeristeyan weke ku tê dîtin Feqî di bin bandora hestên xwe de maye û bi awayekî hestewar di komeristeya yekem de gewşînên dilbera xwe yên erênî mîna dermanbûna jaran, hêvîbûna bêçaran, gulbûna biharan hwd. û di komeristeya duyem de jî rewşa xwe ya neyînî û xerab mîna xerqwendinê, kuştîbûna birînê, dûrketina ji jînê û hwd. li pey hevûdin ristine. Di komeristeya yekem de ji bo rewşa dilberê tabloyeke erênî xêz kiribe jî; lê di komeristeya duyem de di şûna vê rewşa erênî tabloyeke neyînî cî girtiye û rewşa xwe ya ku tê de bi vî rengî nimandiye. Nexwe ev her du tablo dijberên hevûdin in û dema bi awayekî yekpare werin dîtin tezadeke resen derdikeve holê.

“Mubtela qametfena me ji yar û dostan cuda me

'Aşîqê nûra Xuda me kes bi halê min nezan"

(Feqîyê Teyran, Ez Çi Bêjim, m. 5., r. 416)

Ev malik ji bo nîşandana dilsozî û dildayîna Feqî ya li hemberê Xudayê xwe gelek xweş û di cî de ye. Lewre li gor wêjeya tesewîfî bi peyva qametê tê xwestin ku peyama "ji bilî Xuda tu kes ne layîqê îbadet û perestîna ye." were dayîn. Peyva fenayê jî tê wateya tunebûnê, bi tunebûna kesayetîya evdan, tevahîya Xuda pêk tê; anku evd, wek mirov, taybetîyên xwe terk dike, bi tunebûyê/fenayê digihîje Xudayê xwe û li wir dikemile û bê kêmayî dibe. Jixwe di tewhîdê de jî ev lûtkeya herî bilind e. Feqî, li gor rewşa gîyana xwe, xwe ewqas nêzî Xudayê xwe dibîne û bengîbûna qametfenayê, wî jî yar û dostan cuda kiriye. Bi awayekî din wî, bi perestîna û îbadetê ji dil xwe ji hemû çêj û pêwendîyên ji bilî Xuda, yar û dost jî tê de dûr xistiye û ew nêzî Xuda bûye. Naxwe di vir de du bizav derdikevin holê: "Nêzîkbûn" û dûrbûn" û ev jî tezadeke gelek ciwan û bi çêj diyarî me kiriye.

Ciwankariya dijberîyê di menzûmeyên Feqî de her çiqas ji alîyê hejmarê ve di rêjeyê baş de be jî; lê belê ji alîyê çawanîyê ve hinek lawaz maye, anku di nav mînakên ku têkilîya wan bi mijara navborî re hene, bi qasî ku me tesbît kiriye bi gelemperî di hişê me de tehmeke xweş nahêle û ji alîyê çêja wêjeyî ve jî bibîrxistinên hestewar di hundirê me de ava nake; anku lawaz dimîne. Lê nayê wê wateyê ku ev mînak nabine mijara tezadê.

Feqî, di menzûmeyên xwe de hem tîbaqa îcabê hem tîbaqa selbê û hem jî tîbaq anku tezadên ji rêzê bi kar anîne: "Dikî..... nakî, meke..... bike, biçîne..... bimîne, xwar dibin..... rast bikin, şafî..... derd, hişyar..... xafilîn, mecaz..... heqîqî, Xaliq..... bende, gunehkar..... Xeffar, tarî munewwer, ruhnî..... şeva tarî û hwd. ji hin tezadên ku di menzûmeyên wî de derbas dibin in.

2.3. Tekrîr:

Tekrîr, bi wateya xwe ya ferhengî ve "dubarekirin" û "gotin" ¹⁶¹e. Di kurdî de ji bo tekrîrê "ducar", "dubare", "tekrar" û "cardin" tê bikaranîn ¹⁶².

Mebesta bikaranîna ciwankariya tekrîrê, bihêzkirin û perçînkirina peyvê ye; ev, digel zindîbûnê kelecaneke jî dide helbest an jî menzûmeyan.

¹⁶¹ Ferit Devellioğlu, h.b., r. 1067

¹⁶² D. Îzolî, *Ferhenga kurdî-tirkî, tirkî-kurdî*, Weş. Deng, Ç. heftem, Stenbol 2013, r. 989

Di tekrîrê de, bêjeyên ku têne dubarekirin di heman demê de, bi navgînîya dengên ku têne dubarekirin, ahengeke xweş diafirîne. Bi gotineke din dubarekirin, ji alîyê wate û ahengê ve bi awayekî erênî bandorê li metnê dike.¹⁶³ Jixwe tekrîr, ne tenê dubarekirina heman bêjeyan e, di tekrîrê de yê ku têne dubarekirin dibe ku carinan kombêje bin jî.

Divê were gotin di ciwankarîya tekrîrê de peyvên ku têne dubarekirin pêwîst e di heman wateyê de bin, di berevajîya vê de tekrîr dernakeve holê. Bo nimûne : " Emma bi neseb ne merdê Botan / Belkî mutewllidê botan¹⁶⁴" di vê malika cenabê Xanî de peyva "botan" tekrîr ava nekiriye; lewre di risteya yekem de di wateya Cizîra Botanê de û ya duyem de jî di wateya "îftîra û derewker"îyê de hatiye emilandin.

Tekrîr di zargotina kurdî de jî derdikeve pêşberî me. Bo nimûne: "Dizan ji dizan dizî, erd û esman lê pirsî.", "Ev nîn e, ev nîn e, ev jî ji gundê me nîn e.", "Çêkiro bixwe kiro, xerab kiro bixwe kiro.", "Dest destan dişon, dest vedigerin çavan dişon." û hwd. Bo nimûne:

"Ey av û av ey av û av ma tu bi 'îşq û muhbetê

Mewc û pêlan tavêy belav bêsekne û bê rahetê "

(Feqîyê Teyran, Ey Av û Av, m.1., r. 111)

Di risteya yekem de (Ey av û av ey av û av!) dubareyeke baneşanî heye; Feqî ji bo ku vê raza Îlahî ya gerdûnê fêhm bike avê vêdixwîne guftûgoya vê razê. Dubareya baneşana "Ey!" û ya "av û av"ê hem olaneke xweş afirandiye û hem jî wateya armanca xwesteka Feqî perçîn kiriye. Dikare were gotin ku baneşanê dubare bi hêztir kiriye.

"Ne Yehya ma ne Salîh ma ne Harûn ma ne Mûsa ma

Ne Meryem ma ne Îsa ma ne Ehmed ma ne çaryar e"

(Feqîyê Teyran, Dilo Rabe, m.50., r. 225)

Feqî di vê malika xwe ya şîretbar de rastîya demdemîbûna jîyanê bi mînaka mirina hin pêxemberan xwestiye şênber bike. Mafdarîya xwe ya di vê mijarê de jî bi

¹⁶³ M. A. Yekta Saraç, *Klasik Edebiyat Bilgisi*, Belagat, r.196

¹⁶⁴ M. Emin Bozarlan, h.b., r. 348

dubarekirina "Ne.....ma nema" yê bi hêztir kiriye û kiriye ku ev rastî di hişê me de bisêwire.

“Binêr, bêje û balayê binêr, selwe û alayê

Binêr, reyhan û lalayê binêr, Beyta Berê Reş tê “

(Feqîyê Teyran, Ji ‘Işqê Sotîme Welleh, m. 16., r. 438)

Ew di dema ku gewşînên dilbera xwe bi rêya mezmûnan rêz dike bêhempabûna wan bi peyva "binêre" dubare dike. Feqî, dixwaze taybetîyên dilbera xwe ji bo wî bê çiqas hêjayî pesindayîne ne vê peyama xwe ya mişt hêst û bi rêya dubarekirina "binêr"an jî gelek xweş bi cî anîye.

“Bizan ku min yar tu yî dil jê birîndar tu yî

Ez kuştîm yekcar tu yî ê bikom û biçar tu yî

Bişeml û destar tu yî pir li min kubar tu yî “

"Ê bi xezebxwendî ez im di qeyd û benda ez im

Kuştiyê rindê ez im sozanê findê ez im

Zincîr di zendê ez im muştaqê rindê ez im “

(Feqîyê Teyran, Bizan Ku Min Yar Tu yî, b.1. û 2., r.443)

Her weke ku tê dîtî di komeristeya yekem de peyva ku tê dubarekirin "tu yî" ye û ya di duyem de jî "ez im" e. Di navbera her du peyvên ku têne dubarekirin de tezadeke xweş jî ava bûye.

Ciwankarîya tekrîrê ji bo perçînkirina peyvê û ava kirina kelecane ji bo kesekî mîna Feqî hestewar ciwankarîyeke guncan e. Jixwe em di menzûmeyên wî de jî tûşî gelek mînakên tekrîrê dibin. Tekrîr di hin menzûmeyan de carinan bi awayê baneşanê "Ey av û av , ey av û av ! ", "Dilo rabe, dilo rabe!", “Eya Rebbî eya Rebbî!”, ku ev ji alîyê hejmarê ve zêde ne carinan jî bi awayekî ji rêzê "..... wî li wê.... ji te ye, bibin.... bibin.... min....min, me ne...ma, ne....ma ne...ma, meke, binêr,tu yî, ...ez im û hwd. derdikeve holê. Mînaka balkêş di manzûmeya "Dilo Rabe" de ava bûye, dema behsa

fenabûna heval û hevrêyan, şînahî û çîçekan û dîsa kesên navdar ên dîrokî û pêxemberan dike gihaneka "ne" yê û lêkera "mam"ê bi hev re û carnar jî di serê risteyan de, cînavka "me"yê cîyê xwe digire û bi her du bêjeyên din re di gelek malikan de xwe dubare dike dîsa: "ne...mam, ne...mam; Me ne...mam." ji bilî van mînanan hatiye dîtin ku di hin menzûmeyên wî de di her malikekê de risteya dawî, xwe dubare kiriye. Risteyên ku di dawîya çarînan de xwe dubare dikin kêzêde ev in : "Wêran ez im malim xirab", " Kes bi halê min nezan", "Ay dilê min ay dilo", "Qet kes li bal nînin wefa", "Dîsa bi xêr hatî bihar" û hwd."

2.4. Husn û Ta'lîl:

Ev ciwankariya ku li ser du peyvên erebî ava bûye peyvên wê ev in: "Husn", tê wateya "xweş", "baş", "xweşbûn" û "başbûnê"¹⁶⁵; "ta'lîl" jî weke "bahane", "sedem", "bahanenîşandan" ¹⁶⁶û hwd. tê zanîn. Nexwe di husn û ta'lîlê de xweşbahaneyek ava dibe. Ji bilî vê jî vê ciwankariya ku piştî xwe daye kelecane jê re "husn û tewcîl" jî hatiye gotin.¹⁶⁷

Di ciwankariya husn û ta'lîlê de bûyer an jî rewşeke pêkhatî bi sedemeke "xweş" û "nîgaşî/xeyalî" re tê girêdan û sedema rastî jî bi awayekî nepenî tê mandelekirin. Heke ku bûyer bi sedemeke rastî û bivac ve hatibe girêdan wê demê husn û ta'lîl dernakeve holê; lewre di husn û ta'lîlê de sedema bûyereke rastî bi rêya derasayî hatiye ravekirin.

Dema helbestkar di helbesta xwe de bi çavekî nîgaşî û hestewar bi jîyana rastî binêre wê demê serî li vê rêyê; anku husn û ta'lîlê dide, bi vî awayî hem helbest û hem jî menzûmeyên xwe bi xêra jîyaneke nîgaşî dewlemendtir dike.¹⁶⁸

Di husn û ta'lîleke serkeftî de helbestkar; ji bo ku bawerîya me bi bûyera derasayî ya di husn û ta'lîlê de pêk bîne û me têxe wê rewşa hestewar, pêwîst e pêşî ew bixwe qinyata xwe li vê bûyera dûrî rastîyê anîbe. Heke ji sedema ku nîşanî me daye gumanan bike wê demê rewş diguhere û "şîbha husn û ta'lîl" anku " mîna husn û ta'lîl"

¹⁶⁵ Ferit Devellioğlu, h.b., r. 392

¹⁶⁶ Ferit Devellioğlu, h.b., r. 1030

¹⁶⁷ İskender Pala, *Divan Edebiyatı*, r. 147

¹⁶⁸ İskender Pala, *Divan Edebiyatı*, r. 147

derdikeve holê.¹⁶⁹

Gelek caran ciwankarîya husn û ta'lîl û tecahula arif bi hev re têne tevlihevkirin. Di husn û ta'lîlê de divê neyê jibîrkin ku di holê de bûyereke heye û ev bûyer rast e; lê belê sedema vê bûyerê dûrî mantiqa mirovan e û ne rast e; helbestkar sedemeke nîgaşî nîşanî me dide. Dema em dibêjin: "Roja ku cenabê Xanî miriye ne tenê mirov, ewr jî fêrmiskên xwe dibarandin." Di vir de, dibe ku roja cenabê Xanî wefat kiriye baran barîbe, barîna baranê bûyereke rastî ye; lê sedema barîna baranê ne li ser xemgînîya mirina Cenabê Xanî ye, ev rasterast bûyereke xwezayî ye û bi rewşa hewayê ve girêdayî ye. Barana ku ji ber mirina Xanî barîye (Ewrên ku firmiskên xwe li ser mirina Xanî dibarandin.) sedemeke nîgaşî ye û xweş e. An jî: "Ji bo ku ez ji sêvên sor hez dikim dara me ya sêvan, her sal di vê demsalê de sêvên xweş û sor diyarî min dike." Dareke sêvan, sêvên sor dikare bide ev tiştekî ji rêzê ye û peyitandina vê ne tiştekî zor e; lê belê sedema vê bûyerê ne ji hezkirina sêvên sor in, ev sedem derasayî û nîgaşî ye. Di van her du mînan de jî bûyerên rast bi "xweşbahaneyan" ve hatiye girêdan. Bo nimûne:

“Şevan û rojan bêxew î ji muhbeta kê ditewî

Şevtarêyan qet nahewî tu j'emrê kê ve lez ketê”

(Feqîyê Teyran, Ey Av û Av, m. 7., r. 113)

Feqî, di vê malika xwe ya mişt tesewif de bi awayekî pirsnak bi avê re diaxive û sedema tewandina û herikandina avê ya şev û rojan jê pirs dike û di nav pirsên xwe de jî dîsa bersiva van pirsên dide; anku sedema tewandina avê ya şev û rojan bêxew û bêrawestbûna wê bi hezkirinê (muhtetê) ve girêdide. Lê belê em dizanin ku herikandin, tewandin û hwd. ji taybetîyên avê ne û ev taybetî tiştine xwezayî ne û rast in. Sedema rastîya peydabûna pêl û tewandina avê ne ji muhtetê ye, ev tiştekî nîgaşî ye û dûrî mantiqê ye. Bi gotineke din: Bûyerên rastî, herikandin û bêxewbûna çemekî ya bi şev û rojan, bi sedemeke nîgaşî û xweş ve anku hezkirinê ve hatiye girêdan. Naxwe, ev malik ciwankarîya xweşbahaneyê di nava xwe de hundirandiyê.

“Bilbil dîsa xeberda qismet cara ewel bû

¹⁶⁹ M. A. Yekta Saraç, *Klasik Edebiyat Bilgisi, Belagat*, r. 231

'Aşiq bûme li werda maşûqa min sorgul bû

Dikêşim jan û derda lew min birîn di kul bû”

(Feqîyê Teyran, Feqe û Bilbil, m.15., r. 154)

Weke ku tê dîtîn ev sêrist mijara xwe ji çîroka evînî ya gulê û bilbilî sitandiye, jixwe ev çîrok di kevneşopîya wêjeya klasîk de binavûdeng e. Sêrist bi întaqê dest pê dike. Ê bilbil bersiva Feqî dide û sedema xwendina xwe ya di nav baxçe û di nav dar û daristanan de bidildayîna gulê ve girêdaye. Di rastîyê de xwendina bilbil a di nav baxçeyan de ne li derveyî surîştê bilbilî ye anku di jîyana rasteqîn de ev der cîyê wî ye jîyanê ye û li van deran mîna balindeyên din dixwîne ev jî li surîştê wî tê; lê Feqî sedema vê rastîyê bi hezkirina gulê ve girêdaye û xweşbahaneyek anku husn û ta'lîlek çêkiriye.

“Bê rahet û bê sekne yî yan ‘aşiqê baxwê xwe yî

Yan şubhetê qelbê me yî ji eşqa kê natebitê”

(Feqîyê Teyran, Ey Av û Av, m. 2., r. 111)

Di vê malikê de jî Feqî dîsa bi avê re diaxive û sedema herikandina wê ya bêrahet û bêsekne bi eşqê ve girêdide. Bi vî avayî husn u ta'lîleke din çêdike.

Ji bo ku mînakên din ên husn û ta'lîlê bi gelemperî bi vî rengî ne me hewcê nedît ku em cî bidine mînakine din.

Ciwankarîya husn û ta'lîlê bi qasî ku me peyitandiye, bi gelemperî di menzûmeyên wî yên bi navê "Ey Av û Av " û "Feqe û Bilbil" de derketine holê. Di menzûmeya Ey Av û Avê de, di gelek cîyan de mînakên husn û ta'lîlê peyda bûne û edeta ev menzûme li ser vê ciwankarîyê ava bûye; lewre wî herikandina avê di gelek malikên xwe de bi xweşbahaneyên curbicur ve girêdane. Di menzûmeya "Feqe û Bilbil" de jî dîsa peydabûna bilbil a di gulzaran de jî bi xweşbahaneyê dildayîna bilbilî ya bi gulê ve girêdaye. Kê zêde husn û ta'lîlên Feqî li ser van mijaran pêk hatine û ji ber van mijaran mînakên husn û ta'lîlên wî bi xwe re hem teşxîs hem jî întaq anîne.

2.5. Tecahula Arif:

Di erebî de "tecahul" tê wateya "mîna nezanan xuyakirin", "ji nezaniyêvehatin"¹⁷⁰ wateya "arif" jî "kesê ku dizane", "zana" û "xwedîyê têgihîştinê"¹⁷¹.

Di wêjeya klasîk de tecahula arif: Bi kirina mebesta yarîyekê, rastîyeke ku tê zanîn ji nezaniyê ve hatin e.¹⁷² Kakila vê ciwankariyê qerf an jî yarî ye. Kesê ku ev ciwankarî bi kar anîye derheqê tiştê ku dizane de xwe mîna nezanan nîşan dide yan jî xwe nezaniyê diqewimîne. Ji ber vê sedemê, di bingeha vê ciwankariya wêjeyî de "jinezaniyêvehatin" heye û dîsa "tecahula arifane" û "tecahula arifin" jî jê re tê gotin.

Ji bo ku di helbest an jî menzûmeyekê de wateyek ciwan were afirandin yarîyek teqez bi sedema matmayîn, pesindayîn, kêmxistin, berzkirin, lomandinê û hwd. pêwîst e hatibe kirin. Ev yarîya ku kakila vê ciwankariyê ava kiriye, dibe ku ji bo van çar sedeman jî hatibe kirin: Tenşît (kêfxweşkirin), tewbîh (agahkirin), teheyûr (şaşwaxistin) û tedelluh (jixweçûyîn).¹⁷³

Helbestkarek, di tecahula arif de ne dibêje ez tiştêkî nizanim ne jî dibêje tiştê ku ez dizanim vedişêrim, bi awayekî din tiştê ku dizane bi awayekî bi navgîn vedibêje. Gava ku vê pêk tîne jî ji mubalexe, îstîfxam¹⁷⁴ û şibandinê sûd werdigire.

Bi qasî ku hatiye dîtin tecahula arif bi rêya îstîfxamê tê çêkirin. Lê belê divê neyê jibîrkirin ku, di vê mijara navborî de, îstîfxama ku hatiye kirin tu bersivê naxweze anku pirsê ku hatiye kirin ne ji bo bersivgirtinekî ye yan jî xwedîyê îstîfxamê pirsên xwe ne ji bo boçûn û angaşên xwe, kesên li beramberê xwe bide qebûlkirin dike. Bi gotineke din pirsên wî ne înkari (mandelekirin) û ne jî îqrari (pejirandin) ne.¹⁷⁵ Îstîfxamên ku berevajîyên van hatibin kirin tecahula arifê dernaxe holê. Ji bo ku ev mijara girîng zelaltir û rewşentir bibe pêwîst e em çend mînakan bidin. Gava kesek bibêje: "Xwedêyo! Ev helbesta efsûnkar ku her tîpên wê bi ava zêrîn hatine nivîsîn û her bêjeyên wê mîna durên Eden li ba hev hatine ristin gelo ya min e? Kesekî ku helbestek

¹⁷⁰ Ferit Devellioğlu, h.b., r. 1049

¹⁷¹ Ferit Devellioğlu, h.b., r. 38

¹⁷² İskender Pala, *Divan Edebiyatı*, r. 145

¹⁷³ İskender Pala, *Divan Edebiyatı*, r. 145

¹⁷⁴ Cem Dilçin, h.b., r. 441

¹⁷⁵ M. A. Yekta Saraç, *Klasik Edebiyat Bilgisi*, Belagat, r. 227

nivîsîbe dizane ku ew helbest a wî ye yan na, lê xwedîyê vê hevokê vê rastîyê vedişêre û ji nezanîyê ve tê. Di vir de bi awayek binavgîn pesnê helbesta xwe jî dide û wê berztir dike û vê kêfxweşîya xwe dide der, bi baneşana "Xwadêyo!" jî adeta lûtkeya berzkirinê dijî. Weke ku tê dîtîn di vê mînakê de pirsên ku hatine kirin ne ji bo bersiv sitandinê ye, ji ber vê tecahula arifeke xweş çêbûye û bi hevrebûna şibandin (bêjeyên mîna durên Eden) û mubalexeyê (tîpên ku bi ava zêrîn hatine nivîsîn) jî bi awayekî zelal li ber çavan e. Yan jî "Ew tiştên ku ji çavên te têne xwarê hêstir in an Firatên bixwîn in? "were gotin, dîsa di vir de jî ji vê îstîfxamê re tu bersiv nayê xwestin an jî mebesta îqrarî û înkârî tune ye; lê belê jinezanînevehatineke heye; lewre kesê ku ev pirs kiriye gelek xweş dizane ku ji çavên mirovan tu carî Firatên/çemên bixwîn naherikin. Xwedîyê vê hevokê rewşa xwe ya tê de ya qambax û bedhal, ji bo ku ne rasterast vedibêje, bi gotina "Firatên bixwîn" hem şibandin û hem jî mubalexe derketibe holê jî lê belê nayê wê wateyê ku cîyê tecahula arif tê de heye teqez ev her du ciwankarî hebin lê ji bo îstîfxamê ne teqez be jî bi gelemperî ev rewş derbas dibe. Bo nimûne:

"Di xamûşên di razayê di mehcûrên ji dinyayê

Çewa dengê ji wan nayê ji wan fikran Feqê jar e."

(Feqîyê Teyran, Dilo Rabe, m. 75., r. 234)

Ew kesên ku mirine û ji cîhanê veqetîyane di nava xeweke bêdeng û giran de ne; ji vê bêdengîya wan, Feqî behitîye û şaşwaz maye û ji ber vê pîrsa "Çawa dengê ji wan nayê?" dike; li ser vê bûyera li gor wî nedîtî, ewqas bi fikar e ku çîqal û jar maye. Pîrsa di vê malikê de hatiye kirin ne ji bo bersiv sitandinekê ye; Feqî, rastîyeke ku ji alîyê her kesî ve tê zanîn (Dengdernextina mirîyan) ji nezanîne ve hatiye; li gor wî, ev bûyer bûyereke erjengane ye û adeta bi vê îstîfxamê tirs û fikarên xwe veder kiriye. Peyva jarê, ji mubalexayê afirandiye û vê bandoreke xweş li tecahulê arifaneyê jî kiriye û ev rewş ji bo dawîya vê malikê jî serkeftîtir bûye.

"Ji cobaran gîya ker çûn letîf û nazik û ter çûn

Wekî bayî kelemper çûn gelo ew bo çi dijwar e"

(Feqîyê Teyran, Dilo Rabe, m.27., r.215)

Çawa gîyayên coberên ku miçîqî ne û mîna strîyên sivik ên hişkbûyî li hember bayê dijwar xwe negirtine û çûne, ew bedewên nazik û teze jî ji destê vê bûyera dijwar û tund anku ji mirinê xwe xilas nekirine û çûne. Gelo ev bûyer jî bo çî ewqas dijwar e? Feqî, mirinê dişibîne karesatên ku di demsala payîzê de tîr serê xwezayê û pîrsa "Gelo ew bo çî dijwar e" jî vê dijwarîyê gilîyan û loman dike. Bi vê pîrsa xwe ne ku li pey bersiva tund û dijwarbûna mirinê dikeve. Jixwe gelek xweş dizane ku mirin qet nexweş e û dijwar e; lê belê ew dixwaze asta êş û azarên jî kerba mirinê bide nîşandan jî bo wê jî xwe li nezanîne diqewimîne û vê pîrsê dike. Xulasa bi pîrsa di risteya duyem de tecahulê arifane afirandiye û têgiha mirinê, di malikên din de bi awayekî vekirî; lê di vê malikê de jî bi nepenî tê dîtin, jixwe tecahulê arifî di vê mînakê de li ser dijwarbûna mirinê (Gelo ew bo çî dijwar e) ava bûye û vê kiriye ku di vê malikê de rewşeke reşbîn were hîskirin.

“Kesê ‘eql e kesê merd e di ber ku hêj ne bû erd e

Ji vê meyla xwe jê berde çira ax mak e qehar e”

(Feqîyê Teyran, Dilo Rabe, m. 68., r.231)

Di risteya duyem de bi pîrsa “Çira ax mak e, qehar e?” tecahula arifî ava kiriye; lewre ew, tîkîliya mirin, ax û dayikê baş dizane; lê belê di vê mijarê de xwe nezaniyê diqewimîne. Feqî, di vir de jî dîsa atmosfereke reşbîn xêz kiriye û derheqê mirinê de lomeyên xwe domandine. Ji bo ku mînakên din jî bi vî rengî ne me hewce nedît ku em cî bidine wan.

Mînakên ciwankariya tecahula arifî di dîwana Feqî de bi qasî ku me peytandiye bi awayekî jimartî cîyê xwe girtine. Di gelek menzûmeyên wî de her çiqas risteyên ku wateya pîrsan di xwe de vehewandibin hebin jî; lê di eslê xwe de ev malik an jî riste tecahula arifî dernexistine holê. Ji bilî vê jî bo ku tîkîliya wê bi tecahula arifî re heye pêwîst e em bala xwe bidine peyva "eya"yê; lewre eya di gelek menzûmeyên wî de derbas dibin û dibe ku bi peyva "aya"yê re were tevlihevkin. "Eya!" di erebî de tê wateya baneşana "ey!"yê. Ji ber vê, cîyê ku "eya!" hatiye bikaranîn bi xwe re tecahula arifî ava nekiriye jî bo ku ew bes baneşanek (Ey!, Hey!) e; lê belê "aya" di kurdî (hoker) û farisî (daçek) de tê wateya "gelo"yê. Peyva geloyê jî ji bo ku di hevokan de gelek caran di wateya "guman", " behitîn" û "jinezanînevehatin"ê de tê bikaranîn ev jî ji

bo afirandina tecahula arifekê gelek guncantir dibe. Pêwîst e ev her du pey bi hev re neyên tevlihevkin. Me li jor jî cî dabûyê, ya ku di dîwana Feqî de hatiye emilandin ne "aya" ye, "eya!" ye divê neyê jibîrkin ciwankarîya tecahula arif, li gor peytandina me tenê di menzûmeya wî ya bi navê "Dilo Rabe" de derdikeve pêşberî me û di van mînakên de jî bi gelemperî rewşeke reşbîn tê hîskirin.

2.6. Tenasub:

Peyva tenasubê di erebî de tê wateya "lêhatin", "lêketin", "guncanîti" û "lihevhatin"¹⁷⁶ ê. Di rewanbêjîyê de ciwankarîya tenasubê li ser "hevpeywendîya" peyvan ava dibe.

Ciwankarîya tenasubê, peyvên ku di navbera wan de ji hin alîyan ve têkilî û lihevhatin hebin tê çêkirin. Bêjeyên ku hatine nivîsîn an jî hatine gotin dibin babet û di pêwendîyekê de tînin civandin. Di tenasubê de tiştê herî girîng pêwend û lihevhatina peyvan e.

Tenasub, di hunera civandina peyvan de ji bo nîşandana hostetî û hunerê de ciwankarîyeke gelek guncan e.¹⁷⁷ Ji bilî vê, peyvên tenasubê ava kirine dikin ku peyvên nehatibin bikaranîn jî were bibîrxistin û boçûna bingehîn a malik, çarîn an jî ya komeristeyan didine hîskirin.

Di ciwankarîya tenasubê de divê neyê jibîrkin ku di navbera peyvan de pêwîst e "wateya dijberîyê" jî tune be. Di çanda wêjeya klasîk de ji bo tenasubê mura'atê nezîr (Ew peyvên ku ji alîyê wateyê ve li hev hatibin û di hevokekê de hatibin civandin), tewfîq (lêhatin), telfîq (yekkirin, tevlihevkin) û mutenasib (munasib, ji her awayî lihevkin, wek hev)¹⁷⁸ jî tê gotin. Peyvên ku di navbera wan de pêwendî heye anku tenasubê çêkirine di nav malik an jî di nav çarînan de bi gelemperî ne bi şeweyekî birêkûpêk, lê bêserûber hatine nivîsîn. Jixwe peyvên ku birêkûpêk hatibin nivîsîn ne tenasubê, lê "lef û neşrê" ava dikin ev jî mijareke din e.

Tenasub ji alîyê helbestkarên wêjeya klasîk ve bi awayekî karîger hatiye bikaranîn û hatiye hezkirin. Ev ciwankarî ne tenê di helbest û menzûmeyan de, di

¹⁷⁶ Ferit Devellioğlu, h.b., r. 1076

¹⁷⁷ Agah Sırrı Levend, *Divan Edebiyatı*, Weş. Enderun, Ç. çarem, Stenbol 1984, r. 485

¹⁷⁸ M. A. Yekta Saraç, *Klasik Edebiyat Bilgisi, Belagat*, r. 160

pexşan û heta di axaftina rojane de jî hatiye bikaranîn; lewre em, ji bo ku boçûnên xwe yan jî bûyerekê bi awayekî birêkûpêk binin ziman pêwîst e peyvên ji alîyê wateyê ve lihevhatî li cem hev bicivînin da ku ji axaftina xwe di demeke kin de encamek bistînin. Bo nimûne:

"Xaneya bade û mey tê muxnî û hem çeng û ney tê

Min ji eşqa heyahey tê serxweş û sukran im ez "

(Feqîyê Teyran, Îro ji Dest Husna Hebîb, m. 30., r. 135)

Di vê malika xwe de Feqî, bi bêjeyên mîna bade, mey, muxnî, çeng, ney, eşq, heyahey, serxweş û sukran cîyê ku sofî tê de zikrê dîkin anku meyxane ye, mîna wênasazekî di hişê me de dinexşîne û bi xêra bibîrxistinên peyvên lihevhatî em adeta xwe di nav civata sofîyên ku zikrê dîkin de dibînin. Bêjeyên mîna "bende, mey, muxnî, çeng, ney, eşq, heyahey, serxweş, sukran" di navbera wan de pêwendîyek heye; lewre ev hêmanên nava meyxaneyê ne û bi vî awayî lihevhatinek ava kiriye.

"Canfirît im te nebînim deftera 'işqê dixwînim

Serxweş û sekran û dîn im ay dilê min ay dilo..."

(Feqîyê Teyran, Ay Dilê Min Ay Dilo, m. 2., r. 417)

Ev malika ku siruşt Feqî gelek xweş dîyar dike weke ku tê dîtin bibîrxistinên neyînî di hişê me de ava dike; lê nemaze di risteya duyem de bêjeyên weke "serxweş, sekran û dîn" ji gewşînên Feqî yên "jihişçûnê" ne. Naxwe ciwankariya tenasubê li ser hevpeywenda jihişçûnê saz bûye.

"Ew mîr kerîm e satir e xweş hakîm e d'barê xwe da

Xelqno ne dûr e hazir e ew wahid e û bê îbtîda

Her çi bikit ew qadir e ew xaliqê bê bab û da"

(Feqîyê Teyran, Ellah Çi Zatek Ehsen e, b. 6., r. 105)

Feqî, di vê sêrista xwe de dema pesnê Xuda dide hem gewşînên wî û hem jî ji navê wî yên ji "Esam-ul Husna" Kerîm, Hakim, Wahîd, Qadir û Xaliq rêzdike û bi vî

awayî tenasubekê çêdike.

"Zahir kirîn çar "bakir" e ba û av û ax û agir e

Heywan hemû jê çêkire dar û kiswetê “

(Feqîyê Teyran, Ey Av û Av, m. 39., r. 123)

Di vê malikê de jî agahîyên derbarê ramana afirandina gerdûnê de derdikeve pêşberî me. Li gor mutesewifan cîhan li ser çar hêmanan ava bûye; ev hêman jî ba, av, agir û ax in. Ji vê malikê dîyar e ku Feqî jî ev raman pejirandiye¹⁷⁹. Ji van hêmanan re "enasira 'erba" jî tê gotin û ji ber ku navê her "çar hêmanan" di vê malikê de hatiye bikaranîn di vir de tenasubek ava bûye; lewre ew her çar hêman li gor vê bawerîyê heypeywend in.

"Xerîq e 'ebd fil 'isyan bi heqqê Babekir 'Usman

'Elî û 'Umer şerîkê wan xelas ke min ji 'isyanê “

(Feqîyê Teyran, Îlahî 'Ebdükel Atak, m. 19., r. 432)

Bi awayekî zelal di navbera navên xelîfeyên Îslamê de anku Babekir, 'Usman, 'Elî û 'Umer de tenasubek heye.

Weke ku me li jor jî behs kiribû helbestkarên ku pêgirtîyên wêjeya klasîk in ji vê ciwankarîyê gelek sûd wergirtine, Feqî jî rêya wan şopandiye. Em bibêjin dîwana wî li ser tenasubê ava bûye mubalexe nabe; lewre hem ji alîyê hejmarê mînakên tenasubê û hem jî cihêrengbûna peyvên ku tenasubê ava kirine, menzûme û helbestên wî gelek dewlemend in. Ji bo ku wî; bi awayekî jîrane peyvên hem ji alîyê wateyê ve û hem jî ji alîyê mûsîqîyê ve lihevhatî, di berhemên xwe de civandine di ragihandina agahî, boçûn û xeyalên xwe de gelek serkeftî bûye û dîsa bi rêya bibîrxistinên peyvên hevpeywend, di hişê xwînerên xwe de jî dîmênên resen sêwirandine. Peyvên di dîwana Feqî de bi gelemperî di bin van babet û peywendîyan de hatine cem hev: Tenasubên li ser telmîhê

¹⁷⁹ Li gor bawerîyekê bingeha vê ramanê feylesofekî Yewnana antîk bi navê Empedokles avêtiye. Piştêrê vê ramanê hin alimên Îslamê yêr weke Farabî jî di bin bandora xwe de hiştine. (<http://samil.ihya.org/ansiklopedi/anasir-i-erbaa.html>, gihîştin:01.25.2017). Jixwe ev raman di edebiyata tesewîfê de xwe di nav hizra wehdeta wicûd de nîşan dide û gelek helbestkarên klasîk di hunera dewrîyeyê de ev mijar bi kar anîye.

(Mûsa, nûr û Kohê tur; Hîcret, Yûsif û Yaqûbê Ken'an, kor; Loqman, tebîb û şafî; "len tera", Mûsa û Turê Sîna; Leyla û Qeysî; Hudhud û Belqîs; Îbrahîm û Azer û hwd.), li ser agir û şewatê (Soht, dijwar û pereng; agir, pêt, dax; sot, pêt û nar; sot, biraştin û kebab û hwd.), li ser têgihên neyînîyê (birîn, jar, bed û le'în; nexweşî, renglênemayî û kuştin; qetl, xûn, girtî û kuştî; girtî, qeydkirî û bende; dax, kovan, mîhnet, êş û 'ezab; feqîr, geda, mucrîm, rûsîya, merîz û bêdewa û hwd.) li ser jîhişcûnê (Sergeşte, sewda û sergerdan; dîn, sewda, serxweş û sekran; Îşq, serxweş, sekran û dîn, serxoş, sekran û mest û hwd.) li ser şerabê (bade, mey û serxweş, kûze, fincan; mey, şîşe û baderêj; kefa kûzê, tas, cam, mey û wexwun û hwd.) li ser gewşînên dilberê (gerdenzerî, dêmqemerî û nazik; gerdenletîf, qametelîf û reyhana xefîf; gerdenzirav, dêmşûşe û bejinzirav; sade, letîf, şox, beczade û hwd.) li ser kesayetên navdar ên dîrokî û navên pêxember û xelîfeyan (Adem, Nûh, Îdrîs, Yûsif, Cercîs, Eyyûb; Yehya, Salîh, Mûsa, Îsa û Ehmed; Calîs, Soqrat, Talîs, Boqrat, û Zulqerneyn; Eflaton, Harûn, Loqman, Dawîd, Silêyman, Fi'rewn û Homan; Çemşîd, Rustem, Qeyser, Hatem, Asef, Xatem û hwd.) li ser navên şînahî û çîçekan (belçim, sunbul, ruhan û sorgul û hwd.) li ser navên alavên muzîkê (çeng, saz, tembûr, tiraş û kun û hwd.) û hwd. Ev babet dikare were domandin; lê belê ya balkêş, tenasubên Feqî; gelemperî neyînî û hestewar in. Jixwe ev gewşîn ne dûrî siruştê hestewar a Feqî ye.

2.7. Tewrîye:

Wateya wê ya ferhengî, “daxwazên xwe veşartin”¹⁸⁰ e. Pênaseya wê ya wêjeyî jî ev e: Heke gotin, hevok an jî risteyeke ku du wate û zêdetir wateyan bide nîşandan û di şûna ya nêzîk de ji bo sergirtin û poşandinê wateya dûr bê armanckirin ew tewrîye ye.¹⁸¹ Bi gotineke din cîyê ku agahîyek hatibe veşartin û di şûna wê de agahî yan jî gotineke din hatibe pêşvederxistin, di wir de tewrîye derdikeve holê.

Di ciwankariya tewrîyeyê de bi wateya nêz a peyvê ya dûr tê veşartin û kesên ku muxatabê peyvê dibin serê pêşî wateya wê ya nêzîk fêhm dîke û dîsa divê neyê jîbîrkirin di tewrîyeyê de her du wateyên peyvê jî pêwîst e werin nasîn û bikaranîn.¹⁸²

Ev ciwankarî nîşaneya asta şahrezatî û zanatîya helbestkarekî ye. Ji bo ku

¹⁸⁰ Ferit Devellioğlu, h.b., r. 1103

¹⁸¹ M.Ehmedê Zivingî, h.b., C. 1., r. 49

¹⁸² M. A. Yekta Saraç, *Klasik Edebiyat Bilgisi, Belagat*, r. 207

helbestkarek bikaribe tewrîyeyê bi kar bîne pêwîst e xwedîyê feraseteke kûr be. Ji bo ku wateya dûr an jî ya veşartî ji aliyê xwînerêkî zîrek ve were dîtîn bi gelemperî divê delîlek an jî nîşaneyek hebe û jixwe bi xêra vê delîlê wateya dûr a peyvê tê kifşkirin ¹⁸³; lê belê rêzika hebûna nîşane yan jî delîlekê her dem nayê cî; anku ev taybetî ne pîvaneke teqez û jêneger e.

Di tewrîyeyê de wateyên peyvê, çi nêzwate û çi dûrwate, wateyên xwe yên rastî parastine û divê ku mirov vana bi wateyên mecazî re tevlihev neke; anku di ciwankarîya tewrîyeyê de wateya mecazî tune ye. Me di mijara kînayeyê de jî behs kiribû, heke ji wateyên peyvê yek ji wan mecazî û yek ji wan rastî be û mebest wateya dûr be wê demê ne tewrîye, kînaye derdikeve holê. Divê neyê jibîrkirin ku di tewrîyeyê de bi gelemperî mebest wateya wê ya dûr e û wateyeke wê ya mecazî jî tune ye.

Ji bo ronîkirina mijara tewrîyeyê pêwîst e em li ser çend mînakan rawestîn. Gava were gotin ku: " Tu pir bedew, nazik û şîrîn î; lê ez ne ew Ferhadê pazûbendên wî pola me." Di vê hevokê de peyva "şîrîn"ê serê pêşî wateya "beşîşîn" an jî "xwîngermbûnê" tîne bîra mirovan; lê belê dema bi baldarî em li serê diramin û bi alîkarîya peyva Ferhadî em dibînin ku bi peyva "şîrîn"ê mebest, ew Şîrîna ku di çîroka evînî de yara Ferhad e û ev jî wateya dûr a peyvê ye. Gava em dîsa "Ji bo ku av nehatibû bîra me, ji ber vê gulfidanên baxçeyê xwe me av nedabû." bibêjin peyva "bîrê" tewrîye ava kiriye; lewra wateya nêz a bîrê hafîza yan jî hiş e; lê belê di vir de mebest çal an jî bîra avê ye û ev jî wateya wê ya dûr e. Jixwe delîla wateya dûr ji peyva "avê" ye û du caran hatiye nivîsîn û ji bo mînakeke din: " Tu tiştî neguherîne ger, fetla te; lê dîsa jî tu vegere." di vir de peyva "gerê" tewrîyeyê ava dike; lewre wateya nêz a "gerê" heger / heke " ya mercî ye û wateya dûr jî "ger û fetl" e anku zivîrîn e, jixwe em ji peyva "fetlê" têdigihîjin ku mebest jî ev e.

Ji bo tewrîyeyê her çiqas "îham" an "tehyîl" jî hatibe gotin; lê di vê mijarê de tu lihevkirinek derneketiye holê; lewre hin lêkolîner îhamê mîna ciwankarîyeke cuda dipejirînin.

Her çiqas çend cureyên tewrîyeyê hebin jî em ê nekevîne vê mijarê. Bo nimûne:

¹⁸³ Nevzat Yanîk, *Edebi Bilgiler ve Aruz*, Weş. Fenomen, Ç. yekem, Erzirom 2007, r. 83

“Çerxê di nêv çerxa ez im ruh û rewana min tu yî

Ez hişkedar im narizim xeml û rihana min tu yî

Bêy te neşêm gavek bezim xanim mirada min tu yî”

(Feqîyê Teyran, Ellah Çi Zatek Ehsen e, b. 8., r.106)

Di vê benda ku Feqî pesnê dilbera xwe daye û ji bo ku ew mirada wî ya sereke ye, bê wê gavek jî nameşe û ev dilber adeta bûye gîyana Feqî. Feqî bi baneşana "Xanim!" dixwaze bala dilbera xwe bikşîne û dildarbûna xwe vebêje. Lê belê peyva "xanim"ê bi xwe re du wate afirandine. Wateya yekem û ya pêşî ku tê bîra mirovan "dilbera jin e." Lewre delîlên ku hatine bikaranîn mîna: "ruh û rewana min, xeml û rihana min" dilbera beşerî tîne bîra mirovan; lê belê dema em baldarî li vê sêristê dinêrin dibînin ku wateya duyem û ya hatiye mebestkirin "Xanê min" anku hikûmdar û fermandarê min e û bi gotina fermandar mebest "Xwedê" bixwe ye. Weke ku tê dît in ev her du wateya pe vê jî wateyên rast in. Nexwe peyva "xanim"ê tewrîye ava kiriye.

"Li min da tîrekî dijwar serê tîrê di dil çû xwar

Dema ku ez dikim hawar wekî Mecnûn di deştê da“

(Feqîyê Teyran, Çîya Anî li Deştê kir, m. 5., r.426)

Di vê malikê de evîna Feqî, ka bi çî dijwarî û bêmerhemetîyê bandorî wî kiriye û wî; bi dîmenekê, vê bobelata ku hatiye serê wî gelek xweş vegotîye. Ev vegotin di risteya duyem de bi peyva "Mecnûnî" bi xwe re tewrîye anîye; lewre wateya yekem a peyvê lehengê mîrê ê çîroka evînî ya Leyl û Mecnûn anku Qeys e û ya duyem jî şêtbûn û dîn û harbûn e. Dema mirov li vê malikê tenê dinêre dibîne ku mijara tewrîyeyê anku wateya dûr "dîn û şêtbûn" e; lewre di toreya wêjeya klasîk de tîr hêmaya awirên dilberê ye û dilber jî ji bo ku tîravêjeke dijwar û îsabetkar e, ew ji dilê bengîyê xwe lêdixe, ev bûyer heta vê derê ji bo ku bûyereke razber e ji alîyê kesekî ku ji derve binêre nayê dît in û ji ber vê di encamê de jî hawar û gazîyên ku tîne kirin, li gor kesên ku ji derve lê dinêrin, bê sedem in û kesekî ji nişka ve bê sedem hawar û gazîyan kiribin nexwe karê dînan anku mecnûnan kiriye. Jixwe kesên bi vî derdî ketibin, ji ber jana dilê xwe çîya û deşt jixwe re weke wargeh dîtine. Ev wate, wateya veşartî û ya dûr e; lê belê ya

berbiçav û ya pêşî tê bîra mirovan "Mecnûnê Leylayê" ye, Feqî bi wateya pêşî û ya berbiçav, wateya dûr anku dînîtiyê xweş veşartiye.

“Xergeh bi min hîcab e star dikit cemalê

Ewrê reş û nîqab e nedî dikit hîlalê

Perwane lew b’ezab e mehbûb e ji şemalê”

(Feqîyê Teyran, Feqî û Mela, r.175)

Peyva “hîcab”ê tewrîye ava kiriye: wateya yekem a peyvê “fedîkirin” û ya duyem jî “nixwimandin û veşartin” e. Mebest di vir de nixwimandin û veşartin e; lewre delîlên nixwimandinê peyvên mîna “star, nîqab û nedîtîkirin” e. Weke ku em dibînin çawa ku di mînakên din de her du wateyên peyvê rast bin di vê mînakê de jî heman bûyera wateya peyvê ava bûye.

Ev ciwankariya ku zîrektiya helbestkarekî nîşan dide di dîwana Feqî de li gor ciwankariyên mîna tecahula ‘arif, husn û ta’lîl û hwd. gelectir hatiye bikaranîn. Weke ku tê zanîn tewrîye ji hêla çêja wêjeyî ve ciwankariyeke gelek xwedî xatir e û Feqî jî bi xêra zanîna xwe û civandina hin peyvan bibîrxistinên gelek xweş afirandine; lê mixabin di hin malikên wî de hin peyv tewrîyeyê ava bikin jî ji bo ku di malika li pey wê re hatiye ristîn, derbarê wateya peyva ku tewrîye ava kiriye de agahiyên zelal daye û nehiştiye kesên ku muxatabê vê peyva ku mijara tewrîyeyê bûye bîstekê li serê birame û li serê şîrove bike da ku bigihîje wê çêja edebî û vê taybetiyê jî kêmasiyek xistiye mînakên ciwankariya tewrîyeyên wî. Ji bo ku ev xal baştir were fêmkirin em bi mînakekê, wê zelaltir bikin:

"Eya xelqê kerr û gîr e ne ya can e ne ya pîr e

Qebûl nakim ji wî mîre vî Adem ra nebû ware “

(Feqîyê Teyran, Dilo Rabe, m. 48., r.224)

Feqî di vê malika xwe ya şîretbar de derheqê demdemîbûna cîhanê de boçûnên xwe radigihîne di risteya duyem de bi peyva "adem" tewrîyeyek ava kiriye. Lewre peyva Adem tê du wateyê: "Pêxember û zilamê yekem, anku Hz. Adem" û “tunebûn” e.

Naxwe li gor risteya duyem du şîrove derdikevin holê, yan em ê bibêjin : "Ev tunebûn ji tu kesî re nebû wargeh an jî "Ev denîdinya ji Hz. Adem re jî nebû wargeh."; lê belê dema em dixwazin qasekî li ser vê malikê rawestin û li ser wateya nêz û dûr a peyva Adem biramin. Feqî vê fersendê ji destê me bi malika ku li pey malika jorîn tê derdixe:

“Ne Adem ma ne Şîs ma ne Nûh ma ne Îdrîs ma

Ne Yûsif ma ne Cercis ma ne Eyyûbê birîndar e ”

(Feqîyê Teyran, Dilo Rabe, m. 49., r.224)

û bi vê malikê tê fêmkirin ku di malika yekem de bi peyva "Adem" mebest Hz. Adem e û ev jî ji hêla çêja wêjeyî ve li gor me qîmeta vê mînakê dadixe û bi vî rengî mînakine din jî hene; lê nayê wê wateyê ku Feqî di ciwankariya tewrîyeyê de ne serkeftî ye.

2.8. Îstifham:

Ji alîyê wateya ferhengî ve îstifham: "pirskirin", "têgihîştin" û “ji bo têgihîştin û hînbûnê pirsîn”¹⁸⁴ e; lê belê weke ciwankarî di îstifhamê de mebest ne bersivgirtin e; lewre helbestkar pirsî ku di menzûme û helbestên xwe de dike, bersiva wan dizane û tu bersivê naxwaze.

Di îstifhamê de armanca sereke ya helbestkarekî, balkişandina ser hestekê yan jî perçînkirina wateya peyama ku dixwaze were dayîn e. Ev bi xwe re carinan tekrîrê jî tîne¹⁸⁵. Ciwankariya îstifhamê, bi rêya pirsan hem balkêşî û hem jî çêjeke xweş dide helbest û menzûmeyan û jixwe ew, bi bandora behitîn, şaşwazîbûn, xemgînî û hwd. derdikeve holê.

Îstifham, carinan bi ciwankariya tecahulê ‘arifin re tê tevlihevkirin û heta carinan jî mîna hev tînin¹⁸⁶. Di navbera îstifham û tecahulê arifê de cudahîyeke biçûk heye: Di tecahulê arif de rastîya ku ji nezanîyê ve tê dîtin bi awayekî nepen tê hîskirin; lê di îstifhamê de tiştekî wisa tune ye¹⁸⁷. Ji bo ku tecahulê arif bi gelemperî bi pirsan çêdibe ev tevlihevî derdikeve holê. Ji bo çend nimûneyan: "Kanîn ew kesên xame

¹⁸⁴ Ferit Devellioğlu, h.b., r. 455

¹⁸⁵ Cem Dilçin, h.h. r. 456

¹⁸⁶ M. A. Yekta Saraç, *Klasik Edebiyat Bilgisi, Belagat*, r. 227

¹⁸⁷ Cem Dilçin, h.b., r. 456

û xwendinhez; kanîn, li ku ne wan kesên ku di hewşa Medreseya Sor û Mîr Hesenê Welî de emrê xwe terxan kirine?", " Ax! Kî ye raborî û dahatûya me dizane û ew kî ye lawe û daxwazên me dibihîze?" û hwd. Di mînaka yekem de hesta bêrîkirinê bi rêya îstifhamê hatiye vegotin û di ya duyem de jî heyranîtiyek bi rêya pirsan hatiye ser ziman.

Her çiqas me derheqê cudabûna tecahulê arif û îstifhamê de hin agahî dabûn jî li ser vê mijarê tu lihevkiyane derneketiye holê, dema hizrên kesên ku serê xwe li ser vê mijara navborî eşandine (Yekta Saraç, Cem Dilçin, Î. Pala û hwd.) berawird dikin em dibînin ku ev mijar bi rastî jî mijareke herbilî û girêft e. Li gor hizra me îstifham, nêzîkbûneke cuda ya tecahula arif ; bi gotineke din, îstifham her çiqas di nava tecahula arif de cîyê xwe girtibe jî di dema ew tene peyîtandin pêwîst e li gor du rêyên cuda werine şopandin, lewre ne tecahula arif îstifham e û ne jî îstifham tecahulê arif e, lê belê her du jî di nava hevûdin de ne. Jixwe em vê peyîtandinê hem mînakên ku li jorê hatine dayîn û hem jî ji mînakên pirtûkên ku li ser vê mijarê hatine nivîsîn jî dibînin. Dikare were gotin ku cîyê îstifham tê de heye bi gumaneke mezin e ku tecahulê arif jî li wir peyda bûye; lê belê ji bo ku hin îstifham li ser înkârî (mandelekirin) û îqrariyê (pêjirandin) ava bûne tecahulê arif peyda nabin; lewre di înkârî û îqrariyê de her çiqas pirs hebin li beramberê wê bersiv jî kifş in. Gava em bibêjin: "Ma tu dikarî pêşîya demê bigrî û salên borî bi paş ve vegebin?" di vir de îstifham heye; lê tecahulê arif peyda nebûye; lewre di darazên vê mînakê de pejirandin anku bersiva "Na"yê heye û belê e. Ji bilî van, carinan berevajîya vê nêzîkayîyê dikare derkeve holê; anku cîyê ku tecahulê arif heye ne pêwîst e îstifham jî li wir hebe. Bo nimûne:

"Serxweşê ava heyatê meclîsa reqs û sema tê

Dê çikim b'sewm û selatê bi kûzê û fincan im ez "

(Feqîyê Teyran, Îro ji Dest Husna Hebîb, m. 31., r.136)

Di vê malika mişt tesewif de ew, piştî ku ava heyatê vedixwe dikeve nava nemiran û bi vê vexwarinê serxweş dibe û li meclîsa dilbera xwe dikeve rewşa cizbeyê û xwe ji nimêj(selat) û rojîyê(sewm) dişo, adeta van îbadetan bê minet dike, vê kêfxweşîya xwe pirs "Dê çikim b'sewm û selatê ?" tîne ziman. Weke ku tê dîtin Feqî, bi vê pirsê xwe bersivek ji me naxwaze; lê bi vê pirsê dixwaze bala me bikşîne û

kêfxweşîya ku tê de ye ji me re vedibêje.

"Dilo borîn ji Nîsanê hewayê wan mehan kanê

Bûye Eylûl li rozanê ne kanî man ne cobar e"

(Feqîyê Teyran, Dilo Rabe, m. 26., r.214)

Çûyîna demsala biharê wisa bi xwe re bêrikirinek, hatina payîzê (eylûl) jî xemgînîyek anîye û vê jî bandorî li ser gîyanê Feqî kiriye û bi pîrsa: "Hewayê wan mehan kanê ?" wî xwestiye ku vê kovan û bêrikirinê bîne ziman. Bi vê, atmofsereke heyf û mixabinî ava kiriye, bi baneşana "dilo" jî ev rewşa hestewar asteke din bilindtir kiriye.

"Ji sewdayê wekî dîn im li ser eqlê xwe namînim

Ebû Sîna ji kû bînim li mehcûran bikit rayê "

(Feqîyê Teyran, Qewî Îro Ze'îfhal im, m. 3., r. 421)

Rewşa xwe ya qambax a ji destê evînê kişandî re adeta dermanek digere Feqî, bêçarebûna sewdayê* jî bi pîrsa "Ebû Sîna ji ku bînim?" vedibêje. Ya balkêş di vê malikê de Feqî nabêje Îbn-î Sîna anku kurê Sîna, dibêje bavê Sîna; bi vî awayî mubalexeyeke sergirtî dike; lewre payebilindbûna nûjdarekî nîşaneyê zêdebûna pileya nexweşîyê ye jî. Xulasa şaşwazbûn û neçarbûna xwe wî, di risteya duyem de bi xêra îsifhamê vegotiye.

"Şev û roj bo kê dinalim yan gelo bo kê dikalim

Mubtelayê çavxezal im heyf wê yara şefîq "

(Feqîyê Teyran, Ordeka Ava Cizîrê, m. 7., r. 454)

Dîsa Feqî bi pîrsên "Şev û roj bo kê dinalim ?", "Yan gelo bo kê dikalim?" bala me xwestiye bikişîne li ser nalîn û kalîna ku di rêya çavxezala xwe de dikîşîne û bi me, gihiştîye miraza xwe.

***Sewda:** Ji hezkirina di asta nexweşîyê de jê re sewda tê gotin. (Ferit Devellioğlu, hb., r.946) Feqî jî ev peyv di gelek cîyan de bi kar anîye.

Di kurdî de her çiqas daçekên pirsyarîyê tune bin jî wateya pirsê ya hevokê bi rêya cînavkên pirsyarîyê (kî, kê, çi, çend û hwd.) hevalnav (çawa, kîjan, çend û hwd.) û hokerên pirsyarîyê (ji ku, çawa, bi ku ve û hwd.)¹⁸⁸ û bi kirpandinê tê bidestxistin. Di dîwana Feqî de jî peyvên ku wateya pirsan dane risteyan bi giştî: "yan yan, ma, heta kengê, kê, ji kê ra, çi bikit, dê çikim, kanê, ji ku, kî û hwd." in; lê belê van tevan ciwankarîya îstifhamê ava nekirine. Nemaze di menzûmeyên wî yên "Feqe û Bilbil " û "Ey Av û Av" de, her çiqas ev tiştekî derasayî û nîgaşî be jî û jixwe derasayîbûna wê ji teşxîs û întaqê tê. Ew ji avê û bilbilî gelek pirsan dike; lê belê di van menzûmeyan de jî dîsa îstifham ava nebûye; lewre me li jor jî cî dabûyê, di îstifhamê de mebest ne bersiv sitandinek e, mebesta sereke: Bi rêya vegotîneke bibandor ku ev jî bi pirsan tê çêkirin balkişandina xwîneran e. Jixwe ev jî bi xêra şaşwazî, behitîn, xemgînî, heyrantî û hwd çêdibe; em jî di vê babetê de li pey vê şopê ketine.

2.9.Nîda:

Ev peyva erebî tê wateya "gazîkirin, bankirin, qêrîn û denglêkirinê"¹⁸⁹ di kurdî de jî beramberê "bang, baneşan û bangnîşan"¹⁹⁰ e. Baneşan; anku nîda, nîşaneyê hestîyarbûna helbestkarekî ye û di baneşanê de hestên mîna şaşwazbûn, hêrsbûn, bextewarbûn û hwd. derdikeve holê.

Dikare were gotin ku baneşan berzkirina deng e; ev ciwankarî carinan bi xwe re teşxîs anku kesandinê jî dikare biafirîne.

Bo nimûne:

“Bêy te miradek meyt im qelbim ji sur mîr’ate ye

Ez kuştîyê natebitim fexra qulûban te heye

Xelqno! Bi furqan û xetîm her çi dibêjim her we ye ”

(Feqîyê Teyran, Ellah Çi Zatek Ehsen e, b. 9., r.106)

Di vê sêristê de di risteya sêyem de bi peyva "Xelqno!" baneşan ava bûye.

¹⁸⁸ Samî Tan, *Rêzimana Kurmancî, Weş.* Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Stenbol 2011, nr. 154, 186, 175

¹⁸⁹ Ferit Devellioğlu, h.b., r. 833

¹⁹⁰ D. İzolî, h.b., r. 901

“Ey felekê bê wefa yê te çira muhlet nedayê

Yar di nêv axê gihayê ey felekê bê mirwetê “

(Feqîyê Teyran, Îro Girya Me Tê, m. 8., r.141)

Feqî, di vê malika ku ji feleka bêwefa û bêmirwet gazinda dike, adeta dengê xwe bilind kiriye û bi peyva “Ey!”ê bangî felekê kiriye û xem û kula xwe xwestiye bîne ziman. Ji bo ku peyva “Ey felekê!” du caran hatiye dubarekirin asta gazinda ji felekê dike zexmtir bûye!”

“Dilo rabe dilo rabe veke çavan ku êvar e

Nezan û bes di xew da be bi newmê ra mebe yare”

(Feqîyê Teyran, Dilo Rabe, m. 1., r.203)

Bi baneşana “dilo rabe!” wî xwe ji dilê xwe veder kiriye û ji dûr ve şîreta demdemîbûna jîyanê xwestiye li dilê xwe bike. Bi dubarekirina “Dilo rabe!”, “dilo rabe” jî peyama ku xwestiye bide hatiye kirpandin

“Eya xelqê kerr û gîr e ne ya can e ne ya pîr e

Qebûl nakim ji wî mîre vî Adem ra nebû ware”

(Feqîyê Teyran, Dilo Rabe, m. 48., r.224)

Peyva “Eya!”yê di vê malikê de nîda ava kiriye. Feqî xwestiye bangî kesên nezan û asî bike.

“Xwedawenda tu yî me’bûd du’ayê min nekî merdûd

Şefî’e min bikî Mehmûd seqîl bin xêr di mîzanê “

(Feqîyê Teyran, Îlahî ‘Ebdukel Atak, m. 24., r.433)

Feqî lave û daxwazîyen xwe ji Xwedê dike û dema vê bi cî tîne dengê xwe berztir dike û baneşana “Xwedawenda!” derketiye holê.

“Ava mezin fir fir meke zikrê bike fexrê meke

Ehlê Xwefê aciz meke bes e bide min ezyetê”

(Feqîyê Teyran, Ey Av û Av, m. 49., r. 125)

Di vê malikê de ji bo avakirina baneşanê ne qertaf û ne jî peyvek hatiye bikaranîn; lê belê di risteya yekem de em têdigihîjin ku bi awayekî nepen bangî avê hatiye kirin anku “Ey!”eke veşartî tê hîskirin û dema ev malik were şîrovekirin bi awayê:”Ey ava mezin, fîrfîr meke!”tê destpêkirin. Ji bilî vê ji bo ku Feqî bangî avê kiriye “Ava mezin” hatiye kesandin .

“Li meydanê wekî go me bi derba kaşoyî çome,

Gelî xelqa mekin lome ji derheq wê delalê da”

(Feqîyê Teyran, Ji Eşqê Te Ezî Dîn im m. 8., r.480)

“Gelî xelqa!” di vir de baneşan e.

Feqî, di menzûmeyên xwe de carinan bangî: avê, carinan dilbera xwe û carinan jî bangî dilê xwe yê ji destê evînê şewitîye dike. Di hin baneşanên wî de tekrîren mîna: “Ey Mîm û Hê, ey Mîm û Hê!”, “Eya Rebbî, eya Rebbî!”, “Ey av û av, Ey av û av !” û hwd. ava bûne û dîsa di hin cîyan de jî bi xwe re kesandin anîne. Bi qasî ku hatiye peytandin baneşanên wî carinan bi qertefa “a”yê, ku di wêjeya klasik de gelek caran hatiye emilandin, ev qertaf jî tê dawîya peyvê û wateya baneşanê lê bar dike û carinan jî bi qertefa “o” yê ku ew jî qertefa baneşanê ya nêr û yekjimar e, pêk tên. Ji bilî qertaf û peyvên baneşanê di hin manzûmeyên wî de wateya baneşanê ji risteyan tên hîskirin. Bi qasî me peytandiyê berê tîrên nîdayên wî herî zêde ber bi dilê wî û bi Xwedayê wî ve ye; anku ji aliyê hejmarê ve baneşanên wî zêdetir li ser dil û Xwedê ava bûne; lewre kana hestan dil e, dema ew şîretan li xwe anku li dilê xwe dike û yan jî lave û xwestekên xwe dema ji Xwedê dike dengê xwe bi berztir derdixe û baneşanê ava dike.

Baneşanên sereke yên ku di manzûme û helbestên wî de hatine bikaranîn ev in: “Xelqno!”, “Ey!”, “Wey!”, “Dilo!”, “Eya!”, “Eya xûlo!”, “Xwedawenda!”, “Îlahî!”, “Eya Rebbî!”, “Ey dil hilo!”, “Xwedaya!”, “Ya Reb!”, “Gelî xelqa!” û hwd.

2.10. Telmîh:

Wateya wê ya ferhengî tiştêkî ne rasterast; lê awayê bi îma gotin¹⁹¹ e. Di wêjeya klasîk de bi gotin yan jî hevokeke kurt destnîşandana bûyereke dîrokî yan jî serpêhatîyeke navdar re "telmîh" tê gotin¹⁹². Di ciwankariya telmîhê de bi xêra bikaranîna hin bêjeyan helbestkar, bûyereke ku di raborîyê de hatiye jîyîn bi bîra me dixê ji ber vê di telmîhê de "bibîrxistin"ek derdikeve holê.

Di telmîhan de mijara rûdanan; menqîbe, mucîzeyên pêxemberan, efsane, ayetên pîroz, evînên navdar û hwd. dikarin bibin û dîsa mijara telmîhê divê bûyereke navdar be û ji aliyê gelek kesan ve were zanîn. Di bikaranîna telmîhê de mebesta helbestkar ew e ku meseleyeke dûvedirêj bi du sê peyvan ji xwîneran re vebêje¹⁹³ yan jî du sê peyvan bûyereke ku di raborîyê de qewimîye bi tevahî bi bîra mirovan bixe.

Ji bo peytandina vê ciwankariyê pirsên: "Kîjan bûyer, bi kîjan peyvan hatiye bibîrxistin?" were kirin karê xwîner û lêkolîneran ê hêsantir bike. Ji bilî vê ji bo ku telmîh were fêmkirin û peytandin divê xwîner xwedîyê zanîneke kûr be; lewre kesê ku ev ciwankarî di menzûme û helbestên xwe de bi kar anîye asta agahî û behremendîya xwe nîşan daye, pişka peytandina van jî ji xwîner û lêkolîneran re maye.

Ciwankariya telmîhê, ew kesên ku metnan şîrove dikin di hişê wan de hest û boçûnên nû ava dike, ji ber vê ev ciwankarî rêbaza vegotîneke kûr û tîr e jî.¹⁹⁴

Di wêjeya klasîk de ciwankariya telmîhê gelek hatiye bikaranîn û gelek hêja ye.¹⁹⁵ Ji bo ku ev mijar baştir were fêmkirin divê em çend mînakên ji dîrok û wêjeya kurdî bidin: Di menzûme yan jî helbestekê de bêjeyên mîna "Xanê Çengzêrîn" û "Keleh" derbas bibe şerê Keleha Dimdim bi bîra me dixê yan jî dema "Memê Alan", "Zîndan", "Jankêşî" û hwd. derbas bibe evîna navdar a "Mem û Zînê"; "Edûlê", "Eşîra Millî" û "Mêrxasî" evîna Edûlê û Derwêşê Evdî bi bîra me dixê. Bo nimûne:

“Horîya Rehman tu yî mohra sultan tu yî

Îsayê zeman tu yî min dike derman tu yî

¹⁹¹ Ferit Devellioğlu, h.b., r. 1071

¹⁹² M. Ehmedê Zivingî, h.b., C. 1., r. 47

¹⁹³ İskender Pala, *Divan Edebiyatı*, r. 153

¹⁹⁴ M. A. Yekta Saraç, *Klasik Edebiyat Bilgisi*, Belagat, r. 282

¹⁹⁵ M. Emin Bozarlan, h.b., r. 84

Ê ez di ferman tu yî Hekîmê Loqman tu yî “

(Feqîyê Teyran, Bizan Min Yar Tu, b.7., r.444)

Ew, di vê sêristê de bi rêya şibandina mîna "horîya rehman", "Mohra sultan", "Îsayê zeman" û "Hekîmê Loqman" pesnê dilbera xwe daye lê li beramberê vê xwe weke nexweş û bendeyê wê nîşan daye. Di vê sêristê de çend bibîrxistin derketine holê û bi rêya wan metaforan rewşa xwe ya tê de nîşan daye. Feqî, bi rêya peyvên mîna "mohr", "Îsa" û "derman" ew mucîzeyaya ku Hz. Îsa nexweş sax dikirin¹⁹⁶ bi bîra me dixwe, heta bi peyva "mohrê" ev bawerî hinek din piştrasttir û xurttir dike; lewre li gor wêjeya klasîk lêv û devên dilberê mîna mohrê tîpên pêjirandin¹⁹⁷ û lêvên dilberê ji alîyê canbexşandinê ve dişibe Hz. Îsa¹⁹⁸. Li ser mijara dermankirin û çakkirinê jî dîsa li ser Hekîmê Loqman bibîrxistineke din derketiye holê; lewre Hekîmê Loqman hem di nava gel de û hem jî di wêjeya klasîk de weke pîr û dawera hekîmtîyê tê nasîn. Weke ku tê dîtîn Feqî, bi rêya şibandin û bibîrxistinên xweş tîkîlîya xwe û dilberê li ber çavan raxistiye.

"Cema kin tê alemê hemîyan bi ustad kin

Herfek j'lewhê qîdemê bînin b'şerh û sewad kin

Nayêne ber qelemê behran ew bi medad kin”

(Feqîyê Teyran, Feqî û Mela, r.198)

Hemû alemê bînin ba hevûdin û bicivînin û di ser de jî wan hemûyan ustad bikin, ew kesên ku civîyane, tîpek ji "lewhê qîdemê" bila bînin û li ser wê tîpê şîrove bikin û nivîsan binivîsin; lê hemû derya ji hibrê bin jî ji bo nivîsîn û şîroveya wê tîpê têr nake û nayê ber qelemê. Di vir de bi "lewhê" mebest Kîtaba Mûbîn e anku ew Qur'ana ku her tiştî zelal dike û tiştên veşartî ji holê radike û qîdem jî di erebî de tê wateya

¹⁹⁶(Xwedê Te'ala, dê wî) îsraîlîyan bi pêxemberî bişîne (û ew ê ji wan re wiha bibêje:) Min ji cem Xwedayê we ji bo we mucîzeyek anîye; ez ji bo we ji herîyê şiklê teyran çêdikim û ez pif dikimê, vêca bi destûra Xwedê ew dibe teyr. Dîsa bi destûra Xwedê ez kor û kotîyan rehet dikim û mirîyan jî sax dikim. Ez, tiştên ku hûn malên xwe dixwin û hiltînin (pê dizanim û ez ê) ji we re jê xeber bidim. Eger bi rastî hûn bawermend bin, di vê rewşê de ji bo we îbret hene. (*Wergera Qur'ana Pîroz Bi Zimanê Kurdî*, Sûreya Alî İmran, Ayeta 49., r. 578)

¹⁹⁷ İ. Pala *Ansiklopedik Divan Şiiri Sözlüğü*, r. 339

¹⁹⁸ İ. Pala *Ansiklopedik Divan Şiiri Sözlüğü*, r. 236

kevintîyê; Naxwe jêderka tîpa ku tu şîrove û nivîs têra wê nakin Qur'ana Pîroz e. Dema em vê sêristê dixwînin ayeta pîroz ku: "Eger bi rastî çiqas darên li erdê hene pênûs (qelem) bin derya û bi qasî wê heft deryayên din jî hibra wan bin (vêca gotinên Xwedê bi wan binivîsin) gotinên Xwedê dê xelas ne nebin. Bêguman Xwedê ezîz e, hekîm e."¹⁹⁹ bi bîra me dixê. Ji bo telmîheke bi çêj û serkeftî pêwîst e bûyer ne tam veşartî û ne jî tam zelal bin, li gor me ev mînak li vê dîtin û boçûnê tê.

“Cînan avêt û wînda bû li bin behrek mezin dabû

Siyahê bextê min da bû ji Belqîsê cewab nayê “

(Feqîyê Teyran, Qewî Îro Ze'îf Halim, m. 6., r. 422)

Di vê malika ku jê bêsiûdî û reşbînîyek tê xwendin, Feqî bêtî ku navê Silêyman Pêxember bi kar bîne. Di risteya yekem û ya duyem de ew çîroka tê gotin ku cin an jî dêwek gustîla Silêyman Pêxember a ku bi wê gustîlkê hem ajalên hov û hem jî balinde dixistine bin nîrê xwe de bi dest dixê û ji bo ew gustîlk careke din nekeve destê Silêyman Pêxember, wê diavêje nava deryayeke mezin* bi bîra me dixê.

Di risteya duyem de bi gotina "ji Belqîsê cewab nayê" çîroka ku dema Silêyman Pêxember; balindeyê Hûdhûdî ji bo ku Şahbanûya Sabayê ya ku dihebîne, bîne ser dîne xwe dişîne pey wê û Silêyman Pêxember ji bo bersivdayîna Şahbanûyê

¹⁹⁹ *Wergera Qur'ana Pîroz Bi Zimanê Kurdî, Sûreya Luqman, Ayeta 27., r. 414*

*Tê gotin ku gustîleke Silêyman Pêxember hebû û bi xêra wê gustîlê ajalên hov û dirinde jê re serî ditewandin. Silêyman Pêxember ev gustîlk tenê dema diçû daşîrê ji tilîya xwe derdixist û yan dida xanima xwe yan jî dida wezîrê xwe yê bi navê Asaf. Dîsa rojekê gustîla xwe emanetî xanima xwe dike. Silêyman Pêxember, dema li derve ye cinêk dikeve şîklê wî û wê gustîlê ji xanima wî gidire. Piştî demekê Silêyman Pêxember tê û gustîlê ji xanima xwe dixwaze; lê xanima wî û kesên di bin destên wî de ne, ew weke sextekarekî tawanbar dikin û wî ji qesrê diqewirînin. Ew dêwê ku gustîla wî bi dest xistibû diçe li cîyê wî rûdine. Di vê demê de Silêyman Pêxember jî diçe bajarekî peravê û bi dest xebatê dike. Dêw jî ji bo ku gustîlk careke din nekeve destê Silêyman Pêxember wê tavêje deryayê. Ji rojekê rojan Silêyman Pêxember, ji bo hilgirtina masîyan alîkarî dide masîvanekî, masîvan jî ji bo vê suxreya wî di şûna pereyan de masîyekî mezin dide wî. Silêyman Pêxember; êvarê ji bo xwarina masî zîkê masî diqelêşe, di wê demê de gustîla xwe ya windabûyî di zîkê masî de dibîne. Tu nabêjî ku ew gustîlka ketiye binê deryayê bi destûra Xwedê ji alîyê masîyekî ve hatiye daqurtandin û bi vî awayî careke din ew gustîl ketiye destê xwedîyê xwe. (Î. Pala *Ansiklopedîk Divan Şiiri Sözlüğü*, nr. 411-412 digel guhertinên biçûk)

demekê li benda Hûdhûdî disekine** bi bîra me dixê. Ya balkêş ew e ku di dawîya van çîrokên de Silêyman Pêxember encameke xweş bi dest dixê; lê belê dibe ku Feqî, ji bo bêsiûdîya ku aramîya wî ji destê wî standiye baştir bide nîşandan ji serê van çîrokên sût werhirtibe; lê belê sedema bikaranîna van risteyan çî bibe bila bibe, bi me di vê mînakê de du telmîhên xweş ava kirine.

"Çavriyê sîrra li pêş im meqseda ez lê viyêşim

Hîcreta Yûsif dikêşim Ye'qûbê Ken'an im ez "

(Feqîyê Teyran, Îro ji Dest Husna Hebîb, m.20., r. 132)

Li gor mînakên din di vê malikê de bibîrxistineke berbiçav û beloqtir heye. Feqî, bendewar û çavriyê hebîbê xwe ye, ji ber vê cudabûnê ew jan û qehrên ku dikêşine baştir nîşan bide bi navbeynkarîya çîrokeke ku di nava gel de mîna dawera cudabûn, sebr û semaxê hatiye nasîn vegotiye; ev çîrok jî çîroka/qiseya Ye'qûb û Yûsif Pêxember e. Feqî, bi hevokên "Hîcreta Yûsif dikêşim" û "Ye'qûbê Ken'an im ez" çîroka ku di Qur'ana Pîroz de jî wisa derbas dibe: "Wan xwîneke ji derewan li kirasê(gomlekê) Yûsif dan û wan ew anî cem bavê xwe. (Ye'qûb ji wan re) Got: Nexêr ne wisan e, belkî nefsa we karekî xerab ji bo we xemilandiye. Vêca sebrê min dê sebreke rind be û li ser vê ya hûn dibêjin bes ez jî arîkarîyê ji Xweda dixwazim."²⁰⁰ û dîsa "(Ye'qûb) berê xwe ji wan vegehand, keserek kişand û got : 'Ax ji bo kul û kovanên Yûsif!' Ji ber xema(Yûsif) spîk avête ser her du çavên wî(êdî pê nedidît), vêca kerba xwe di dilê xwe de dihişt."²⁰¹ bi bîra me dixê. Weke ku tê dîtin wî xwe ji hêla sebrê ve şibandîye Ye'qûb Pêxember û di berdewamîya vê menzûmeyê de jî tê fêmkirin ku Feqî ji vê rewşê ne gilîdar e, berevajîya vê pê şanaz e; lewre di wêjeya klasîk de dildar di rêya dilbera xwe de çiqas jar be û derdan bikişîne ev nîşaneyên dilsozî û bendewarîya dildarekî ye.

"Her çî kir ya kuftarî kir li şêx hukmê xwe carî kir

Ku mey dayê xumarî kir li pey wehşa çî rengxweş tê "

** Şahbanûya Sebayê, li ser vexwendina Silêyman Pêxember a ku dixwest Melîkeyê dînê xwe biguherîne, wê piştî bi wezîrê xwe re şewirê dike daxwazîya Silêyman Pêxember dipejirîne û biryara xwe ya erênî bi navbeynkarîya Hûdhûdî radigihîne Silêyman Pêxember.

²⁰⁰ *Wergera Qur'ana Pîroz Bi Zimanê Kurdî*, Sûreya Yûsif, Ayeta 18., r. 238

²⁰¹ *Wergera Qur'ana Pîroz Bi Zimanê Kurdî*, Sûreya Luqman, Ayeta 84., r. 246

(Feqîyê Teyran, Ji 'Işqê Sotîme Welleh, m.10., r.436)

Feqîyê Teyran, bi peyvên mîna "kuftarî", "şêx", "mey dayê", "xumarî" û "wehş" çîroka Şêxê Sen'anî û keça Xaçperest tîne bîra me. Ev çîroka ku behsa merhaleyên kamilbûna şêxekî dike ji aliyê gelek neteweyên Mislîman ve hatiye nivîsîn; lewre nivîsîna vê çîroka tesewifî di nav çanda tesewifê de mîna kevneşopîyekê hatiye dîtîn û Feqî jî xwe ji vê pişkê dûr nexistîye. Wî qîma xwe tenê bi ciwankariya telmîhê neanîye, weke ku tê zanîn li ser vê mijarê berhemeke serbixwe jî nivîsîye.

"Ê bişewq û halê ez im daim dinalê ez im

Zarzar dikalê ez im Harût di çalê ez im

Dûr ji wîsalê ez im yar di xiyalê ez im "

(Feqîyê Teyran, Bizan Ku Min Yar Tu, b. 4., r. 444)

Di vê sêristê de jî Feqî rewşa xwe ya evînî ya janbar û bi zarezar baştir bide fêmkirin bi rêya peyvên mîna "Harût" û "Çalê" çîroka Harût û Marût* ku mirov hînî sêhrê kirine û pê re jî bêemrîya Xwedê kirine û ji rê derketine. Ji ber van bûyeran Xwedê jî xwestiye ceza bide van her du ferîşteyan û wan bi serberjêr xistiye çalekê, tîne bîra mirovan. Ev çîroka ku me behsa wê kiriye ji îsraîliyâtê hatiye girtin; lewre di Qur'ana Pîroz de ev çîrok bi vî rengî derbas nabe û di wir de behsa çaleke tije agir jî nake²⁰². Lê dema em ji hêla ciwankariyê ve dinêrin ji bo şayeskirina rewşa ne baş a

* Li ser çîroka Harût û Marût ji îsraîliyâtê gelek gotegot hatine gotin; lê ya herî nevdar bi kurtasî ev e: Harût û Marût du ferîşteyên wisa bûn ku bêemrîya Xwedê kiribûn anku xelk hînî sêrê kiribûn û ji rê derketibûn. Piştî van kirinên wan ên neyînî, Xwedê xwest ku ceza bide wan her du ferîşteyan. Ew jî çûn cem Îdrîs Pêxember û jê şefe'et xwestin. Xwedê jî ew di navbera tercîha ezabê axiret û dinyayê de hiştin, wan jî ji ber hizra axiret ebedî û dinya fanî ye, ezabê dinyayê xwestin. Wê demê, ew di Babilê de di nava çaleke ku nava wê tiji agir e bi awayekî serberjêr hatine daleqandin û heta qiyametê dê wisa bimînin... (Î. Pala *Ansiklopedîk Divan Şîiri Sözlüğü*, r. 194 digel guhertinên biçûk)

²⁰² Wan (cihûyan) derbarê hukimdarîya Silêyman de daye dûv tiştê ku şeytanan (di heyama Silêyman Pêxember de) digot. Hal ev e ku Silêyman Pêxember kafir nebûbû sêrbazî nikarîbû û bawerî pê neanîbû, lê belê şeytan kafir bûbûn ku xelk fêrî sêrbazîyê û ya ku li Babilê ji Harût û Marûtî re daketibû, fêrî mirovan dikirin. Hal ev e ku her duyan (Harût û Marût), kes fêrî sêrbazîyê nedikirin heyanî negotine: " Em bi xwe îmtîhan û ceribandî in, êdî fêrî sêrê nebin da hûn kafir nebin, vêca ji her duyan tiştê ku pê jin û mêr ji hev diqetandin fêr dibûn. Ew sêrbaz eger ku bi destûra Xwedê Teala (û teqdîra wî) be nikarin bi tu avayî zerarê bidin xelkê. Ew a ku zîyanê dide wan û bi kêrî wan nayê, fêr dibûn. Bi rastî wan (cihûyan) zanîbû ku kesê (bi ayetê Xweda) sêrbazî kir di axiretê de jê re tu par nîn e. Eger ew bizanîbin; tiştê ku xwe pê firotine çiqas pîs e. (*Wergera Qur'ana Pîroz Bi Zimanê Kurdî*, Sûreya Beqereyê, Ayeta 102., r.17)

keseke, çaleke tije agir û kesekî bi serberjêr tê de daleqandiye bikaranîneke gelek serkeftî û jîrane ye. Jixwe Feqî jî rewşa xwe ya xerab şibandiye rewşa Harût û Marûtê ku serberjêr di bîra agir de ne.

"Beraber bû ji wê navê xwe talan kir ji wê gavê

Xelas ke Mem ji girdavê ji tehrîra bi mer keştê “

(Feqîyê Teyran, Ji ‘Işqê Sotîme Welleh, m. 14., r. 437)

Di vê malikê de Feqî, bi peyvên "Mem", "Agir" û "Girdavê" serpêhatîyên lehengê destana netewî ya kurdan anku Memê Alan²⁰³ bi bîra me dixê û bi awayekî sergirtî xwe şibandiye wî; lê ev jî ne bê sedem e; lewre di destanê de ji ber derew û ewantîya Beko, Memê Alan ji aliyê Mîr Ezîn ve tavêjin zindanê. Di vir de peyva girdavê di şûna zindanê de hatiye bikaranîn û îsti'are ava kiriye; lê belê di wêjeya klasîk de "girdav" tê wateya "bela", "musîbetan" û "tengasî"yê jî ji ber vê Feqî xwe di rêya evînê de mîna Memê Alanê ku ketiye derîyê teng anku ketiye zindanê, dibîne û hawara xwe jî dixwaze bi vî awayî bigihijîne dilbera xwe.

Ya bal kêş ew e ku vegotina vê destana neteweyî bi qasî ku tê zanîn di nava kurdan de gelek kevin e û bi awayekî devkî nifş bi nifş hatiye veguhestin; lê di wêjeya klasîk a kurdîya kurmancî de navê Memê Alan di nava helbestan de cara yekem ji aliyê Cizîrî û Feqîyê Teyran ve hatiye bikaranîn. Ev mînak jî nîşaneyê vê taybetîya Feqîyê Teyran e.

Tiştêkî teqez heye ku Feqîyê Teyran di ciwankariya telmîhê de helbestkarekî pêşpîşe ye; ev taybetmendî, asta ‘ilm û agahîyên wî nîşan dide; lewre ew ne xwende û guhdêrekî baş bûna nikarîbû agahîyên curbicur û bûyerên navdar ên di raborîyê de hatine jîyandin bi bîra me bixista û jixwe rêbaza bibîrxistinê jî bi serê xwe hunerek e. Li gor me Feqî jî ev huner baş bi kar anîye. Jixwe agahîyên di -çi tesewifî çî jî yên din demenzûmeyên xwe de dane, aliyê wî yê xwendetîyê baş nîşan dide. Feqîyê Teyran di dîwana xwe de telmîhên mîna “boçûna afirandina dinyayê”, "hin evînên navdar",

²⁰³ Bnr. Roger Lescot, *Memê Alan*, Weş. Avesta, Ç. duyem, Stenbol 2010.

"ayetên pîroz ên ji Quranê ", " dîroka pêxemberan", "bawerî û Îslamîyet" û hwd. kiriye. Lê belê di hin menzûmeyên wî de her çiqas navên kesên dîrokî û navdar derbas bibin jî ji bo ku ji bilî navên wan tu tiştêkî din an jî tu taybetmendîyên wan ên din derbas nebûne em wan weke telmîhê nikarin bipêjirînin. Bo nimûne Feqî gava behsa demdemîbûna dinyayê dike dibêje:

"Ne Yehya ma ne Salih ma ne Harûn ma ne Mûsa ma

Ne Meryem ma ne Îsa ma ne Ehmed ma ne çaryar e "

(Feqîyê Teyran, Dilo Rabe, m. 50., r.225)

Her weke ku tê dîtîn di vê malikê de ji navên pêxemberan "Yehya, Salih, Harûn, Mûsa, Îsa û Ehmed û navê Meryemê ya dêya Îsa Pêxember derbas dibe; lê belê derbarê jîyan û serborîyên van kesan de tu delîlên telmîhê tune ne û ji ber vê jî derheqê wan de di hişê me de tu tişt nasewire. Di telmîhê de ji çî re telmîh tê kirin pêwîst e were fêmkirin²⁰⁴ Lê belê bi van navan nayê zanîn ku li ser kîjan taybetî û serborîyên wan telmîh hatiye kirin. Li ser heman mijarê û di heman helbestê de dîsa malikeke wisa derbas dibe :

“Ne Adem ma û ne Şîş ma ne Nûh ma ne Îdrîs ma

Ne Yûsuf ma ne Cercîs ma ne Eyyûbê birîndar e”

(Feqîyê Teyran, Dilo Rabe, m. 49., r.224)

Di vê mînakê de dîsa her çiqas navê Adem, Şîs, Nûh, Îdrîs, Yûsuf, Cercîs derbas bibe jî ji sedema jorîn a ku me behsa wê kiribû, li gor me weke bibîrxistinê nayê pejirandin; lê belê di dawîya malikê de bi bêjeyên "Eyyûb" û "birîndar" telmîhek li ser birînen Eyûb Pêxember hatiye kirin; lewre Hz. Eyûb bi birînen xwe yê cansoj û xedar ji aliyê Xwedê ve hatiye ceribandin û ev mijar di Qur'ana Pîroz de derbas dibe²⁰⁵. Û dîsa li ser vê mijarê hin gotinên di asta derbêmesel de jî hatine nivîsîn û gotin.²⁰⁶ Weke encam ji bo ku Feqî, bi navê Eyûb Pêxember re bêjeya "birîndar" jî bi kar anîye ew

²⁰⁴M. A. Yekta Saraç, *Klasik Edebiyat Bilgisi, Belagat*, r. 282

²⁰⁵Eyûb jî dema gazî Xwedayê xwe kir;(Xwedêyo!) Derdekî giran bi min girtiye û tu dilovantirîn dilovan î! (*Wergera Qur'ana Pîroz Bi Zimanê Kurdî*, Sûreya Enbiya, Ayeta 83., r.330)

²⁰⁶Agah Sırrı Levent, h.b., nr. 116 û 117

bûyera ku di raborîyê de hatiye jîyîn tîne bîra mirovan û ev rûdan di hişê me de disewire; lê belê di navên din de tu telmîh ava nebûne.

Bi qasî ku hatiye dîtin telmîhên Feqîyê Teyran bi gelemperî li ser bûyerên ji serê pêxemberan derbas bûne û ji van pêxemberan herî zêde li ser Hz. Mûsa yan jî hin bawerîyên ku çavkanîya wan dîne Îslamê ye û referansa wan Qur'ana pîroz e, ava bûne. Ji bilî van ji zargotina kurdî li ser Memê Alan, ji evînên tesewîfî Şêxê Sen'anî, ji evînên beşerî Leyl û Mecnûn, Yûsuf û Zuleyxa û hwd. Telmîhên curbicur di dîwana wî de cî girtine, telmîhên wî carinan bi awayekî zelal û carnar jî bi awayekî bi îma hatine nivîsîn. Ev tev nîşan didin ku Feqî, di mijara telmîhê de gelek serkeftî ye.

2.11. Îqtîbas:

Ji hêla ferhengî ve tê wateya ronahî û pîzot jêwergertîne²⁰⁷ û ji hêla têgihî ve jî "qerz" û "deynstandin"²⁰⁸ e. Di îqtîbasê de kesek di axaftin an jî nivîsînên xwe de cî dide gotineke navdar. Ev gotinên navdar ji ayetên Qur'ana pîroz û yan jî ji hedîsên Hz. Pêxember in.

Deynstandin an jî îqtîbas ji hedîsên şerîf hatîbin wergirtin jê re "tenwîr"²⁰⁹ anku "ronî kirin" tê gotin.

Di îqtîbasê de ne pêwîst e ku temamîya ayet an jî hedîsan werin nivîsîn, di menzûme û helbestekê de du-sê peyv hatîbin nivîsîn dê bes be. Dema ayet û hedîs bi tevahî hatîbin nivîsîn "tam îqtîbas" û bi tevahî nehatîbin nivîsîn jî "nîv îqtîbas" derdikeve holê.

Armanca bikaranîna ayet û hedîsên pîroz, perçînkirin û piştrastkirina peyv an jî boçûnekê ye. Ji bilî vê ew ayet û hedîsa ku hatine bikaranîn di Qur'ana pîroz û di hedîsên şerîf de di kîjan wateyên xwe de derbas bûbin pêwîst e dîsa di wê wateyê de werin bikaranîn²¹⁰. Divê neyê jibîrkirin ku helbestkar ji bo jêgirtinên ayet û hedîsan nabêje ev hedîs û ayet in, bes li gor wateya malik an jî bendan îqtîbasan bi kar tîne.

Ciwankarîya telmîh û îqtîbasê ji bo ku hinek nêzîkî hevûdin in dibe ku werin

²⁰⁷ Perwîz Cihanî, h.b., r.58

²⁰⁸ Ferit Devellioğlu, h.b., r. 424

²⁰⁹ M. A. Yekta Saraç, *Klasik Edebiyat Bilgisi, Belagat*, r. 274

²¹⁰ M. A. Yekta Saraç, *Klasik Edebiyat Bilgisi, Belagat*, r. 274

tevlîhevkerin; di îqtîbasê de ji hedîs û ayetan jêgirtineke rasterast heye û ev jêgirtin, dibe ku carinan nîv îqtîbas be jî; lê jêgirtineke resen e. Di telmîhê de ji bo bûyer, boçûn hwd. îşaret û delîl hene û ji wan bûyer û boçûnan tu jêgirtineke resen tune ye, bes derbarê wan de hin hêma û delîl hene jixwe bi xêra wan delîlan çî bûyereke navdar, çî boçûneke kevnare û çî jî çîrokek be ew tev di hişê me de disewirin. Jixwe îqtîbas ji hêla mijarê ve tenê ji ayet û hedîsan tê wergirtin; lê belê xeleka mijara telmîhê jê gelek berfirehtir e. Bo nimûne:

"Gelek sotim kirim kibab kirye bi min sed reng xirab

Ya leytenî kuntu turab wêran ez im malim xirab"

(Feqîyê Teyran, Dilber, m. 12., r.160)

Ew dilbera bêrehm û xezebxwendî, bi evîna xwe mîna goştekî biraştî ez şewitand, ez wêran kirim û mala min xira kir. Bi vî rengî bi sedan xirabî li min kiriye ji ber vê " Ya leytenî kuntu turab /... xwezî ez ax û xwelî bûma (û sax nebûma!).²¹¹" Weke ku tê dîtin ji sûreyê Nebeyê îqtîbasek hatiye çêkirin; lê belê ji bo ku ayet tam nehatiye nivîsîn "nîv îqtîbasek" derketiye holê.

"Nazik û mehbûn ciwanik qamet û bejna zirav

"Kullu şey'in" dê bin halik ji xeyrî Şahê Qudretê "

(Feqîyê Teyran, Îro Girya Me Tê, m. 10., r.141)

Ji bilî Şahê Qudretê anku Allah Teala; hemû hezkirîyên ciwan, nazik, bejinziravik û her tişt "... ji Ellah Teala pê ve her tişt (Kullu şey'in)²¹²" fanî ye û namîne." dê helak û tune bin. Bi gotina "Kullu şey'in" nîv îqtîbas hatiye çêkirin.

"Dilo erînî neke gazî cewaba lentera sazî

Meke fikrê ji Musayî dilê min Turî Sînaye"

(Feqîyê Teyran, Îlahî Lew Dikim Zarî, m. 6., r.238)

Ey dil! Gazîya "Xwe nîşanî min bide!" neke û mîna Mûsa fikaran neke; lewre

²¹¹ *Wegera Qur'ana Pîroz Bi Zimanê Kurdî, Sûreya Nebeyê, Ayeta 40., r. 584*

²¹² *Wegera Qur'ana Pîroz Bi Zimanê Kurdî, Sûreya Qesesê, Ayeta 88., r. 397*

bersiva te "... Bêguman tu yê Min nebînî! (lentera sanî²¹³)" be. Ax! Dilê min Çîyayê Sînayê ye. Di vir de gotina "lentera sanî!" îqtîbas ava kiriye. Di vê malikê de bê şik e ku Feqî bi şibandina "dilê min Turî Sîna ye" bi nêrîneke sofîyane mubalexe û telmîheke gelek xweş ava kiriye. Lewre tecelîgeha Xwedê, dilê sofîyan e û li gor vê şibandîne Xwedê di dilê Feqî de tecelî kiriye û piştî vê rûdanê dilê wî mîna Çîyayê Sînayê -ku Xwedê, li ser xwesteka Hz. Mûsayê ku ji Xwedê re gotibû: "Ez dixwazim te bibînim." li Çîyayê Sînayê tecelî kiribû û çîya ji ber vê perçe perçe bûbû- perçe perçe bûye.

"Tewhîd e 'ilmê hal e 'arif dîkin tefsîrî

Miradek e li bal e bi "mîn ledun" xebîrî

Nizanim te kî xiyal e tu b'kîjanî dilgirî"

(Feqîyê Teyran, Feqe û Bilbil, b.8., r.150)

Ev zanîneke tewhîd û 'ilmê hal e û bi gotina "... Me ew hînî zanîneke taybet kiribû (mîn ledun²¹⁴)" hatiye agahdarkirin, tenê kesên zana dîkarin vê zanîna mişt me'rîfet ji xwe re bikin armanc û li serê şîrove bikin. Ey, bilbilê kêmaqîl! Di xeyalê te de kî heye, dilê te bi çi ve ye?

Li gor peytandina me di dîwana Feqî de mînakên îqtîbas anku deynstandîne bi jimar in. Û wî, dema îqtîbasan bi kar anîne tenê ji Qur'ana pîroz sûd wergirtiye anku di dîwana wî de mînakên "tenwîrê" nehatine dîtin. Ew di menzûmeyên xwe de bikaranîna "nîvîqtîbasan" çêtir dîtiye. Jixwe bi vî awayî zimanê helbest û menzûmeyên wî ji hevok û ravekên dirêj ên erebî dûr ketiye û li gor dema wî jî kurdîyeke xwerû derketiye holê.

2.12. Teradif:

Teradif; wateya wê ya ferhengî "çûyîna li pey hevûdin", "şopandina hevûdin"²¹⁵e. Di rewanbêjîyê de du yan zêdetir peyvên ku wateya wan yek bin ji wan re teradif hatiye gotin. Peyvên ku teradifê ava dîkin di nava xwe de hemwate ne.

Bi xêra ciwankarîya hemwateyî helbestkar wateya peyvê xurt dike, ji bo vê ne pêwîst e ku peyvên hemwate li pey hev hatibin ristin. Di vê ciwankarîyê de bi gelemperî

²¹³ *Wergera Qur'ana Pîroz Bi Zimanê Kurdî*, Sûreya A'rafê, Ayeta, 143., r. 168

²¹⁴ *Wergera Qur'ana Pîroz Bi Zimanê Kurdî*, Sûreya Kehfê, Ayeta, 85., r. 302

²¹⁵ Ferit Devellioğlu, h.b., r. 1082

peyvên hemwateyî ji zimanên cihê tên girtin, ev rewş pêwendîya şêwaza helbestkar û zimanên din li ber çavan baş radixe. Bo nimûne:

“Hub rêtî canê beşer e sewda ji mêjîyê wî firî

Goyînê nêv dar û ber e bêşûc e qet nakit girî

Işq û evîna qemer e neqt û lîsanê jê birî”

(Feqîyê Teyran, Ellah Çi Zatek Ehsen e, b. 13., r.108)

'Işq û evîn di heman wateyê de ne ji ber vê ciwankariya teradifê ava bûye. Di kurdî de "evîn" çî be, di erebî de jî "işq" ew e. Her du peyv li pey hevûdin hatine nivîsîn û bi gihaneka “û”yê komepeyvek ava kirine.

“Hafizê medh û pesindan rohnîya mehbûb û rindan

Bê hesab wêrbûn bi findan sotiyê bêcan im ez “

(Feqîyê Teyran, Îro ji Dest Husna Hebîb, m. 12., r.130)

Peyvên "medh" û "pesind" teradif in, lê divê neyê jibîrkin "mehbûb" û "rind" teradif ava nekirine lewre wateya wan (hezkirî û bedew) ne yek in.

"Bêkêf kirim zilfê di reş biskê siyah, zilfêd qemer

Eşq û muhbeta min li ser wêran ez im malim xirab “

(Feqîyê Teyran, Dilber, m. 15., r. 161)

Risteya yekem xwerû teradif e; lewre bisk (kurdî) - zilf (farisî) û siyah (farisî) - qemer (erebî, di wateya reşê de) di heman wateyê de ne.

"Ji wê bejnê ji wê qamê nicûma zulmeta Şamê

Stêra dêm û endamê tecella bû li selwayê”

(Feqîyê Teyran, Qewî Îro Ze'îfhal im, m. 15., r. 424)

Peyvên ku teradif ava kirine: "bejn" û "qamê", "nicûma" û "stêra" nin; weke ku tê dîtîn di nava malikê de bi awayekî belavkirî hatine nivîsîn; lê ji xurtkirina wateya

peyvan tu tişt kêm nebûye.

Dîwana Feqî ji hêla teradifê ve bi qasî ku me peytandiye gelek dewlemend e; wî dema xwestiye wateya hin peyvan bikirpîne yan jî xwirttir bike ji hin peyvên erebî, farisî û kêm be jî ji tirkî sûd wergirtiye. Peyvên ku teradif ava kirine bi gelemperî bi gihaneka "û" yê bi hev re hatine girêdan; lê di hin malikan de bê gihanek jî mînakên teradifê hatine dîtin. Peyvên ku di dîwana wî de teradif ava kirine li gor cureya peyvê, navdêr in û dîsa hejmara van peyvan kêm caran ji du peyvan derbas bûye. Hin peyvên sereke yên ku di dîwana wî de teradif ava kirine ev in; rûh û rewal, îşq û evîn, mewc û pêl, fetl û ger, nalîn û efxan, serxweş û sekran, bade û mey, medh û pesind, wech û sûret, nar û agir, keser û kovan, bejn û bal, jan û derd, gilh û gazin, qamet û bejn, ne sultan ne xwunkar, pêt û nar; deng - sewt - awaz, ax - turab, du çav - eynan, tazîyê 'uryan, atêş - agir, gişt - exleban, reş - sîyah, biraştin - kebab û hwd.

3.CIWANKARÎYÊN BI RUXSARÊ VE TÊKILDAR IN

Ev ciwankarî ji alîyê binyadê ve bi dirûva peyvan û bi ahenga tîpan ve girêdayî ne; lê belê kêm be jî carinan bi wateya peyvan re jî têkildar in. Di van huneran de sazûn, xwendin û nivîsandina peyvan ji alîyê ahengê ve cîyekî girîng digire, ji ber vê di navbera tîp û peyvan de ji alîyê bihîstin û dîtinê ve estetîkek heye. Em ê di vê beşê de behsa ciwankarîyên mîna: "cînas, îştîqaq, alîterasyon, asonans, î'ade, muwazene û tesmîtê" bikin.

3.1. Cînas:

Cînas peyveke erebî ye û tê wateya "hevrêgezî" yê²¹⁶, di vir de rêgeza yekane jî tîp û deng in. Ji ber vê di cînasê de "hevtîpî" yan jî "hevdengî"yek derdikeve holê. Ji hêla ciwankarîyê ve cînas: Ji du yan çend peyvên xwendina wan yek; lê wateya wan ji hev cihêreng tê çêkirin.

Ciwankarîya cînasê, hunereke wisa ye ku li ser manendîya dangan ava bûye, berawirdkirina deng an jî tîpan herî kêm di navbera du peyvan de tê çêkirin û pêwîst e wateya peyvan jî ji hevûdin cuda bin, di berevajîya vê de cînas di navbera peyvan de ava nabe.

Bi qasî ku hatiye dîtin ciwankarîya cînasê bi giştî di dawîya çarîn û malikan de

²¹⁶ Perwîz Cîhanî, b.n.b., r.53

ava dibin; lê belê nayê wê wateyê ku cînas tenê di dawîya risteyan de tê dîtin. Cînas, dibe ku carinan di nava riste yan jî di serê risteyan de jî were dîtin; heta ew peyvên ku di navbera wan de cînas heye dibe ku di heman risteyê de bin jî jixwe ji vê celeba cînasê re "tecnîs"²¹⁷ tê gotin û divê were gotin ku ji vê ciwankariya wêjeyî ciwankariyên dangan ên mîna "îştîqaq" û "qelbê" hetine dariştin

Ev peyvên ku di navbera wan de cînas ava bûye ji aliyê cureya peyvê ve ji hevûdin cuda bin anku ji peyvên yek ji wan navdêr û yek ji wan jî lêker be ev rewş cînasê ji holê ranake. Di cînasê de ya bingehîn manendîya dangan e, ji vê manendîyê çiqas were dîrketin sûda ku ji cînasê tê hêvîkirin ji wê ewqas tê dîrketin.²¹⁸ Di vê pêwendê de gelek cur û celebên cînasê derdikevine holê; yên sereke "cînasa tam" û "cînasa kêr" in.

3.1.1. Cînasa Tam:

Cînasa ku di navbera du peyvên de ji aliyê "hejmar", "rêz", "awa" û "cureyên tîpan" de wekhevî û manendîyek hebe jê re dibêjin cînasa tam.²¹⁹ Cînasa tam jî di navbera xwe de dibe du beş: Cînasa basît û cînasa murekeb.²²⁰

3.1.1.1. Cînasa Basît:

Ev peyvên ku cînasê diafirînin hejmara wan yek be jê re cînasa basît anku cînasa hêsan tê gotin. Bo nimûne:

Ji destên wî dixwestin derxin welat, ax

Ew westîyabû her roj ji ber keser, ax !

Peyvên "ax" di navbera xwe de cînas ava kiriye. Di risteya yekem de "ax" tê wateya "weten" anku "welat" û ya duyem de jî tê wateya "axîn" û "axkişandinê" ev cînas jî ber ku tenê di navbera peyvekê de anku "ax"ê de çêbûye cînaseke basît e.

Emma bi neseb ne merdê Bohtan

Belkî mutewellîdê ji bohtan

²¹⁷ Îskender Pala *Ansiklopedîk Divan Şiiri Sözlüğü*, r. 92

²¹⁸ M. A. Yekta Saraç, *Klasik Edebiyat Bilgisi, Belagat*, r. 246

²¹⁹ M. Ehmedê Zivingî, C. 1., h.b., r. 47

²²⁰ M. A. Yekta Saraç, *Klasik Edebiyat Bilgisi, Belagat*, r. 247

Peyven "Bohtan" cînas e. Cînas, ji bo ku tenê di navbera peyvekê de derbas bûye cînaseke basît e.

3.1.1.2. Cînasa Murekeb:

Wan peyvên ku cînas ava kirine herî kêr yek ji wan jî ji du peyvan pêk hatibe jê re cînasa murekeb²²¹ anku cînasa hevedûdanî tê gotin. Bo nimûne:

Şahîşahê textekê Medîne

Mu'cîz ji te ew qeder me dîne

Di dawîya risteya yekem de peyva "medîne"yê di wateya bajarê Medîneyê de û di dawîya risteya duyem de jî "me muc'îzeyan dîtine" ye. Cînas bi awayê "Medîne" û "me dîne" çêbûye, weke ku tê dîtin peyva di risteya duyem de derbas dibe ji du peyvan (me dîne) pêk hatiye bi xwe re cînasa murekeb ava kiriye.

Perwa nedikir ji ateşê xem

Perwane dikir ji bo xwe her dem

"Perwa nedikir" û "Perwane dikir" ji bo ku her yek ji wan ji du peyvan pêk hatine cînasa murekeb ava bûye. Bo nimûne:

"Quds û Şam û Kerbela 'îşq li min bûbû bela

Teqdîr we ye ji "qal û bela" qet kes li bal nînin wefa"

(Feqîyê Teyran, Ey Dil Hilo Terk Ke Sefa, m. 14., r. 451)

Peyvên ku di dawîya risteya duyem û ya sêyem de derbas dibin ji alîyê wateyê ve "belaya" yekem tê wateya "qeda"yê û ya duyem jî di wateya "belê" yan jî "erê" yê. Ev her du peyv ji hêla wateyê ve ji hevûdin cihê ne; lê belê ji hêla hejmar, rêz, awa û cureyên tîpan ve manendî hevûdin in. Ji ber van her du peyvan cînaseke tam ava kiriye. Her çiqas ev cînas mîna cînaseke basît bisekine jî; lê "û" ya li pêşîya wan "... û bela" û "û bela" ew kirine cînasa murekeb; lewre peyvên ku cînas ava kirine yek ji wan ji du peyvan anku "û bela"yan pêk hatine.

²²¹ M. A. Yekta Saraç, *Klasik Edebiyat Bilgisi, Belagat*, r. 245

"Di nêv agir di nêv pêtê li ser sihlê xewa kê tê

Ecel gureye yeqîn pê tê te ne fikr e ne efkar e"

(Feqîyê Teyran, Dilo Rabe, m. 11., r.207)

Di navbera peyvên di nîvê malikê de dîsa cînasa tam a murekeb heye. Peyva "pêtê" tê wateya "agir" û peyva "pê tê" jî tê wateya "kirinê" anku bawerkirin "yeqîn pê tê". Heke em dawîya risteya yekem û her du peyvên nîvê malikê de ne berawird bikin "pêtê, kê tê, pê tê" wê demê cînasa kêma a muteqerib derdikeve holê; lewre tîpa "k"yê ji tîpên serê peyvê cî girtine cuda ye; lê ev cudahî ahenga cînasê dîsa xira nekiriye.

"Mîm û Hê" aqil ve der da sicleya işqê û derda

Lew qelem anî bi ser da me'fûyê xufra im ez"

(Feqîyê Teyran, Îro ji Dest Husna Hebîb, m.33., r. 136)

Di risteya yekem de di navbera "der da (der ket) û derda (derdan/gelek dert) de cînasa tam a murekeb ava bûye û ji bo ku ev her du peyv di heman risteyê de ne, wan tecnîs jî çêkiriye.

3.1.2. Cînasa Kêma:

Cînasa ku di navbera du peyvên de ji aliyê "hejmar", "rêz", "awa" û "cureyên tîpan" de herî kêma cudahiyeke çêbûbe jê re cînasa kêma hatiye gotin²²². Li gor kêmbûna wan manendîyan cînasa kêma jî di navbera xwe de dibin çend beş; lê belê em li ser wan binbeşan nasekinin.

Vê firqetê pir dil şewand cerhên qedîm dîsa kewand

Şîşên di sor tê de tewand feryad ji destê firqetê

Di navbera "şewand, kewand, tewand" de cînaseke kêma ava bûye; lewre tîpên li serê peyvên (ş, k û t) ji hêla awayê ve ji hevûdin cuda ne.

Geh geh sipî şubhetê şîr qet mîslê te naçin tu tîr

Reng e ku te yar têtê bîr meyla Hebîb j'çûna te tê.

²²² M. A. Yekta Saraç, *Klasik Edebiyat Bilgisi, Belagat*, r. 247

(Feqîyê Teyran, Ey Av û Av, m. 11., r.114)

Di vê malikê de peyvên mîna "şîr, tîr û bîr" cînas ava kiriye. Tîpên van peyvan ji hêla hejmar û rêzê ve manendê havûdin in; lê ji hêla awayê tîpan ve ji hevûdin cihê ne ev cudahî di navbera "ş", "t" û "b" yê de derdikeve. Ji ber vê, ev ji cureya cînasa kêma cînasa muteqerib e.

"Kaf Ha" îsmê kûr e tuxra ye di tenzîlê

Cisim wî "kohî Tur" e îcmal e di tefsîlê

Cemal ji 'eynî nûr e kewkeb e di qendîlê"

(Feqîyê Teyran, Feqe û Mela, r. 173)

Peyvên mîna "kûr", "nûr" û "Tur" ji cînasa kêma cînasa muteqerib ava kiriye û weke ku tê dîtîn qertafa "e" jî paşserwa ye.

"Mîm û Hê wesfê xwe hilda xwesmîsal in çûn di cilda

Cerh û kovan çûn di dil da ay dilê min ay dilo "

(Feqîyê Teyran, Ay Dilê Min Ay Dilo, m.19 r. 420)

"Hilda", "cilda" û "dil da" di navbera xwe de cînasa kêma ava kiriye

"Ne xalib ma ne mexlûb ma ne talib ma ne metlûb ma

Ne ewladê di Ya'qûb ma kefa behrê Yûsif xare "

(Feqîyê Teyran, Dilo Rabe, m.57., r. 227)

Peyvên mîna "xalib" û "talib" , "mexlûb" û "metlûb" bi hev re dîsa cînasa kêma muteqerib çêkiriye. Bi van tecnîsan di risteya yekem de ahengeke gelek xweş ava bûye.

"Tijî mar e tijî mûr e qewî teng e qewî kûr e

Jixwe qebrî neke dûr e li wê mal e li hir war e"

(Feqîyê Teyran, Dilo Rabe, m.16., r. 210)

Di risteya yekem de peyvên "mar" û "mûr" ji bo ku di heman risteyê de hatine dîtin tecnîs ava kiriye û li gor mînakên din tîpên ku ji hevûdin cuda ne dengdêr (a,e) in, ji ber vê cînasa kêma ava bûye. Ji bilî van di dawîya risteya yekem û di ya duyem de peyvên "kûr e" û "dûr e" dîsa cînaseke kêma ava kiriye.

Mînakên ku heta vê derê me dane her çiqas bi awayê cînasa kêma hatibin nivîsîn jî ji peyvir û çêja cînasê gelek tişt kêma nekirine û aheng û mûsîqîyeke xweş bi xwe re anîne.

Ciwankarîya cînasê, ne tenê ji hêla wêjegerên endamên wêjeya klasîk ve hatiye ecibandin; di zargotina kurmancî de jî mînakên cînasê gelek in û divê neyên jibîrkirin ev ciwankarîya dangan, ne tenê di menzûmeyan de di pexşanê de jî hatine bikaranîn jê re "sec" tê gotin. Feqî, di dîwana xwe de ji bilî çend mînakan cînasa tam bi kar neanîye, di şûna wê de cînasa kêma û di nav cureyên cînasa kêma de jî bi awayekî serdest cînasa muteqerîb anku "cînasa nêzik" bi kar anîye. Di cînasa muteqerîb de peyvên ku di navbera wan de cînas hene ji hêla hejmar, rêz, awayê tîpên wan de manendî hene; lê ev manendî ji hêla cureyên tîpan ve xira dibe. Feqî jî di menzûme û helbestên xwe de bikaranîna cînasa muteqerîb çêtir dîtiye. Ji hêla vê curecînasê ve dîwana wî gelek dewlemend e. Ji bilî vê cureya tecnîsê jî dîsa di dîwana wî de bi hejmareke baş cîyên xwe girtine. Divê were gotin ku ciwankarîya cînasê ji hêla afirandina ahenga di navbera peyvan de cîyekî taybet û girîng girtiye. Wek encam a balkêş ew e ku cînasên Feqî ne tenê di dawîya risteyên wî de hatine dîtin, gelek caran di nava risteyên wî de hatine çespendin, sedema vê jî bikaranîna serwaya navekî ye.

3.2. Iştîqaq:

Peyva iştîqaqê ji "şeqqa" erebî tê²²³; ev jî tê wateya "qelaştin, derizandin, şikandin, terikandin û dirandinê". Ji hêla ciwankarîya wêjeyî ve: Ew peyvên ku ji heman rayekê hatibin dariştin û di heman babetê de hatibin bikaranîn ji wan re iştîqaq hatiye gotin.

Bo nimûne: kir, kirin, çêker, kirde, bikir, rakirin û hwd. weke ku tê dîtin ev tev ji lêkera "kirinê" ev peyv jî ji rayeka "k" yê hatiye dariştin, bikaranîneke wisa di helbest an jî di nivîseke pexşankî de derbas bibe di navbera van peyvan de ciwankarîya iştîqaqê

²²³ Ferit Devellioğlu, h.b., r. 466

hatiye sazkirin tê gotin.

Divê neyê jibîrkirin ku di mijara îştîqaqê de du xalên girîng hene. Yek ji wan ev e: Ew peyvên ku di navbera wan de ciwankariya îştîqaqê ava bûye pêwîst e ji heman rayekê hatibin dariştin; anku jêderka wan yek be. Lewre carinan hin peyv hene ku ji hêla teşeyê ve weke ku ji heman rayekê hatibin dariştin tên xuyakirin; lê belê ev peyv mîna îştîqaqê nayên pejirandin. Bo nimûne:

“Da kaxetê “îsbat” bikin qeydêd hûr “îtîbar” bikin

Carek li min “îzhar” bikin “wazih” ku fêmê min re tê”

(Feqîyê Teyran, Ey Av û Av, m.23., r.119)

Peyvê mîna “îsbat, îtîbar û îzhar” dema bi rûxsarî têne xwendin musîqîyeke xweş ava dîkin û weke ku ji heman rayekê hatibin dariştin xuya dîkin; lê belê îsbat ji “s-b-t”, îtîbar ji “-b-r” û îzhar jî ji rayeka “z-h-r-” hatiye dariştin. Weke ku têne dîtin ev peyv ji bo ku ji heman rayekê nehatine dariştin ji îştîqaqê nayên pejirandin. Minakên wisa wek “qaşo îştîqaq” dikarin werin binavkirin. Weke ku tê dîtin ev xal bi etîmolojîya peyvan ve girêdayî ye. Xala duyem jî ev e: Divê peyvên ku ji heman rayekê hatine dariştin ji hêla wateyê ve ji hevûdin cuda bin; anku ji rayekekê herî kêr ji du peyvên ku wateyên wan ne weke hevûdin in ava bibin. Lê belê li ser vê xalê yekdemgîyek derneketiye holê; lewre di hin mînakên pirtûkên ku li ser rewanbêjîyê hatine nivîsîn de (Klasîk Edebiyat Bilgisi M. A. Yekta Saraç nr. 254-256, Divan Edebiyatı; İskender Pala, r. 157) tê dîtin ku peyvên ku nehatine dariştin an jî wateya wan nehatibe guhertin mîna îştîqaqê hatine çespendin û nîşandan. Li ser vê mijarê dîsa em dikarin ji dîwana Feqî mînakekê bidin:

“Nalîna teyr û tiyûran kalîna çeng û bilûran

Xulxulîn d’qesr û qisûran bilbilê xweşxwan im ez

(Feqîyê Teyran, Îro ji Dest Husna Hebîb, m.8., r. 129)

Her çiqas peyvên “qesr” û “qisûr” ji rayeka “q-s-r” yê hatibin jî lê wateya wan neguherîye anku ev peyv ne dariştî ne; lewre qesr tê wateya mal û xaniyê mezin, qisûr jî pirjimarîya wê ye, ji ber vê tu wateya wan neguherîye. Bo nimûneyên din: aşiq û uşşaq,

sermê û sarî; fikr û efkar; qelb û qulûb şahê û şahan; hat, nehat û hatibû û hwd. Ev mînak di heman rewşê de ne. Li gor me van peyvên di navbera xwe de îştîqaq ava nekiriye. Dema em li hin çavkanîya dinêrin (Türk Şiir Bilgisi, Cem Dilçin, nr. 483-484, Osmanlıca - Türkçe Ansiklopedik Lûgat, pênaseya îştîqaqê binêre, r. 466) dibînin ku di navbera vê şîrove û nêzîkahîya me û mînakên ku wan di pirtûkên xwe de dane lihevkirinek heye. Lê belê ev mijar ji nîqaş û şîroveyan re vekirî ye. Wek encam li gor me peyvên ku di nav xwe de îştîqaq ava kirine divê ji heman rayekê hatibin dariştin û wateyên wan jî ji hevûdin cuda bûbin mîna parêz, parastin, parêzger, parêzgeh û hwd.

Me, dema mînakên îştîqaqê yên di dîwana Feqî de peytandine her du xalên ku li jorê behsa wan kiriye li ber çavan girtine. Bo nimûne:

"Sani'ê "ku feyekun" ê alimê bûn û nebûnê

Mifteya dil pê vebûnê narê 'îşqê zatî ye"

(Feqîyê Teyran, Ah ji Destê Cama Wîsalê, m. 3., r.487)

Peyvên "bûn", "nebûnê" û "vebûnê" ji lêkera bûnê, bûn jî ji rayeka "-b"yê dariştî ye; ev her sê peyv ji hêla wateyê ve ji hevûdin cihê ne; anku ji rayekê sê peyvên nû hatine ava kirin. Naxwe van peyvên di navbera xwe de îştîqaq ava nekiriye. Lê divê neyê jibîrkirin di risteya yekem de îqtîbasa navdar a "kun feyekun" her çiqas derbas bibe jî her du peyvên wê di navbera xwe de îştîqaq ava nekiriye. Lewre rayeka wan yek e; lê ne dariştî ne (kun/bibe, feyekûn/dibe) anku du peyvên ku wateyên wan ji hevûdin cihê ne, derneketine holê.

"Gul im destê xaran b'ismê Muhammed nav im

Bilbil im di gulzaran ji îşqê lew zerbav im

Di remza muhirdaran tu roj î, ez hetaw im "

(Feqîyê Teyran, Feqe û Mela, r.200)

Di vê sêrista ku Feqî navê xwe yê rastî daye li ser xwe du şibandin neqşandine: Ez, ew gula ku ketime destê strîyan û ew bilbilê ku di nav baxçeyê gulan de xweşxan im. Peyvên "gul" û "gulzar" anku "baxçeyê gulan" di nav xwe de îştîqaq çêkiriye lewre

ev her du peyv ji rayeka gulê hatine dariştin.

"Lat sûretek heq e ji esmeyên heqqanî

Li bal min muheqqeq e di nêv keşfa subhanî

Lahut e her mutleq e di nasûta însanî “

(Feqîyê Teyran, Feqe û Mela, r.194)

Ev mînak, ji hêla musîqîyê ve gelek hêja ye; lewre hin dengdar û dengdêr gelek caran hatine dubarekirin û serwa hem di nava risteyan de û hem jî di dawîya risteyan de hatine bikaranîn û dîsa sê peyvên ku di navbera wan de îştîqaq ava bûye di vê bendikê de cîyên xwe girtine. Van tevan kiriye ku musîqîya vê bendê berztir û xweştir bibe. Peyvên "heq, heqqanî û muheqqeq" di navbera xwe de îştîqaq ava kiriye; lewre ev her sê peyv ji rayeka "heq" tê û ji hêla wateyê ve jî heq tê wateya "maf"ê heqqanî tê wateya "ew tiştê ku li heqîyê tê" yan jî "ew tiştê li ser heqîyê " û muheqqeq jî tê wateya "teqezîyê". Di vir de rayek yek e; lê wateya peyvan ji hevûdin cuda ye. Divê neyê jibîrkin ku peyva "mutleqê" bi wan re îştîqaq ava nekiriye; lewre rayeka wê û wan ne yek e, ev bi wan re "qaşo îştîqaqê" û dîsa peyvên "lahût" û "nasût" jî bi hev re "qaşo îştîqaq"ê ava dikin.

"J' wesfîyetê cuda kirin ji subhetê em rakirin

Heta qiyam sewda kirin sergeşte yin di hicretê “

(Feqîyê Teyran, Ey Av û Av, m. 46, r.125)

Peyvên "kirin" û "rakirin"ê bi rêya pêşgira "ra"yê hem ji hêla wateyê û hem jî ji hêla sazûnê ve ji hevûdin cuda bûne; lê her du jî ji lêkera kirinê û ev lêker jî ji rayeka "-k"yê dariştiye.

“Sema û saz û hey hey tê ji reqsê ‘er’er û ney tê

Şerab û şerbet û mey tê ji dest mehbûbê saz xweş tê”

(Feqîyê Teyran, Ji ‘Îşqê Sofîme Welleh, m. 4., r.435)

Peyvên “şerab” û “şerbet”ê îştîqaq saz kiriye.

Her çiqas ev mijar ji hin alîyan ve tam nehatibe zelalkirin jî dema em li dîwana Feqî dinêrin dibînin ku ji alîyê ciwankariya îştîqaqê ve gelek serkeftî û dewlemend e. Jixwe, menzûmeyên Feqî ji alîyê aheng û musîqîyê ve gelek xurt in û yek ji sedema xwirtbûna musîqîya nav peyvên risteyên wî jî helbet ciwankariya îştîqaqê ye. Ciwankariya îştîqaqê di nav menzûmeyên wî de bi peyvên kurdî, farisî û erebî hatine ava kirin. Bo nimûne: Rakirin - kirin, gah - bêgah, çêkir - kir, heye - nebûn - bûn, bax - baxvan, mey - meyhan, heq - heqqanî - muheqqeq, gul - gulzar, hîcran - mehcûr, Rehîm - Rehman, Şerab - şerbet û hwd. Ji bilî van qaşo îştîqaq jî hene û ev gelek in: me'fû - xufan, qiyam - qu'ûd, xewfan - xew û hwd.

3.3. Alîterasyon û Asonans:

Alîterasyon ji Fransî anku "alliteration"ê hatiye. Di helbest û pexşanê de ji bo ahengek were saz kirin ew kîte û "dengdarên" ku xwe di ser an jî di dawîya peyvên de dubare dikin ji wan re "alîterasyon" hatiye gotin.²²⁴

Ciwankariya alîterasyonê dubarekirina deng û ahengkirina gotinan e.²²⁵ Anku ciwankariyeke dangan e. Ev ciwankari bi piranî bi rêya tîpên dengdar tîpên duristkirin, heman deng/tîp di nava riste yan jî di nava peyvên de çend caran xwe dubare dikin û hevdengîyekê saz dikin, ev hevdengî caran di nava kîteyan de jî dikare were dîtin. Bi rêya alîterasyonê di navbera peyvên de musîqîyeke xweş derdikeve holê û ev jî "musîqîya hindurîn a dengdar" jî.

Ji bilî alîterasyonê, ciwankariyeke din a dangan heye ku ew jî "asonans" e; asonans jî ji heman zimanê hatiye. Di asonansê de tîpa/dengê ku tê dubarekirin "dengdêr" e û di vê de jî "musîqîya hindurîn a dengdêran" derdikeve holê.

Di vê ev her du termên ku ji Fransî hatine, me neşehitîne; anku li pêşîya tevlihevî û çewtîyeke ku em bibêjin Feqîyê Teyran di bin bandora wêjeya Fransî de maye veneke. Lewre dibe ku ev her du term (alîterasyon û asonans) ji alîyê binavkirinê ve Fransî bin; lê ji hêla tetbîqkirinê ve di nava risteyên wêjegerên klasîk ên kurd de bi awayekî karîger û xurt cîyên xwe girtine. Ev tê vê wateyê: Dibe ku nav ne yek be, heta nav lê nehatibe kirin jî; lê kar, yek e. Lewre çî bi rêya îlhamê û çî bizane bûn, di encamê de di nav peyv û risteyên wî de lihevanîneke dangan a xweş derketiye holê û bi zimanê

²²⁴ İskender Pala, Ansiklopedik Divan Şiiri Sözlüğü, r.20

²²⁵ M.Ehmedê Zivingî, b.n.b., C. 1., r.,50

wêjeya îroyîn jî ev ciwankarî bi navê alîterasyon û asonansê hatine binavkirin. Bo nimûne:

“Kuştîme her du 'uyûnan Yengiyên nîsbet ji nûnan

Radikin ew qetl û xûnan girtiyê zindan im ez ”

(Feqîyê Teyran, Îro ji Dest Husna Hebîb, m.15., r. 131)

Dengdara ku herî zêde xwe dubare dîke "n" ye anku "n" ciwankarîya alîterasyonê ava kiriye. Gava mirov bi baldarî li malikê dinêre dibîne ku tîpa "n"yê di dawîya peyvan de çêtir hatiye dubarekirin. Tîpa "n"yê diwazdeh caran di nava malikê de hatiye dubarekirin û ahengek ava kiriye.

“Dinê berdan ‘ewanan

Le’net bî l’kal û canan

Vêkra biç’ne sekmanan

‘Ecem nekin emanan”

(Feqîyê Teyran, Şerê Dimdim, ç. 11., r. 385)

Di vê çarristê de tîpa “n”yê çardeh caran xwe dubare kiriye û alîterasyon ava kiriye.

"Serxweş û sekran û mest im e'fayê eswed digest im

Sebr û aram çûn ji dest im ay dilê min ay dilo... “

(Feqîyê Teyran, Ay Dilê Min Ay Dilo, m.3., r. 417)

Weke ku tê dîtîn tîpa "s"yê di nava malikê de heşt caran xwe dubare kiriye û ev tîp bi awayekî mêzîn cîyê xwe di malikê de girtiye, nexwe "s" alîterasyon e. Lê divê neyê jibîrkirin tîpa "e"yê deh caran û ya "i"yê jî heşt caran hatiye dubarekirin, van her du tîpan jî asonansê ava kiriye.

“Dilo newma me jê behs e beyana xefletê nehs e

Ne hişyarî gelek tehs e me nêv xabe ku mirdar e”

(Feqîyê Teyran, Dilo Rabe, m.3., r. 204)

Bi awayekî serdest tîpa "e"yê xwe dubare kiriye, ev deng şazdeh caran hatiye bikaranîn. Ev malik adeta bi dengê "e"yê hatiye nivîsîn, bi xêra vê asonansê ahengeke gelek serkeftî derketiye holê.

“Paşî wan xal û nîşanan qet nayê bêhna rihanan

Ji mîhnetê êş û janan tên ji narê firqetê “

(Feqîyê Teyran, Qewî Îro Girya Me Tê, m. 17., r. 143)

Tîpa "n"yê sêzdeh caran û tîpa "a"yê jî diwazdeh caran xwe dubare kiriye di vê malikê de hem alîterasyon û hem jî asonans heye.

"Tu bi qesta min dikujî tu bi kifra dil nasojî

Gelek sotim kirim rijî wêran ez im malim xirab”

(Feqîyê Teyran, Dilber, m.8., r. 159)

Bi tîpa "i"yê asonans ava bûye û ew sêzdeh caran hatiye dubarekirin.

Weke ku berî niha jî me gotibû, taybetîyeke berbiçav a dîwana Feqî bikaranîna musîqîyê ye. Peyv û risteyên ku di menzûmeyên wî de hatine neqşandin ji alîyê lihevkirina dangan ve gelek xurt in. Bê mubalexe adeta aheng û musîqîyeke xweş ji peyvên risteyên wî difûre û ev dîlkêşîyek li wan dike û dibe navgîna çêjeke xweş. Bi qasî ku me peytandiye alîterasyon û asonansên ku di risteyên wî de hatine dîtin bi awayê tîpên dengdar û dengdêr in, anku bi gelemperî ne bi awayekê kîteyî ne. Carinan di hin malikan de du sê tîpên dengdêr ku ji hevûdin cuda ne alîterasyonê ava dikin û ev rewş carinan di asonansan de jî tê dîtin. Ji bilî van di hin malikan de tîpên ku xwe dubare dikin hem dengdêr û hem jî dengdar in; anku di van malikan de hem alîterasyon û hem jî asonans bi hev re derdikevin holê. Di dîwana Feqî de kêma zêde tîpên sereke yê ku alîterasyon û asonansê ava dikin ev in. Alîterasyon: "b, m, n, r, s, l... hwd." û ji vana herî zêde tîpa "n"yê; Asonans: "a, e, ê, i ... hwd." û ji vana jî tîpên mîna "e, i "yê tîpên serdest in. Wek encam, dikare were gotin ku Feqî di kêma cîyan de (di malik an jî komeristeyan de) asonans û alîterasyon bi kar neanîne.

3.4. Î'ade:

Peyva î'adeyê ji hêla ferhengî ve tê wateya "veger", "lêvegerandin", "paş ve vegerandin", "lêzîvirandin"²²⁶ê. Ji hêla ciwankarîya wêjeyî ve î'ade: Ew peyv an jî komepeyvên ku di dawîya malikekê de cîyê xwe girtine di serê malika bin re hatibin nivîsîn ji wî karî re ciwankarîya î'adeyê hatiye gotin. Ji bilî vê salixdayînê, peyva ku di dawîya malikê de hatibe nivîsîn careke din di serê malika bin re tê dubarekirin²²⁷. Di vê ciwankarîyê de "lêvegerandin"ek derdikeve holê; lewre peyva ku dibe mijar, di malika pêşî de tê nivîsîn û di ya duyem de careke din tê nivîsîn anku tê lêvegerandin.

Ciwankarîya î'adeyê di helbest û menzûmeyan de bi du guherto anku bi du celebên derdikeve pêşberî me. Ji bo celeba yekem "redûl-acûz ele's-sedr"²²⁸ Ji bo ku baş were fêmkirin dikare bi vî awayî were şemakirin:

Malika 1. _____
_____ A _____

Malika 2. _____
_____ A _____
_____ B _____

Malika 3. _____
_____ B _____
_____ C _____

Weke ku tê dîtin peyva di dawîya malikê de û peyva di serê malika bin re yek in, ew helbestên ku bi vî rengî hatine nivîsîn ji wan re "muad"²²⁹ anku "ya ku hatiye vegerandin" tê gotin. Ev lêvegerandin, me li jor jî gotibû, bi awayê komepeyvî jî çêdibe.

²²⁶Ferit Devellioğlu, h.b., r. 401

²²⁷M. A. Yekta Saraç, *Klasik Edebiyat Bilgisi, Belagat*, r. 263

²²⁸Cem Dilçin, b.n.b., r. 486

²²⁹Cem Dilçin, h.b., r. 486

Ji bo ku celeba duyem a î'adeyê "muqedem û mûcher"²³⁰ anku "ya pêş û ya paş " e şemaya vê cure î'adeyê jî wisa ye:

Malika 1.

_____A_____

_____A_____

Malika 2.

_____B_____

_____B_____

Ji vê şemayê jî tê fêmkirin ku peyvya di serê malik û di dawîya malikê de anku peyvya pêş û paş yek in. Wek encam di redûl acûz ele's -sedr de heman peyv di navbera malikan de; lê di muqedem û mûcher de di nava malikekê de tê dubarekirin.

Peyvên ku xwe, çi di navbera malikan de û çi jî di nava malikekê de dubare dikin ji hêla manendina hevûdin dibin sê cure:

- A) Peyvên ku ji alîyê wate, nivîs û bilêvkerinê ve yek in.
- B) Peyvên ku ji alîyê nivîs û bilêvkerinê ve yek in, lê ji alîyê wateyê ve cuda ne.
- C) Peyvên ku ji heman rayekê (iştîqaq) hatine dariştin an jî wisa xuya dikin.²³¹

Divê neyê jibîrkerin ku ew peyvên bûne mijara î'adeyê dibe ku ji alîyê hin daçek an jî tîpan ve ji hevûdin cuda bin²³². Lê ev kêmasîyek naxe î'adeyê û mirov vê dikare wek kêmasîyekê nehesibîne. Bo nimûne:

"Da seh bikin vê melê cuz'ek ji behsa ewwelê

Binyad-i bûna menzelê dewran û çerxa **xîvetê**"

Xîvetê alem di navê j' berketa fetz û gulavê

²³⁰ Cem Dilçin, h.b., r. 487

²³¹ M. A. Yekta Saraç, *Klasik Edebiyat Bilgisi, Belagat*, r. 263

²³² M. A. Yekta Saraç, *Klasik Edebiyat Bilgisi, Belagat*, r. 263

Min temenna ki ji avê ji me'neya heqîqetê"

"Heqîqeta van cewheran me'rîfeta 'enasiran

Penhan neke j'yar û biran bê dev bibêje hikmetê"

(Feqîyê Teyran, Ey Av û Av, m. 45, 46 û 47., nr. 117-118)

Di navbera mîna "Xîvetê" û "Xîveta", "Heqîqetê û heqîqeta" de î'ade ava bûye.

Di her du mînakên de her çiqas qertafên dawîyê (-ê û -a) cuda bin jî ev ji bo î'adeyê ne kêmasîyek e. Ji hêla bikaranîna cîyên peyvên ve ev î'adeya "redûl - acûz ele's - sedr" e û peyvên ku î'ade ava kirine ji hêla bilêvkirin, nivîsîn û wateyê ve yek in.

"Tu yî Xaliq ez im bende ze'îfê jar û şermende

Dirêj lewra dilim hind e te kêma nabî ji îhsanê "

"Ji îhsana te pur 'am e sema û erz ketin Şam e

Di gunahan de xerîq mame tu her mewcûd û subha î "

(Feqîyê Teyran, Îlahî 'Ebdûkel Atak, m. 15 û 16., r. 432)

Bi peyvên "ji îhsanê" û "ji îhsana" î'adeyê "redûl -acûz ele's -sedr çêbûye. Peyvên "îhsanê ji" hem ji alîyê bilêvkirin û nivîsînê ve hem jî ji alîyê wateyê ve yek in. Jixwe daçeka pêşîya wan jî (ji) di heman rewşê de ye.

"Wucûda min heye me'dûm melek fi'lan dîkin me'lûm

Bi heqqê Wahîdê Qeyyûm nekî meşleh di dîwanê"

"Di dîwanê bibim hazir gunahê min nekî zahir

Bibexşî min nefer kafîr nemînim xerqê 'isyanê "

(Feqîyê Teyran, Îlahî 'Ebdûkel Atak, m. 17 û 18., r. 432)

Weke ku tê dîtin di wan her du malikan de di navbera "di dîwanê"yan de ciwankarîya î'adeyê ava bûye û ev jî weke mînakên din î'adeyê "redûl -acûz ele's - sedr e.

Piranîya peyvên ku bûne mijara î'adeyê hem ji alîyê bilêvkirin û nivîsînê ve û hem jî ji alîyê wateyê ve yek in. Peyv û komepeyvên sereke yên di dîwana Feqî de cîyên xwe girtine ev in: "ta'et - Ta'et, Xulmetê - xulmetê, dengê te tê - dengê te tê, nakî beyan vê îlletê - vê îlletê beyan bike, xîvetê - xîveta, heqîqetê - heqîqîta, teftêş bikin me'rîfetê - me'rîfetê teftêş bikin, cuda kirin j' wesfîyetê - j' wesfîyetê cuda kirin, sergeşte yin di hîcretê - Di hîcretê sergeşte yin, ma hûn nebûn di hizretê - Di hizretê ma hûn nebûn, nivîstin – nivîstin, tu Rehman î - tu Rehman î, ji ihsanê - ji ihsana, heybetê - heybet, şîretê - şîret, heraretê - herareta, gulistanê - gulistana, di fermanê - ji fermanê û hwd. bi vî rengî bi dehan mînakên din hene. Ji van mînakên tê fêmkirin ku Feqî ne tenê bi peyvên bi komepeyvên jî î'adeyê ava kirine û ya balkêş û ji hêla wêjeyê ve ya hêja ev e ku: Ew dema bi komepeyvên î'adeyê saz dike di malika bin wan de cîhê komepeyvên diguherîne û adeta di nava ciwankarîyekê de ciwankarîyek din ava dike û ev ciwankarîya ku ava dike mîna ciwankarîya 'eksê anku dengvedanê ye. Bo nimûne:

"Carek bibêj em çar xweh in bê meshelet nakerr'ihîn

Ji meşyetê na bettîhîn **cuda kirin j'wesfîyetê** “

“J'wesfîyetê cuda kirin ji şubhetê em rakirin

Heta qiyam sewda kirin **sergeşte yin di hîretê**”

”**Di hîcretê sergeşte yin** qaîm li ser zatê xwe yîn

Çarde tebeq karê we yîn rabû ji maza xefletê”

(Feqîyê Teyran, Ey Av û Av, m. 45, 46 û 47., r. 125)

Ji van malikan tê fêmkirin ku di nav komepeyvên mîna "cuda kirin j' wesfîyetê" û "j'wesfîyetê cuda kirin", "sergeşte yin di hîcretê" û "di hîcretê sergeşte yin" de hem ciwankarîyek î'adeyê û hem jî “ekis” anku cîguherîna peyvên jî heye. Ji bo ku mînakên bi vî awayî di dîwana wî de gelek hene ev ne tesaduf e, çêtirdîtina wî ye.

Me li jor jî behs kiribû: Ciwankarîya î'adeyê di dîwana Feqî de bi awayekî guherbar cîyê xwe girtiye. Heta hin peyv hene ku mîna î'adeyê di navbera malikan de hatine lêvegeradin; lê ew li salixdayîna î'adeyê nayên ji ber vê em nikarin ji wan re bibêjin î'adeyên tam. Ji bo zelalkirina mijarê mînaekeke wisa em dikarin bidin:

"Ah ji dest baran û qehran min sebir nayêt li sehran

Şubhetê mewcê **di behran qulzemê** 'Umman im ez

"Qulzem û behrên di heftê agirê eşqê ku heftê

Dê sojît şubhetê neftê **min diye** û pê zanim ez"

"Min diye muhbet çî reng e soht û dijwar e pereng e

Min mudam dil jê bi heng e bi nalîn û efxan im ez "

(Feqîyê Teyran, Îro ji Dest Husna Hebîb, m. 5 ,6 û 7., nr. 128-129)

Peyvên mîna "Qulzemê "û "Qulzem", komepeyvên mîna "Min diye" û "Min diye" di nav malika de û di serê risteyan de tên lêvegerandin. Feqî, ji bo ku di gelek cîyan de pê nûsa xwe bi vî rengî bezandiye em fêrî dikin ku ev terciheke wî ye; anku li gor xwe ciwankariyek ava kiriye; lê belê ji bo ku tam naşibe î'adeyekê jê re î'adeya kêr; anku î'adeya naqis jî dikare were gotin.

Bi qasî me çespandiye cureya yekane ku di dîwana wî de hatiye bikaranîn î'adeya "redûl -acûz ele's -sedr"e; em tûşî tu mînakên î'adeya "muqedem û mûcher"ê nebûne. Jixwe me ev agahî bi mînakên jorîn li ber çavan raxistiye.

Wek encam li gor çespanîna me mînakên vê ciwankariyê herî zêde di van menzûmeyan de li pey hevûdin hatine rastin: "Ey Av û Av ", "Îlahî 'Ebdukel Atak" ,"Îro Ji Eşqa Sorgulê" û hwd. Divê were gotin ku vê ciwankariyê kiriye ku di navbera malikên wî de -herî zêde ji aliyê mijarê ve- têkilîyeke zîndî ava bibe û wana adeta mîna xelekên zîncîrekê bi hev ve girêdaye.

3.5.Muwazene:

Muwazene; di ferhengê de tê wateya “du tişên ku ji aliyê wezn û giraniyê ve yek in”, “berbihevûna du tiştan”, “qiyas” û “pîvan”²³³ê. Weke têgeheke rewanbêjîyê: Çî pexşan çî jî di menzûmeyan de “du peyvên ku bi heman kêşeyê û di bin hev re

²³³Ferit Devellioğlu, h.b., r. 696

hatibin nivîsîn” di navbera wan de muwazene heye tê gotin.²³⁴

Muwazene, di navbera du peyvên/tefîleyên ku bi hev re hev kêş bin tê çêkirin; ev her du tefîle, divê di bin hevûdin re hatibin ristin. Bi vî awayî di navbera du tefîleyan de bi heman keşê sîmetrîyek ava dibe. Lê belê ya herî girîng jî divê di navbera van peyvên de serwa tune be, heke hebe dê wê demê ne muwazene lê sec’ derkeve holê.

Bo nimûne:

“**Xizmeta** şertê xulaman

Deftera ‘aqiltemaman

Teb’etê naehlê xaman

Xeber ji xelqê wan netê”

(Feqîyê Teyran, Şêx Sen’an, b.123., r.271)

Weke ku tê dîtin, di vê malikê de peyvên di serê her sê risteyên pêşî de bi hev re sîmetrîyeke dangan anku muwazene ava kiriye: Xiz- me- ta(- . -), Def-te-ra(- . -) û Teb-’e-tê(- . -) û di dawîya van peyvên de serwa jî tune ye.

“**Çengela** şîrînkêlamê

Merkeza Şêxê selamê

J’rohniyê kete zelamê

Din ava nûr û zulmetê”

(Feqîyê Teyran, Şêx Sen’an, b.134., r.274)

Peyvên mîna: Çen-ge-la(- . -), Mer-ke-za(- . -), J’roh-ni-yê(- . -) di navbera xwe de hevdengîyek ava kiriye.

“**Muhrêya rohnî** şerîf e

Neynika Şêxê şerîf e

²³⁴ M. A. Yekta Saraç, *Klasik Edebiyat Bilgisi, Belagat*, r. 258

Mezhera Şahê letîf e

Me'dena durdane tê"

(Feqîyê Teyran, Şêx Sen'an, b.247., r.306)

Komepeyvên mîna: Muh-ri-ya roh-nî(- . - / - -), (- . - / - -), Ney-ni-ka Şê-xê(- . - / - -), Mez-he-ra Şa-hê(- . - / - -) û Me'-de-na(- . -) muwazene çêkiriye.

"Xem'î bi libsê haciyan

Werbû di dilqê sofiyan

Zêde 'esa û tizbiyan

Ji canibê Necdê ve tê"

(Feqîyê Teyran, Bersîsê 'Abid, b. 46., r.347)

Xem'-î bi lib-sê(- . - / . / - / - -) û Wer-bû di dil-qê(- . - / . / - / - -) weke ku tê dîtin di navbera xwe de dîsa muwazene ava kiriye.

Dikare were gotin ku di dîwana Feqî de ciwankarîya muwazeneyê gelek lawaz maye, sedema vê li gor hizra me ev e: Feqî di erûzê de ne gelek serkeftî ye. Di beşa duyem a binbeşa erûzê de jixwe me cî dabû vê agahîyê ku kifşkirina keşa erûzê ya di menzûme û helbestên wî de gelek dijwar in. Çewtîyên wî yên erûzê ji mînakên ku me li jorê cî daye wa kifş dibe; lewre mînakên vê ciwankarîyê di berhema wî ya bi navê Şêxê Sen'an de zehfir hatine dîtin. Wek encam di dîwana wî de mînakên berbiçav ên vê ciwankarîyê gelek kêr in.

3.6. Tesmît:

Tesmît, tê wateya "aliqandinê". Ji alîyê rewanbêjîyê ve dema di xezel û qesîdeyên musemmat de malikek dibe çar beş, her sê beşên pêşî di nav xwe de û beşa dawî jî di dawîya malika ser xwe re hemserwa be ciwankarîya tesmîtê derdikeve holê.

Şemakirina wê:

Malika 1.

_____ A _____ A
_____ A _____ C

Malika 2.

_____ B _____ B
_____ B _____ C

Weke ku tê dîtî her sê beşên pêşî (B, B, B) bi hev re û ya dawî jî (C) bi dawîya malika ser xwe re (C) hem aheng e, jixwe ji bo ku beşa çarem bi beşa ser xwe re ji aliyê ahengê ve aliqandî ye jê re “tesmît” anku “aliqandin” hatiye gotin. Bo nimûne:

“Bê rahet û bê sekne **yî** / yan ‘aşiqê baxwê xwe **yî**

Yan şubhetê qelbê me **yî** / ji işqa kê natebitê”

“Ji işqa kê her têtî û têtî / heta kengê her bêtî û bey

Bom in bêj heyrana kêy / da ez bizanim qissetê”

(Feqîyê Teyran, Ey Av û Av, m. 2. û 3., n. r. 111 û 112)

Weke ku tê dîtî ev malik ji xezeleke musemmat hatine wergirtin û her malikek dibe çar beş. Her sê beşên malika duyem di nav xwe de bi serwa ne; beşa çarem jî bi dawîya risteya ser xwe re bi serwa ye. Anku peyvên mîna “têtî”, “bêtî” û “kêtî” bi hev re “natebitê” û “qissetê” jî bi hev re hemdengîyek ava kiriye û bi vî rengî tesmît derxistiye holê.

“Dilo newma me jê **behs e** / beyana xefletê **nehs e**

Ne hişyarî gelek **tehs e** / me nêv xabe ku mirdar e”

“Dilo rabe ji vê **xabê** / wekî bapîr û wek **babê**

Em jî dê çîne **turabê** / bi bal baxwo û ferwar e”

(Feqîyê Teyran, Dilo Rabe, m. 3. û 4., r. 204)

Di malika duyem de peyvên mîna “xabê”, babê” û turabê” bi hev re hemserwa ne û peyva “ferwar e” jî bi peyva “mirdar e “ re aliqî ye anku pê re bi serwa ye û bi vî awayî tesmît ava bûye.

“Reşrihana ser **deravan** / ‘enbera **rîşîbelavan**

Her seherbihn çû **hinavan** / qutiya miska **‘ebîq”**

“Reqs û şama tê di **baxê** / gulşenê bilbil bi **şaxê**

Xweş dikir cerhan û **daxê** / şubhetê xemra **rehîq”**

(Feqîyê Teyran, Ordeka Ava Cizîrê, m. 3. û 4., r. 453)

Peyvên “baxê”, “şaxê” û “daxê” bi hev re û “ ‘ebîq” û “rehîq” jî bi hev re serwa ne.

“Kes nizanit ew **bibêjit** / hêstiran j’xûnê **bibarît**

Dil di ‘îşqê **bipêjit** / sani’ê wî **baqî ye”**

“Sani’ê kun **feyekûnê** / ‘alimê bûn û **nebûnê**

Mifteya dil pê **vebûnê** / narê ‘îşqê **zatî ye”**

(Feqîyê Teyran, Ah ji Destê Cama Wîsalê, m. 2. û 3., r. 487)

Dîsa “feyekûnê”, “nebûnê” û “vebûnê” di nav xwe de bi serwa ne û peyvên “zatî ye” û baqî ye” jî bi hev re serwa ne, wan bi vî rengî ciwankariya tesmîtê ava kiriye.

Feqîyê Teyran, menzûmeyên wî yên tesewîfî û dîrokî ne tê de, ji bo ku hemû helbestên xwe bi serwaya navekî nivîsiye di hemû helbest û menzûmeyên wî de bê îstisna ev ciwankarî peyda bûye.

ENCAM

Feqîyê Teyran, bi navê xwe yê rasteqîn “Mîm û Hê” anku Mihemmed Hekkarî, di navbera sedsalên 16em û 17em de jîyaye. Ew tenê ne helbestkarê girîng ê van sedsalan e; ew, yek ji helbestkarên cihêreng ê dîroka wêjeya kurdî ye. Di çarçoveya mijarên ku me ji xwe re bijartibû û lêkolîna wan ji xwe re kiribû armanc hindik be jî bi vî awayî dikare were rêzkirin:

Gava keşên erûzê li berhemên Feqîyê Teyran tên teqdîkirin em dibînin ku 29 berhemên wî bi keşa erûzê hatine nivîsîn. Ev jî ji behra recezê: “Mustefîlun/Mustefîlun” û “Mustefîlun/Mustefîlun/Mustefîlun/Mustefîlun” ji behra hecezê: “Mefa’îlun/Mefa’îlun/Mefa’îlun/Mefa’îlun” û ji behra remelê jî: “Fa’îlatun/ Fa’îlatun/ Fa’îlatun/ Fa’îlun” in. Lê belê di 4 berhemên wî de me tu cureyên keşa erûzê neçespanîye, ji ber vê me ew mîna bi 7 kîteyî û 14 kîteyî hatine nivîsîn pejirandine. Di vê peywendê de dikare were gotin ku Feqîyê Teyran di keşa erûzê de gelek ne serkeftî ye; lewre di gelek berhemên wî de em gelek caran tûşî zîhaf û îmaleyan hatin û qelsbûna ciwankarîya muwazeneyê jî vê çespanîna me piştrast dike. Digel van di hin menzûme û helbestên wî de jî carinan kîteyên kêman jî yên zêde derdiketin pêşberî me. Ev kêmasî hem di berhemên wî yên bi erûzê û hem jî yên bi kîteyî hatine nivîsîn dihatin dîtin. Lê belê ev polînkirin piştî ku edîsyon krîtîkeke zanistî li ser destxetên Feqîyê Teyran were kirin dibe ku biguhere.

Helbestên Feqî, bi formên teşeyên nezmê yên mîna xezel, qesîde, muselles û serbixwe hatine nivîsîn; lê belê di vê mijarê de ew, xwedî cîyekî cuda ye: Xezelên wî ne mîna xezelên asayî ne; lewre wî 24 helbestên xwe di forma xezelên musemmat, muzeyyel û bêmetla nivîsîne. Di vir de ya balkêş xezelên wî yên bêmetla ne; lewre ev helbestên wî bi her awayî dişibin xezelan, lê malika wan a destpêkê tune ye. Loma bi vî navî hatine nimandin. Ji van 24 xezelan 8 ji wan bi vî awayî hatine nivîsîn. Helbesteke wî jî bi awayê qesîdeya musemmat hatiye ristin, lê ev jî qesîdeyeke nekemilî ye anku beşên qesîdeyê tê de tune ne. Dîsa 4 helbestên wî bi forma musellesan hatine nivîsîn. Feqîyê Teyran di musellesên xwe de ji alîyê honandina serwayê ve ne li gor musellesên asayî tevgerîyaye; lewre muselles, bi awayê aaa/bbba/cca/ û hwd. tên ristin; lê yên Feqî bi awayê aaa/bbb/ccc/ û hwd. hatine nivîsîn. Lê belê dibe ku ev taybetîyeke musellesên kurdî be jî. Balkêşîyeke wî ya din jî teşeyên wî yên serbixwe ne, 4 menzûmeyên wî jî ji

bo ku li tu formên teşeyên nezmê nedihatî ew bi vî rengî hatine binavkirin; lê belê ev menzûme ji gelek alîyan ve dişibin destanên çêker jî.

Di helbest û menzûmeyên Feqîyê Teyran de hemû mînakên cureyên serwa û paşerwayê hatine dîtin. Di vê mijarê de ya ku derdikeve pêş bêguman serwaya navekî ye; lewre wî di hemû helbestên xwe de serwaya navekî bi kar anîne. Vê jî kiriye ku helbestên wî ji alîyê ahengê ve gelek bi hêztir bibe. Heta ahenga serwaya navekî, kiriye ku helbestên wî hêsantir werin jiberkirin jî. Nexwe helbestên wî ji alîyê aheng û musîqîyê ve gelek xurt in, jixwe di berhemên wî de zêdebûna ciwankarîyên wêjeyî yên ku bi ahengê re têkildar in mîna cînas, alîterasyon, asonans, î'ade û hwd. nîşaneyên xurtbûna ahenga helbest û menzûmeyên wî ne.

Ji ciwankarîyên wêjeyî û termên ku Feqî di helbest û menzûmeyên xwe de bi kar anîne em ji wan têdigihîjin ku ew 'ilmê hal ê tesewifê baş dizane û ji bo vê mutesewifekî jidil û dilsoj e. Digel vê em ji şêwaza wî ya hestewar û mijarên vegotîne fêmkirin ku ew helbestkarekî evînê ye, jixwe ji ber vê ye ku di gelek helbestên wî de hewarî û reşbînîyek tê hîskirin. Mubalexe jî ji bo kesekî wisa guncantirîn ciwankarî ye, ew bi xêra vê ciwankarîyê carinan zor daye sînoren xeyalên xwe û vê jî ne bi şêwaza wêjeya klasîk a tîkel û giran kiriye. Lewre gava taybetîyên zimanê wî li ber çavan tê raxistinê tê dîtin ku di berhemên wî de peyvên farisî ne gelek in, ên tirkî jî bi jimar in, lê yên erebî her çiqas zêde bin jî ev tê de beloq nakin û sedema zêdebûna peyvên erebî ji perwerdeya wî ya medreseyê tê. Jixwe ji naveroka berhemên wî tê fêmkirin ku ew ji alîyê 'ilm û zanîne ve jî gelek tîr û tije ye; lewre wî li gelek medreseyên Kurdistanê perwerdeyeke baş girtiye.

Wî, bi şêwaza xwe ya hêsan û riwîn razên dilê xwe bi navbeynkarîya gelek ciwankarîyên resen û jîrane vegotiye. Ciwankarîyên ku di helbest û menzûmeyên wî de cîyên xwe girtine ji bilî cureyên wan 25 heb in. Me ji ciwankarîyên bi mecazan re têkildar in 6, ji ciwankarîyên bi wateyê ve têkildar in 12 û ji ciwankarîyên bi rûxsarê ve têkildar in jî 7 heb ciwankarî çespendine. Lê em bawer dikin ku hejmara wan ne ewqas tenê ne û digel vê, ciwankarîyên wî ne tenê ji alîyê çendîniyê ve dewlemend in, wî ji alîyê çawanîyê ve jî gelek ciwankarîyên wêjeyî yên bi çêj hilberandine.

ÇAVKANÎ

- Adak, Abdurrahman: *Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk*, Weş. Nûbihar, Stenbol 2013
- Abdurrahman, Adak•Yusuf Baluken•Hayrullah Acar, "Gora Feqîyê Teyran", Nûbihar
Akdemî, H. 1, C. 1, Stenbol 2014
- Abdurrahman, Adak: *İslam Ansiklopedisi*, Weş. Türkiye Diyanet Vakfı, Stenbol 1988
- Azîzan, Herekol: *Klasîkên Me An Şahîr û Edîbên Me Ên Kevin*, Şam 1941
- Barnas, Rojen: *Termên Edebî*, Weş. ?, Swêd 1992
- Boleli, Nurettin, *Belagat, Arap Edebiyatı Bilgi ve Teorileri*, Weş. Marmara Üniversitesi
İlahiyat Fakültesi Vakıf Yayınları, Stenbol 1993
- Bozarslan, M.Emin: *Mem û Zîn*, Weş. Deng, Stenbol 2010
- Cebecioğlu, Ethem: *Tasavvuf Terimleri ve Deyimler Sözlüğü*, Weş. Otto, Ankara 2014
- Celîl, Ordîxanê, Celîlê Celîl: *Zargotina Kurda*, Weş. Aram, Amed 2013
- Celîl, Ordîxanê: *Kürt Kahramanlık Destanı, Dımdım*(Wer.: İbrahim Kale), Weş. Avesta,
Stenbol 2001
- Cîhanî, Perwîz: *Mem û Zîn*, Weş. Nûbihar, Stenbol 2010
- Develioğlu, Ferit: *Osmanlıca-Türkçe Ansiklopedik Lûgat*, Weş Aydın Kitapevi,
Enqere2001
- Dêreşî, Seîd: *Kelehên Ava*, Weş. Spîrêz, Hewlêr 2005
- : *Dîwana Feqîyê Teyran*, Weş. Lîs, 2011 Enqere
- Dilçin, Cem: *Örneklerle Türk Şiir Bilgisi*, Weş. TDK, Enqere 2004
- Dilovan, Selman–Huseyn Şemrexî: *Dîwana Seyîd Elîyê Findikî*, Weş. Nûbihar, Stenbol
2012
- Doskî, Tehsîn İbrahim: *Dîwana Fethî, Mela Ebdulfettah Hezoyî*, Weş. Nûbihar, Stenbol
2012
- : *Dîwana Perto Begê Hekkarî*, Weş. Nûbihar, Stenbol 2014

- Farqînî, Zana: *Ferhenga kurdî-tirkî*, Weş. Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Stenbol 2004
- Îzolî, D: *Ferhenga kurdî-tirkî, tirkî- kurdî*, Weş., Deng, Stenbol 2013
- Kaplan, Mahmut: *Esrâr Dede Divanı 'nda Renkler*, International Periodical For The
Languages, Literature and History of Turkish or Turkic Volume 8/1 Winter,
Enqere 2013
- Kara, Mustafa: *Tasavvuf ve Tarikatlar Tarihi*, Weş. Dergah, Ç. Sêzdehem, Stenbol 2016
- Kurdo, Prof.Qanatê: *Tarixa Edebyeta Kurdi*, Weş. Öz-Ge, Enqere 1992
- Lescot, Roger: *Memê Alan*, Weş. Avesta, Ç. duyem, Stenbol 2010.
- Levend, Agah Sırrı: *Divan Edebiyatı, Kelimeler ve Remizler-Mazmunlar ve
Mefhumlar*, Weş. Enderun, Stenbol 1984
- Malmîsanij, M. : *Ji bo rastnivîsînê Ferhenga Kurdî(Kurmancî)-Tirkî*, Weş. Rûpel,
Stenbol 2012
- Orkin, Şeyhmus: *Di Berhemên Feqîyê Teyran de Hêmanên Tesewîfî*, Zanîngeha
Alparslan a Muşê Estîtuya Zanistên Civakî, Şaxa Makezanista Ziman
û Çanda Kurdî, Teza Lîsansa Bilind (Teza neçapbûyî), Muş 2015
- Pala, İskender: *Divan Edebiyatı*, Weş. Ötüken, Stenbol 1998
- : *Ansiklopedik Divan Şiiri Sözlüğü*, Weş. Kapı, Stenbol 2004
- Qur'ana Pîroz : *Wergera Qur'ana Pîroz Bi Zimanê Kurdî*, Wer., Mele Huseynê Êsî,
Mele Se'îdê Girdarî, Mele Muhemmed Bêrkevanî, Weş. Bang, Ç. duyem, Stenbol 2011
- Sadîni, M. Xalid: *Feqîyê Teyran, Jîyan, Helbest û Berhemên Wî*, Weş. Nûbihar,
Stenbol 2013
- : *Mela Huseynê Bateyî, Jîyan, Helbest û Berhemên Wî*, Weş. Nûbihar,
Stenbol 2011
- : *"Çend Mesele di Derbarê Feqîyê Teyran de"*, Nûbihar, H.127, Stenbol 2014

- Sagniç, Feqî Huseyn: *Dîroka Wêjeya Kurdî*, Weş. Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Stenbol, 2002
- Samur, Aziz: *Destana Zembîlfiroş û Gulxatîn*, Weş. Nûbihar, Çapa yekem, Stenbol 2015
- Saraç, Yekta M.A.: *Klasik Edebiyat Bilgisi*, Weş. Gökkubbe, Stenbol 2010
- : *Klasik Edebiyat Bilgisi, Biçim-Ölçü-Kafiye*, Weş. Gökkubbe, Ç. nehem, Stenbol, 2015
- Saydun, Edip: *Berawirdkirina Feqîyê Teyran û Melayê Bateyî*, Semînera Lîsansa Bilind a Bitez, Semînera neçapkirî, Wan 2015
- Serdar, Bamed: *Dîwana Şêx Şemsedîne Exlatî*, Weş. Nûbihar, Ç. Yekem, Stenbol 2015
- Şerefhan: *Şerefname Kürt Tarihi* (Wer.:M. Emin Bozarslan), Weş. Hasat, Stenbol 1990
- Tan, Samî: *Rêzimana Kurmancî*, Weş. Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Stenbol 2011
- Temo, Selim: *Kürt Şiiri Antolojisi*, C. 1., Weş. Agora, Ç. yekem, Stenbol 2007
- Tenîk, Alî: *Tarihsel Süreçte Kürt Coğrafyasında Tasvvuf ve Tarikatlar*, Weş. Nûbihar, Ç. yekem, 2015 Stenbol
- Uludağ, Süleyman: *Tasavvuf Terimleri Sözlüğü*, Weş. Kabalıcı, Ç. duyem, Stenbol 2016,
- Uzun, Mehmet: *Destpêka Edebiyata Kurdî*, Weş. Îtakî, Ç. sêyem, 2011 Stenbol
- Xanî, Ehmedê: *HEM Û BERHEM*, Weş. Lîs, Ç. Yekem, Stenbol 2008
- Yanık, Nevzat: *Edebi Bilgiler ve Aruz*, Weş. Fenomen, Ç. yekem, 2007 Erzirom
- Yıldırım, Kadri: *Faki-yi Teyran Divan-Dîwan Feki-yi Teyran*, Wer. Kadri Yıldırım, Weş. Wezaretê Çandê, Ç. yekem, Enqere 2014
- Yûsif, Ebdurreqîb: *Dîwana Kurmancî, Şairên Klasîk ên Kurd*, Weş. Dîwan, Stenbol 2012

Zivingî, Mela Ehmedê: *Gerdeniya Gewherî /Şerha Dîwana Melayê Cizîrî*, Weş.

Avesta, Ç. yekem, C. sêyem, Stenbol 2013

<http://samil.ihya.org/ansiklopedi/anasir-i-erbaa.html>, gihîştin:01.25.2017

<https://www.etimolojiturkce.com> gihîştin, :04.06.2017



JÎNENÎGARÎ

Edip SAYDUN, di 17ê Gulana 1981ê de li Batmanê hatiye dinyayê. Dibistana seretayî, ya navîn û lîseyê li heman bajarî xwend. Piştî di navbera 2001 û 2005an de li Zanîngeha Yüzüncü Yıl a Wanê beşa Wêje û Zimanê Tirkî lîsansa xwe qedand. Piştî bi salan dersên ziman û wêjeyê da. Di sala 2013an de li Zanîngeha Mardin Artukluyê Enstîtuya Zimanên Zindî yê li Tirkîyeyê di Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî de lîsansa bilind a bêtez xilas kir. Ji 2015an ve li Batmanê di dibistaneke navîn de dersa kurdî ya kurmançî bi awayekî fermî dide. Ew zewicîye û xwedîyê du zarokan e.

